

Z E N D



RÊZEPİRTÛK / 2

BERPİRSÊ WEŞANÊ
Yaşar Eroğlu

SERERASTKIRIN
Zana Farqînî, Yaşar Eroğlu

TASHÎH
Qahir Bateyî

MÎZANPAJ
Besna Tonguç

ÇAP
Îmaj Matbaacılık

ISBN
975-6282-15-3

Wênêyê bergê yê pêşîn
Şahan

Wênêyê bergê yê paşîn
www.diyarbakir.com

ZEND BİLİM KÜLTÜR EĞİTİM BASIN YAYIN LTD. ŞTİ.
Namık Kemal Cad. Gençoğlu İş Merkezi No: 19/6 Aksaray / İST
Tel: (0212) 586 39 84 Fax: 586 39 90

NAVEROK

JI ZENDÊ.....2

LI TIRKIYEYÊ REWŞA ZIMANÊ KURDÎ3/12

NASNAMEYA KURD Ê PIRSGIRÊKA ZIMAN
PHILIP G. KREYENBROEK13/20

GIRÎNGIYA XALBENDIYÊ
ADAR JIYAN21/25

HIN TAYBETIYÊN CÎNAVKA VEGEROK
SAMÎ BERBANG26/27

TEWANG Ê RAYEKA LÊKERAN
ZANA FARQÎNÎ28/31

BERNAMEYA BEŞA DÎROKÊ YA ENSTÎTUYA
KURDÎ YA STENBOLÊ (II)
BEŞA DÎROKÊ32/39

MAMOSTEYÊ SÊYEMÎN XANÎ
CEMŞÎD BENDER40/42

LI SER WERGERA M. EMÎN BOZARSLAN A
MEM Ê ZÎNA EHMEDE XANÎ
PERWÎZ CÎHANÎ43/52

MELA EHMEDE XASÎ
C. ZERDUŞT PÎRANIJ53/55

PÎR ŞALYARÊ HEWRAMÎ YÊ YEKEM
M. REŞÎD IRGAT56/57

ŞÊX MIHEMED KARBELAYÎ
KEREM SOYLU58/60

BI ZANA FARQÎNÎ RE HEVPEYVÎN
YAŞAR EROĞLU61/72

TEORIYA MUZİKÊ YA GIŞTÎ
VEYSÎ VARLI73/87

ÊZÎDÎTÎ
EZÎZÊ CEWO88/93

XEBAT Ê ÇALAKIYÊN ENSTÎTUYÊ94/96

JI ZENDÊ

Piştî salekê ji nû ve merheba.

Ji bo kovarake sê mehî, salek demeke dirêj e. Me ancax di nav salekê de pêk anî ku em bikaribin Zendê bi rêk û pêk bigihînin ber destên we. Mixabin ev rastiyêke me bû. Em jî li gor vê rastiyê tevgeriyan. Lê jiyana bi hincetan nameşe, em lêborîna xwe ji we dixwazin.

Ji ber pirsgirêkên fermî, Zendê dîsan wek rêzepirtûk derkeve. Me hewl da ku em vê hejmarê jî bi naverokeke xurt bigihînin we. Me nivîsên vê hejmarê bi zanebûn wek nivîsarên dirêj hilibijartin. Digel vê yekê, ew nivîsên cur bi cur in û em bawer dikin ku dê bala we bikişînin.

Di vê hejmarê de hûn dê nivîsara Veysî Varli bixwînin. Nivîsareke lekolînî ye û bi giştî derbarê muzîkê û muzîka kurdî de, dîtî û nêrînên nû pêşkêş dike. Ji ber ku ev nivîsareke dirêj e, loma jî em dê berdeewamiya wê di hejmara bê de biweşînin. Hûn dê di vê hejmarê de nivîsara Perwîz Cîhanî bibînin ku li ser xebata Mem û Zînê ya M. Emîn Bozarslan werger û tîpguhêziya wê kiriye. Ev nivîsareke rexneyî û nirxandinî ye.

Piştî demek dirêj em ê cih bidine hevpeyvînekê. Me xwest ku wek amadekarê du ferhengên em Zana Farqînî û xebatên wî binasînin. Hevalê me Yaşar Eroğlu, bi Zana Farqînî re hevpeyvînek pêk anî û em wisan bawer dikin ku xebateke baş derket holê.

Ezîzê Cewo, di nivîsara xwe ya balkêş de, cih daye ezîdîtiyê û ji jiyana xwe jî, bi dayîna mînanan behs kiriye.

Di vê hejmarê de dîsan giraniya nivîsaran mijarên li ser ziman in. Xebateke Zana Farqînî li ser tewanga lêkeran e. Farqînî di vê xebata xwe ya lêkolînî de balê dikişîne ser tewanga di lêkeran de. Samî Tan jî di xebata xwe de li ser cînavka "xwe" rawestiyaye.

Adar Jiyan, di nivîsara xwe de li ser xalbendiyê rawestiyaye û girîngiya xalbendiyê derxistiyê pêş. Ji Zanîngeha Utrechtê ya Holandayê Philip G. Kreyenbroek li ser nasnameya kurd û pirsgirêka ziman sekiniye.

Di nav rûpelên kovarê de nivîsarên din ên cur bi cur jî cihên xwe girtine. Li ser dîroka perwerdeya ziman Cîhan Pola nivîsiye. Lêkolîner û dîrokzan Cemşîd Bender, derbarê pirtûka H. Mem "Mamosteyê Sêyemîn Xanî" de nivîsiye û ew daye nasandin. Kerem Soyul jî danasîna Şêx Mihemed Kerbelayî kiriye. Bernameya Beşa Dîrokê, ku ji hejmara beriya vê dest pê kiribû, bi beşa xwe ya dawî cih girt.

Di hejmara heştêmîn a Zendê de xebatên Enstîtuyê yê navxweyî jî cih girtine. Bi sernavê "Xebat û Çalakiyên Enstîtuyê" hûn dikarin ji xebat û çalakiyên enstîtuyê jî agahdar bibin. Em dê ji îro pê de jî cih bidin xebat û çalakiyên Enstîtuyê.

Dîsan me pêwîst dît ku em teblîxa bi navê "Li Tirkiyeyê Rewşa Zimanê Kurdî" biweşînin, ku Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê pêşkêşî Konferansa Ziman a Amedê kiribû.

C. Zerdestî Piranij, bi zaravayê kirmanckî (dimilkî) Mela Ehmedê Xasî û mevlûda wî dide naskirin.

Me dixwest ku nivîsarên bi zaravayê kirmanckî zêdetir bin, lê mixabin li ber destên me nivîsîn in û em tengasiyê dikişînin. Lewre em bi nivîsekê bisînor man. Bi hêviya ku em di hejmarên bê de rêjeya nivîsaran kirmanckî zêdetir bikin û nivîskarên ku bi vî zaravayî dinivîsin jî me ji vî zaravayî mehrûm nekin. Em bi riya Zendê bang dikin ku xwendevanên me bila eleqeyêke xurt nîşan bidin ku kovara Zendê baştir û zêdetir bibe navgîna berbelayîbûna zaravayê kirmanckî jî.

Lê ne tenê ji bo kirmanckî, eger xwînerên me bixwazin ku Zendeke xurtir bigihîje ber destên wan, bila ew jî nivîs û xebatên xwe ji me re bişînin. Bi rastî jî her kovarek bi qasî xwendina xwe, bi piştigirîya nivîsarên xwendevanên xwe jî mezin û xurtir dibe.

Bi van hest û ramanan em bang li xwînerên Zendê dikin, zendê ji xwe bêpar mekin.

LI TIRKIYEYÊ REWŞA ZIMANÊ KURDÎ*

A) Berî Komara Tirkîyeyê rewşa zimanê kurdî

Beriya em ji rewşa zimanê kurdî ya li Tirkîyeyê behs bikin, bi awayekî serkî be jî, me divê ku pêşî em ji rewşa wê ya dewra osmanî ya sedsala 20'an behs bikin. Gava em behsa vê demê bikin jî, em dê bi du aliyên nêzikayî lê bikin. Yek ji aliyê çap û weşanê ve, ya duduyan jî, ji hêla perwerdehiya bi zimanê kurdî ve.

1) Weşanên bi zimanê kurdî

Em pêşî ji rewşa çap û weşanan ên bi zimanê kurdî dest pê bikin. Wek ku tê zanîn, siyaseta tund a osmanî ya li hemberî gelê kurd, ji dewra Siltan Mehmed II. ve dest pê dike. Bi vî siltanî, kurd û pê re jî zimanê kurdî rastî êrîş û berastengkirinên qanûnî tên. Bi vê yekê re jî êdî gelê kurd wek hêmaneke mîletê osmanî tê ragihandin.

Digel vê rewşê, di nav sînor û tixûbên dewleta osmanî de, weşanên bi zimanê kurdî derketine û li medreseyan, ligel zimanê erebî, bi zimanê kurdî perwerde û hîndekarî hatiye kirin. Ev weşanên ku hatine derxistin jî, bi piranî du zimanî bûne, wek zimanê kurdî û osmanî.

Îcar li hemberî weşanên kurdî, kargerî û rêveberiya

dewleta osmanî tu car ne xwedî helwesteke pak bûye⁽¹⁾. Ji lew re rojnameya yekemîn a kurdan, Kurdistan (22 avrêl 1898) ne li paytexta osmanî Stenbolê, lê belê li Qehîreya Misrê derçûye û gav avêtiye nav jiyana weşanê ya kurdî. Paşê jî neçar maye û barî çend deverên din kiriye. Ji lew re em dikarin bibêjin ku ew ji ber vê rewşê bûye rojnameyê geroke.⁽²⁾

Ji ber ku em nikarin rewşa zimanê kurdî ji rewşa siyasî ya kurdan cihê bifikirin û wisan hildin dest, divê em bînin bîra xwe ku çî gava rewşa siyasî xweş bûye pêşeng, zana, rewşenbîr û kesên xuyanî yên kurd zemîn dîtine dest birine xwe, ketine nav

Ji ber ku em nikarin rewşa zimanê kurdî ji rewşa siyasî ya kurdan cihê bifikirin û wisan hildin dest, divê em bînin bîra xwe ku çî gava rewşa siyasî xweş bûye pêşeng, zana, rewşenbîr û kesên xuyanî yên kurd zemîn dîtine dest birine xwe, ketine nav karên çandî û pê qîma xwe neanîne dam û dezgehên weşanî, perwerdehî saz kirine û xwestine gelê kurd bi rêxistin bikin.

karên çandî û pê qîma xwe neanîne dam û dezgehên weşanî, perwerdehî saz kirine û xwestine gelê kurd bi rêxistin bikin.

Ji bo nimûne, piştî îlana meşrûiyetê (1908), em dibînin kurdan dest bi derxistina kovar û rojnameyan kirine, zend û bend hildane dam û dezgeh, sazî û rêxistin ava kirine. Bi gotineke din, bi geşbûna ramana neteweyî û tevgerên pê re têkildar re, welatparêz û neteweperwerên kurd hem hejmara weşanên kurdî zêde kirine û hem jî sazî û rêxistinên kurdan damezirandine.

Wekî avakirina sazî û rêxistinên mîna Kürdistan azm-i Kavî Cemiyeti (Komeleya Wireya Zexm a Kurdistanê), Kürd Teavûn ve Terakkî Cemiyeti (Komeleya Hevkarî û Pêşketina Kurd), Kürd Tamim-i Maarif Cemiyeti (Komeleya Kurd a Ji bo Belavkirina Zanîne), Kürd Talebe Hêvî Cemiyeti (Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî) û derxistina mîna weşanên bi navê Kürd Teavûn ve Terakkî Gazetesi, Yekbûn, Kurdistan, Rojî Kurd û Hetawî Kurd.⁽³⁾

Ji van rêxistinan me divê ku em piçek balê bikişînin ser Kürd Teavûn ve Terakkî Cemiyetiyê (Komeleya Hevkarî û Pêşketina Kurd). Vê Kome-

leyê gelek siyasetmedar, rewşenbîr û xuyaniyên kurdan di nav xwe de dihewandin. Di nav armancên vê saziyê de daxwazên girîng hebûn ku wê dixwest zimanê kurdî wek zimanekî resmî bi dewleta Osmanî bide pejirandin, zanîngeh û dibistanan ava bike, bi zimanê dayikê jî rojname û kovaran derxe. Heta bi navê "Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi" rojnameyêke bi kurdî-tirkî derxistiye ku ev weşan hefteyî bûye. ⁽⁴⁾

Dîsan em dizanin ku kurdan tenê qîma xwe bi avakirina rêxistin û bi derxistina weşanan neaniye. Heta ji bo ku xwendin û nivîsandinê di nav kurdan de belav bikin, li Stenbolê dibistanek jî vekirine. ⁽⁵⁾

Ev rewşa hanê ya baş, ku ji bo kurdan wek geşbûnekê dikare bê nirxandin, ancax heta Şerê Cîhanê yê Pêşîn domiyaye. Karbidestên Îttihad ve Terakkîyê (Yekîti û Pêşketinê) derbeyeke kujende li van weşan û saziyan xistine û endam, rêveber û kargerên wan, pêşeng û kadroyên wan ên xuyani girtine şandine cepheyên şer. Ku Celadet Bedirxan bi xwe jî di nav kesan de bûye. Ew li cepheyê Qefqasê tevî artêşa osmanî bûye û wî şerê rûsan kiriyê.

Di dema Şerê Cîhanê yê Pêşîn de, bi gotineke din ji sala 1914'an heta sala 1918'an çalakiyên çandî, yên çap û weşanê yên kurdan ji neçarî radiwestin.

Piştî Mutarekeya Mondrosê (1918) ku osmanî qels dikeve, kurd dîsa dest bi derxistina weşanan dikin, sazî û dezge-

hên xwe dadimezirînin. Ji bo mînak Kürdistan Teali Cemiyeti (Komeleya Pêşketina Kurdistanê) û kovarên mîna Jîn û Kurdistanê ⁽⁶⁾.

Sedemê ku em dixwazin ji van sazî û weşanan behs bikin ev e. Ev sazî û weşan ji bo daxwazên kurdan hatibûn avakirin û derxistin. Jixwe carek weşan, navgîn û amûrên hişyarî, agahdarî û birêxistina bîr û bawerî, hizir û ramanên kurdan bûn. Her wiha bi van weşanan, dorpêç û berastengkirina zimanê kurdî dihat şikandin. Geşbûna zimên pêçêdibû û ew adetê zimanê nivîskî yê kurdî di nav kesên xwende û rewşenbîrên kurd de berbelav dibû, dibû kevneşopiyek. Rewşenbîrên vê demê dixwestin dibistan li Kurdistanê jî vebin û di nav wan de bi zimanê kurdî perwerdehî bê kirin.

2) Medrese

Li nav kurdan heta avakirina Komara Tirkîyeyê medreseyan cihekî girîng digirt. Lewma medrese ji aliyê parastin û pêşvebirina zimanê kurdî ve xwedî roleke girîng û berbiçav bûn. Ev gotina ku kurd dibêjin "dê medreseya zarokan e", ji vir tê. Ew, warê hîndekarî û perwerdehiyê bûn. Bi gotina îro, dibistan bûn. Li ser dozdeh zanistan perwerdehî hebû. A ev gotina "meleyê dozdeh ilmî" ji ber vê yekê ye.

Li medreseyên Kurdistanê, zimanê perwerdehiyê ligel zimanê erebî, bi zimanê kurdî bû. Xort û ciwanên kurd li van medreseyan, li ber destê

mele û seydayan perwerde dibûn. Gava ji van medreseyan mezûn dibûn jî, ligel zimanê kurdî, bi erebî û heta bi farisî jî dipeyvîn, dixwendin û dinivîsandin. Ew helbestkarên me yên ku em bi wan serbilind û şanaz in, tev ji van medreseyan rabûne û ji me re berhemên hêja û nemir hiştine. Ji van medreseyan ne tenê helbestkar û wêjekar, her wiha gelek kesên zana, ronakbîr û zanyar jî rabûne.

Aliyekî din î medreseyan jî heye ku, neteweperweriya

Li nav kurdan heta avakirina Komara Tirkîyeyê medreseyan cihekî girîng digirt. Lewma medrese ji aliyê parastin û pêşvebirina zimanê kurdî ve xwedî roleke girîng û berbiçav bûn. Ev gotina ku kurd dibêjin "dê medreseya zarokan e", ji vir tê. Ew, warê hîndekarî û perwerdehiyê bûn. Bi gotina îro, dibistan bûn. Li ser dozdeh zanistan perwerdehî hebû. A ev gotina "meleyê dozdeh ilmî" ji ber vê yekê ye.

kurdî ji van damezireweyan derketiye. Ango tevgera neteweyî ya kurdan, li ser zemîna medreseyan şax û aj daye.

Îcar bi xurtbûna tevgera kemalîstan û bi îlankirina komarê re, êdî rê li ber weşanên kurdî û medreseyan tê girtin. Bi taybetî bi qanûna Tevhîd-i Tedrisatê, hemû medreseyên li nav sînorên Tirkîyeyê hatin girtin. Çendî li nav kurdan bi awayekî fiilî

van medreseyan jiyana xwe domandibin û dereng ji holê rabûbin jî, lê bandor û hîkariya wan a li ser gel, hêdî hêdî kêmbû. Dibistanên komarê serî ji van dameziraweyên perwerdehiyê stend û ew ji holê rakirin.

Li van dibistanan zimanê perwerdehiyê bi temamî tirkî ye û axaftina bi kurdî bi xwe jî li nav van dibistanan qedexeyê. Kesên ku ji van dibistanan radibûn, êdî bi qasî dê û bavên xwe, bi qandî kesên nexwende nikaribûn bi zimanê xwe yê bav û kalan bipeyîvin. Her wiha, kesên ku ji medreseyan rabûbûn, bi alfabe ya aramî (ango erebî) ya bi kurdî dinivîsandin. Lê belê yên ku li van dibistanan, li dibistanên komarê dixwendin û yên ku ji wan mezûn dibûn, nikaribûn bi kurdî binivîsandina û her wiha ji fêhmkirina alfabe ya erebî jî bêpar diman.

A bi qedexekirina van sazîyan, derbeyeke mezin li civariya çand û edebiyata kurdî ya nivîskî hate xistin. Êdî nifşên berê û yên nû, ji hev qut dibûn. Nifşeke din bi zîhnîyeteke din radibû, ku bi piranî ji raboriya xwe qut bû. Vê nifşê nikaribû têkilî bi nifşên beriya xwe re daniya. Di navbera van her du nifşan de danûstendineke çandî, wêjeyî û zimanî çenedibû. Ji ber ku ziman û alfabe ya ku pê perwerdehî didîtin, ji hev cuda bûn.

B) Di heyama komarê de rewşa kurdî

Piştî me ev agahî dan, hîna

em hez dikin li Tirkîyeyê li ser rewşa zimanê kurdî rawestin. Lê dîsan jî em dixwazin li gorî dewr û çaxan vê mijarê hildine dest. Serê pêşîn ji dewra avakirina Komara Tirkîyeyê heta makeqanûna (qanûna bingehîn) sala 1961'ê, em ê li ser rewşa zimanê kurdî rawestin. Berî vê em dixwazin hinek li ser peyv û gotina zimanê kurdî rawestin, bê mebesta me jê çiyê. Heta niha bi vê terkîbê, mebesta me hemû zaravayên zimanê kurdî bûn ku di nav sînorên dewleta osmanî de dihatin axaftin. Lê piştî Peymana Lozanê, tenê du zaravayên zimanê kurdî di nav tixûbên Komara Tirkîyeyê de man. Loma, qesta me ya ji zimanê kurdî, êdî ji bo her du zaravayan e. Ji bo kurmançî û kirmançî (zazakî) ye.

Niha em ji çaxa damezirandina Komara Tirkîyeyê heta sala 1961'ê pê bikevin û bere bere em bi mijara xwe de biçin. Sedemê ku em heta sala 1961ê dabaşê didin ber xwe jî, ev e. Piştî makeqanûna sala 1961'ê li Tirkîyeyê bi awayekî dîtineyî (îzafî) be jî rewşeke demokratîk peyde bûye û kurdan jî ji vê rewşê hinek sûd wergirtiye.

1) Ji dema avakirina komarê heya sala 1961'ê

Her çendî em wek rewşa zimanê kurdî li mijarê dinêrin û wisan bi nav dikin jî, lê belê rewş ji rewşa gelê kurd, ji rewşa wî ya siyasî cihê nikare bê fikirkirin. Mesele, di rastiya xwe de arîşe û kêşeya kurdî ye.

Digel ku di çaxa têkoşîna ji bo damezirandina dewleta Tirkîyeyê de, kurdan cihê xwe stendibin û ji aliyê serokê vê tevgerê Mustefa Kemal Atatürk ve wek hêmana sereke ya dewletê hatibin binavkirin jî, nemaze piştî Peymana Lozanê û makeqanûna sala 1924'an, hebûna kurdan hatiye redkirin, zimanê kurdî hatiye qedexekirin, medreseyan kurdan jî bi qanûna Tevhîd-i Tedrisatê hatine girtin. Makeqanûna sala 1924'an her kesê ku li Tirkîyeyê dijiya tirk bi nav dikir. Jixwe karakterê komarê jî ev bû. Etnîsîteya sereke tirk bû û yên din jî di nav vê nîjadê de diviya bihatina bişaftin û helandin. Serwerên Tirkîyeyê, bi vê makeqanûnê, çawaniya komarê dabûn xuyakirin û niyeta xwe jî aşkera kiribûn.

Berî Tevgera Îttihad û Teraqî û Komara Tirkîyeyê, Me-

Peymana Lozanê û makeqanûna sala 1924'an, hebûna kurdan hatiye redkirin, zimanê kurdî hatiye qedexekirin, medreseyan kurdan jî bi qanûna Tevhîd-i Tedrisatê hatine girtin. Makeqanûna sala 1924'an her kesê ku li Tirkîyeyê dijiya tirk bi nav dikir. Jixwe karakterê komarê jî ev bû. Etnîsîteya sereke tirk bû û yên din jî di nav vê nîjadê de diviya bihatina bişaftin û helandin. Serwerên Tirkîyeyê, bi vê makeqanûnê, çawaniya ko-marê dabûn xuyakirin û niyeta xwe jî aşkera kiribûn.

zopotamyaya jêrîn û Anatoliya baxçeyên çand û zimanan bûn, lê piştî avakirina komarê ev baxçe bûn goristana çand û zimanan. Tek ziman, tek çand, tek nijad, bi kurtasî te-kîfî (monolîte) bûye felsefeya komara nû.

Lê kurdan, ev rewşa nû ne-pijirandine û wekî ku çawan tê zanîn, êdî dema serhildan û berxwedanên kurdan ên li hemberî polîtîkayên hikûmeta navendî, dest pê kirine. Wekî serhildan û berxwedanên Şêx Seîd, Agirî, Dêrsim û yên din.

Rejîmê ne tenê xwendin, nivîsandin, çapkirin û weşandina kitêb, kovar û rojnameyên bi zimanê kurdî qedexekirine, her wiha axaftina bi vî zimanî jî qedexe kiriye. Êdî di dema komarê de qedexekirina axaftina zimanê kurdî jî, digel qedexekirina zimanên gelên din, di rojê rejîmê de ye û ev bername di hemû warên jiyandê de tê sepandin û pêkanîn.

Ji bo ku mirov ji kir û kirinên Komara Tirkîyeyê yê doman û pêvajoya dameziran-dinê tam agahdar bibe, bi rastî nameya ku Celadet Bedirxan di sala 1933'yan de ji Mustafa Kemal Atatürk re şandiye, bi tena xwe bes e. Tiştên sosret û derî mirovahiyê, dikin ku mirov zende ji wan digire.

Mustafa Kemal Atatürk ê ku beriya avakirina komarê navê kurdan ji ser zimanê xwe nedixist, pişt re bi kar neaniye û bi lêv nekiriye. Li Amedê, Mufetîşê Umûmî (bi gotina îro Waliyê Super), lêxistina gramofonên kurdî û heta axaftina bi kurdî qedexe kiriye. Di van deman de zihniyeta

redker û qedexeker a rejîmê ya li hemberî gelê kurd, bi awayekî apaşkera derketiye holê.

Lê paşiyê ji neçarî, axaftina kurdî li gundiyan serbest kirine. Ji ber ku bêpenêr, mast, şîr, hêk û tiştên din diman ku ew jî gundiyan dianîn erase û çarşiyên difirotin û şênîyên bajêr bi vî awayî hewcedariyên xwe peyde û bîter dikirin. Ev kirin, ne tenê li Amedê, li bajar û bajarokên din jî wisan bûne⁽⁷⁾.

Digel ku di Peymana Lozanê de (nemaze madeya 39'an) hin mafên çandî yê gelên ne tirk hebûn jî, hemû çalakiyên bi zimanên din hatine qedexekirin. Hebûna kurdan hatiye red û înkarkirin. Bi gotina aşkera û zelal, kurdbûn hatiye qedexekirin. Kurdbûn êdî ji bo kurdan bûye kirasekî ji hesin..

Gotineke navdar a Wezîrê Dadê Mahmut Esat Bozkurt heye ku dibêje: "Li vî welatî jî bilî kesên saf ên ku ji nîjada tirk in, mafekî tenê yê kesên din heye. Ew jî, ji tirkan re xulamîkirin e."⁽⁸⁾

Di warê xebatên zimên de ji sala 1920'î heta sala 1960'î bêdengiyê gelek dirêj heye. Di navbera van salan de serhildan û berxwedanên kurdan li Bakur dest pê kirine û hemû jî ji aliyê rejîma kemalî ve hatine serkutkirin, kuştîyarên mezin hatine kirin û yê ku ji ber van kirinên hov filitîne jî, ji cih û warên xwe hatine dûrxistin. Ku em bi awayekî din bibêjin, ew sirgûnî herêmên cur bi cur yê Tirkîyeyê kirine. Ev sal, salên bêdenkirin û bêdenghiştina kurdan in. Ne tenê ziman û çanda kurdî,

kurd bi xwe nîn in. Jêbehs-kirin ceza ye. Hêzên serdest ên Tirkîyeyê tez li ser kurdan çêkirine û ew wek tirk qebûl kirine. Bi rastî ne tenê xwestine ku kurdan tirk bidin nîşandin, gelek şaristaniyên dîrokî yê Anatoliya û Mezopotamyayê jî wek pêşiyên tirkan ji xwe re qebûl kirine. De wisan pê de çûne, bi navên xebatên zanistî têkoşiyane ku tirkan wek nîjadeke arî (ar-yan) bidin pejirandin.

Güneş Dil Teorisi û Türk Tarih Tezi, gelek navdar e. Li aliyê din ji bo îspatkirina van tezên xwe jî, xwedêgiravî sazîyên akademîk dameziran-dine. Wekî Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü.

Li aliyê din jî hemû navên cografîk, navên gund, bajar û bajarokên kurdan li tirkî wergerandine. Ev guhartina navên cografîk li ser gelên din jî hatiye pêkanîn. Em hema kin lê bixin, seferberkirina tirkîkirinê dane destpêkirin.

Çendî li nav sînoren Tirkîyeyê ev pêk dihatin jî, lê rewşên bîrên kurd ên ji bakurê welêt wekî Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan û kesên din xebatên xwe yê li ser zimanê kurdî li derveyî Tirkîyeyê, li Sûriyeyê û li welatên din kirine. Pêwîstî pê heye ku em navê kovara Hawarê bînin zimên û bibêjin ku ev kovar ji gelek aliyan ve ji bo kurdan bû destpêkek.

Ev dem, bi rastî ji bo kurdan demeke kambax e. Li Tirkîyeyê û li bakurê welêt, wêrankirin heye, talan û tajan-kirin heye. Bêdengkirin û serkutkirin heye. Kurd ancax

hinek piştî salên şêstî karibûne bên cem hev, kovar û pirtûkan, sêlikên kurdî (plakên kurdî) derxin.

Rejîma tirk li hember kurdan û li hember zimanê kurdî politikayeke wisan taybet ajotiye ku mêjî û psikolojiya kurdan xera kiriye. kurd ketine rewşeke wisan ku ji kurdbûn û zimanê xwe fedî kirine û jê dûr ketine. Ev pêvajoyê, em dikarin bibêjin ku ta salên 70'î didome. Gava Kurd derdikevin qada siyasetê, tevgera xwe ya siyasî xurt dikin, ev domana (pêvajoya) xerab ji hêdî hêdî diguhere.

2) Ji sala 1961'ê heta sala 1980'yî

Çawan me berê jî got, piştî derbeya leşkerî û qanûna bingehî ya sala 1961'ê, li gor berê rewş û zemîneke hîn demokratîk li Tirkîyeyê çêbûye. Ji ber ku makeqanûna nû rê li ber xwerêxistinkirin, maf û azadiyan vedikir. Rewşa siyasî hîn baştir bû. Ji bo nimûne Doğu Mitingleri (Mitingên Rojhilat) piştî sala 1960'î dest pê kirin. Kurdan hinek bi wêrekî dengê xwe bilind kir û dest pê kirin nerazîbûnên xwe diyar kirin, helwest li dijî kirin û îcreatên dewletê girtin û berdekiyên xwe dan nîşandan.

Kurdan dest bi derxistina weşanan kirin. Di van weşanan de carinan cih didan nivîsarên bi kurdî û hin jê jî bi tirkî-kurdî bûn. *Mîna Dicle-Firat, Deng, Roja Newe, Rizgarî, Roja Welat*. Li Stenbolê sêlikên kurdî çap bûn, Xebatên li ser zimanê kurdî hatin weşandin. Wekî xebata Ke-

mal Badılı ya bi navê "*Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri*" di sala 1965'an de û berhema Musa Anter "*Ferhenga Kurdî-Tirkî*" jî di sala 1967'an de çap bûn. M. Emin Bozarslan hem alfabeya xwe û hem jî *Mem û Zîn* a Ehmedê Xanî çap kirin û weşandin. Di van salan de xebata gramera kurdî ya Dr. Sait Kirmızıtoprak jî çap bû. Her wiha divê ku mirov kovara Tîrêjê ji bîr neke, ku ew xwerû bi zimanê kurdî bû û kovareke tekane ya çandî û wêjeyî bû. Nivîsên wê bi zaravayên kurmançî û kirmanckî (zazakî) bûn.

Tevgera kurdan a siyasî gava geş û gur dibe, pê re jî xebatên li ser ziman û yên çandî geş dibin. Lewma em bi hêsanî dikarin bibêjin ku liv û tevgera berbiçav di van salan de heye. Zimanê kurdî pê re jî zanav û nasnameya kurdî hêdî hêdî xwe dide hisandin. Tevgera siyasî ya kurd a ku li Başûr (ya Mele Mistefa Berzanî) hîkariya xwe li kurdên Bakur dike. Pêşeng û rewşenbîrên kurd dikevin nav tevger û çalakiyên çandî û siyasî. Daxwazên xwe ne bi awayekî tam be jî, bi lêv dikin.

Lê karbidest û rayedarên dewleta Tirkîyeyê ji vê rewşê zivêr in, çavê wan bi vê azadiya qismî jî bar nade û hin derdorên nîjadperest ên tirk bi ramanên xwe yên faşîzan êrîşî pêşeng, siyasetmedar û rewşenbîrên kurd dikin. Tehemûla wan ji helbesteke bi kurdî re jî nîn e. Digel ku bi awayekî qanûnî nikaribûn rê li ber weşanên kurdî bigirin û qedexe bikin jî. Ji bo nimûne, em ji xebata Malmîsanîj û Mehmûd

Lewendî, ya bi navê "*Li Kurdistanê Bakur û li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî*", hîn dibin bê van derdorên nîjadperest helwesteke çawan li dijî nivîsarên bi kurdî didan nîşandan.

Ji ber ku xwediyê rojnameya Silvan Sesi (Dengê Silvan) Îsa Şans (Îsa Ruhi Silvanli) di rojnameya xwe de bi kurdî dinivîse û di wan nivîsan de jî dibistan û weşanên kurdî pêşniyar dike, rojnameya bi navê Diyarbakir Sesi (ku rojnameyeke paşverû bûye) di rûpelên xwe de dozgeran gazî erk û peywirên wan dike û wiha dibêje: "A muhîm, divê laşê vî heramzadeyî ji ortê rabe." Paşê jî, Îsa Şans li Amedê tê girtin û li Farqînê jî wî tewqîf dikin. Ev bûyer di 30'yê sermaweza sala 1962'an de qewimiye.⁽⁹⁾

Li aliyên din, rojname û weşanên ku di nav rûpelên xwe de cih didan nivîsên kurdî dihatin berhevkin. Dicle-Firat, ku rojnameyeke mehane bû û li Stenbolê derdiket, li gor ku Malmîsanîj û Mehmûd Lewendî di xebata xwe ya navborî de dibêjin, bi taybetî li Kurdistanê (wek Bîngol û Cizîrê) û li Stenbolê ji aliyê karbidestên cihî (mihelî) ve hatiye berhevkin.

Bi awayekî kurtasî ku em bibêjin, piştî salên şêstî, kurdan hem di warê siyasî de û hem jî di warên çand û weşanan de hemleyek kiriye. Ketine nav hewldaneke berbiçav û gavên girîng ji vî aliyê ve avêtine. Ji lew re mirov bi hêsanî dikare ji destpêka ronensansa kurdî, ji hişyariya

ramanî û neteweyî ya kurdî behs bike.

Ji bilî weşanên legal û qanûnî, hin weşanên nihênî (îlegal) jî hebûn. Wan jî bi zimanê kurdî û tirkî weşana xwe dikir û bi giştî organên partî û rêxistinên kurdan bûn. Ew bi awayekî veşarî diketin destên alîgirên xwe. Wek Pêşeng Bo Şoreş, Xebat û hwd.

A vê hişyariya kurdan rayedarên komarê gelek aciz kirine û qet tehemûl ji weşanên bi zimanê kurdî re nekirine. Çimkî çalakiyên bi zimanê kurdî jî ji xwe re wek helwesteke siyasî ya kurdan dîtine û çî ji destên wan hatiye, li dijî weşanên kurdan kirine. Kes girtine avêtine hepsan, weşan qedexe kirine, qefil avêtine ser deriyê idarexaneyên wan û rê li ber wan girtine.

Ligel vê yekê, dîsan jî derdorên leşkerî ji çalakî, xebat û têkoşîna kurdan nerihet dibûn.

Bi amûrên mîna perwerdeya bi tirkî, navgînên ragihandinê, mecbûrgirtina zimanê fermî û hwd. Polîtîkaya bişaftinê ango ya asimilasyonê hate meşandin. Feraset û mêjiyên nîfşên nû hatin guhartin. Kêm û biçûkdîtina kurdan û zimanê kurdî, ji ber vê ferasetê bişaftinê bû. Dema bişaftinê encam girt, vê derûniya xerab a kurdan jî dest pê kir. Ji bo kurdî ev pêvajoya çûna ber bi jêr ve bû. Lewma jî kurd neçar man, li hemberî vê rewşa xerab, helwesteke tund û siyasî bidine nîşandan.

Li aliyê din derdorên çepgir ên tirk jî di nav xebat û hewldanên girîng de bûn. Ji ber ku qîma leşkeran bi girtina tedbîrên asayîşê nedihat, rabûn di 12'ê adara 1972'yan de muxtura da hikûmetê. Leşkeran bi awayekî veşarî derbe pêk anî û sazûmana demokratîk a heyi kulektir kir. Li bakurê welêt dîsan zilmeke mezin li kurdan hate kirin. Ev zilm bi navê "zilma qumando" derbasî nav rûpelên dîrokê bû. Serok û êndamên partiyê siyasî yên kurdan li dadgehên leşkerî hatin darizandin. Parêziyên DDKO'yê yên li Dadgeha Leşkerî ya Diyarbekirê dest pê kirin. Kurdan li dadgehan jî hebûna kurdan û mafên kurdan parastin.

Digel vê rewşa hanê li bakur kurdan hem di warê legal de û hem jî di warên îlegal de çalakiyên siyasî û çandî kirin. Kurdan guh nedan fişar û pêkutiyên dewletê. Rastîyeke din jî hebû, kesên ku li ziman, çand û zanava kurdî xwedî derdiketin û têdikoşîyan, hemû kesên siyasî bûn. Ji ber ku wan doza mafên kurdan dikir, li pêş çavên karbidestên dewletê ew mirovên ziyankar û zerardar bûn.

Ev pêvajoya ku hinek firsend dida kurdan û dikir ku ziman, çand û wêjeya kurdî piçek geş bibe, bi derbeya leşkerî ya 12'ê Rezberê, bi carekê sekinî. Ew zemîna demokratîk ku bi makeqanûna sala 1961'ê çêbûbû û bi muxtoreya 12'ê Adarê derbe xwaribû, bi vê kutedaya leşkerî bi tevayî ji holê rabû. Ji hêla weşan û çapemeniyê ve rewşa zimên ev bû. Lê baş tê zanîn

ku xetereyeke din li pêş zimên hebû, ew jî bişaftin bû ku di van salan de pêk hatibû.

Bi amûrên mîna perwerdeya bi tirkî, navgînên ragihandinê, mecbûrgirtina zimanê fermî û hwd. Polîtîkaya bişaftinê ango ya asimilasyonê hate meşandin. Feraset û mêjiyên nîfşên nû hatin guhartin. Kêm û biçûkdîtina kurdan û zimanê kurdî, ji ber vê ferasetê bişaftinê bû. Dema bişaftinê encam girt, vê derûniya xerab a kurdan jî dest pê kir. Ji bo kurdî ev pêvajoya çûna ber bi jêr ve bû. Lewma jî kurd neçar man, li hemberî vê rewşa xerab, helwesteke tund û siyasî bidine nîşandan.

3) Ji sala 1980'yê heta sala 1991'ê

Hêzên derbekar, nehiştin ku kesek baş çavê xwe veke û hemû çalakiyên kurdan hatin qedexekirin ku ziman jî di nav vê qedexekirinê de hebû. Ne tenê berhemên nivîskî yên bi kurdî, yên bihîstinî ango kaset û sêlikên bi kurdî jî, heta axaftina bi kurdî jî li kurdan hate qedexekirin. Ku em bibêjin kurdbûna kurdan li kurdan hate qedexekirin, dê negotîneke pirole ango mubaxele be. Cunta leşkerî bêhn û hilm li kurdan çikand, kurdbûn wek sîcek ji xwe re qebûl kirin. Eynî mîna destpêka damezirandina Komara Tirkîyeyê li kurdan qewimî ku çawan wan deman kurdên ku nikaribûn bi tirkî bipeyîviyana diçûn ser dikan û firinan û digotin "Ka nanek bide min bi tirkî."

Kargêriya leşkerî ya der-

bekar, li her derê dest bi kampanyaya "Vatandaş Türkçe Konuş"ê kiriye û hilm û bêhn li kurdan çikandine. Careke din pêvajoya piştî avakirina komarê dest pê kiriye. Ango em bibêjin careke din ew maf û azadiyên ku bi makeqanûna sala 1961'ê hatibûn bidestxistin, îcar bi makeqanûneke din, bi ya sala 1982'yan ji gelê kurd hate stendin. Vê makeqanûnê, ne tenê rê li ber çalakiyên bi zimanê kurdî digirt û axaftina zimanê kurdî qedexe dikir, her wiha derbeyeke mezin li maf û azadiyên mirovan ên demokratîk jî dixist. Gelên Tirkîyeyê bi tevahî di bin pest û pêkutiyên rejîma leşkerî de bûn êdî.

Cuntaya leşkerî bi taybetî li girtîgeh û zîndanên tehde, stem û îşkenceyê mezin li girtiyên siyasî yên kurd kirin. Nedihîşt ku malbatên girtiyan bi xwe jî bi girtiyan re bi kurdî biaxivin, bi wan re bi zimanê xwe yê dayikê bidin û bistînin. Girtî û serdanên wan tenê li nava çavên hev dinihêrtin û wisan ji hev fêhm dikirin. Bi çavan bi hev re didan û distendin. Ev rewşa hanê bû mijara leyîzên tiyatroyên biyanî jî.

Ev kirinên derî mirovahiyê, li her derê Tirkîyeyê, li her derê welêt hatin kirin. Lê bi taybetî li Zîdana Amedê, cuda bû. Girtiyên siyasî yên kurd, nemaze yên ji doza PKK'ê berxwedaneke bêhempa dan nîşandan û li hundirê zîndanê bi xwe jî, digel berdêlên mezin û giran, weşanên bi kurdî derxistin. Leşkeran li derve kurdî qedexe kiribû, lê girtiyên siyasî li hundir bi

zimanê kurdî weşan derdixistin. Ev helwest bi xwe tişteki gelek balkêş divê bê nixandin. Mîna Çandîya Berxwedan, Çirûska Jiyan û Berhem...

Girtiyên ji vê dozê, her wiha li dadgehên helwesteke din jî dan nîşandan û dest pê kirin parêziya xwe bi zimanê kurdî kirin.

Ji dema derbeya leşkerî heta sala 1991'ê li Tirkîyeyê, ji bilî di hin weşanên legal de weşandina çend nivîsar û çend hevokên bi kurdî, bi awayekî qanûnî tu tişteki bi zimanê kurdî nehate weşandin. Ew çalakiyên ku piştî salên şêstî di warên çand û weşanên bi kurdî de dest pê kiribû û ber bi geşbûnekê ve diçû, bi derbeya leşkerî ya sala 1980'yî bi carekê hatibû rawestandin. Vê rewşa kambax heta sala 1991'ê berdewam kir.

Çendî ji vî aliyê ve kurd ne di nav liv û tevgerê de bin û bêdengiyek hebe jî, li bakur, di sala 1984'an de bi pêşengiya PKK'ê li dijî rejîmê dest bi têkoşîna çekdarî kir û daxwazên xwe yên siyasî radigihandin dinya alemê. Qet nebe ji vî aliyê ve bêdengbûna kurdan şikandin û li hemberî neheqî, siyasatên çewt ên red û înkare serî hildan.

4) Ji sala 1991'ê heta niha

Di navbera salê 1982 û 1991'ê de kurdên şoreşger û welatparêz hem li zîndanên hem jî li seriyê çiyên û li nav bajaran ji bo mafên kurdan ên rewşa berxwedaneke birûmet û serketî pêk anîn. Vê berxwedanê bandor li ser siyaseta Tir-

kîyeyê kir ku Turgut Ozal û hikûmeta wî di sala 1991'ê de qanûna bi navê 2932'yan hilîne. Vê qanûnê rê li ber çalakiyên zimanê kurdî digirt. Piştî hilanîna vê qanûnê, hêdî hêdî pêşketinek di warê weşan û çapemeniya kurdî de çêbû. Li gor vê madeya hanê, ji bilî zimanên ku qanûnên Tirkîyeyê ew qebûl dikirin, tu çalakiyên çandî, weşanî, çapemeniyê û yên bi deng ne serbest bûn. Piştî ev qanûna ku li ber zimanê kurdî astengeke mezin bû rabû, derdorên kurdan jî dest birin xwe û dest bi derxistina rojname, kovar, pirtûk û kasetan kirin. A rast beriya hilanîna vê qanûnê kurdan di hin weşanên xwe de hin caran cih didan nivîsar û çend hevokên bi kurdî, lê belê em rastî weşanên ku bi xwerû kurdî ne an jî bi du zimanî lê giranî didin nivîs û nivîsarên bi zimanê kurdî, nayên. Li vir, elbet em behsa weşanên qanûnî dikin.

Nemaze, piştî hilanîna vê qanûnê qet nebe ji aliyê qanûnan ve serbestiyek çêdibe. Êdî em rastî kovar û rojnameyên kurdan tên. Ev weşan bi piranî xwedî navên kurdî ne û hema bibêjin bi du zimanî ne. Ango bi kurdî û tirkî ne. Mîna kovara Rewşen Govend, Nûbihar, ku pişt re Rewşen bi tevayî bû bi Kurdî.

Rojnameya pêşîn a ku bi awayekî xwerû bi kurdî li Tirkîyeyê dest bi weşanê kiriye rojnameya bi navê Rojname ye. Ev weşan, bi tenê hejmara wê ya bi navê "hejmara provayê" di 29.12.1991'ê de derketiye. Piştî vê, rojnameya heftane û xwerû bi kurdî Welat, di 22.02.1992'yan de

dest bi jiyana weşanê dike û gav diavêje nav gorepana weşangeriya kurdî. Piştî girtina rojnameya Welat îcar Welatê Me û piştî wê jî Azadiya Welat vê erk û peywirê digire ser xwe û ev weşana hanê heta roja îro jî weşana xwe berdewam dike. Ev tekane rojnameya xwerû bi kurdî ye ku derdiçe.

Li vir divê em ji Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê jî behs bikin. Enstîtu di 18'ê Avrêla sala 1992'an de li Stenbolê ava bû. Ev sazî di parastin û pêşvebirina zimên de xwedî roleke pir girîng e. Ta niha ji bo hînkirin û belavkirina zimên gelek xebatên hêja kirine. Amadekirina berhemên hîndekarî û ferhengên kurdî xebatên enstîtuyê yên hêja ne.

Di vê pêvajoyê de kovarên çandî û wêjeyî jî beşdarî li weşangeriya kurdî kirin. Em dikarin navên kovarên mîna Rewşen, Jiyana Rewşen, Rewşenname, Zend, War, Gulistan, Tîrêjên Bawerî, Tîroj, Kevan, Vate, Zembîlfiroş, Vesta û Kovara W'yê bidin. Lê mixabin, digel ku gelek kovar tevî jiyana çapemeniya kurdî bûn jî, gelek jê neçar man weşana xwe rawestand. Halê hazir, îro yên ku weşanên xwe berdewam dikin hema bi derbekê tîn bîra mirov Zend, Nûbihar, War, Tîroj û kovara W'yê ye.

Li vir divê em weşanxaneyên kurdan jî ji bîr nekin. Ev weşanxane bi tevayî weşanên xwe bi du zimanî çap dikin, bi kurdî û tirkî. Mîna Avesta, Pêrî, Sî, Bajar, Aram û Dozê. Van weşanxane û weşanxaneyên din ên ku me navên wan bi lêv nekirin, gelek berhemên bi

zimanê kurdî çap kirin û gihandin berdestê xwînerên (ango xwendevanên) zimanê kurdî.

Digel van çalakiyên ku bi kurdî dihatin kirin, li Tirkîyeyê piştî ku radyoyên taybet, nemaze yên ku li ser banda FM'ê dest bi weşana xwe kirin û bi pîranî jî weşîneka herêmî û cihkî dikirin, dest pê kirin demekê stranên kurdî jî di bernameyên xwe de weşandin. Lê ev rewş jî zêde dirêj neajot û Saziya bi navê Desteya Jor a Radyo û Televîzyonê (RTÜK) ev weşan qedexe kirin û yên ku rîayetî biryarên wê nekirin, weşana wan sekî nandin.

Ji bo ku zimanê kurdî jî aliyê dewletê ve bê naskirin û bi vî zimanî perwerdehî bê kirin, di sala 2002'an de ji aliyê 3000 xwendekarên kurd ve kampanyayek hat meşandin. Di çarçoveya vê kampanyayê de 15 hezar daxwazname pêşkêşî saziyên têkildar ên dewletê hatin kirin. Ji bo van daxwaznameyan 2 hezar xwendekar hatin darizandin û ji van 35 kes têkiliyên wan ji zanîngehê hatin birîn.

Wek tê zanîn Tirkîye ji bo ku bikeve nav Yekîtiya Ew-rûpayê, dest pê kiriye hin guherînên qanûnî anîne pê. Ev veguherîn jî, ji ber Krîterên Kopenhagê pê hatin ku ji Tirkîyeyê hatine xwestin. Yek ji van daxwazan jî weşanên bi zimanê dayikê bû.

Dewleta Tirkîyeyê bi navê "Zarava û Zimanên Cuda yên ku Welatîyên Tirk di Jiyana Xwe ya Rojane de Bi Kar Tînin" tenzîmeke nû çêkir û rê li ber Radyo û televîzyonên

ku bi awayekî neteweyî weşana xwe dikin, vekir da ku bi karibin bi van zimanan jî weşanê bikin. Lê radyo û televîzyonên herêmî û cihkî ji vî mafî bêpar hatine hiştin. Her wiha ji bo televîzyon û radyoyan jî saet, mawe û cureyên bernameyan jî hatine tespît kirin. Kes nikare li gora dilê xwe bi van zimanan weşanê bike.

Heta îro tenê TRT'ê bi zimanê kurdî û yên din dest bi weşanê kiriye. TRT heftiyê saetek, nîv saet bi kurmançî û nîv saet jî bi kirmanckî (zazakî), di kanala xwe ya televîzyonê ya bi navê TRT 3'yê de weşanê dike. Vê yekê he-man demê di radyoya xwe de jî pêk tîne.

Radyo û televîzyonên din nikarin bi kurdî weşanê bikin. Tenê hin radyoyên ku bi awayekî herêmî û cihkî weşana xwe dikin cih didin stranên kurdî. Ew televîzyonên taybet ku xwedî weşana neteweyî ne, tenê di bername û rêzefilmên xwe de wek muzîka fonê stranên kurdî bi kar tînin, lê ne bi awayekî wêrane. Kêm kes di bernameyên xwe de cih didin stranbêj û hunermendên kurd, ku ew jî stranek an jî du stran dikarin bibêjin. Dîsan stranên kurdî wek hêmaneke xeml û rewşê ya van bernameyan dimîne.

Ji bilî weşana bi zimanê dayikê, Tirkîye ji ber daxwaziyên krîterên Kopenhagê, mafê hîndekariyê jî pejirand û rê li ber vekirina dersxaneyên taybet vekir. Çendî ku gelek şertên dijwar ji bo vekirina van dersxaneyan dixwest jî,

dersxane vebûn û bi kurdî dest bi hîndekariyê kirin. Niha li Tirkîyeyê li bakurê welêt li şeş bajaran (Stenbol, Ruha, Amed, batman, Qoser û Wan) dersxaneyên taybet ên kurdî xebatên hîndekariyê didominin.

Li aliyê din me divê ku em balê bikişînin ser xebat û çalakîyên sînema û tiyatroyê jî. Di vî warî de jî li Tirkîyeyê liv û lebatek heye. Bayek diweze. Skeç, klîp, lîstikên tiyatroyê, filmên sînemayê (çendî ku qalîteya gelek jê pir xerab e jî) wek sêlik (CD) derdikevin piyaseyê û gel wan dikire û li wan temaşe dike. Bi vî awayî, di warê zimanê kurdî de geşbûnek çêdibe.

Digel ku li derveyî sînorên Tirkîyeyê dest bi weşana xwe kiribin jî, me divê em bi çend gotinan pêşî behsa Radyoyên Erîvan, Tehran û Bexdayê bikin. Di demên herî xerab de jî bi weşanên xwe yê gelek hindik, xwe gihandine malên kurdan û di wan tariyan de ji wan re bûne piçek ronayî.

Ji ber ku weşanên bi zimanê kurdî yê bi riya radyo û televizyonê qedexe bûn, kurd ji xwe re li çareyeke din geriyên û li derveyî Tirkîyeyê li Ewrûpayê, bi riya weşana peykê (satalaytê) dest bi weşana televizyonê kirin. Pêşî Med TV, pişt re Medya TV û di pey wan de jî Mezopotamya û Roj TV ava kirin. Her wiha divê em radyoya Dengê Mezopotamyayê jî ji bîr nekin. Kurdan bi van amrazên weşanê, ku di çapana navneteweyî de bi giranî bi zi-

manê kurdî pexş û weşana xwe dikirin, ketin malên kurdan û ji weşanên sazûmanê re bûn raqîbeke cidî. Bi weşanên xwe yê kurdî li hemberî politikayên asimilasyonê bûn mertalên kartêker û bi naveroke bernamêyên xwe jî bûn ên alternatîf. Divê em navên Kurdistan TV û KurdSatê jî bi lêv bikin ku ew jî tevî vî karwanî bûn. Wan dezgehên ragihandinê tixûbên siyasî yê di navbera kurdan de nas nekirin û xwe gihandin malên kurdan. Bi rastî van televizyonan bandor û hîkariyeke gelek mezin li zimanê kurdî kirin û niha jî dikin. Bi van amrazan, em dikarin bibêjin ruh hate zimanê kurdî.

Niha li Tirkîyeyê bi taybetî li bakurê welêt, li gundan kurdî tê axifîn, lê li bajar û metropolan bi giranî kurd bi tirkî diaxivin. Ev yek ji bo pêşeroja kurdan rewşeke xeternak e. Êdî zimanê kurdî tenê bi awayekî giranî, li deverên gundewar tê axaftin. Serdestiya wê mixabin li bajar û bajarokên kurdan jî di talûkeyê de ye.

Tirkiye li gorî hiqûqa navneteweyî (peymanên ku îmze kirine) bi politikaya xwe ya bişaftinê sûcdar e. Divê ev rewş biguhere. Divê Tirkiye dev ji vî politikayê berde. Li Tirkîyeyê divê zimanê kurdî di qada fermîtiyê de (xwendegêh, zanîngeh û sazgehên dewletê yê din), bi her awayî bê bikaranîn. Divê ji bo zimanê kurdî di bin banê zanîngehan de enstîtu û akademiyanê kurdî bîn avakirin û ji aliyê dewletê ve bîn finansekirin. Divê bi zimanê kurdî

di radyo û TV' yê fermî û yê taybet de hem di çarçoveya herêmî û hem jî di çarçova neteweyî de bi dorfirehî weşan bîn kirin. Heke zimanek nebe zimanê fermî û di qada gelemperiyê (warên saziyên dewletê) de neyê bikaranîn nikare hebûna xwe biparêze û bi pêş keve.

Ji ber vî yekê divê zimanê kurdî li herêma ku kurd lê dijîn bibe zimanê fermî û serke. Ji bo pêkanîna vî politikayê, divê herêmeke kurdan a xweser ango otonom hebe.

Encam

Wekî ku xuya û diyar e, beriya Komara Tirkîyeyê, di heyama dewleta osmanî de kurd xwedî hin dezgeh û rêxistinên çandî, civakî û siyasî bûn. Bi avabûna komarê re, ev tevde ji destê kurdan derketin. Zanav û zimanê kurdî hate qedexekirin. Karbidestên komarê bi her awayî xebitîn ku gel û nîjadên ne tirk di nav boteya etnîsîteya tirk de bihelînin û bibişêvin. Di vî warî de hinek bi ser ketin jî. Hin çand û qewm ji holê rakirin. Lê kurdan tu carî serî ji van kirin û daxwazên rejîmê re danên û pê re şer kirin. Cure cure rêbazên têkoşînê li dijî komara kemalî bi kar anîn.

Li Tirkîyeyê jî, meseleya kurdan meseleyeke siyasî ye. Heta ev pirsgirêk çareser nebe, ya zimanê kurdî jî hel nabe. Çimkî her du bi hev ve girêdayî ne. Bêyî hev nabin û wisan jî nikare bêhizirkirin.

Rewşa zimên, ji rewşa kurdan cihê nikare bê nîqaşekirin. Ji ber ku ziman, hîmê

Ji ber ku di vê serdema me de ziman, tenê bi axaftinê nikarin xwe li ser piyan bigire. Heta ziman nebe zimanê perwerdehî û çandê, ew ji talûkeya mirinê nafîlete. Ji lew re zimanê devkî û gotinkî ne zimanekî mayînde ye. Mayîndebûn û pêşketina zimên, bi zimanê nivîskî pêk tê.

çandê ye, ziman maka hemû hunerên gotinkî ye. Ziman hestiyê piştê yê neteweyan e. Ziman pênasa berhemên wêjeyî ye. Ziman, hêmana sereke ya neteweyîbûnê ye. Bi gotineke din, çawan ê ku mirovan dike mirov ziman e, yê ku neteweyan dike netewe jî dîsan ziman e. Ji lew re ziman, amûr û alava man û nemanê ye. Em bînin bîra xwe ku raboriya neteweyan hinek jî di zimanê wan de veşarî ye.

Dahatû û ayendeya zimanekî, bi zarokan ve ye. Eger zarok bi zimanê bav û kalên xwe mezin nebin, pê nepeyîvin, pê perwerde nebin, pê nexwînin û nenivîsinin, paşeroja wî zimanî dikeve xetereyê. Dê û bavên me ev ziman sipsax teslîmî me kir. Gelo em jî dikarin bi awayekî zipzindî û sipsax vî zimanî radestî nişên li dû xwe bikin. Pêşiyên me ne bi dilê me be jî peywira xwe anîne cih, gelo em, kurdên li Bakur, dikarin vê erka xwe pêk bînin.

Ji ber ku di vê serdema me de ziman, tenê bi axaftinê nikarin xwe li ser piyan bigirin. Heta ziman nebe zimanê per-

werdehî û çandê, ew ji talûkeya mirinê nafîlete. Ji lew re zimanê devkî û gotinkî ne zimanekî mayînde ye. Mayîndebûn û pêşketina zimên, bi zimanê nivîskî pêk tê.

Di vê serdema hanê de, di vî ziman xwedî hemû mafan be. Bi gotineke aşkera û zelal, divê zimanê kurdî jî xwedî heman mafên zimanê tirkî be, nexwe ew dê nikaribe li ber xwe bide, parêziya xwe li hemberî zimanê serdest bike.

Hema em piçek li ser cureyên berhemên ku bi zimanê kurdî derketine hûr bibin û dêhna xwe bidinê, em dê bibînin ku bi pîranî berhemên wêjeyî ne. Helbest, çîrok û roman. Berhemên ji cureyên din ji hejmarê tiliyên destekî derbas nabin. Lewma, heta ku zimanê kurdî di her warê jîyanê de neyê bikaranîn, bi vî zimanî her cure çalakî yên nivîskî, dîtbarî û bihîzbarî neyên kirin, bi vî zimanî perwerde neyê kirin, nişên nû bi vî zimanî ranebin, pê mezin nebin xetereya li ber zimanê me ji holê ranabe. Eger em naxwazin zimanê me bibe zimanekî mirî û arkaîk, divê em zarokên xwe ku dahatûya me ne, ji bîr nekin.

Zarokên neteweyekê dahatûya wê neteweyê ne. Ziman jî nasnameya wan e û di devê wan de ye.

Em xwediyê vê baweriyê ne: Heke zimanê şoreşa bakur bi kurdî bûya, rewşa niha a zimanê kurdî dê ne wiha bûya. Lê mixabin ev rastiya me ye. Divê em vê rewşa xerab biguherînin. Li vir em dixwazin ku bang li rêxistinên

siyasî, li saziyên xwe yên sîvîl, li rewşenbîr û siyasetmedarên xwe, bi taybetî jî li dayik û xortên kurdan bikin. Bi zimanê kurdî bi axifin, çî dikin bikin, lê bila zimanê kirinên we kurdî be.

Amedekar: Zana Farqînî

Têbînî: Ev gotar wek teblîxa Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, li Konferansa Ziman a di çarçoveya "Rojên Wêjeyê" ya ku Şarederiya Mezin a Amedê li dar-xistibû, hat pêşkeşkirin.

Çavkanî

1. Malmîsanij, Yüzyılımızın başında Kürt milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet, Weşanên Jina Nû, Upsala, 1986
2. Dilgeş, Felat; Rojnameya Kurdî ya Pêşîn Kurdistan, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê; Stenbol, 1998
3. Bozarşan, M. Emin; Jîn Cild I., Weşanxana Deng, Upsala, 1985
4. Malmîsanij; Kürt Teavûn ve Terakki Cemiyeti ve Gazetesi, Weşanên Apec, Spanga, 1992
5. Celil, Celilê; Kürt Aydınlanması, Weşanên Avestayê, Stenbol, 2001
6. Malmîsanij & Lewendî; Meh-mûd; Li Kurdistana Bakur û li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1992), Öz-Ge yayımları, Enqere, 1992
7. Bedirxan; Emîr Celadet Ali; Bir Kürt Aydından Mustafa Ke-mal'e Mektup, Weşanên Doz, Stenbol, 1992
8. Beşikçi; İsmail; "Hayali Kürdistan"ın Dirilişi, Weşanên Aram, Stenbol, 1998
9. Malmîsanij & Lewendî; Meh-mûd; Li Kurdistana Bakur û li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1992), ÖzGe yayımları, Enqere, 1992

NASNAMEYA KURD Û PIRSGIRÊKA ZIMAN

► Philip G. Kreyenbroek

Ji bo gelek mînan, têkiliya di navbera ziman û neteweyê ango nasnameya etnîkî de aşkera ye: îtalyan bi îtalyanî, tirk jî bi tirkî diaxivin. Ev rastî pir an hindik heta deh salên destpêkê yê û sedsalê, ji bo kurdan û kurdî jî bi vî awayî bû. Lê belê ji parvekirina împaratoriya Osmanî û bi vir de rewş gelek guheriye. Çewisandinên cur bi cur ên li ser kurdan ji bo asîmîlasyona wan a di nav çandên serdest ên dewletên ku tê de dijîyan dihat kirin, têkiliya di navbera nasname û ziman de pir tevî hev kir. Politikayên van dewletan ên li hemberî kurdan ne tenê rastî û pêkhatina terma nasnameya kurdî⁽¹⁾ derxist holê, lê ji bo beşdariya jiyana civakê, herikbariya di zimanê serdest de kire hewcedariyek. Bi wî awayî ji bo piraniya kurdên perwerdebûyî, li ber axaftina kurdî bû sedemê axaftina zimanekî din jî û ji bo pêşketinê dijwar kir. Wekî encam, valahiya di navbera îdeala neteweya kurd, a ku xwedî çanda xwe ya ku bi zimanê wê tê îfadekirin û rastiya kurdî ku zimanekî ji zimanen raqîbên serdest pir li paş maye û hatiye qedexekirin, zêde dibe.

Lê gelek kurd zimanê xwe wek delil û sembola nasnameya kurdîtiyê dibînin û ji bo îdîayên netewebûnê, hebûna zimanê kurdî dibe bingeheke sereke. Ji lew re gelek kurdên hemden, ji ihtîmala paşveçûyî heta hinek ji windabûna zimên ku dê di demeke dirêj de bibe sedema mirina nasnameya kurd, pir fikaran dikin û ditirsin. Ji ber vê rastiyê, ji bo parastin û pêşvebirina du zaravayên bingehehî, bi taybetî jî di forma nivîskî de, hewldanên mezin tên kirin.

Ji ber van sedeman, dîroka zimanê kurdî di sedesala 20' an de ji her demê bêhtir biproblem e. Ev nivîs hewl dide ku li ser çend aliyên vê dîrokê, bi taybetî jî li Tîrkiye, Iraq û Îranê⁽²⁾ li ser ziman û terma etnîk û nasnameya çandî li heremên kurdan, derxîne holê.

Ji lew re gelek kurdên hemden, ji ihtîmala paşveçûyî heta hinek ji windabûna zimên ku dê di demeke dirêj de bibe sedema mirina nasnameya kurd, pir fikaran dikin û ditirsin. Ji ber vê rastiyê, ji bo parastin û pêşvebirina du zaravayên bingehehî, bi taybetî jî di forma nivîskî de, hewldanên mezin tên kirin.

Wekî ku baş tê zanîn, kurdî zimanekî rojavayê Îranê ye. Teoriya ku ji aliyê gelek kurdan ve tê pejirandin, dibêje kurdî zimanê Mediyana e ku împaratorên ewilî yê Îranê bûne, ji aliyê lîngûîstîkê tê şikkirin (Mc Kenzie 1961). Îhtîmalek heye ku eşîrên kurdan li başûrê Mediyana jiyane. Wiha xuya dibe ku eşîrên dawiyê koçberî bakur bûne û li rojhilatê Anatoliyê bi cih bûne. Vê koçê dibe ku milekî gelên Îranî ku pêşiyên zazayan ango dimiliyên hemdem ên ku di sêgoşeya Dîyarbekir, Sêwaz û Erzeromê de dijîn ji cihê wî derxistibe û ber bi hundirê Anatoliyê ve ajotibe. Zimanê zazayan pir nezîkî zimanê goran e. Dibe ku pêşiyên goran jî, ji bo sedema koçberiya kurdan ji aliyê milekî gelekî din ji cihê xwe hatibin derxistin. Beşeke biçûk a axiverên goran nêzîkî bexteran (bi zimanê fermî Kermansah) a Îranê dijîn. Îro, zaza û goran digel ku zimanê her duyan jî ne pir nezîkî kurdî ne û ne jî ji aliyê kurdan ve tê fêmkirin, bi gelemperî wekî ew kurd bin tên dîtin. Li ser tê nîqaşkirin ku (Mc Kenzie) hinek eşîrên kurdan li dawiyê bi paş de vegeryane başûr û nêzîkî goran jiyane. Sedema vê texmînê ev e ku, zimanê goranî li ser zaravayên bakur ku li ser

wan bandora goranî tune ye, dubendiyeye sereke çêkiriye.

Ji nav van sê komên zaravayan bakur, navend û başûr ew ên bakur û navendî me eleqedar dike. Li ser zaravayên başûr xebat kêr hatine kirin û di pêşketina zaravayên standard ên kurdî de roleke sereke nalîzin. Digel ku hinek lêkolînerên kurd (mînak: Nebez 1975:98 n. 7) li hember van navan derkevin jî, ji bo zaravayên bakur û navîn dê navên kurmançî û soranî bîn bikaranîn. Mukrî ku navê kurdiya li Îranê ya nivîskî ye, ji soraniya standard a ku li Iraqê tê bikaranîn ne pir cihê ye û li vir dê wekî formeke soranî bê dîtin. Kurmançî li Tirkîye, Sûriyeyê, li Yekîtiya Sovyetê û li axa kurdîxêvê e bakurê Iraq û Îranê tê axaftin. Kurmançî, ji bilî Yekîtiya Sovyetê ku piranî alfabe ya kiril lê tê bikaranîn û ji bilî Iraq û Îranê⁽³⁾ ku carinan tîpên romanî tên bikaranîn, bi tîpên romanî tê nivîsandin.

Soranî li Iraqê, li başûrê Zapa mezin û li axa navîn a Îranê tê axaftin. Piranî bi tîpên erebî tê nivîsandin.

Cudabûna alfabeyê hew faktoreke bi ziman ve eleqedar e û kurdan ji hev diqetîne. Ya din cudabûna girîng a ku di navbera soranî û kurmançî de ye, digel ku ev bi gelemperî wekî ku zaravayên kurdî bin koka wan a hevbeş û dilîniya nasnameya etnîkî û yekîtiya kurdan nîşan dide tên dîtin jî, cudabûnên rêzimanî yên di navbera wan de jî, ji cudabûnên di navbera almanî û flamanî de mezintir in. Di

soranî de ne zayend û ne jî qertafa rewşê heye. Lê di kurmançî de ev her du jî hene. Cînavka qertafî di soranî de beşeke grîng a lêkeran e, lê di kurmançî de ev tune. Cudabûna bêjeyan û bilêvkirinên van her du zaravayan pir nêzîkî ya di navbera almanî û flamanî de ye. Ji vê jî bêhtir devokên herêmî yên van her du zaravayan jî, ji hev û din cuda ne. Ev cudabûn, dibe ku dema ev formên kurdî piranî ji bo axaftinê li herêmên xwe tên bikaranîn hindik problem derdixînin holê, lê li hemberî formasyona forma kurdiya nivîskî, dibin astengên mezin.

Digel ku kurd beriya tirkan demeke dirêj li Anatoliyê bûne û ligel xaka pir fireh ku lê kurdî dihat axaftin, kurdî nebûye zimanekî sereke. Wiha xuya dike ku daxwaziya kurdan ji bo damezirandina dewleteke mezin tune bûye û kurd ji serdestiya çanda komên din, heya ku ew bi meseleyên hundir ên kurdan re pir eleqedar nebûne, kêfxweş bûne. Di heyama îslamî de zimanê serdest ê herêmê erebî, farisî û dawiyê jî tirkîya Osmanî ji bo armancên olî di rêveberiyê de hatine bikaranîn û demeke dirêj ji bo formeke standard pêşxistina formên nivîskî ya kurdî hewce nebûye.

Hewldanên ji bo kurdiyê⁽⁴⁾ standard û yekgirtî ku bi gelemperî ji bo daxwaza dewleteke neteweyî ya kurd derketiye holê, encemake vê sed sala me ye. Ev karakterîstîkên xebatên utopîk ku ji rastiya "zaravayan" re çavê xwe digire û pirsgirêkên ku ji cudabûnên rêzimanî çêdibin, zehf

biçûk dibîne. Wek mînak, di axaftinê de pir an hindik veşartî bimîne jî, ji aliyê rêziman ve di navbera hebûn an tunebûna rewşa zayendê de riyeke navincî tune ye. Hewldanên ku ji her duyan yekê hîlbijêre û dawiyê jî ji bo pirsgirêkên ku bi vê hîlbijartinê derketine holê, li çareseriyên digere, ji ber vê yekê dê nika-ribe bi ser bikeve.⁽⁵⁾

Bi rastî formên nivîskî yên kurmançî û soranî ji ber sedema pêvajoya dîrokî ya xwezayî bi awayekî ji hev cuda bi pêş ketin. Di dawiya sed sala 16'an de ango di destpêka sed sala 17'an de helbestkarekî ku bi kurmançî diaxivî, Melayê Cizîrî bi devoka xwe ya herêmî dest bi nivîsandina helbestan kir. Ên din ew şopandin û di sed sala 17'an de, bi devoka Cizîrê⁽⁶⁾ çend xebatên wêjeyî derketin holê; dibe ku ji nav wan a herî girîng Mem û Zîna Xanî ya ku versiyona wêjeyî ya destaneke devkî ya ku baş tê zanîn e. Lê xaka Kurdistanê ku soranî lê dihat axaftin rewş ji ber ku goranî di bin parastina malbata Erdelan a biesil de bû û tevî farisî û erebî wek zimanê wêjeyî dihat bikaranîn, tevî hev bû. Lewma ji bo pêşvebirina forma nivîskî ya soranî, derfet hindik bûn. Lê demek bi şûn de siûda mîrîtiya Erdelan tefiya û di 1784'an de malbateke din a herêma Mîrîtiya Baban, bajarê Silêmanî, ku zaravaya wê formeke soranî ye, dê hêdî hêdî wekî zimanê helbestê, li herêmê bedewiya wî zêde bû.

Mixabin ev hewldanên zû yên wêjeyî ji destpikîrîna pir wê de neçû û hinek bi şûn de

eleqeya ji bo wan kêmbû (em zanin ku di sedsala 18'an de û di piraniya 19'an de bi kurmançî berhemên wêjeyî nehatine nivîsandin) û girîngiya wan a di demê de bi sînorbû. Lê rewşenbîrên hemdem ên kurdan van xebatan wek beşeke girîng a mijara çanda xwe dibînin. Ji vê jî bêhtir devoka Cizîrê û Silêmaniyê bû bingeha forma standard a kurmançî ku di dawiyê de dê bi pêş ketana.

Di sedsala 19'an de neteweperweriyeye kurdî dest pê kir û ji dawiyê ve sedsalê bi şûn de em dibînin ku rewşenbîrên kurd kovarên ku hinek ji wan azadiya Kurdistanê⁽⁷⁾ diparêzin, dinivîsîn. Soranî heya hilweşandina Împaratoriya Osmanî, piranî wekî zimanê helbestê bi pêş ket. Di wan salan de ên ku li dû ve bûyerê dihatin, avabûna dewleteke kurd a serbixwe wek derfeteke rast xuya dikir⁽⁸⁾ û pêwîstiyeye xurt ji bo zimanekî kemilî derket holê. Bi Peymana Lozanê re (1923) hêviyên ji bo Kurdistaneke azad ji holê rabûn û parvekirina Kurdistanê bû rastiyek. Lê, ev yek nebû sedema terikandina hewldanên wêjeyî yên kurdan. Heta dev ji terikandinê berdîn, kurdên Tirkîye, Iraq û Îranê, li ku derê derfet çêbû, zimanê xwe pêş ve birin.

Wisa xuya dike ku damezirînerê Tirkîyeya modern Kemal Atatürk, di nuqteyekê de derfeta vekirina Kurdistaneke serbixwe difikire. Lê, tiştên di hundirê ve gavê de naskirina rastiya îdfayên neteweperest ên komeke etnîkî ya

Di sedsala 19'an de neteweperweriyeye kurdî dest pê kir û ji dawiyê ve sedsalê bi şûn de em dibînin ku rewşenbîrên kurd kovarên ku hinek ji wan azadiya Kurdistanê diparêzin, dinivîsîn. Soranî heya hilweşandina Împaratoriya Osmanî, piranî wekî zimanê helbestê bi pêş ket.

tirk dê pir dirêj pêk were tê dît. Di encamê de parçeyekî mezin ê Kurdistanê bû parçeyekî Komara Tirkîye ya ku li gorî doktrîna kemalîzmê, ku welatîyên ve dewletê tirk in û divê bi tirkî biaxivin. Ji ber vê yekê hebûna zimanên ku li ser axa komarê ji tirkî bêhtir dihatin axaftin, qayîş bi îdeolojiya fermî re dikişand. Di sala 1924'an de, dibistan, avahiyên olî û weşanên kurdan hatin qedexekirin.⁽⁹⁾ Pêvajoya ji salên 1925'an heta salên ewilî yên 1930'î bû şahidê serhildanên girîng ên kurdan ku di dawiyê de bi hovîtiyeye mezin hatin tepesekirin. Di sala 1938'an de serhildaneke kurdan a dawiyê li herêma Dêrsimê bi dijwarî hate qedandin. Û piştî ve serhildanê, hêviyên kurdan şikiyan. Di pêvajoya 1938-61'ê de her awayê nasnameya kurdan, ziman jî tê de bi awayekî tund hate bînpêkirin. Zimanê kurdî hate qedexekirin û peyvên "kurd" û "Kurdistan" ji ferhenga fermî winda bûn. Kurd bûn "Tirkên Çiyayî". Tiştêkî srûştî ye ku piraniya kurdan di jiyana xwe ya şexsî de axaftina bi kurdî dewam kirin. Lê ew kesên ku di fêrbûna kurdî

de bi ser neketin, di komara tirk de ji jiyana sereke ya civakî bi dûr ketin. Kêmasiya avahiyên perwerdehiyê, kovar û weşanên tirkî bandoreke mezin derxist holê û ji salên 1950'î bi şûn de kurdî her wekî ku ew dê li gelek herêmên Tirkîyeyê, di çend salan de ji holê rabe, dihat dîtin.

Lê bûyerên 1961'ê, hem girîngiya zimanê kurdî hem jî nasnameya etnîkî ya kurdan dikare li ber çavan raxe. Di ve salê de zagona nû, ji bo azadiya îfadekirina komeleyan û çapemeniyê, destûr da. Kêşeya kurd careke din, pir yan hindik dê bi awayekî vekirî di medyayê de bihatana nîqaşkirin. Ev, ji nû ve di nava kurdan de, ji bo nasnameya çandî û lînguîstîk bû sedema pêleke nû.⁽¹⁰⁾ Gelek kes ji nû ve li kurdîtiya xwe vejeriyan. Di navbera salên 1962 û 1968'an de çend kovarên kurmançî hatin weşandin û paşveçûyîna kurdan li Tirkîyeyê sekinî ango qet nebe hinek kêmbû. Di sala 1967'an de desthilatdarên tirk, li hemberî ve pêvajoyê derketin û ji ve salê bi şûn de, bi taybetî li ser kurdiya nivîskî kevneşopîya çewsandina fermî ku bi serketî dihate meşandin, dest pê kir. Di salên 1980'yî de helwesta fermî ya li hemberî kurdan, pir an hindik ji ya 1930'î cuda bû. Xala 28'an a makeqanûna 1982'an dide xuyakirin ku 'zimanên ji aliyê qanûnan ve hatiye qedexekirin, nikarin ji bo xwe îfadekirin û ji bo belavkirina ramanê bînan bikaranîn.'⁽¹¹⁾

Ji aliyê rewşenbîrên tirk ve hewldanên mezin hatine kirin

ku kurdî wek zimanekî tirkî bidin nîşandan (Parmaksız-oğlu, 1983) Li hemberî kesên ku nasnameya xwe ya kurdî diyar dikirin an jî li ser pirs-girêka kurd disekinîn⁽¹²⁾ lêpirsîn çêdibûn, lê ji bo kurdiya axaftinê, bi gelemperî, heta niha tolerans hatiye nîşandayîn. Dema me ev nivîs amade dikir (1990) ji ber sedemên rewşa xerab a li rojhilata Tirkîyeyê, li hinek herêman li ser axaftinê jî çewsandin dihate kirin. Li aliyekî din, nêzîkbûna çapemeniyê ya ji bo mijarê, dide xuyakirin ku beşeke girîng a civaka tirk aleqedarî nîşanî meseleyê nade, yan jî helwestên fermî yên ku hebûna kurdan û zimanê kurdî înkâr dikin, dipejirîne. Ji bo hilanîna qedexeya li ser zimanê kurdî, dibe ku di demeke kurt de hinek hewldanên nû di Parlamentoyê de çêbibin.⁽¹³⁾

Di salên 1920 û 1930'î de, gelek rewşenbîrên kurd reviyayan Sûriyeyê ya ku di bin rêveberiya fransewîyan de bû. Li wir, ji bo têkoşîna kurdan a li Tirkîyeyê alîkarî kirin û ji bo pêşvebirina zimanê xwe xebitîn.⁽¹⁴⁾ Ji vê pêvajoyê bi şûn de, kurmançiya nivîskî hema bi tevahî li der ve bi pêş ve çû. Piştî 1945'an, dema rêveberiya fresewîyan li Sûriyeyê bi dawî bû, navenda xebatên wêjeyî ya kurmançî, gav bi gav ber bi Ewrûpaya rojava ve çû. Di salên dereng ên 1960'î, bûn sedema veqetîna gelek rewşenbîrên kurd ji Tirkîyeyê. Dîsan ji Tirkîyeyê gelek kurd, wekî xebatkarên koçber di salên 1960 û 1970'yî de hatin Ewrûpâyê. Li cihên

xwe yên nû, ji wan beşeke bêhtir polîtîze bûn û haya wan ji wan çêbû, bi serbestî kurd-bûna xwe anîn ziman. Di encam de, cur bi cur materyalên nivîskî yên bi kurmançî li mişextiyê hatin çapkirin. Nêrîna ku dibêje kurmançî nikare ferhengogeke guncan a ji bo entelektueliyê di hundirê xwe de bi pêş bixe, rastî hêrsa gelek nivîskarên kurd ên ku li dijî hemû peyvên ji zimanê biyanî hatine (wek erebî û tirkî) derdiketin û ev jî bû sedema mantiqê nû yê pejirandina fireh û xurt ê ji bo dengên kurdî.⁽¹⁵⁾ Ji ber vê yekê, çend peyvên cuda ku ji aliyê niştecîhên kurdên Tirkîyeyê nayên fêmkirin, her dem dikarin di kurmançiya nivîskî de bîn dîtin. Her çî qas rewşenbîrên li Ewrûpâyê yên bi kurmançî diaxivin dixwazin bi ferhengê standard⁽¹⁶⁾ forma guncan a nivîskî ya zimanê xwe bi pêş ve bibin jî, ew hewl didin ziman ji peyvên biyanî paqij bikin û wisan xuya dike ku dixwazin valahiya di navbera kurmançiya axaftinê û ya nivîskî de dagirin.

Sedema sereke ya ku ji bo rewşa li Iraqê çima ji Tirkîyeyê cuda bûye, dikare di rêveberiya Brîtanya de bê dîtin ku ji salên 1920'î heta 1930'î ku li Mezopotamyayê berdeham kiriye. Desthilatdariya brîtanî îsrar kiriye ku kurd perwerdehiyê û rêveberiyê bi zimanê xwe bikin. Wê, kurd mecbûr kirine ku li ser formeke standard a kurdî li hev bikin û formeke soranî ku zaravaya piraniyê kurdên Iraqê bûye qebûl bikin. Zaravaya

Silêmanî ku wekî zimanê helbestê xwedî prestîj bû, li ser devokên din ên soranî yên li Iraqê bi ser ket.

Lê dîsan jî kurdan bêyî têkoşîn azadiya xwe ya ziman bi dest nexistine. Di bin desthilatdariya brîtanî de, hikumeta Iraqê mafê bikaranîna zimanê kurdî li dibistanan û di karê rêveberiyê ya herêmê de, pejirand. Dema desthilatdariya brîtanî bi dawî bû, ji bo pêkanîna van biryaran tu amadekariyên girîng nehatibûn kirin. Ev, di navbera kurd û ereban de bû sedema xirecîrên mezin û di sala 1931'ê de Qanûna Zimanên Herêmî, di dibistanên seretayî de ji bo bikaranîna zimanê kurdî, pejirand. Piştî vê yekê, xuya dike ku kurdan bibiryar zimanê xwe bi pêş ve birine. Pênga-veke sereke di sala 1958'an de, bi derbeya General Qasim pêk hat. Komara Iraqê ya ku nû hatibû damezirandin, kurd wek 'şirikên ereban' nas kirin û heta demekê kurdî bi awayekî fermî hat teşwîqkirin. Digel nakokiya nû ya di navbera serokatiya kurdan û hikumeta Iraqê de, wêjeya kurdî ji bo çend salan bi pêş ket. Piştî derbeya Baas a di sala 1968'an de, bi hevnebawerbûna dualî dom kir. Lê, di sala 1970'yî de peymaneke ku kurdî li Iraqê zimanê fermî didît, hat înzekirin. Di salên li dû vê peymanê de, saziyên kurd ku wekî Yekîtiya Nivîskarên Kurd û Akademiya Zanistî ya Kurdî (Nebez 1975: 1067) hat avakirin yan jî hatin zexmkirin. Akademiya Zanistî ji bo bipêşvebirina kurdî roleke girîng list.

Lê, sala 1970'yî bû saleke dîrokî. Di maweya du salan de, di navbera hikumeta Iraqê û serokatiya kurdan de dijberiyên mezin derketin. Ev, di sala 1974'an de gihîştin radeya herî bilind. Di sala 1975'an de Şahê Îranê ku alîkariya şerkarên azadiyê yên kurd kiribû, bi hikumeta Iraqê re Peymana Cezayirê îmze kir û kurd tenê hiştin. Berxwedana kurdan di carekê de hilweşiya.⁽¹⁷⁾ Di salên li dû vê sala hatî de, gelek pêşketin ên 1970'yî gav bi gav ji aliyê desthilatdariyê ve hatin tengkirin. A niha, helwesta hikumetê li hemberî kurdan ketiye rewşeke ku tu kes ji paşeroja edebiyata kurd ne bihêvî ye. Li aliyekî din, kurdên Iraqê wêjeyê berbiçav û zimanekî nivîskî yê guncan afirandine û nîfşên kurd ên îroj perwerdehiya xwe ya seretayî û navîn bi kurdî dibînin.

Li Îranê, dîroka zimanê kurdî ya van salên dawîn, ne bi qasî ya li Tirkiyeyê trajîk e ne jî bi qasî ya li Iraqê baş e. Ji bo çewsandina li ser kurdiya axaftinê, hew çend hewldanên girîng çêbûne lê weşanên kurdî gelek caran serbest bûye.

Di bin serdestiya Riza Şah de (1926-41) ji bo farisî bê axaftin, hinek gav hatin avêtin û çapkirina bi kurdî hatiye qedexekirin. Di dema dîroka kin a Komara Mehabadê (Rêbandan-Berfanbar 1946) û di salên li dû hatî de weşanên kurdî bi pêş ketin.⁽¹⁸⁾ Piştî têkçûna Komara Mehabadê, pêvajoyê çewsandinê ya aktîf a li ser hemû şeweyê îfadekirina kurdîtiyê, dest pê kir

û çalakiyên wêjeyî sekinîn. Ji bilî çend tesadûfên biçûk, di dema salên dawî yê desthilatdariya Riza Pehlewî (1941-79) de hemû weşanên kurdî hatin qedexekirin.

Rêxistinên kurdan bi awayekî aktîf beşdarî şoreşa ku malbata pehlewî ji desthilatdariyê xist, bûn. Gelek kes xwedî hêviyên mezin bûn ku dê Kurdistan di hundirê Komara Îslamî de bibe herêmeke otonom û kurdî jî dê li herêmê digel farisî bibe zimanê fermî. Pêşnûmaya xweser a qanûna bingehîn a Îranê di dibistan û çapemeniya herêmî de bikaranîna zimanê herêmî peji-rand, lê di şeweya dawî ya zagonê de (di Sermawez'a 1979'an de hate pejirandin) ev maf hinek hate tengkirin û hate destnîşankirin ku zimanên herêmî hew dikarin digel farisî bîn bikaranîn û pirtûkên dibistanan dê tenê bi farisî be.⁽¹⁹⁾

Her çi qas bi damezirandina Komara Îslamî re di navbera serokatiya kurdan û hikumeta Tehranê de alozî bilind bû û digel garantiya binor a qanûna bingehîn, kovarên kurdî bi awayekî tund hatin qedexekirin. Lê, di 1984'an de helwesta fermî ya li hemberî ziman û weşanên çanda kurdî guherî û weşandina weşanan serbest bû. Ji wê demê û bi wir de çend weşanên kurdî tên weşandin. Li Îranê çapxaneyê kurdî heye û îro perwerdehiya kurdî jî serbest e.

Digel ku dîroka kurdan di mercên taybet ên ku kurd tê de jiyane dirûvê xwe girtiye

jî, çend pêşveçûnên ku li jor hatibûn gotin, dişibe hinek zimanên biçûk ên koma Îranî. Wekî kurdî, peştû jî ku li Afganistan û Îranê tê axaftin, di sedsalên 16 û 17' emîn de zimanekî nivîskî yê wêjeyî pêş xistiye, lê ev ziman ne wekî zimanê danûstendina rojane yê nivîskî bû. Wekî kurdî, li vir jî tevgera ji bo zimanekî modern ê standard di vê sedsalê de derketiye holê.⁽²⁰⁾ Peştû, li Afganistanê ji sala 1930'î û bi vir ve wek "zimanê neteweyî" hatiye nas-kirin. Lewma rewşa Afganistanê naşibe herêmên kurdan⁽²¹⁾ û me eleqeder nake. Ji aliyekî din, li Pakistanê ku li wir peştûyî qedexeyê,⁽²²⁾ ji bo formeke standard a zimanê nivîskî hewldan heye û ji bo fikara windabûna nasnameya peştû ya ku xwestin ziman û wêjeya xwe ya nivîskî bi pêş ve bibin tune. Hêviyên ji bo maf, wekî em li Kurdistanê şahid dibin, ji windabûna zimên derdikeve holê. Ji dema damezirandina Pakistanê û bi taybetî jî ji 1960'î bi şûn de, li Pakistanê ji bo wêjeyê nivîskî ya di zimanê belûcî de hewldanên muhtesem hatine kirin.⁽²³⁾

Wekî encam em dikarin bibêjin ku di sedsala 20' emîn de çend komên etnîkî yê çarenûsiyê yan jî ji bo serxwebûna neteweyî û çandî, hew ji bo vê yekê rola xwe lîst. Lê, ji bo çend mînakên, di navbera van hêviyan û çalakiyên wêjeyî de yekser têkilî heye.⁽²⁴⁾ Ji xeynê wê jî hewldanên ji bo pêşxistina ziman, pirî caran piştî ku hêviyên polîtîk dişken jî berdewam dike.⁽²⁵⁾ Pêwîs-

tiyeke pratîk a ji bo zimanê nivîskî ew qas xuya nabe; di vir de hinek aliyên din jî tên dîtin. Hemû nebin jî, piraniya ew kesên ku kurdî, peştû yan jî belûciya nivîskî bi pêş ve dibin, dikarin awayekî baş xwe bi zimanê ku li herêmen wan serdest e, îfade bikin. Ji ber ku bi gelemperî perwerdehiya seretayî bi zimanê serdest e, ew kesên ku tenê bi zimanê "kêmeteweyan" diaxivin⁽²⁶⁾ piranî nikarin bixwînin û⁽²⁷⁾ ji wêjeya nivîskî ya zimanê xwe tehmekê nabînin.

Di kêşeya kurdî de, grîngiya ku ji bo bikaranîna gelemperî ango fêmkirina zimên di warê zelalbûna zimên de tê dayîn, heta di hewldanên xurt ên ji bo kurdiyeke çêkirî û yekgirtî û standard ku kurd jê fêm bikin, wisan xuya dike ku ji motîvasiyoneke pratîk wê de motîvasiyoneke îdeolojîk derdikeve holê. Bi gotineke din, zimanê nivîskî ji ber pêwîstiyeyeke pratîk çêdibe, lê ev ji bo kurdan û zimanên kêmeteweyên din ên Îranê ne wisan e. Xuya dibe ku formên nivîskî yên kurdî, pirî caran ne ji ber ku pêwîstî pê heye, lê belê divê formên nivîskî hebin, hatine pêşxistin.

Lewma em nikarin bibêjin zimanê ku em li ser disekinin, pêşiyê nehatiye pêşxistin, lê ji ber ku ziman wek beşeke girîng e nasnameya etnîkî tê dîtin, ev hewldan tên kirin. Pêwîstiya ji bo formeke standard a kurdî, a niha ji sedsalên derbasbûyî bêhtir pêwîst e. Em dikarin zimên beşeke nasnameya etnîkî bibînin. Nasname di xwezaya xwe de, ji rasyonaliya wê wêdetir tiştekî

dilînî ye. Lê kevneşopî, nêrîn û dîrokeke hevbeş -rast be jî, tiştekî mîtolojîk be jî- ji bo afirandina van hestan di ziman de cihekî girîng digire. Ji bo kurdan dikare bê gotin ku, pêşveçûn û hemdemî hinek bi kevneşopî û hinek jî bi aliyên çanda kurdan re ku piraniya kurdan, bi taybetî jî yên perwerdebûyî pesnê xwe didin, bisînorkirî ye. Perwerdehiya li dibistanên dewletê li ser nêrîna kurdekî/ê ya der barê kurdan de û dîtina cihanê ya der barê kurdan de, bandoreke ne baş hîştîye û dîroka kurdan a muhteşem kurdan wekî serhildêr, her dem serbest nîşan daye; ev yek⁽²⁸⁾ ne ji bo niştecihên kurd ên têkçûyî yê vê sersala me neynikeke rast e, ne jî alîkariya hevîyên di pêşerojê de avakirina dewleteke kurd dike.⁽²⁹⁾ Digel ku zimanê kurdî di sedsala me de gelek caran bi paş ve çûbe jî, ji rûmeta xwe ya sembolîk tiştek winda nekiriye. Tê bawerkirin ku ziman diselmîne kurd tevî dîrok, wêje û çanda xwe ya taybet mirovên serbixwe ne. Li Tirkiyeyê çewsandina li ser kurdî wek nîşaneke herî balkêş a zilma li ser gelê kurd tê dîtin û ev li Rojava, heta li Tirkiyê her ku diçe wisan tê fêmkirin.

Ziman, dema bi danûstendina bi kesên biyan re, ji bo îfadekirina nasnameya kurd roleke girîng dilîze. Dîsan, dibe sedema dîtina mirovan a ji bo rûmet û kurdîtiya wan. Ev hêmaneke girîng a kurdîtiyê ye ku rêgez, tevger, norm û helwestên wê kurdan dide naskirin û ji ber vê jî parçeyeke îdeala nasnameya kurd e

ku heta cihekî hemû kurdan dixwe bin bandora xwe. Rastiya ku di 1960 û 1970'yî de ku gelek kes li Tirkiyeyê îdîa dikin ku ew kurd in, nîşan dide ku berjewendiyên polîtîk û civakî ji bo vê tercîhê bi serê xwe têr nake. Heta di van salan de ji bo gelek kurdan hêsan bûye ku xwe wek tirkên asîmîlebûyî bibînin. Ev dide xuyakirin ku nasnameya kurdan hîn ji bo gelek hêza xwe didomîne. Lê hindik kes bi dilxweşî bêriya demên berê û dozên dîrokî dikin û dibe ku ev ji bo kurdan jî wisan be. Wisan dixuyê ku heta bawerîya wan bi nasnameya kurd hebe ku kêmeteweyên hatibe diyarkirin hebe, ew dê ji bo kurdîtiya xwe amade bin.⁽³⁰⁾

Sedema ku çima kurd îro ji berê bêhtir di vê sedsalê de parastina zimanê xwe pir pêwîst dibînin, di vê rastiyê de ye ku zimanê serdest îro ji sedsal berê bêhtir bi hovane serdest in, tê fêmkirin. Perwerdehî bi piranî bi zimanê serdest e; hemû medyaya mezin wê bi kar tînin û derfeta dîtina kar ji bo kesên ku nikarin zimanê serdest biaxivin, gelek kêmeteweyên çandî yên ji bo parastina zimanên xwe ku wekî me dît nîşaneke girîng a nasnameyê ye û ji berê bêhtir hewce ye ji ber vê yekê dikare bi tîrsa bilez, asîmîlekirina bilez a ku ji aliyê çanda serdest, bê şîrovekirin.

Heke zimanên wekî kurdî hinek jî ji bo astengkirina danasîna endamên ji komên kêmeteweyên ku wekî ew endamên gelê serdest bin, bê

parastin, wisan dixuyê ku ziman fonksiyoneke wê ya ku kes nabîne jî, heye: Parastina mirovên ji der ve ya ji danasîna wan ew e ku ew wek endamekî/ê komeke kêmnetewe bin. Digel ku paşveçûyîna kurdî li Tirkîyeyê sekinîbe jî, bêguman kurdên li dorhêla welat êdî ne wek berê zimanê xwe xweş bi kar tînin û ne jî her dem diaxivin. Ji ber vê yekê tiştêkî girîng e ku tirkên ji çîna nizm ên li van herêman dijîn, tê ragihandin ku bi kêşeya kurd re her ku diçe zêde eleqedar dibin û ew, hindik yan pir xwe kurd dîhesibînin. Li Iraqê ku kurdî ji bo îfadekirina nasnameyê roleke sereke ya pratîk dilîze, komên ereban xwe wisan nabînin. Bi rastî jî pêkan e ku ziman li vir faktoreke pir girîng e. Ji ber ku piraniya kurdên van herêman wek cîranên xwe yên ne kurd in, tirkîyeke xweş diaxivin û ji aliyê kesên derveyî wan pir hindik hatiye fêmkirin ku ew zimanekî din diaxivin. Cudabûna bingehîn a di navbera wan û piraniya tirkan de ne koka wan a etnîkî ye, lê cihê wan ê civakî ye. Eger pêşveçûneke wisan li Tirkîyeyê bidomiya dê li ser forma kurdîtiyê jî bandor bihişta.

Îro ev xetere hinek dûr e; hebûna hejmareke zêde kurdên li welat li hemberî van xetereyan dikare bisekine. Ev, ne xeyal e û hinek tiştên ku dişibe wan, li Kurdistanê pêk hatine. Peyva 'goran' an gûran (gûranî) ku berê wekî komeke ne şîrîkê xurt ê Kurdistanê dihat bikaranîn, îro bi taybetî ji bo 'gundî'yan tê bikaranîn.

Minorsky, di nivîseke xwe de (1943) dibêje ku vê peyvêbûye. Wateya wê ya kevn ji "gavbarakan" a kevn tê û wateya wê gavan e û komeke eşîran nîşan dide. Goran jî ji gabranê ku wateya wê 'kafir' e tê; ew zerdeştî bûne. Etîmolojiya ji bo peyva duyemîn hatiye dayîn û peyv ji bo peyva rûsî "krestyanin" ku wateya 'gundî' ye tê bikaranîn. Wisan diyar dibe ku ev ji aliyê lîngûîstîkê ve nikare bê parastin. Di bikaranîna rojane de -an ji bo yekhejmar (gûran, goran, gundî) tê bikaranîn. Pêwîst e em zanîbin ku çawan peyva "gabran" a "infîdel" a ku pirejmar e endamê gundiyan bi nav dike. Li herêman din ên Îranê di zimanê gel de ji bo "gabranî" peyva "gabrî" tê bikaranîn. Ji xeynî wê jî, formên bi -ân bi gelemperî eşîr û komên ku navên wan qet tune be, ji dema Axamenîdan bi vir de, di de nasandî. ⁽³¹⁾ Li ser bikaranîna têgeheke wek "gabr" (ku etîmolojiya wê nayê zanîn, her dem wateyeke wê ya biçûkdîtinê heye) a ji dema zerdeştîyê yan jî ji bo hinek komên ku xweş hatine naskirin û beriya îslamiyê jiyane maye, tu delîl tune ne.

Wisan xuya dike ku peyva gûran/goran, gundî ji peyva "gabr" bêhtir bi navê eşîrên guranî re têkildar e û ji ber vê yekê jî ji nakokîya di navbera her du wateyên vê peyvê ji guherandina nasnameya goranî tê. Digel ku kêmasiya delîlan nahêle em zêde bifikirin jî, em bawer dikin ku hejmareke zêde eşîrên goran bi cih bûbûn. Wekî baş tê zanîn, de-

ma koçer bi cih dibin, di nava çîna herî nizm de cihê xwe digirin û li wir dimînin. Ji ber vê yekê piraniya goran gundiyan jî rêzê bûne. Ji ber gelek sedeman, dibe ku wan li herêma zaravayekî kurdî pejirandibe. Dîsan, em dizanin ku zimanê goranî wekî zimanekî wêjeyî, di sedsala 18'an de ku grîngiya wê sêmbolbûnê ji bo nasnameya etnîkî ji holê rabûye, prestîja xwe wînda kiriye. Ji vê rojê bi şûn de hem prestîja wê hem jî hejmara axivgerên vî zimanî gelek ketiye û goranî di vê sedsalê de wek zimanê dapîrên di kuçeyên teng ên ji navenda bajarê Senendej dijîn, dûr hatiye naskirin. (Kurdistanî apud Nebez 1973:...) Wê demê em dikarin bibêjin, mimkun e ku nasnameya lîngûîstîkî û ya çandî ya gûranî, ji ber ku gelek goran di gelek aliyên jiyane de dest ji axaftina xwe berdane û gûranî prestîja xwe ya kevn wînda kiriye, hundirê wê vala bûye. Lewma peyva goran ji bo komeke eşîrên serbilind bêhtir, ji bo çîneke civakî ya ji rêzê hatiye bikaranîn.

Digel em nikarin her tiştên ku hatiye serê goranî bibêjin jî, vê nêrîna ji bo bersîva fikarên mezin ên axivgên zimanên "kêmnetewe" û ji bo hişyarkirina wan a ji bo pêşgirtina li van bûyeran ku ji parastina aktîf a zimanê wan tê fêmkirin, bes e.

Di encamê de em dikarin bibêjin, ziman yek ji faktorên girîng e ku alîkariya hesta etnîkî yan jî ya nasnameya etnîkî dike. Lê, di pîrsa kurdî de ev girîngî di sedsala me de

pir bilind bûye. Kurdî, hem li hemberî kesên biyan û hem jî ji bo kurdan nasnameya kurdîtiyê dinimîne. Ziman, wekî îspat û sembola nasnameya etnîkî tê dîtin û tê hêvîkirin ku zimanekî pêşketî yê kêmteweyekê li hemberî asimilasyona endamên komeke serdest a li dijî kêmteweyekê jî dibe asteng û nasnameya komên serdest jî ku wekî ew komeke etnîkî bin, diparêze. Ji ber vê yekê, fikara kurdan a ji bo zimanê wan ê ku di hewldanên wan ên ji bo pêşxistina zimanê standard ê nivîskî yên vê sedsalê tê dîtin, bi tevahî heq e.

Ji inglîzî: **Behzat Jiyan**

NÎŞE:

1) Şahidiya nîqaşên di çapemeniya tirk ên der barê qewirandina niwînerên kurd ên Parlamentoyê Mehmet Turk (Ahmet Turk -Wer) û ên din ji Partiya Demokrat a Gelperwer (SHP), bi sedema beşdarbûna wan a Konfransa Navneteweyî bû, Les Kurdes: Droit de l'homme e Identite Culturelle (Paris 14-15 Kewçer 1989). seroktiya partiye da zanîn ku pîrsa kurd tune ye.

2) Digel ku dîroka zimanê kurdên li Yekîtiya Sovyetê pir balkêş be jî em nikarin li vir nîqaş bikin.

3) Wekî mînak rojnameya Bzav li Iraqê bi tîpên erebî ji 1989'an bi vir de tê weşandin û gotarên kurmançî çarînan di kovara Sirwê de ku ew jî alfabe ya erebî bi kar tîne, tê weşandin.

4) Nebez di sala 1975'an de ji wan rêzehewldanan yekê temsîl dikir.

5) Hewldaneke din a ji bo serfiraziya avakirina kurdîyeke standard a hevbeş di sala 1934'an de, dema Kongreya Nivîskar û Helbestkarên Kurd ên YKSS (Yekîtiya Komarên Sovyetên Sosyalîstwer) bi kêfxweşî biryar da ku kurmançiya kurdên Sovyetê divê wekî zimanê standard ê kurdan bê naskirin, derket holê.

6) Li gorî hin delîlan, nivîskarê ewilî yê kurmançî ne ew bû ye lê der barê nivîskarên ewilî de kêmtîşt tîn zanîn. Melayê Cizîrî bi gelemperî wekî bavê nivîsa kurmançî tê naskirin.

7) Ji bo lêkolîna van weşanên kevn li nivîsa Kreyenbroek ku dê bê weşandin, binêrin.

8) Peymana Sevrê ku di 10'ê Gelawêja 1920'an de hatibû îmzekirin, dameziranîna wê dewletê dipejirîne.

9) Helwesta fermî ya tirkan a li hemberî kurdan û zimanê wan, di salên destpêkê yê Komarê de bi vê banga ku ji aliyê wezîrê hikumetê hatiye kirin, pir baş tê fêmkirin: "Ez bawer dikim pêwîst e ku tirk tenê bibin xwedî û mezîne vî welaîf. Ew kesên ku ne tirk bin, li vî welaîf tenê mafekî wan heye: mafê xizantî û koletiyê" (Milliyet 16 Rezber 1930, ji aliyê Kendal 1980) Vê agahiyê nîşan dide ku bîrdariya kemalîzmê hemî niştecîyên Tirkîyeyê tirk dihesîne.

10) Nûçeyên têkoşîna serfiraziya kurdên Iraqê, di vê demê de dilên kurdên Tirkîyeyê xweş kir.

11) Di sala 1983'an de li hemberî bikaranîna kurdî qanûnên bêhtir tund derketin. (Qanûna 2392, xal.3: "zimanê resen ê welaîyên tirk, tirkî ye, abikaranîna zimanekî resen ê derveyî tirkî û beşdariya her cure çalakîyên bi wan zamanan, qedexeyê...")

12) Di sala 1983'an de serokê berê yê şaredariya Diyarbekirê Mehdî Zana, ji ber ku bi xebatkarê xwe re kurdî axivîye, bi 25 salan hate cezakirin. (Studia Kurdica 1-5, 1988:185<9 di 1987'an de stranbêjekî navdar İbrahim Tatlıses ji ber ku li Stockholmê stranek bi kurdî gotiye li Tirkîyeyê hatiye daizandin (Studia Kurdica). Edîtorê kovara Medya Guneşî ya ku bi kurdî-tirkî dihat weşandin, di payîza 1989'an de hate girtin. Sosyolog İsmail Beşikçi di adara 1990'î de ji bo pirtûka xwe ya "Kurdistan: Mêtîngeha Navneteweyî" li Stenbolê hate girtin.

13) Di Gulana 1990'î de hate diyarkirin ku SHP'ya çend meh berê pîrsgirêka kurd tune dihesiband, pêşnûmayekê jî bo nasîkirina zimanê kurdî dê aşkera bike.

14) Kovara Hawarê bi tîpên latînî, bi kurmançî li Şamê hate weşandin (1932-4; 1941-3)

15) Heman tişt heta cihekî ji bo soranî jî rast e. Lê li Iraqê bikaranîna zaravayekî di weşan û perwerdehiyê de mantiqekî nû ku ji ya li Tirkîyeyê hêsantir tê qebûl-kirin, derdixê holê.

16) Ji bihara 1987'an ev nivîskar û rewşenbîr salê du caran ji bo bikaranîna kurmançî dicivîn û encama civînan di kovara Kurmançî de tê weşandin.

17) Ji bo dîroka nûjen a kurd li McDowall 1985: 12ff binêrin.

18) Ji bo hin ji van weşanan li Nebez 1975 :103 binêrin.

19) Ji bo agahiyên bêhtir li Koohi- Kamali ya Kreyenbroek û Sperl, ku dê bê weşandin binêrin.

20) Berjewendiyên mêtîngerî yê britanî di nivê sedsala 19' emîn de xebatên wê-jeyî di zimanê peştû de teşwîq kir (Kreyenbroek 1984), lê vê hewldanê di nava peştûyên perwerdebûyî de pir kêmtir bersiv dît.

21) Heta di demoya salên 1970'î piştevaniya ji bo peştû li Afganistanê bi gelemperî ji ya piştevaniya ji bo soranî ya li Iraqê xurtir bû. Di wê demê de li Afganistanê li hemberî serdestiya farisî, peştû astengiyek bû. Lê li Iraqê ji serdestiya erebî tu caran bi awayekî cîdî guman nehatiye kirin.

22) Cara ewilî di sala 1989-90'î de li herêma Belucistanê ji bo perwerdehiya peştû di dibistanên seretayî de destûr hate dayîn. Elbet ji bo texmînkirina pêşveçûyînê di dahatûyê de hin pir zû ye.

23) Li gotara Baluchistan: Language, Literature and Archaeology, Baluchi Academy, Quetta n.d., ya B.A. Baloch, A.J. Jamalîni û N. Gichky û Jahani 1989, binêrin.

24) Ji bo 1920'î li Mezopotamîyê û beriya û piştî demajoya Komarê li Mahabadê, li gotara Kreyenbroek a ku dê bê weşandin binêrin.

25) Îstîsnayek piştî demajoya Komarê li Kurdistanê Îranê ye, ku çewsandina hikumeta li hemberî hewldanên din ên wê-jeyî bû asteng.

26) Digel ku wek mînak peştû li Afganistanê komeke serdest in, li vir bikaranîna tîgîha zimanê kêmteweyê ji bo kurdî, peştû û belûcî di nav tîgîhan de ya herî bêsiud e.

27) Îstîsnayek ev e ku gelek kurdên Iraqê bi zimanê soranî perwerde bûne. Li ser dahatûya bêhtir xweşbîn a ji bo kurdiya li Îranê û peştû û belûciya li Pakistanê, li jorê binêrin.

28) Qedera gundiyên kurd ên bindest a bi sedsalan bi awayekî xwezayî di şîrove-yên wîsan ên dîroka kurdan de ne xwedî roleke mezin e.

29) Dîroka nûjen a Rojhilata Navîn pêşniyar dike ku tunebûna dewleteke wîsan li ser şansê avabûna dewleteke kurd, di dahatûyê de bi awayekî objektîf nabe bandor nahêle.

30) Li aliyekî din rastiya ku gelek kurdên Tirkîyeyê ku êdî nikarin kurmançî biaxivin şampîyonîya pîrsa kurd dikin, nîşan dide ku qet nebe di dema kurd de îdeala nasnameyek kurd pir kêmtir nêzikî rastiya rojane be ji xwedî hêzekê ye.

31) Paşgîra -ânâm ji pirhejmara paşgîra xwedîtiyê ya pirhejmar a farisîya kevn -ânâm tê. Mînak: îran < *aryânâm '(xaka) aryanan'. Forma mukrîyîni ku carinan di dewsa mukrî de tê bikaranîn ji forma duyem a -î çêbûye û dibe ku di dema nêzik te bi şibandîna tîgîhên wekî soranî, gûranî û hwd. derketibe holê.

GIRINGIYA

XALBENDIYÊ

Adar Jîyan

Her zimanek xwediyê teng û bilêvkirineke cuda û xweser e. Di her zimanî de îşareyên ku deng nîşan didin û alfabe-yê pêk tînin hene. Ev nîşane di zimanê kurdî de wekî "tîp" têne binavkirin. Lê belê deng û tîp ne heman tişt in.

Deng, di zimên de wekî lerza hilm û bayê ku ji cegeza mirov derdibe, tê binavkirin. Belê tîp, di nivîsandinê de beramberiya deng bi xwe ye. Alfabe jî tevahiya tîpên ku di zimanê nivîskî de wekî rêzekê li pey hev dişeridin, tê navandin.

Zimanê kurdî, her çendî ku xwediyê alfabe-yê 31 tîpe jî, di zimanê devkî (axaftinê) de zêdeyî 35 dengên resen û xweser hene. Bi salan e ku ev mijar tê nîqaşkirin û guftûgokirin. Belê hê jî satandardkirineke birêkûpêk, pêk nehatiye. Ango hin dengên ne ji hev (belê nêzîkî hev) bi heman tîpê tînin nîşandan. Ev yek bi serê xwe mijara nîqaşêke din e. Em ê di vê mijarê de, ji girîngiya deng û tîpan bêhtir, li xalbendiyê û girîngiya wê ya çarenîn hinekî rawestin.

Xalbendî, di vegotina nivîskî de, karê bikaranîna nîşaneyên ku şêwe, wate û peywira wan hatiye diyarkirin, di-

de ser xwe. Di vegotina devkî de, mirov dikare ji bo têngihîştin û fêmkirina gotinê, kirpandin, sedîn û bilêvkirina peyvê, di cih de bi kar bîne. Hevok, li gorî hin rêbaz û qaydeyên axaftinê û her wiha li gorî bizav, îşare û mîmîkên mirov tînin fêmkirin.

Di vegotina nivîskî de mirov nikare xeletî û çewtiyên xwe sererast bike. Tu şans û derfeta mirov nîn e ku bikaribe lêborîna xwe bixwaze an gotin û hevoka ku derbasî nivîsandinê bûbe dubare û têkûz bike. Ji bo wê, di zimanê vegotina nivîskî de, di cih de danîn û bikaranîna xalbendiyê tiştêkî misêwa, girîng û çarenîn e. Di zimanê nivîskî de xalbendî û vekît, teşeyê didin wateya vegotinê. Û wate, her gav li gorî bikaranîna îşareyan li hevokê tê barkirin. Ango, tevîkirin û xurtkirina wateya vegotinê, her gav bi saya xalbendiyê bi dest dikeve.

Fêmkirin û têngihîştina vegotina nivîskî, ji aliyekî ve girêdayî fêrbûn û bikaranîna xalbendiyê û ji aliyê din ve jî girêdayî sepandina vekîtê ye. Bikaranîna xalbendiyê çendî girîng be, di cih de danîna îşare û xaleşaniyê jî ew qas girîng e. Divê, rastiya cihê ku îşare lê tê danîn, an jî bi çi

mebestê û piştî kîjan peyv û hevokê hatiye danîn, baş bê fêmkirin. Ji bo wê jî, divê ku birên xaleşaniyê li gorî cihê ku lê têne danîn, ji hev bînin veqetandin. Mirov dikare li gorî xalbendiyê (xal, bêhnok, pirs-nîşan, baneşan, xalebêhnok, xalecot, sêxal, dunik, bendik, xêzek, dabir û hwd.) wateya hevokê biguherîne. Ji bo nimûne:

"Mamoste Ehmed vexwend malê"

Hevoka jorê bêxaleşan e. Mirov dikare bi xalbendiyê re çend wateyên cur bi cur lê bar bike:

1. Mamoste, Ehmed vexwend malê.

Di vê hevokê de, kirde diyar e. Kirde, mamoste ye. Ji ber ku bêhnok piştî kirde (mamoste) hatiye danîn, yê ku Ehmed vexwendiyê malê mamoste ye. Û yê ku tê vexwendin jî Ehmed e.

2. Mamoste Ehmed, vexwend malê.

Di vê hevokê de kirde Mamoste Ehmed e. Mamoste Ehmed, kesek vexwendiyê malê; lê belê kesê/a ku hatiye vexwendin ne diyar e.

3. Mamoste Ehmed vexwend malê.

Di vê hevokê de, mirovekî/ê Mamoste Ehmed vexwendiyê malê. Kirde ne diyar e.

Yê ku tê vexwendin Mamoste Ehmed e. Belê yê ku Mamoste Ehmed vexwendiyê malê ne diyar e. Mamoste, Ehmed vexwend malê?

4) Mamoste, Ehmed vexwend malê?

Hevok, bi pirsnîşanê bi dawî dibe û kesek pirsax vexwendina Ehmed a ku dê ji hêla mamoste ve pêk bihata, dike.

5) Mamoste Ehmed, vexwend malê?

Di vê hevokê de, pirsax kesê/a ne diyar a/ê ku dê ji hêla Mamoste Ehmed ve bihata vexwendin, tê kirin. (Gelo Mamoste Ehmed, ew mirov vexwend malê?)

6) Mamoste Ehmed vexwend malê?

Di vê hevokê de jî, pirsax kesê/a nediyar a/ê ku dê Mamoste Ehmed vexwenda malê tê kirin.

Minaka jorê, girîngî û pêwîstiya xalbendiyê ya di zimanê nivîskî de nîşan dide û hewcetî û jênageriya bikaranîna wê ya di cih de li ber çavan radixe. Gelek hêmayên xalbendiyê yên bingehîn he ne. Ev hêmayên bingehîn di her zimanî de bi heman awayî tene bikaranîn. Ango rêbazên xaleşaniyê, wekî rêbazên zimanên din ên hevpar û gerdûnî hatine pejjirandin.

Hêmayên Xalbendiyê

A) Hêmayên ku li dawiyê bête û hevokê tene danîn:

1. xal (.) :

Li dawiyê hevokê tene danîn. Ev nîşane dide zanîn hevok bi dawî bûye. Piştî ku hevok diqede, li dawiyê wê xal (.) tene danîn û piştî xalê hevok din dest pê dike. Peyva piştî xalê bi tîpa mezin dest pê dike. Xal, tene wateya qedandin, rawestandî û bidawîbûna gotin û hevokê. Dixwendî de xal, mirov bi qandî hilmekê dide rawestandî.

Cihê ku ev nîşane, ango xalê tene danîn ev in:

1.1. Xal, li dawiyê hevokên ku wateya wan temam dibe, tene danîn.

Zimanê kurdî zimanekî qedîm û dewlemend e. Her çend ku bi salan hatibe qedexekirin û astengkirin jî, dîsan tene neçûye. Ziman, bi saya dayikên ku wekî zimanzanên xwezayî tene zanîn, hatiye parastin.

1.2. Xal, li dawiyê bêteyên kurtkirî, tene danîn.

hwd. (her wekî din), bnr. (binêrin), r. 18 (rûpel 18), ap. (apartman)

1.3. Xal, li dawiyê jimareyên rêzkirî ango li şûna qertafa "emîn" an jî "em", tene danîn.

Çar birên hevokê hene:

- 1) Kirde (hêman yekemîn)
- 2) Pêveber (hêmana duyemîn)
- 3) Bireser (hêmana sêyemîn)
- 4) Têrker (hêman çaremîn)

Di zimanê nivîskî de ev xala dawiyê jimareyê, vegotin û tenehîştinê asantir dike.

1.4. Xal, li dawiyê an jî di navbera reqemên mêjûyê tene danîn. Roj, meh û sal bi saya xalê ji hev û din tene veqetandin. Mînak:

Azad, di 07. 03. 1971'ê (di sala hezar û nehe sed û hefte û yekê) de ji dayik bûye.

1.5. Xal, di navbera beşên demjimêrkê de tene danîn. Ango li dawiyê saet, xulek û çirkeyê tene danîn. Mînak:

Kendal, di pêşbaziyê bezê de bi 3.12. 34. (3 saet, 12 deq û 34 saniyeyan) wekî pêşbazê yekemîn hate hilbijartin.

1.6. Xal, di navbera pêlîkên jimareyan de tene danîn. Mînak:

Evîne îro, bi 35.600. 000'î (sî û pênc milyan û şeş sed hezarî) pirtûkên nû yê li ser zimên kirin.

1.7. Xal, di destnîşankirina xalên bingehîn de tene bikaranîn. Mînak:

Di kurmancî de birên hevokê deh in:

- 1) Navdêr
- 2.) Veqedandek
- 3) Rengdêr
- 4.) Cînavk
- 5.) Lêker
- 6.) Jimarnav
- 7) Hoker
- 8) Daçek
- 9) Gihanek
- 10.) Baneşan

2. Bêhnok (,) :

Di xwendinê de, li cihê ku mirov bêhnê xwe lê vedide, tê danîn. Bêhnok, wekî nîşaneyê veqetandinê li dawîya peyvên ku li pey hev têne nivîsandin, ango li şûna gihanekê tê danîn û bikaranîn. Xwendin û fêmkirina hevokê, hêsantir dike. Fêmkirina hevokekê, girêdayî cihê ku bêhnok lê tê danîn, diguhere an li wate-yeke din dadigere. Mînak:

Mamoste Evînê, pirtûkek kirî.

Mamoste, Evînê pirtûkek kirî.

Ligel ku hevok ji heman peyvên pêk hatiye jî bêhnok, wateya hevokê diguherîne û li wateyeke din dadigêrîne.

Di hevoka yekem de, bêhnok li dawîya peyva "Evîn"ê hatiye danîn û tê fêmkirin ku navê wê Mamoste Evîn e; ango "Mamoste Evîn" pirtûkek kiriye.

Di hevoka duyem de bêhnok li dawîya hevoka "Mamoste" hatiye danîn û tê fêmkirin ku, mirovek bi bîra mamoste dixê ku kesa bi navê Evîn, pirtûkek kiriye.

Wekî din jî em dikarin li ser cihê ku bêhnok lê tê danîn an jî li ser peywira bêhnokê rawestin.

Cihên ku bêhnok lê têne bikaranîn:

2. 1. Bêhnok, navdêran ji hev vediqetîne:

Zelal, Rûbar, Amed, Rozerîn... hemû, hemsalên hev in û diçin dibistana navîn.

2. 2. Birên navdêran ji hev vediqetîne:

Serwer kevçikên çayê, fincanên qehweyê, kêrên fêkî, încaneyên kulîlkan difroşe.

2.3. Birên rengdêran ji hev vediqetîne:

Qîzên bedew, xortên çeleng, şagirtên jêhatî, zaro-kên jîr... hemû li hev civiyan.

2. 4. Cînavkan ji hev vediqetîne:

Ez, tu, ew, em, hûn...em hemû ji bo aştî û azadiyê tedi-koşin.

2.5. Lêkeran ji hev vediqetîne:

Bi kurdî bifikire, bi kurdî biaxive, bi kurdî bixwîne, bi kurdî binivîse!

2.6. Bireseran ji hev vediqetîne:

Mirovên rûmetdar, ji gelê xwe, ji welatê xwe, ji neteweya xwe, ji civaka xwe hez dikin.

2.7. Têrkeran ji hev vediqetîne:

Divê mirov, li malê, li derve, li dibistanê, li kargehê, li kuçeyê... li ku dibe bila bibê, bi mirovan re têkiliyên germ deyne.

2.8. Kirdeyan ji hev vediqetîne:

Berfîn, Baran, Evîn, Hogir, Newal, Botan şagirtên vê dibistanê ne.

2.9. Pêveberan ji hev vediqetîne:

Di zarokatiya xwe de em li keran siwar dibûn, diçûn çem, me avjenî dikir û bi gokê dilîst.

2. 10. Peyva ku di hevokê de tê kirpandin nîşan dide:

"Zanîn, ji bo mirov hewce-dariyeke çarenîn e."

"Ziman, bingeha nîrxên neteweyî ye."

2.11. Li dawîya kirdeya ku ji pêveber bi dûr dikeve, tê danîn:

"Mirin, ji ber ku sînordariya jîyanê bi mirov dide fêmkirin, tiştêkî manîdar e."

2. 12. Piştî gotina deng-lêkirinê (xîtabê) tê bikaranîn:

"Hevalino, divê em karekî baş bikin!"

"Hevalê heja, nameya te ya dawî gihîşte min."

"Gelî jin û mêran, hûn ê kengê xwe ji vê rewşa kam-bax reha bikin?"

2.13. Piştî mêtûya ku li pey navê cih û deveran (gund, bajar, bajarok, navçe û hwd.) tê nivîsandin, tê bikaranîn:

"Mereş, 27. 04. 2004, Enqere, 22.06.1927, Mêrdîn, 28.03.1962"

2.14. Piştî rengdêrên ku dibin navdêr (ên ku beriya navdêr têne danîn), tê bikaranîn:

"Nexweş, bijîşk nabîne."

2. 15. Di ravekirina hevo-ken ku ji çar hêmayan ji yekê tê dayîn, hem li pêşîya raveyê û hem jî li dawîya wê tê danîn:

"Gelek kes, ji ber qeyrana aborî, nema dikarin zarokên xwe bidin xwendin."

2. 16. Wekî, nîşaneyê hevo-ken navbêr tê bikaranîn:

"Heke ronakbîr bi civaka xwe re ne lihev be, sûcdar ne civak e, ronakbîr bi xwe ye."

Cihên ku bêhnok lê nayên bikaranîn

1. Bêhnok, di navbera peyvên ku komên navdêr û rengdêran pêk tînin de nayê bikaranîn.

2. Bêhnok, berî û piştî gi-haneka "û"yê nayê danîn.

3. Xalebêhnok(;)

3.1. Xalebêhnok, di gelek cihan de dikeve dewsa gi-hanekê. Di navbera hevokên ku awa û wateya wan dişibe hev de, tê bikaranîn:

"Ronakbîr dişibe rojê; şewq û ronî dide."

3.2. Li pêşiya gi-hanek û daçekên ku bi tevayî hevokê vediqetin (lewre, belê, ancax, ji ber ku û hwd.) tê danîn:

"Kesên zanyar zêde tu kesî rexne nakin; belê ew her gav dibin hedefa rexneyan."

3.4. Di navbera peyvên mînak an jî mînakên ku ji peyvên cur bi cur pêk tînin de, tê danîn:

"Pirtûkxaneya Zanîngeha Dicleyê bi pirtûkên roman, çîrok û helbestan; bi helbestên nûjen, helbestên klasîk, bi pirtûkên zanyariyê; felsefe, civaknasî û perwerdehiyê têra xwe dewlemend e."

4. duxal (..)

Duxal, nîşana "rave û mînakdanê" ye.

4.1. Piştî sernivîsên ku bi tîpên hûrdek tîne nivîsandin, tê danîn:

Tîpên Dengdêr

a, e, ê, î, î, o, u, û

4.2. Piştî mînaknîşandanê tê danîn:

Di hevokê de sernav her gav bi tîpa girdek dest pê dike: Rewşen, Botan, Rûbar, Rêzan

4.3. Piştî çend mînakên ku li pey hev rêz dibin, tê danîn:

Zaravayên sereke yê kurdî ev in: Kurmanciya jorîn, kurmanciya jêrîn, goranî (hewremanî), kirmanckî (dimilî), lorî...

4.4. Di nivîsê de piştî gotin an jî vegotina ku ji hêla hin kesan ve hatibe gotin, tê danîn:

Goethe dibêje:

"Ziman nivê neteweyekê ye."

4.5. Beriya hevokên axaftinê tê danîn: Mînak:

"...Seyrê ji Elî re got:

Pismamê Elî, min ji xwe re bixwaze.

- Seyrê, ez ê te bi çi bixwazim?

- Bi pereyan.

- Bi pereyannn! Ma pereyên min hene?"

Hevokên ku piştî du xalan tîne nivîsandin, bi tîpa girdek dest pê dikin. Mînak:

Lilcoln dibêje:

"Mirovê/a ku ji şaşiyên bitirse, dê nikaribe tu tiştî bike."

5. Pirsnîşan (?)

5.1. Piştî hevokên ku pirsê nîşan didin, tê danîn. Di kurdî de, di zimanê devkî de hevoka pirsê bi riya kirpandinê jî tê fêmkirin. Belê di zimanê nivîskî de hevoka pirsê bi saya

pirsnîşanê ji hevoka erênî xwerû (asayî) tê veqetandin. Mînak:

Diya Rojîn rojnameyê dixwîne? (Diya Rojîn rojnameyê dixwîne.)

Hemû diçin şahiya Newrozê? (Hemû çûn şahiya Newrozê.)

5.2. Piştî peyv û raveyên şikdar ên ku zanîna wan ne misoger be, tê danîn. Mînak:

Mele Qadirê Caf (?1908/9)

Xelîfe Yûsif (1885-?)

5.3. Li dawiya gotin, vegotinên ku nayên fêmkirin an jî ecibandin, tê danîn. Mînak:

We xwarin bêyî min xwar ha?

Weleh bavo tu çi mêr î?

Tu jê xweştir dixwînî?

6. Baneşan (!)

Baneşan, li dawiya gotin, vegotin û hevokên baneşanê tê danîn:

6.1. Li dawiya hevok, bêje an jî gotina ku hezkirin, ecibandin, rêz, qencî, tirs, saw, kîn, peros û xetereyê nîşan dide. Mînak:

Wax wax ew zarok di derincê werbû!

Vir de were, dê moz bi te vede!

Ox çi bayekî hênik!

6.2. Li dawiya peyv û hevokên ku tinazî, qeşmerî û biçûkdîtîne nîşandandin, tevî pirsnîşanê (di hundirê kevanekê de) tê bikaranîn. Mînak:

Ew pêlewane (!) ku li ber wî egidê (!) çardeh salî bi navê dilîst, zêdeyî du deqeyan li ber xwe da(!?)

7. Sêxal (...)

Sêxal, li dewsa mînakên ku li pey hev rêz dibin ên ku nayên dayîn (û hwd.) tê bikaranîn. Mînak:

Navenda çand û hunerê bi amûrên muzikê yên mîna gîtar, saz, keman, qanûn, org, rebab...hatibû xebilandin.

B. Hêmayên ku hem li serê bêje û hevokê û hem jî li dawiya bêje û hevokê têne danîn:

1. Dunik (" ")

Nivîs, gotin û vegotinên ku ji kes an jî cihekî hatibin girtin, bêguherandin di nava dunikê de têne danîn. Mînak:

Zana û ramanwerê navdar Sokrates beriya niha bi hezar salan gotiye: "Baştirîn tiştê ku ez pê dizanim ew e, ku ez tu tiştî nizanim."

2. Kevanek ()

Kevanek, nişana rave û ravekirinê ye.

Peyv û vegotinên hemwate an jî raveyên ku têkiliya wan bi peyv û vegitinê re heye, di hundirê kevanekê de têne danîn. Mînak:

Pîgarî (piştgirî, piştevanî û alîkarî), ji bo her mirovî/ê pêdiviyeye çarenîn e.

3. Xêzek (-)

Li serê hevoka axftinê an jî gava ku di navbera du kesan de gotûbej pêk tê, tê bikaranîn. Mînak:

- Rojbaş!

- Rojbaş, hûn çawan in?

- Ez aş im, lê hûn?

- Ez jî baş im. Zor spas.

4. Dabir (')

Di jimare û kurtenivîsa peyvyan de, qertafa tewangê bi riya dabirê tê veqetandin. Mînak:

PEN'ê girtina nivîskarên kurd şermezar kir.

Cejna Newrozê, her sal di 21'ê Adarê de tê pîrozkirin.

Xebatkarên NÇM'ê daxuyanî dan çapemeniyê.

5. Bendik (-)

Di navbera du bêjeyên ku têkiliya wan bi hev re hebe de, tê danîn. Mînak:

Ez ê vê carê neh-deh rojan li Dîlokê bimînim.

Her otoboseke belediyê heftê-heftê mirovî hildide.

Li Amedê pênc sed-şeş sed hezar mirov beşdarî pîrozbahîya Newrozê bûn.

Her wiha peyva ku di rêzenivîsê de hilneyê, bi bendikeke kurt (-) tê kîtekirin û veqetandin. Mînak:

"Digel ku hin darazî û behreyên xwezayî bi lewiran re hebin jî ew her gav ji hêla mirovan ve têne hêvotin û şerdekirin. (Peyva mirovan ji sê kîteyan pêk tê: mirovan û kîteya ku di rêzenivîsê de hilnehatiye, li gorî rêbaza kîtekirinê, hatiye dabeşkirin)

6. Hêmaya paranê (/)

Li navbera du beşan tê danîn. Her wiha, di kurdî (zara-vayê kurmançî) de di navbera

bêjeyên ku zayendê diyar dikin de tê danîn. Mînak:

Bijîşkekî/bijîşkekê (bijîşkekî/ê) derûnînasiyê nikare nişdariya nexweşekî/ nexweşeke (nexweşekî/ê) dil bike.

Daçekên ku di kurmançî de tên bikaranîn: ji/ /di/ /li/ /bi/ /ji/ /bê ne.

Ev pêûs a wî/wê ye.

7. Rêzexal (.....)

Li pêşî an jî li dawiya rêzenivîsê û jêgirtinên ku tên qutkirin, têne danîn û bikaranîn. Mînak:

.....

Bizane xwendin ji bo me derman

Da ku bizanin qanûn û ferman

Derxin ji dil em van tirs û şerman

Der rabe ser xwe, kurê min rabe!

.....

(Seydayê Cegerxwîn di helbesteke xwe de bi vî awayî şîretên xwendinê dike.)

8. Nişana bidawîkirinê ()

Piştî bidawîbûna mijarekê an jî qedandina nivîsekê, xêzeke bi qasî du santîman (cm'an) li dawiya nivîsê tê danîn. Ev xêz bi mebesta nivîs/mijar "bi dawî bû" an jî "qediya" tê bikaranîn. Mînak:

Ji ber ku mijara me bi dawî bû em ê li vir mînakê () di cih de bi kar bînin. Êdî hewcetî bi mînakeke din nîn e.

HIN TAYBETIYÊN

CÎNAVKA VEGEROK

Samî Berbang

Di vê gotara xwe de min divê ez li ser taybetiyeke cînavka vegerok "xwe" û aloziyeke ku ew cînavk derdixe pêşberî me, rawestim. Berî ku ez derbasî mijarê bibim, pêwîst e ku ez der barê vê cînavkê de hinek agahiyên gelemperî bidim.

Cînavka vegerok, bi îngilizî jê re "reflexive pronoun", bi tirkî jê re "dönüşlü zamir" tê gotin. Xuya ye ku cînavka "xwe" li kirdeyê vedigere, lewre jî jê re vegerok hatiye gotin. Gava ku em dibêjin, "Min xwe şûst" tê zanîn ku kirina kirde li xwediyê xwe vegeriyaye. Bi kurtasî dema ku kirde û bireser heman kesî nî-an bidin, di cihê bireserê de cînavka "xwe" tê bikaranîn.

Di kurmacî de cînavka "xwe" bi hinek taybetiyên xwe jî cînavkên din cuda dibe. Di kurmacî de cînavk bi piranî du cure ne: Xwerû û tewandî. Cînavkên ku xwerû bin cihê navdêrên xwerû digirin, cînavkên tewandî jî cihê navdêrên tewandî digirin.

Mînak:

Zozanê dar çandin.

Li vê derê "Zozan" tewandî, "dar" xwerû ye. Cînavkên ku cihê wan digirin jî li gorî

vê yekê tene neqandin. Heke em di vê hevokê de li şûna navdêran cînavkan bi cih bikin, dê rengê hevokê wiha be: Wê ew çandin.

Her wekî tê zanîn bi riya tewangê jî em zayend û mêjera navdêran dinasin.

Cînavka vegerok "xwe" di vî warî de ji cînavkên din vediqete, ji ber ku cînavka "xwe" cînavkeke nêtar e. Yanî ev cînavk hem cihê navdêra nêr, hem jî cihê navdêra mê digire. Her wiha ew hem dikeve cihê navdêra yekjimar, hem jî dikeve cihê navdêra pirjimar.

Mînak:

Wê di awênayê de li xwe temaşê kir.

Wî di awênayê de li xwe temaşê kir.

Wan di awênayê de li xwe temaşê kir.

Her wekî ji mînakan jî diyar dibe, di van hevokan de reng û dirûvê cînavka "xwe" qet naguhere, her tim wekî xwe dimîne.

Li aliyê din cînavka xwe cihê navdêrê xwe û tewandî jî bi heman awayî digire.

Mînak (xwerû)

Ez xwe dibînim.

Tu xwe dibînî.

Ew xwe dibîne.

Em xwe dibînin.

Hûn xwe dibînin.

Ew xwe dibînin.

Mînak (tewandî)

Min xwe dît.

Te xwe dît.

Wî/wê xwe dît.

Me xwe dît.

We xwe dît.

Wan xwe dît.

Ji mînakan jî tê fêmkirin ku cînavka "xwe" ji aliyê mêjerê ve her tim yekjimar e. Li gorî rêz û rêçika ergatîviyê, di demên borî de lêker dikeve bin bandora bireserê (objeyê). Li vir jî lêker li gorî cînavka "xwe" hatiye kişandin, lewre jî her tim yekjimar maye.

Heke li şûna cînavka "xwe" navdêr an jî cînavkeke din hebûya, dê lêker li gorî hejmara wê bihata guhartin.

Mînak:

Min du sêv xwarin.

Te sêvek xwar.

Cînavka xwe û xwedîtî

Divê neyê jibîrkirin ku, di kurmacî de xwedîtî jî bi alîkariya veqetandek û cînavkan pêk tê.

Mînak:

Ê min, ê te, ê wî/wê, ê me, ê we, ê wan...

A min, a te, a wî/wê, a me, a we, a wan...

Ên min, ên te, ên wî/wê, ên me, ên we, ên wan...

Ji bilî van cînavkên kesane, şanîdanê, bi cînavka xwe jî xwedîti tê destnîşankirin.

Mînak

Ê xwe, a xwe, ên xwe...

Di dema xwedîtiyê de ev nêtarbûna cînavka "xwe" bi xwe re hinek aloziyan tîne. Nemaze di devoka Semsûr, Meletî û Efrînê de cînavka "xwe" di şûna kesên sêyemîn de jî tê bikaranîn.

Nimûne:

Navê xwe çi ye?

Bavê xwe kî ye?

Navê bavê xwe çi ye?

Pirtûkê rengê xwe sor e.

Her wiha aloziya ku ev cînavk derdixê holê, bi şaşîya li jorê ne bisînorkirî ye. Hin mînak hene ku bi rastî jî mirov nikare ji navê derkeve.

Nimûne:

Bager û bavê xwe çûn bajêr.

Heke mirov ji aliyê wate-nasiyê ve li vê hevokê binêre, dikare bibêje ku gelo ev hevok çendî di cihê xwe de ye? Aya dibe ku em bibêjin, "Bager û bavê wî çûn bajêr"?

Cînavka "xwe" di zaravayê kirmanckî (dimilkî) de jî

nêtar e, lewre di hin devokên kirmanckî de jî ev alozî heye. Li şûna ku "namê aye çik o?", "Namê êy çik o?", "Namê xo çik o?" tê gotin.

Lê di zaravayê kurmanciya jêrîn (soranî) de rewş cuda ye. Ji ber ku cînavka "xwe" jî wekî navdêran cînavkên qertafî yên xwedîtiyê /-m/, /-t/, /-y/, /-man/, /-tan/, /-yan/ digirin. Ev paşgir di farisî de jî hene, bi tenê li şûna /-y/ û /-yan/ a soranî /-ş/ û /-şan/ hene.

Wate di soranî û farisî de xwedî bi alikariya van paşgiran pêk tê.

Mînak:

Soranî: *Destim, destit, destiy, destiman, desttan, destiyân*

Farisî: *Kîtapem, kîtapît, kîtapîş, kîtapman, kîtaptan, kîtapşan*

Ev paşgir têne dawîya cînavka "xwe" û xwediyê nîşan didin.

Mînak:

Xom

Xot

Xoy

Xoman

Xotan

Xoyan

Hevokên ku di zaravayên bakur de aloziyê derdixin, di soranî de bi vî rengî ne:

Nawî xoy çi ye?

Bawkî xoy kam e?

Nawî bawkî xoy çi ye?

Pirtûk rengî xoy sor e.

Mînaka din jî bi zaravayê kurmanciya jêrîn dikeve vê rewşê:

Bager û bawkî xoy çûn bo şareke.

Wekî encam em dikarin bibêjin ku nêtarbûna cînavka "xwe" di zaravayên bakur ên kurdî de bi xwe re hinek aloziyan tîne. Ji ber ku cînavka "xwe" natewe, di demên borî de mirov nikare zayend û mêjêra bireseran bi cînavka "xwe" nîşan bide. Her wiha di dema xwedîtiyê de jî, ji ber ku cînavka "xwe" qertafên xwedîtiyê nagire, hin caran mirov nikare pê kesên sêyem nîşan bide.

Lewma jî di hevoka "Bager û bavê xwe çûn bajêr" de kirde nikare bandorê li cînavka "xwe" bike. Heke mirov hevokê bike "Bager û bavê wî çûn bajêr" îcar wate tam cihê xwe nagire. Heke navdêr û cînavkên kurmanckî jî wekî soranî û zimanê farisî qertafên wê yên xwedîtiyê hebûna, dê ev pirsgirêk derneketana, lê mixabin zaravayên bakur ên kurdî ji vê derfetê bêpar in.

Lê di hin devokên kurmanckî de hebûna forma "navê xwe çi ye?" bi baweriya min nîşaneyê vê yekê ye ku di zaravayên bakur de jî berê ev qertaf hebûne.

Her taybetî, digel gelek taybetiyên mîna nebûna daçeka /ji/yê û li şûna wê jî bikaranîna daçeka /li/yê, nîşan didin ku têkilîyeke xurt di navbera zaravayê kurmanciya jêrîn û van devokan de heye.

TEWANG Û RAYEKA

LÊKERAN

Zana Farqînî

Tewang, yek ji taybetiya zimanê kurdî ye. Lewma beriya ku ez dest biavêjim mijara tewanga lêkeran, ez dixwazim pêşî li ser terîfa tewangê rawestim. Serê pêşî jî hez dikim cih bidim ravekirina nemir Celadet Bedirxan, bê wî der barê tewangê de çî gotiye:

"Zimanê kurdmancî zimanekî tewangbar e. Yanî bêjeyên wî di qisetê de weke xwe namînîn û li gora cihê ko di qisetê de dikevin ê, û wezîfa ko li ser xwe digirin têne tewandin û hin parkît bi wan ve dibin, an hin tîpên wan bi tîpine din diguhêrin."⁽¹⁾

Zimanzan Dogan Aksan jî der barê heman mijarê de dibêje ku, tewang di dema kişandinê de guherîna rayekê, bi taybetî jî guherîna dengdêra rayekê ye.⁽²⁾

Ji van her du terîfan, gotinên ku bi mijara me re eleqedar in jî, gotina guherîna tîpan bi tîpên din e. Celadet Bedirxan dibêje ku "...hin tîpên wan bi tîpine din diguhêrin" û Dogan Aksan jî dibêje "...di dema kişandinê de guherîna rayekê, bi taybetî jî guherîna dengdêra rayekê" ye. Jixwe di vê nivîsarê de tiştê ku ez dixwazim li ser rawestim, dabaşa guherîna

dengan e ku di rayeka ango koka lêkerê de pêk tê.

Beriya ku ez bêm ser mijara tewanga lêkeran, min divê ez careke din serî li zimanzanê me yê hêja Celadet Bedirxan bidim. Di zimanê me de bi navê birên qisetê, deh cure peyv hene. Senifandina ku ji aliyê Celadet Bedirxan ve hatiye kirin wiha ye: *Navdêr; veqetandek, pronav, jmarnav, lêker; rengdêr; hoker; daçek, gihanek û baneşan.*⁽³⁾

Ji van pênc jê guhêrbar û pênc jê jî neguhêrbar in. Ji bo ronîbûna mijara me, ku li ser tewanga lêker û rayeka wan e, divê ez bêjeyên guhêrbar hil-dim dest û wan nîşan bidim: *Navdêr; veqetandek, pronav, jimarnav û lêker*

Li şûna pronavê ku Celadet Bedirxan wisan nav lê daniye, ez peyva *cînavkê* û li şûna *jmarnavê* jî, ez awayê nivîsîna *jimarnavê* tercîh dikim. Bala we kişandibe, Celadet Bedirxan lêker jî di nav birên qisetê yê guhêrbar de nîşan daye. Lê mixabin ku di xebata xwe de li ser tewanga wan nesekiniye. A di vê xebata xwe de ez dê li ser tewanga lêkeran û rayekên wan bisekinim.

Rayeka Lêkeran

Beriya ku ez dest biavêjim

mijara tewanga lêkeran, dixwazim pêşî li ser rayeka lêkerê rawestim. Ji ber ku di zimanê me de lêker xwedî du rayekan in. Gramerzanên me bi giştî bal kişandine ser du cureyên rayeka lêkeran. Zimanzanê me yê gorbihîşt Feqî Huseyn Sagniç, di xeba xwe ya rêziman de li ser vê mijarê van agahiyan dide: *"Di zmanê meda du celeb qurmê lêkeran hene:*

Qurmê lêkerê: çawan li jorin ji dixwiyê bi avêtina qertafa raderê (n, in) qurmê lêkerê derdikeve hmatê.

Lêkera fermani: Bi ketina tîpek ji dawiya hinde lêkeran, qurmê lêkera fermani pêktên û hinek jê guhertinên curbecur dixwaze û lêkerên ne sazi hindik bin ji hene."⁽⁴⁾

Min dest neda rastnivîs û zimanê mamoste Feqî Huseyn Sagniç û wisan ji berhema wî veguhast.

Wekî ji tespîten rehmetî Feqî Huseyn Sagniç jî xuya dibê, di zimanê me de du rayek ango kokên lêkerê hene. Ev rayek li gorî kişandina deman, di rewşên cuda de, tîpên kişandin. Piştî avêtina raderê ji lêkerê, rayeka wê ya ji bo kişandina hemû demên borî bi dest tê xistin. Ji koka raweya fermânî jî, rayeka lêkerê ya ji bo demên niha û bê, bi dest tê xistin.

Gava em /-n/ û /-in/ ji dawîya lêkerê biavêjin, bi gotineke din raderê jê bigirin biavêjin rayeka lêkerê tenê dimîne û bi wê ji bilî dema bê û niha, hemû demên din tên kişandin. Di wexta kişandinê de jî qertafên kişanê lê zêde dibin, lê belê guherîna di dengên rayeka lêkerê de çênabe. Rayek her wekî xwe dimîne.

Rayeka lêkerê ya ku ji raweya fermanî bi dest tê xistin, ku ji bo dema bê û niha tê bikaranîn, ji bilî ku qertafên kêşanê lê zêde dibin, guherîna dengên jî tê çêdibe. Bi gotineke din, hem di dengdar û hem jî di dengdêrên rayeka raweya fermanî ya lêkerê de guherîna dengên diqewime. A mijara tewanga lêkerê, di vê rayekê de dertê pêşiya me.

Îcar em niha lê bixebitin ku bi mînakên mijara xwe zelaltir û rontir bikin. Em pêşî çend lêkeran derpêş bikin û li ser rayekên wan rawestin. Bi la lêkerên me ev bin:

Parastin, kuştin, axaftin, qelaptin, nivîsandin, kirin, birin, dan, çûn, kirin...

Ji van lêkeran ên ku kîteya wan a dawî bi /-tin/, /-din/ û /-rin/ê diqedin, radera wan /-in/ e. Piştî avêtina raderê, rayeka lêkerê li rastê dimîne. Wekî me li jorê dabû xuyakirin, ew ji bo kêşana demên borî ne. Di wexta kêşanê de tu guherîna dengên di wan de çênabe û her wiha deng jî ji wan nakeve. Wekî nimûne: Ji *parastinê* parast; ji *kuştinê* kuşt; ji *axaftinê* axaft; ji *kirinê* kir; ji *birinê* bir û ji *nivîsandinê* nivîsand. Niha li gor

dema gava em wan bikişînin, em dê bibînin ku tenê qertaf li wan zêde dibin ku ev qertaf jî hem tên pêşiyê û hem jî tên paşiya wan.

Min parast, min *di-pa-rast*, min *dê bi-parast-a*, min *pa-rast-iyê*, min *parast-ibû...*

Min kuşt, min *di-kuşt*, min *dê bi-kuşt-a*, min *kuşt-iyê*, min *kuşt-ibû*

Ez *axaft-im*, ez *di-axaft-im*, ez *dê bi-axaft-ima*, ez *axaft-ime*, ez *axaft-ibûm*

Min nivîsand, min *di-nivîsand*, min *dê bi-nivîsand-a*, min *nivîsand-iyê*, min *nivîsand-ibû...*

Min kir, min *di-kir*, min *dê bi-kir-a*, min *kir-iyê*, min *kir-ibû...*

Min bir, min *di-bir*, min *dê bi-bir-a*, min *bir-iyê*, min *bir-ibû...*

Min bi taybetî ew qertafên kêşanê û yên kesî ji rayeka lêkerê veqetandin û bi awayê îtalîk dan, da ku baş bê fehm-kirin û mijar zelaltir bibe.

Îcar gava em ji van cure lêkeran bixwazin rayeka lêkerê raweya fermanî bi dest bixin, em rastî rewşeke din tînin. Lewma divê îcar em bi navberavekî li mijara xwe bidomînin.

Tewanga Lêkeran

Di raweya lêkerê fermanî de em rastî tewanga lêkeran tînin. Dengên dengdar û yên dengdêr xwe li dengên din ditewînin. Ango guherîna dengên pêk tê. Ligel vê yekê, divê em balê bikişînin ser rewşeke balkêş. Gava rayeka lê-

kerê li rayeka lêkerê fermanî dadigere, dengdara dawî ya rayeka lêkerê dikeve. Em bi nimûneyan li ser vê rewşê bisekinin dê çêtir be.

Ji *parastê paras*; ji *kuştê kuş*; ji *axaftê axaft*; ji *qelaptê qelap*; ji *nivîsandê nivîsan*, ji *kirê kir* û ji *birê bir*. Wekî hate dîtin ji van lêkeran dengdêrên dawî ên /t/, /d/ û /r/ ketine. Em halê dawî yê van lêkeran careke din hildin dest: *paras*, *kuş*, *axaft*, *qelap*, *nivîsan*, *kir* û *bir*. Îcar em ji van rayeka lêkerê fermanî çêkin.

Ji *parasê bi-parêz-e*; ji *kuştê bi-kuj-e*; ji *axaftê bi-axiv-e*; ji *qelaptê bi-qelêb-e*; ji *nivîsanê bi-nivîs-e*; ji *kirê kir* û ji *birê bir*. Em qertafên ku me bi îtalîk ew nîşan kirine ji wan hildin biavêjin, li rastê ev awayên wan dimînin: Ji *parasê parêz*; ji *kuştê kuj*; ji *axaftê axiv*; ji *qelaptê qelêb*, ji *nivîsanê nivîs*, ji *kirê kir* û ji *birê bir*. A ev rayekên lêkerên fermanî ne û bi wan dema niha û dema bê tînin kişandin. Her wiha ji van rayekên fermanî hem navdêr û hem jî qertafên çêkirinê bi dest tînin xistin. Ji ber ku ev yek ne mijara vê nivîsê ye, ez dê bi tenê bi daxuyakirina vê rewşê qîma xwe bînim.

Lê li vir, min divê ez li ser taybetiyeke lêkerên ku kîteya wan a dawî bi /-din/ê diqede bisekinim û çend gotinan bibêjim. Ev cure lêker (nivîsandin, şewitandin, reşandin û hwd) di rewşa gerguhêz (têper, derbasî) de ne. Ji lew re awayê wan ên negerguhêz (netêper) jî hene û bi /-in/ê diqedin û radera wan tenê /n/

ye. Ji bo nimûne ev lêker nivîsandin, şewitandin, reşandin di rewşa gerguhêz de ne û rewşa wan a negerguhêz jî ev e: nivîsîn, şewitîn û reşîn. A raweya fermanî bi vî halê wan tê çêkirin.

Piştî van amajepêkirinan, em careke din vegerin ser mijara xwe û li gorî dema niha û dema bê van rayekan bi kar bînin.

ez di-parêz-im,
ez dê bi-pa-rêz-im

ez di-kuj-im,
ez dê bi-kuj-im

ez di-axiv-im,
ez dê bi-axiv-im

ez di-qelêb-im,
ez dê bi-qelêb-im

ez di-nivîs-im,
ez dê bi-nivîs-im

ez di-k-im,
ez dê bi-k-im

ez di-b-im,
ez dê bi-b-im

Ji van nimûneyan jî xuya dibe ku dengdara /s/yê li /z/yê, dengdara /ş/yê li /j/yê, dengdara /f/yê li /v/yê, dengdara /p/yê jî li dengdara /b/yê dageriyaye. Her wiha dengdêra /a/yê li /ê/ û li /i/yê dageriyaye.

Em careke din guherîna dangan, ango tewanga ku di rayeka lêkera fermanî de hatiye pê diyar bikin. Parast dibe parêz, kuşt dibe kuj, axaft dibe axiv, qelapt dibe qelêb.

Ev wek rêzik e, ango qayde ye. Lêkerên me yên ku dawiya wan bi *-andin*, *-stin*, *-ştin*, *-ftin* û *-ptin* diqedin, ji

bilî awarteyan, ev guherîn di wan de çêdibe û di dema rastnivîsandin û rastkişandina lêkeran de divê mirov rîayetî vê rêzikê bike. Lê awarteyên van yekan jî hene. Em nikarin ku vê rêzika hanê ji bo hemû heman cure lêkeran gelemper bikin. Bi gotineke din her tim dengên /ş/ li /j/yê, /s/ li /z/yê danagere. Wek nimûne em lêkera şkestin û malaştin bidin:

Pêşî ji lêkera şikestinê em dest pê bikin:

ez şkest-im,
ez di-şikest-im,
ez di-şkê-m,
ez dê bi-şkê-m

Di vê nimûneyê de dengdara /s/yê nebû /z/, lê belê dengdêra /e/yê li dengdêra /ê/yê dageriya.

Niha ji bo em bên ser lêkera malaştinê û ji bo wê kêşana deman wek nimûne derpêş bikin:

min malaşt,
min di-ma-laşt,
min dê bi-malaşt-a,
min malaşt-ive,
min malaşt-ibû
ez di-malêş-im,
ez dê bi-malêş-im

Ji vê lêkerê jî xuya dibe ku tenê dengdêra /a/yê li ya /ê/yê dadigere ango dengdara /ş/ li /j/yê danegeriya. Ji lew re em dikarin bibêjin ku di kêşana lêkeran de her tim dengdara /ş/yê li dengdara /j/yê danagere.

Berî ku ez bêm ser lêkerên me yên ku radera wan /n/ ye, xaleke girîng heye ku divê ez li ser rawestim û tiştinan diyar bikim. Lêkerên me yên ku kî-

teya wan a dawî bi /tin/ê diqede, hin jê negerguhêz in, lewma tewanga wan a lêkeran wek ên gerguhêz ne saxlem in û hem dengdêr û hem jî dengdar bi hev re natewin. Hem dikare her du jî bitewin û hem jî yek ji wan. Ji bo kişandina van cure lêkeran em van mînanan bidin: *leyîstin* (*listin*), *nivistin* (*razan*).

ez di-leyîz-im,
ez dê bi-leyîz-im,
ez leyîst-im,
ez leyîst-ibûm
ez di-niv-im,
ez dê bi-niv-im,
ez nivist-im,
ez nivisti-bûm

Di lêkera leyîstinê de em rastî tewanga dengdara /s/yê bi /z/yê tîn, di lêkera nivistinê de em rastî vê yekê nayên û em bi deformbûna lêkerê re rû bi rû ne. Li gorî rêzikê diviyabu ku me lêker wiha bikişanda:

ez di-nivîz-im,
ez dê bi-ni-vîz-im

Lê ev lêker wiha nayê bikaranîn û kişandin û /-îz/ jî jê ketiye, êdî wek *ez di-nivim*, *ez dê bi-niv-im* tê bikaranîn û kişandin.

Piştî ravekiran van cure lêkeran, em îcar bên ser cureyê lêkerên din ku qertafa wan a raderê /n/ ye. Wekî *dan*, *zan*, *pan*, *çûn*, *kirin* û hwd. Bi hilanîna /-n/ya radêrê koka lêkerê tê bidestxistin û ev rayek ji bo hemû demên borî tê bikaranîn. Di kêşana van deman de, tu guherîn di dengên rayekê de çênabe.

min da, min *di-da*, min *dê*

bi-da, min da-ye, min da-bû

ez za-m, ez di-za-m, ez dê bi-za-ma, ez za-me, ez za-bûm

ez pa-m, ez di-pa-m, ez dê bi-pa-ma, ez pa-me, ez pa-bûm

ez çû-m, ez di-çû-m, ez dê bi-çû-ma, ez di-çû-me, ez çû-bûm

min kirî, min di-kirî, min dê bi-kirî-ya, min kirî-ye, min kirî-bû

Ji bo ku rayeka lêkera fermanî pêk bê, bi gelemperî dengdêra li dawî ya rayeka lêkerê dikeve û yên din dimînin. Li gel vê yekê, di hin lêkeran de wek rayeka lêkera fermanî, tenê dengdarek dimîne. Li aliyê din, di hin lêkeran de jî dengdêra dawî ku ew bi piranî /a/ ye, li dengê /ê/yê dadigere.

Em van mînan careke din bidin ber xwe û di wan bifikirin:

da, za, pa, çû, kirî. Ji van jî /da/yê gava /a/ya dawîn bikeve tenê /d/ wek rayeka lêkera fermanî li holê dimîne. Rayekên lêkerê yên za û pa dibin zê û pê. Gava dengdêra li dawî ya rayeka lêkerê ya çû-yê jî bê hilanîn tenê /ç/ dimîne. Eger em /î/ya li dawî ya kirî jî hilanîn, di destê me de bi tenê kir dimîne.

Ji bo serwextbûn û têgihîştina ji mijarê em van rayekên lêkerê li gorî raweya fermanî bikişînin û bi wan dema niha û dema bê çêkin.

Ji lêkera danê *bi-d-e*, ji ya zanê *bi-zê*, ji ya panê *bi-pê*, ji ya çûnê *bi-ç-e* û ji ya kirîna jî

bi-kir-e. Em /bi/ya fermanî û /e/ya kesê sêyemîn, ku me bi awayê îtalîk ew destnîşan kirine, ji ber û pêş wan hildin biavêjin. Bi dorê di dest me de /d/, /zê/, /pê/, /ç/ û /kir/ dimîne. Niha jî em wan bikişînin:

Ez di-d-im,
ez dê bi-d-im

Ez di-zê-m,
ez dê bi-zê-m

Ez di-pê-m,
ez dê bi-pê-m

Ez di-ç-im,
ez dê bi-ç-im

Ez di-kir-im,
ez dê bi-kir-im

Ji van mînakên ku me dane jî diyar dibe ku di rayeka fermanî ya lêkerê de jî deng di-tewin. Lê bi tenê dengdêr li dengdêreke din dadigere û ev bi awayekî giştî /a/ ye. Ango dengdêra /a/yê li ya /ê/yê diguhere. Lê tiştê girîng ev e ku bi piranî ev tewang di rayeka lêkera fermanî ya van cure lêkeran de pêk nayê. Her wiha em tenê rastî tewanga rayeka lêkera ku bi dengdara /a/yê diqede tên. Lê ev nayê wê mehneyê ku her rayeka lêkera ku dawî ya wê bi /a/yê diqede ev rêzik ango qayde heye. Wek mîna lêkera man, kutan, kolan û hwd. Di van lêkeran de, di rayeka lêkera fermanî de ev guherîna deng-an ango tewangê çênabe û /a/li /ê/yê danagere.

ez ma-m, ez di-ma-m, ez di-mîn-im, ez dê bi-mîn-im

min kola, min di-kol-a, ez di-kol-im, ez dê bi-kol-im

min kuta, min di-kuta, ez di-kut-im, ez dê bi-kut-im

min kola, min di-kola, ez di-kol-im, ez dê bi-kol-im

Dibe ku awayê wan ê raderîn ne man, kolan, kutan be, lê belê wek mîn, kolîn, kutîn be, ku îro em rastî vî awayê wan nayên. Lê carinan, gava em bixwazin ji radera lêkerê navdêrek bi dest bixin ku nemaze kêteya wan a dawîn bi /în/ê diqede, /î/ya wê bikin /a/ navdêr çêdibe. Wek ji birîna biran, ji gerîna geran, ji vereşîna vereşan, ji nasîna nasan, ji danîna danan, ji pincirîna pinciran, ji rakişîna rakişan û hwd.

Wek encam, der barê vê mijarê de em van gotinên dawîn bibêjin. Di zimanê me de du cure rayekên lêkerê hene. Yek jê ji bo dema niha û dema bê ye, ku ji raweya fermanî ya lêkerê peyde dibe û ya din jî rayeka lêkerê ye, ku ew jî piştî avêtina radera lêkerê bi dest dikeve. Ev rayek jî ji bo hemû demên borî yên kêşanê ne.

Tewanga lêkerê jî tenê di rayeka fermanî de pêk tê û dengdar û dengdêrên di rayeka raweya fermanî ya lêkerê de, li dengdar û li dengdêrên din dadigerin.

Çavkanî

1. Bedir-Xan, C. A., (1998), Elfabêya Kurdî Bingehên gramera kurdmancî, Weşanxaneya Doz, Stenbol, r. 57.
2. Aksan, D., (1979), Her Yö-nüyle Dil I (Ana Çizgileriyle Dilbilim), Türk Dil Kurumu Yayınları, Enqere, r. 107.
3. BedirXan, C. A., berhema navborî.
4. Sagnîç, Feqî Huseyn; (1991), Hêmana Rêzmana Kurdi, Melsa Yayınları, Stenbol, r. 108-109.

BERNAMEYA BEŞA DÎROKÊ YA ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ (II)*

DÎROKA KURDÎ

Nêrîna li dîroka kurdî

Dîroka kurdî ku di encama çanda şoreşa neolîtîk a 12 hezar sal berî zayînê ya li qûntarên rêzeçiyayên Zagros û Torosan derketiye holê, teşe girtiye. Li gorî daneyên ku di encama xebat û lêkolînên zanistî de derketine, tê xuyakirin û çêspandin ku kurd berî zayînê jî li van wargehan jiyane. Kurd, ji kakila wan gelan e ku serdema neolîtîk afirandine. Kurd di serî de di teşegirtina çanda şaristaniya sumeran û gelek şaristaniyên din de, yên ku bingeha mirovahiyê danîne, rolek pir girîng bi cih anîne. Zêdetirî vê yekê, di vejîn û hatina van şaristaniyan a heta roja me de jî xwedî cihêkî mezin in. Dema ku mîmarî, şêwaz û awayê jiyana kurdan a civakî baş bê dahûrandin, hingê dê derkeve holê ku hîna jî bermayên neolîtîkî di hundirê xwe de dihewîne. Bi vê pêwendiyê, ger ku em kurdan wekî gel û cavakek girîng ê çanda şaristaniya arî bibînin, hingê em ê bikaribin vê rewşê bi awayekî pisporî bişopînin.

Em dikarin bibêjin ku kurd gelekî ji wan gelan e ku di destpêka avakirina şaristaniya sumeran de cih girtiye û di vê

pêvajoyê de jî roleke sereke girtiye ser xwe. Di serdemên pêşiyê de, dîroka kurdan ji komên serbixwe, ji dewletokên mîna gutî, elam, hûrrî, mîtanî, lor û qasîtan û dji ewlet û konfederasyonên wekî ûrartû û medan pêk tê. Piştî hilweşîna dewleta medan û bi vir ve axa kurdan di navbera dewletên wekî roma, artêşên Îskender, pers û sasaniyanan de bûye cihê şer û gengeşiyên. Kurd, li hemberî dagirkerî û êrîşên ku rewşeke domdar girtin, bi çanda xwe ya dewlemend û kevn, rawestine û wekî eşîrên serbixwe hebûna xwe berdewam kirine. Kurdan her wiha ola Zerdestî jî hebandine û bûne parêzkarên wê.

Ola îslamiyetê ku li ser erdnîgariya ereban derketiye holê û ji wir berbelav bûye, bi awayekî zordarî bi kurdan dane pejirandin. Di van şerên ku di bin navê umetiya îslamiyetê û nijadpestiya ereban de bi salan domiyaye, bi dehan caran kurd hatine qetilkirin. Serhildanên gel, ji hêla dewletên dagirker û xwînmêj ve bi awayekî hovane hatine serkutkirin û tepeserkirin. Ola gelê kurd Zerdûştî jî holê hatiye hilanîn û di bin navê qewmîyeyê de jî bi hezaran

kurd hatin kuştin. Ola îslamiyetê, bi taybetî ji hêla gelên ereb, fars û tirkî ve wekî alavekî nijadperestî, zor û zextê hatiye bikiranîn.

Kurdan bi şerê Melazgirê deriyên Anatoliyayê ji tirkî re vekirin. Bi vê bûyerê kurd, bûne sedema destpêkirin û vebûna serdemeke nû ku heta roja me jî didome. Di vê maweyê de kurd bi riya dewletokên merwanî û mîretiyên serbixwe, xwedî li çanda xwe derketine. Di dema Osmanîyan de jî kurdan wekî otonomî û mîrekiyên nîvserbixwe girêdayî Osmanîyan mane.

Di dema Şerê Yekemîn ê Cînanê de ku ji hêla dewlet û hêzên emperyalîst û kapîtalîst ve hatibû destpêkirin, dewleta Osmanîyan têk çû. Di encama vî şerî de axa gelê ereb hate

Ola îslamiyetê ku li ser erdnîgariya ereban derketiye holê û ji wir berbelav bûye, bi awayekî zordarî bi kurdan dane pejirandin. Di van şerên ku di bin navê umetiya îslamiyetê û nijadpestiya ereban de bi salan domiyaye, bi dehan caran kurd hatine qetilkirin.

parevekirin. Girêdayî vê yekê, axa Kurdistanê di nav dewletên wekî Îran, Iraq, Sûriye û Tirkiyeyê de hate dabêşkirin. Kurdên ku di dema avakirina komarê de cih girtin û roleke girîng û serek girtibûn ser xwe, piştî avakirina komorê hatin jibîrkin û ji aliyê dewletê ve hatin bişafandin, her wiha bi zilm, zext û zoriyê re jî rû bi rû man. Kurd bi serhildan û berxwedanên wekî Qoçgirî, Şêx Seîd, Agirî, Dêrsim û bi gelek serhildanên din, li dijî vê rewşê derketine. Di encama van serhildanên ku şikestin de, neçareseriya kêşeyê kûrtir bû.

Li deverên din ên Kurdistanê jî rewş cihê nebû. Li başûrê Kurdistanê, li hember polîtîkaya erebkirinê, bi taybetî tevgerên Mehmûd Berzencî û Barzanî serî hildane. Her wiha her çiqas temenkin be jî, li Rorhilatê Kurdistanê, di sala 1945'an de Komara Kurdistanê ya Mahabadê ava bûye.

Dema ku em li dîroka kurdan dinêrin, bi piranî derdikeve holê ku gelê kurd di 200 salên dawîn de nekariye wekî dewleteke serbixwe xwe organîze bike. Ji serhildanan tu encam negirtiye; hingî çûye ji hêz ketiye û maye di bin zilm, xedr û zordariya gelên ereb, fars û tirkan de. Di nav sistêmên van dewletan de, nebûye xwedî roleke girîng û ji aliyê van dewletan ve bi înkâr û tunekirinê re rû bi rû hatiye hiştin. Digel van hemû neyînîyan, her tim têkoşiyê û di çarêka sedsala me de li her çar aliyên Kurdistanê têkoşînek daye destpêkirin û di

*Ger em dîrokê
wekî alavekî, ku gelan
dijiyine û radigihîne
pêşerojê bihesibînin,
hingê ronîkirin û zelal-
kirina dîroka kurdî, dê li
dijî zext, zor, îmha û
înkara ku bi salan e li
ser kurdan tê meşandin,
bibe bersîveke zanistî.*

têkoşîna xwe de, xwe ji nû ve vejandiye û gelek destkeftinên berbiçav bi dest xistine. Kurd, bi taybetî ji salên 1970'î bi vir ve li ser bingeheke hemdem bi rêk bûn û têkoşiyar. Em dibînin ku bi vekirina vê rûpela nû re kurdan di dîroka xwe de piştî medan cara yekem şansê azadiyê qefaltine.

Di nav dîroka mirovahiye de cihê dîroka kurdî

Bav û kalên kurdan, bi destpêkirina çînibûyîn, dewletbûyîn û ligel vê yekê bipêşveçûna têngihîştina mantelîteya zilamî, bi serxwebûneke rolatîf û mentalîteya xweparastinê, xwe spartine çiyayan. Bi sedema ku erdnîgariya wan her tim bi dagirkeriyê re rû bi rû maye, kurdên kirdeya (subjeya) dîrokê bûne biresera (objeya) dîrokê. Nivîsîna dîrokê ya ku ji aliyê serdestan ve hatiye kirin, neteweyek bi hemû nirxên xwe ve dabeş û înkâr kiriye. Heta ev rewş, ji bilî neteweya kurd, ji bo gelek neteweyên li Rojhilata Navîn jiyane jî derbas dibe. Girêdayî vê yekê, derketina holê ya dîroka kurdî ya bi awayek zanistî, dê bi xwe re zelalbûna dîrokên gelek ne-

teweyên din û dîroka mirovahiye jî bîne. Bi vê pêwendiyê, em bawer in nivîsîna dîroka kurdî ya li ser bingeheke zanistî dê rewşa dîroknivîsîna ku ji hêla serdestan ve hatiye kirin a alîgir, bi awayekî baş û zelaltir raxe ber çavan. Nêzîktêdayîneke bi vî rengî, dê bibe boneya rastnivîsîna dîroka kurdî û gelek neteweyên bi kurdan re jiyane. Careke din em dibînin ku zanist û teknolojî bi awayekî pir xurt bi pêş dikeve û ev jî dibe sedemê rabûna sînoren di nav neteweyan de. Ji ber vê jî çand, ziman û ol derfeta pêşveçûneke bêsinor bi dest dixin. Bi vê firûzê em dibêjin; zelal û ronîbûna gelekî ku 14 hezar sal şahidiya dîrokê kiriye, dê bi van pêşveçûnan jî biratî û wekheviya gelan xurt bike. Li gorî pêdiviya van şert û mercan, pêdiviya jiyana gelan a bi hev re jî heye ku li ser bingeheke wekhev û demokratîk e.

Her wiha di vê gel, dîrok, çand û zamanê hev bipejirîn û bi vê rêgezê piştgiriya hev bikin da ku karibin van çand, dîrok û zamanên hemanê dîrokê bidin jiyandin û bi pêş ve bibin. Ger em dîrokê wekî alavekî, ku gelan dijiyine û radigihîne pêşerojê bihesibînin, hingê ronîkirin û zelalkirina dîroka kurdî, dê li dijî zext, zor, îmha û înkara ku bi salan e li ser kurdan tê meşandin, bibe bersîveke zanistî. Xebateke bi vî awayî ji bo biratiya gelan a li ser bingeheke wekhev û azad, tişteki jêner e.

Pirsgirêkên di nêzîktêdayîna rûdana kurdî de

Tiştê dîrokê dike dîrok, hilberîna bi hişmendî ye ku di bingeha wê de azînen pêşveçûn, guherîn û vîna ku di van pêvajoyan de cih girtiye. Civak, di vê pêvajoyê de wekî hêza sereke û vînî ye. Ev hêza vînî, mîna kirdeya civakî, bi çêkirina dîrokê re xwe jî diafirîne. Pêşiyên kurdan di dema derketina pêvajoyên guherîn, pêşveçûn û belavbûna van de cihekî girîng girtine. Bi derketina şaristaniyan jî xwedî hewldaneke pir girîng in. Dema ku ev rewş bi vî awayî li ber çavan bê girtin, hingê dê were dîtin ku dîroka kurdan û derketina şaristaniyan di heman demê de çêbûne. Lê mixabin piraniya şîroveyan li ser dîroka kurdan tên kirin, em dibînin ku dûrî zanîstê ne. Bi vî awayî, gelek ku di despêka dîrokê de cih girtiye, ji nav dîrokê hatiye vederkirin. Derketina encamên zanistî, dê bi xebatên zanistî pêkan bibe. Ji ber vê yekê, xebatên ku li ser dîrokê tên kirin bigihên bingehên zanistî, dê Beşa Dîrokê bixebite û dê vê yekê wekî peywireke sereke deyne pêşiya xwe. Em bawer in ku dema em bi vê nêrîne li dîrokê bimêzin, dê hingê cih û taybetiya dîroka kurdan a ku di nav dîroka mirovahiyê de baştir bê zanîn. Çalakiya dîroka mirovahiyê ya herî mezin, derketina mirovahiyê ya li ser dîka (sehneya) dîrokê ye ku bi çalakiya hişmendî ya kedê û hilberîna pêk hatiye.

Hemû mirov bi awayê koman biçûk ên wekî hev dijiyan. Van koman jiyana xwe bi berhevkarî û nêçîrvaniyê di-

Zanîna serdema neolîtîk, dê li ser ronîkirana dîroka kurdan be, a ku di encama şer û gengeşiyên de roleke kifşker bilîze. Em ê bi çirûskên ku ji destpêka dîrokê heta niha hatine, bikaribin derfeta derxistina agahiyên çardeh hezar sal berî niha, yên dîroka mirovahiyê û dîroka gelê kurd bi dest bixin ...

domand. Di dema neolîtîk a di serdema prehistoryayê de, di nav çand û zimanan de, hêdî hêdî cudatî çêbûn. Ji ber vê yekê mirov nikare di vê radeyê de civakê ji civakê din binirxir bihesibîne. Civaka ku di serdema neolîtîk de cih girtiye, tê wateya bingehdaînan mirovatiyê. Bêguman divê em çavekî binirx li civakê binêrin. Serdema neolîtîk, li hîlala zêrîn derketiye holê, li vê derê bi pêş ve çûye, xurt bûye û ji vir li hemû cihanê belav bûye.

Dema mirov li dîrokê mêze dike, mirov dibîne ku ji despêka dîrokê heya niha li vê wargehê, li ser vê axê jiyane. Ev wargeh ji xwe re wekî welat pejirandine. Bi awayekî zelal derdikeve holê ku, li wir gelê kurd di afirandina vê pêşveçûna serdema neolîtîk de xwedî roleke pir girîng e. Ev yek jî nîşan dide ku, gelê kurd yek ji wan gelên kevnare ye ku serdema neolîtîk afirandine. Ji ber ku krîtêr û taybetiyên neolîtîk tê zanîn, ravekirina li ser kal û dapîrên kurdan jî hêsantir dibe. Ji bo

gelê kurd, cihgirtina wan a di nav gelên kevnare de, taybetiyek pir binirx û mezin e. Encamên vê rewşê jî, dergûşiya mirovahiyê ye. Zanîna serdema neolîtîk, dê li ser ronîkirana dîroka kurdan be, a ku di encama şer û gengeşiyên de roleke kifşker bilîze. Em ê bi çirûskên ku ji destpêka dîrokê heta niha hatine, bikaribin derfeta derxistina agahiyên çardeh hezar sal berî niha, yên dîroka mirovahiyê û dîroka gelê kurd bi dest bixin û bi vê yekê re bikaribin bersîva pirsê "divê dîrok ji ku derê dest pê bike?" bi avakirina pira dialogê ya di destpêka dîrokê de û hata roja me bidin.

Civak bi rêgezên objektîfî yên civakiya dîalektîkî, yên guherîn û veguherînê, fehmkirin, dahûrandin, di nav dîrokê de cihê xwe digirin. Lê, civakên ev şert û merc û dahûrandinên civakî bi cih neanîbin, an li hemberî civakên serdest û dagirker qada dîrokê dîtîkînin an jî dibin figuranekî dîrokê, yanê mîna kurdan, di destpêka dîrokê de dimînin û xwe ji çanda serdema neolîtîkî xelas nakin. Di nav vê çandê de niqo dibin. Her wiha gelê kurd bi vî awayî bûye figuranekî dîrokê. Xwe di destpêka dîrokê de, bi çanda neolîtîk sînor kiriye. Ji ber vê rewşê em dizanin ku lêgerîn, lêkolîn, aşkerakirin, belgîkirin û afirandina civakî ya dîrokê ku di nav civakê de bê herêkirin û pejirandin, ne tiştêkî hêsan e. Her wiha em dizanin ku tu zanist jî bi qasî zanista dîrokê ji hêla dagirker û mêtîngeran ve nehatiye se-

robinkirin. Lê belê, bi pêşveçûn û hakimbûna zanîstê re, hêdî hêdî dîroka gelan û dîroka kedê ya ku hatiye serobinkirin zelal dibe û tê nivîsandin. Bi vê pêwendiyê, dîroka kurdan jî bi bikarnîna rêbaza zanîstê, dê cihê xwe yê ku şayanî wê ye, di nav malbata mirovahiyê de bigire.

Tunebûna dîrokeke nivîskî ya serdema neolîtîk, nayê wateya bêdîrokbûna ku wan gelên li vê serdemê jiyane. Ancax mirov dikare bibêje ku dîrokeke wan a siyasî ya nivîskî tune ye. Li aliyê din, teqez e ku ew gel xwedî dîrokeke çandî, mîtolojîk û nijandî ne. Ji ber ku dîrok ne tenê bi nivîskî û siyasî ye. Heta mirov dikare bibêje ku dîroka watedar û rasteqîn, ew e ku hemû hêmanên civakî yên madî û manewî dihewîne û bandoreke tund li ser civakê dike. Dema mirov bi vî çavî lê mêze bike, hingê mirov dê bibîne ku gelê kurd, gelek ji gelan e ku serdema neolîtîk ew afirandine. Xwediyê wê çandê ye ku zanist û teknîk bi pêş ve birine. Bandorkirina çanda Mezopotamyayê ya tund a li ser cîhanê, çavkaniya xwe ji vir digire. Gelê kurd çanda neolîtîk a ku demeke dirêj e bandoreke tund li ser mirovahiyê kiriye û tevlikirineke mezin li çanda mirovahiyê kiriye, afirandiyê. Lê mixabin, ev dîrok nenivîsiye û ev yek jî, ji bo wî kêmasiyeke pir mezin e.

Ev gelên jêderka şaristanîyê, di nivîsîna dîrokê de ne xuyan e û bi ser de jî ji aliyê serdestan ve tune tene hesibandin. Mixabin em bi rasti-

yeke wiha tîrajîk re rû bi rû mane. Serdestan, ji bo berjewendiyên xwe kurd înkarkirine. Li aliyekî din, nêzîktêdayîna her tiştî girê dide.

Tunebûna dîrokeke nivîskî ya serdema neolîtîk, nayê wateya bêdîrokbûna ku wan gelên li vê serdemê jiyane. Ancax mirov dikare bibêje ku dîrokeke wan a siyasî ya nivîskî tune ye. Li aliyê din, teqez e ku ew gel xwedî dîrokeke çandî, mîtolojîk û nijandî ne.

Tiştên ku kurdan û bûyeran, ji rastiye dîr dixîne jî çêbûne. Em dikarin bibêjin ku, înkarkirina kurdan, înkarkirina dîroka kurdan jî bi xwe re tîne.

Dibe ku nêrîna mîtolojîk û olî ji bo bîngeha ravekirinê, ji însanên serdema pêşîn û serdema navîn, guncan be. Lê îro ev nêrîn ji bo derxistina rastiye, xwediyê kêmasiyan e. Ger em heyama beriya nivîsîna dîrokê jî wekî dema dîrokê bipejirînin, ravekirina vê dema dîrokê bipejirînin, ravekirina vê demê bi mîtolojiyê û jortirîna vî, bi teolojiyê pêkan e. Ji bo dagirkeriyê, guncanbûn û piralîbûna erdnîgariya kurdan bûye sedem ku li ser dîroka kurdan şewirandinên sosret ên mîtolojîk û olî bîne kirin. Vê yekê jî parêznameya bîrdozî ya bav û kalên kurdan bi xwe re anîye. Ji ber wan sedeman, eger dîroka kurdan bi têgihên serdema navîn û serdema pêşîn bê ravekirin, dê nivco bimîne.

Nêzîktêdayîneke din ya li ser kurdan nêzîktêdayîna nijadî û yekalî ye û ev jî bi des-

tên hêzên serdest tê bikaranîn. Ev rewş bûye sedem ku li ser kurdan û dîroka kurdan çewtîyên mezin çêbin. Bi taybetî jî, di nivîsîna dîrokê de dîroknasan nekarîne dîroka fermî red bikin û li şûna dîroka fermî, dîroka rasteqîn derxînin holê. Em dikarin vê rewşê wek kêmasiya herî mezin binirxînin.

Mijar û gotebêja li ser kurdan, her tim hatiye qedexekirin û ji zanîstê hatiye bidûrxistin. Ji ber ku ronahîkirina kurd û dîroka kurdan ji bo gelek nîjad û hêzên navneteweyî li dijî berjewendiyên wan e. Her tim, mebest sûdwergirtin bûye. Ji bo wan berjewendiyên, zordestî û înkâr li ser kurdan hatiye ferzkirin. Mixabin ev rewş hê jî didome.

Hal wa ye, nêzîktêdayîna zanîstî ya li ser dîroka kurdan, dê derxîne ku di taybetiyên xweser û giştî yên kurdan, çiqas rengîn û balkeş e. Dîsan dê derkeve holê ku şewirandinên dîrî rastiye, dema bi polîtîka û xeta çalakiyê re bibe yek, çî qas sosret dibe. Bi kurtasî mirov dikare bibêje nêzîktêdayîna dîrî rastiye, ne etik e û bi kêr nehatiye.

Em, dîroka xwe baş nenirxînin, jê fedeya herî mezin negirin û raveyeke zanîstî nekin, dê fersend bikeve destê wan kesan ku li hemberî ziman, wêje û dîroka me di nav hewldanên neyînî de ne. Nirxandinên nijadperest û kêma, dê tu feyde nede pêşveçûna dîroka kurdî ya modern. Keda bi sedan salan a mirovatîyê, ji bo sîdên biçûk, bi awayekî hovane tê texrîpkirin.

MEBEST**Afirandina hişekî dîrokî yê rast**

Divê em bizanibin ku li pêşiya me demeke pir zêde tune ye. Lûkseke me ya wiha jî tune ye û divê em li gorî vê rewşê tev bigerin. Peywira beşa me ya sereke ew e ku dîroka me ya bi hezar berdêlan hatiye afirandin, ya bêjeyî, nivîskî, dîtbarî û hwd. bi xebatekê bê belgekirin û ji çavkaniyê bi awayekî rast û bi riyên rast dersbasî civakê bibe da ku di nav civakê de hişê dîrokê ya civakê biafire.

Beşa Dîrokê bi xebat û lêkolînên xwe, belgeyên hatine veşartin, înkarkirin û windakirin berhev dike û wan diparêze. Beşa dîrokê dê bi Enstîtuyê û akademyên li welatên biyanî re xebatên hevpar bike û bi wan re konferans, semîner û sempozyonan pêk bîne. Beşa Dîrokê dê dîroka erdnîygariya me ya ji aliyê serdestan ve hatiye serobinkirin, ji nû ve têkûz bike. Dê li ser çanda Mezopotamya û Anatoliyayê ku bi salan gelên cihê wekî biran bi hev re li ser jiyane, berhev bike û ji vir pêşkêşî gelan bike.

Beşa Dîrokê dê çanda ve erdnigariyê bike bingeha biratiya gelên ku li ser ve erdnigariyê dijîn. Dê lê bixebite ku hêviya gelan, ya bi sedan salan, bike ya cihan û civakê azad.

Afirandina hişekî dîrokî yê kurd

Gelê kurd ji cih, çand dîrok û şaristaniya xwe hatiye veqetandin, ji resenî û rehên xwe hatiye dûrxistin û bêbir

(hafiza) maye. Di dîrokê de, gelê kurd yekem car dîroka

Beşa Dîrokê dê bi rêgeza "hêza bêkontrol û bêrêxistin, hêz nîn e" derkeve rê û girêdayê vê yekê, ji bo ku ji xebatên xwe sûd wergire dê lê bixebite ku xebatên xwe ji aliyê çawaniyê ve bi pêş ve bibe û mayînde bike. Ligel vê, dê kadrobûyînekê peywira sereke bide pêşiya xwe. Em ê wekî beşekê, armanca vekirina enstîtu, dibistan, pirtûkxane û pişgiriya perwerdehiyê bimeşînin.

xwe bi destê xwe afirandiye. Careke din Beşa Dîrokê dê hewl bide ku derfeta kiryarbûna gelê kurd a li ser dîroka xwe biafirîne. Dê derfetên ku em bi karibin ji nû ve dîroka xwe hîn bin û bibin xwedî hişekî û bi vî hişî bîra xwe ya ku hatiye texrîbkirin, nû bikin, biafirînin. Girêdayî ve yekê jî, xwedî li dîroka xwe ya kevnare derkevin. Beşa Dîrokê dê pêşnûmayeke nû ji bo dîroka kurdî ya ku ji aliyê serdest û dagirkeran ve hatiye bişaftin, biafirîne. Û dê bingeha ve yekê jî, li ser rêgeza çanda neolîtîkî ya li herêma hîlala bibereket, ku li qûntarên çiyayên Toros û Zagrosan biavêje.

Sazîbûyîn

Eger peywira organîzasyonê ya sazîti bi awayekê kifş nehatibe diyarkirin û der-

feta wê ya ku bikaribe ji çavkaniya xwe debar bigire tune be, hingê em nikarin bibêjin ku ev sazî û rêxistinên wiha dê bikaribin bi ser bikevin. Ji ber vê boneyê, divê di serî de sazîbûyîn bi cih bê.

Beşa Dîrokê dê bi rêgeza "hêza bêkontrol û bêrêxistin, hêz nîn e" derkeve rê û girêdayê ve yekê, ji bo ku ji xebatên xwe sûd wergire dê lê bixebite ku xebatên xwe ji aliyê çawaniyê ve bi pêş ve bibe û mayînde bike. Ligel vê, dê kadrobûyînekê peywira sereke bide pêşiya xwe. Em ê wekî beşekê, armanca vekirina enstîtu, dibistan, pirtûkxane û pişgiriya perwerdehiyê bimeşînin. Dê têkiliyên bi kes û saziyên derve yên ku li ser çand û dîroka kurd dixebitin, xurt bike. Ji ber ku pêdiviya xebatên sazîbûyîni bi qadroyên pispor heye, dê li ser dîrok, arkeolojî û metodolojiyê xebata kadroyan bê kirin. Dê beşên dîrok, arkeolojî û metodolojiyê bîn avakirin. Dê beşên lêgerîn û lêkolînê yên wekî zanîsta dîrokê û metodolojiya wê, pêşnûmayên dîrokê, qilavûza xebatên dîrokê, pêşnûmeya dîroka devkî, pêşnûmeya dîroka cîgeyî, pêşnûmeya dîroka eşîr û pêşnûmeya dîroka kurdan, bîn avakirin.

Lêgerîn û lêkolîn

Beşa Dîrokê dê li ser beşên dîrokê yên ku di nav mijara wê de dayî ber xwe û xwe berpirs dîtî, xebatan bike û belgeyên nivîskî, dîtbarî, bêjeyî yên têkildarî van beşan û dê van envanteran biparêze û pêşkêşî kesên têkildar û

raya giştî bike. Yanî mebesta dîrokê ji nivîsîna dîrokê bêhtir, lêkolîn, lêgerîn û parastina belgeyên dîrokî ye. Dê belgeyên dîrokî derxe ser rûyê erdê û wan berdest bike. Bi vê yekê dê arşîveke dewlemend û berdest pêşkêşî kes û saziyên ku dixwazin li ser dîrokê bixebitin, bike. Ligel vê berpirsiyê dê van belgeyan nîqaş bike, binirxîne û ragihîne civakê.

Çapemenî û weşan

Ji bo agahî û ezmûnên ku di encama xebatên hatine meşandin de derketin holê, bigehînin civakê û gel, dê di serî de ev di kovara Zend û weşanên têkildar de û li ser malpera Beşa Dîrokê bêne weşandin.

Ji bo ku agahiyên dîrokî bi awayekî qewî derbasî civakê bibin, dê agahiyên ku bi dest ketine, di serî de bi riya kovar, rojname, tv û radyoyên ku dixwazin hişê dîrokî bigehînin gel û bi organîzekirina sempozyûm, semîner, pêşengeh û wêneyên dîrokê, bigehîne civak û raya giştî.

Belgeyên nivîskî an jî destnivîsar, dîtbarî û pirtûk, afîş, belavok, kartpostal, wêne, sûret, belgeyên serpêhatiyên dê bîna parastin û texrîbkirana wan a bi zanebûn an ne bizanebûn bê astegnîkirin û ji bo yê li welatên biyanî ne bînin, dê di nav hewldanan de be. Ew belgeyên ku dê bîna berhevkirin, bi derfet û alavên teknolojiyê yê wekî mîkrofilm, mîkroafîş, wîdeo, bandên dengî bêne parastin û ji bo ku bêne bikaranîn jî dê pêşkêşî lêkolîneran bike. Dê di

çarçoveya zagonan de bi sazî û rêxistinên xebatên mîna wê û yê heman karî dikin re, têkilî bê danîn.

Arşiv

Tê zanîn ku kesên herî zêde pêdiviya wan bi arşivan hene, dîrokzan in. Dê ji bo tîkûzkirin û berhevkirina belgeyan û pêşkêşkirina wan jî bo lêkolîneran xebat bîna kirin. Dê ji bo ku her kes bikaribe bi riya înternetê bi awayekî hêsan bigihîje van agahiyên, malperek were avakirin. Dê dîroka zindî bê tomarkirin û bi awayê roman, film, rojane, wêne û bi şêwaza derbirandinê bêne teşekirin.

TEŞEDARÎ

Beşeke çawan a dîrokê?

Mebesta Beşa Dîrokê ew e ku xebatên xwe bi derdoreke herikbar re bimeşîne. Ji ber vê yekê Beşa Dîrokê dê li gorî hemû radeyan, kesan beşdarî xebatên xwe bike û ji bo ku wan tevî saziyê bike, dê wan bilebitîne û tevî pêvajoya

Beşa Dîrokê dê bi saziyên di warê dîroka şaristaniyên Mezopotamya û Anatoliyayê xebatên zanistî, akademîk dikin re pêşnûmayên hevpar pêk bîne; bi vê mebestê bi van sazî û kesan re di nav diyalog û piştevaniyê de be. Ji bo ku van tîkiliyan pêk bîne, dê di zûtirîn demê de dest bi xebatên cidî bike

hilberînê bike. Kesên Beşa Dîrokê dê kesên ku xebatên siyasî, civakî û çandî li ser pêşveçûna dîroka şaristaniyên Mezopotamya û Anatoliya kirine û niha jî van xebatan didomînin, kesên welatparêz, şoreşger, demokrat, akademîsyen, xwendekarên zanîngehan ên nêzikî dîrokê yê wekî ku li ser arkeolojî, antropolojî, civaknasîyê xebat kirine û niha dikin, li ser rêgeza daxwaziyê bikêşe nav van xebatan. Beşa Dîrokê dê bi saziyên di warê dîroka şaristaniyên Mezopotamya û Anatoliyayê xebatên zanistî, akademîk dikin re pêşnûmayên hevpar pêk bîne; bi vê mebestê bi van sazî û kesan re di nav diyalog û piştevaniyê de be. Ji bo ku van tîkiliyan pêk bîne, dê di zûtirîn demê de dest bi xebatên cidî bike.

Beşa Dîrokê dê ji bo demeke dirêj van xebatên xwe li ser şaxên makezanîstê bimeşîne. Rêxistinkirina van şaxên makezanîstê dê bi sazîbûyîna Beşa Dîrokê re bi awayek paralelî pêk bîna. Her çiqas di demeke nêzik de pêk neyê jî, dê bi sazîbûyîna Beşa Dîrokê re sazîbûyîna şaxên makezanîstê jî bîna birêxistin. Divê Dîroka Kurdistanê li gorî teybetmendiyên xwe bê asokirin. Bi taybetî divê dîroka Kurdistanê li gorî bûyerên ku di encamên mezin, pêşveçûnên qewî û di guherînên bîngehîna de pêk hatine, bê asokirin. Em wekî Beşa Dîrokê, dê van serdeman bi hêzên ku tevî xebatan bîne û di nav demê de, pêk bînin. Em ê lêgerîna serdemên dîrokê û derxistina holê ya rastiyên

dîrokê, wekî armancê deynin ber xwe. Ligel vê ye-kê, serdema neolîtîk ku em dikarin wekî zayîna mirovahiyê bi nav bikin û di dîroka gelê kurd de jî cihekî wê ye pir girîng heye, dê ji her aliyê ve bê lêgerîn û dahûrandin. Beşa Dîrokê dê teşedariya xwe bi awayekî qestî çêneke, dê xebatên beşê li gorî pisporyê û li ser bingeha karbeşiyê bîn avakirin. Bi vê pêwendiyê, dê di nav Beşa Dîrokê de têkiliyên mîna têkiliyên di navbera xwendekar û mamosteyan de tune bin û dê her kes di nav de, xwe û derdora xwe perwerde bike. Mebesta me ev e ku di vê beşê de her kes hem mamoste û hem jî xwendekar be. Beşa Dîrokê çawan li dijî qastbûyîna di nav xwe de ye, dê wisan jî li hemberî gel tevgerê. Beşa Dîrokê dê xwe ji talûkeyên wekî dîrketina ji gel, ji veqetiyên, ji gel û elîtbûyîna komek rewşên biparêze. Dê bi gel re hilberîna û dê hilberîna xwe bi gel re parî bike.

Rêbaza xebatê

Beşa Dîrokê dê rêbaza xebatê ya şewaza pêşnûmayê wekî bingeh bigire û xebatên xwe li ser wê bingehê bimeşîne. Em dikarin rêbaza xebatê ya şewaza pêşnûmayî wiha bi nav bikin; li gorî çavkaniyên heyî yên li ber dest. Xebitîna di nav demeke hatiye kifşkirî de, li gorî bicihanîneke asoyîkirî û pêkanîna li gorî armanca ku hatiye danîn. Xebata şewaza pêşnûmayî tê wateya bikar-anîna awayekî baş a çavka-niyan û têkiliyêke xurt a bi gel re.

Xebata şewazî ya pêşnûmayî, ne pêngavek e, ew pêvajoyek e. Pêşnûmayêke bi fikir û ramanan dest pê dibe û bi siwêrandina van fikir û ramanan digihîje teşeyekê. Pêşnûmaya ku bi siwêranekê derdikeve holê, bi temînkirina

çavkaniyên wekî mirov û aborî derfeta pêkanîna bi dest dixe. Di vê pêşnûmayê de tiştê herî girîng, bikaranîna wê ye. Em dikarin bicihanîna wê

Beşa Dîrokê dê bi saziyên di warê dîroka şaristaniyên Mezopotamya û Anatoliyayê xebatên zanistî, akademîk dikin re pêşnûmayên hevpar pêk bîne; bi vê mebestê bi van sazî û kesan re di nav diyalog û piştevaniyê de be. Ji bo ku van têkiliyan pêk bîne, dê di zûtirîn demê de dest bi xebatên cidî bike.

wekî piştî bidestxistina derfetan a mirov û aborî, gihîştina armancên ku di pêşnûmayê de hatine kifşkirin. Di dawiyê de jî nirxandina encaman cih digire. Di vê radeyê de encamên ku derketine holê, tîr nirxandin û ji bo pêşnûmayên nû encam tîr derxistin. Û di xebatan de domdariyêke mayînde tê bidestxistin. Di xebata şewaza pêşnûmayî de bikar-anîna rasthatinî, bêberpirsariyê ji holê radibe û di xebatan de îstîkrar tê bidestxistin. Careke din bi vê projê tê zanîn ka dê kîjan kes, bi çi karî û bi çi awayî bixebitin, baştir û hêsantir tê kifşkirin. Ji ber ku di vê pêş-

nûmayê de hatiye diyar-kirin ka xebatên sazîtiyê wekî pêşnûmayan bi awayekî şênber hatine daxuyandin, beşdarbûna kesan jî hêsantir dibe. Bi vê rêbazê keda bi dilxwazî domdartin dibe. Bi tevîbûnên kêmcergebezî namîna û dibe boneya beşdarbûnên pisporî.

Pêşnûmayên herî baş, bi keda dilxwazî tîr çêkin. Bêguman di gelek waran de û di karên şênber de derfetan ku mirov bikaribe bigihîje van projeyan, ne gengaz e. Careke din tiştê herî girîng ew e ku dilxwaziyê wekî mebestekê rave bike û bi cih bîne. Her wiha gengaz e ku mirov karên zêde pisporbûnê naxwazin, wekî kategoriyekê çêbike û wan li ser bingeha keda dilxwaziyê pêk bîne û bi rêk û pêk bike. Pêkan e ku beşek, projeya mezin bi riya keda dilxwazî bi cih bîne.

Teşeya beşê

Beş, xebatên xwe yên li ser bingeha lêgerîn û lêkolînê yên zanistî, bi awayê komîsyonan dimeşîne.

Di bin avaniya beşê de li gorî pêdiviyên, di çarçoveya derfetan de ji bo mijarên cur bi cur, komîsyonên lêkolînê dê bîn avakirin.

Wekî di rêznameya Enstîtuyê de jî hatiye diyarkirin, Beşa Dîrokê, lêkolînerên ku xebatên wan li ser dîrokê hene, dihewîne. Beşê jî kesên ku di hundirê beşê de ne, komîsyoneke bilind a ku dê ji kadroyên gihîştî û akademîsyenên pêk bê, çêke û xebatên xwe di bin venêriya wê komîs-

yonê de bimeşîne. Beş ji bo ku nivîsîna dîrokê ya zanistî û xebatên wekî wê bike, dê komîsyon û komîteyên ku pêdivî pê hebe, li dar dixê.

Komîsyona Beşê ya Bilind, xebatên beşan ên werzeye-yî-salane, bi plan û organize dîke û dema ku hewce dît, komîsyonan ava dîke û xebatên wan vedinêrîne.

Komîsyonên beşan ên bilind, saziyan beşdarî xebatên ku têkildarî warê ew li ser dixebitin dîke û civînên hevpar çêdîke.

Komîsyonên beşan ên bilind xebatên beşê li gorî rêznameya navxweyî ya ku ji aliyê senatoyê ve hatiye çespendin, dimeşîne. Endamên komîsyonên beşan ên bilind, ji sê kesan pêk tên û ji aliyê endamên beşan ve ji bo salekê tên hilbijartin. Komîsyonên beşan ên bilind, mehê carekê dicivin.

Serokên beşan li senatoyan tên hilbijartin, di pergela civakî de, beşên xwe temsîl dikin. Serok, xebatên beşê bi rêk û pêk dîke, xebatên beşê yê salane çêdîke û wan radestî senatoyê dîke.

Endamî

Endamên esil: Ew kes in yê ku di warê dîrok, arkeolojî, civakî, ramiyarî û xebatên çandî de lêgerîn, lêkolîn kirine û ligel cihgirtina di beşekê de, rêzname û pêşnûmaya Beşa Dîrokê pejirandina. Endamtiya esil, bi pêşniyarkirina beşê û çespendina Senatoyê çêdibe. Serlêdana endamtiyê, herî kin di nav sê

mehan de bi encam dibe.

ARMANC

Armancên ji bo demeke kin

- Têkilîdanîna ligel kes û saziyên ku li ser dîrokê dixebitin, kifşkirina warê xebatê û têkûzkirina dan û stendina agahiyan ya ji çavkaniyê.

- Lidarxistina sazîbûyîne.

- Derxistina kovara Beşa Dîrokê ya gelemperî.

- Amadekirina forma endamtiyê ya ji bo Beşa Dîrokê û li gorî pêdiviyê qeydkirina enaman.

- Têkilîdanîna bi perwerdekarên welatparêz re û beşdarîkirina wan a ji bo beşê.

- Têkilîdanîna bi kes û saziyên ji derve yê ku li ser heman waran xebatê dikin û sazîkirina derfetên yekîtiyê.

- Çêkirina komîteya arşîvê.

- Berhevkirina çavkaniyên ku li ber dest in û temînkirina alavên teknîkî yê wekî cih, kompîtur û sûdgirtina ji xwe-diyên pêşnûmayan.

- Rêxistinkirina koma pêşnûmayan a li ser pêşnûmayan.

- Amadekirina pela (sayfeya) dîrokê ya li ser malpera enstîtuyê.

- Sazîkirina lijneyeke şewirî ku ji akademîsyenên li ser dîrokê xebitîne, pêk tê.

- Nivîsîna metnên li ser dîrokê, ji bo ku di kovara Zendê de bîne weşandin.

- Amadekirina Atlasa Dîroka Kurdî.

Armancên ji bo demeke dirêj û navincê

- Sazîkirina komîteyên lêgerînî-lêkolînî yê dîroka kurdî.

- Sazîkirina pêşnûmaya dîroka cîgeyî û girêdayî vê yekê,

di serî de sazîkirina komîteyên li cihên dîrokî yê wekî Amed, Wan, Riha û Mêrdînê.

- Li darxistina konferansa cîgeyî.

- Amadekirina broşûreke li ser metodolojiya zanîsta dîrokê.

- Amadekirina broşûreke li ser xebatên dîrokî yê bêjeyî.

- Amadekirina broşûreke ku li ser xebatên cîgeyî yê dîrokî.

- Amadekirina broşûreke ku li ser xebata şewaza pêşnûmayî.

- Lidarxistina konferansa Rojhilata Navîn a dîroka kurdî

- Çêkirina rêze-ansîklopediya dîroka kurdî

- Çêkirina rêze-pirtûkên dîroka kurdî

Şaneya agahiyê

Em, Bernameya Beşa Dîrokê, ku dê bi tevîbûna keda we bigihîje şekî xwe yê dawî, pêşkêşî dîtin, nixandî û pêşniyarên we dikin.

Hûn dixwazin tevî kîjan xebatên dîrokî yê sazî, akademîk bibin ku di Bernameya Beşa Dîrokê de hate diyarkirin? Wek mînak; ji bo bicihanîna projeyên demeke nêz, demeke navincî û demeke dirêj, dê komîsyon bêne avakirin. Hûn dixwazin di kîjan komîsyonê de cih bigirin?

Ji bo gişt Bernameya Beşa Dîrokê der heqe beşan de em li hêviya nixandî, fikir û pêşniyazên we ne.

*Destpêka vê nivîsarê di hejmarê berî vê hejmarê de bi heman sernavî hatiye weşandin.

MAMOSTEYÊ SÊYEMÎN

XANÎ

Cemşîd Bender

Lêkolînerê hêja H. Mem kitêba xwe ya sêyemîn ya der barê Xanî de, weşand. Me ev xebata nivîskar a dawiyê jî bi baldarî xwend. Em gihîştin wê qeneetê ku vê berhema H. Mem di warê xwe de valahiyeke mezin dagirtiye. Wekî ku tê zanîn Ehmedê Xanî di sala 1651'ê de hatiye dinyayê û di sala 1706'an, an jî di sala 1707'an de wefat kiriye. Temenê wî yê fanî 55 an jî 56 sal kişandiye, lê di nav vê dema kurt de Ehmedê Xanî berhemeke wekî Mem û Zînê a dêwîn pêşkeşî mirovahiyê kiriye.

H. Mem di vê lêkolîna xwe de ya ku digihîje 534 rûpelî, rêzê di bin sernivîsarên wekî Kesayetiya Xanî ya Beşerî, Nasnameya Wî ya Zanistî, Di Mem û Zîn de Xweda û Mirov, Şexsiyet û Kevirên Bîngêhîn ên Fikir û Felsefeya Xanî û Pestana Yekîtî û Jiyînê de diyasporaya Ehmedê Xanî pêşkeşî xwendevanên xwe kiriye.

Nivîskarê me, ji ber ku Ehmedê Xanî û berhema wî ya navdar Mem û Zîn, herî

kêm du sed sal di tariyê de maye diqehire û mafdar e jî. Wekî ku li ser berga kitêbê ya paşîn jî hatiye diyarkirin, H. Mem dixwaze wê perdeya ku

Nivîskarê me, ji ber ku Ehmedê Xanî û berhema wî ya navdar Mem û Zîn, herî kêm du sed sal di tariyê de maye diqehire û mafdar e jî. Wekî ku li ser berga kitêbê ya paşîn jî hatiye diyarkirin, H. Mem dixwaze wê perdeya ku li ser Xanî hatiye pê-çandin rake û ji bo vê jî hewl dide.

li ser Xanî hatiye pêçandin rake û ji bo vê jî hewl dide. Ya rastî jî ev e ku Xanî li cografyaya me zêde nayê nasîn. Wekî din jî, hin derûdor wî di çarçoveyê teng de dinirxînin.

Çendî ku Ehmedê Xanî hemû zemanê xwe di ber xebatên çandî û şarezayî, edebî, felsefî û di ber xwendekarên xwe de daye û di jiyana xwe de hiç nezewiciye û nebûye xwedî zarok jî û piştî evqas fedakarî, mana wî

ya di tariyê de rastiyeke jandare.

Lê belê hemin e ku, seraf qîmeta zêr dizane, nivîskarê me yê hêja H. Mem jî di vê berhema xwe de bi daneyên ku daniye holê, tariyan deçirîne û ronahiya Ehmedê Xanî li cîhana fikrî ya îro roja me belav dike. Hem jî yek bi yek bi şîroveyên zanistî. Ne hêsan e ku 10 salên xwe temam di vê riyê de daye, ji serdemên kevnare dest pê kiriye li ser dîroka felsefeyê hûr bûye. Yek bi yek li ser filozof û fikirmendên navdar hûr bûye, di serî de berhemên fikirmendên Anatolyayê û berhemên fikirmendên sereke yên çanda ereb û farisan xwendine û bi wan re muqayese kiriye û wisan gihîştîye Ehmedê Xanî û di dawiyê de ew encamên ku heyecanê didin me, di vê berhema xwe de pêşkeşî me kirine.

H. Mem di vê xebata xwe de tevî baweriyên kevnare kesên (qencên) ola Zerdûşt, behsa pêxemberên ku navên wan dane, kiriye û bi vî awayî jî repertuara xwe gelek fireh daniye.

H. Mem bi vê metodolojiya xwe ya xweser

derxistiye meydanê ku zanyarekî kurd ê ku di sedsala 17' an de, cografyaya Anatolyayê wekî mekan ji xwe re girtiye û pirek di navbera rabirdû û dahatû de çêkiriye û ev sifata Mamosteyê Sêyemîn bi nivîskariya xwe bi dest xistiye.

Li gorî H. Mem mamosteyê yekem şagirtê Eflatûn (Platon) Aristo ye, ku gotiye "Devlet ji bo parastina jaran pêwîst e" Nivîskarê me der barê vê yekê de vê şîroveyê dike: "Xaniyê mezin di teoriya xwe ya dewletê de bi kesayetiya Aristo ya toreyî ve tam girêdayî ye. Alîgirekî rêzdar ê Aristo ye. Li gorî wî ya esasî civak e. Lê belê tore û enene, ew zanistên ku di parzûna dîrokê re derbasbûne wekî rewa hatine pejirandin. Rewabûn jî edalet e. Edalet qencî ye, rasti ye, delalî ye."

Nivîskar bi bîr tîne ku Aristo ji aliyê zanyarên îslamê ve jî bi erênî hatiye şîrovekirin û wekî mamostayê yekem bi nav kirine û nivîskar dibêje ku Farabî bi riya Aristo teza xwe ya "îradeya mirovan hakimê gerdûnê ye" bi pêş xistiye.

Li gorî H. Mem, mamosteyê duyem Farabî ye. Li gorî agahiyên ku me ji ansîklopediyên bi dest xistiye, Farabî di sala 870' yan de bûye û di sala 950' yan de li Şamê wefat kiriye. Farabî bi temamî, 103 berhem nivîsine. Xwendina xwe ya bilind li Bexdayê temam kiriye. Ji zanyarên navdar ên wê demê,

ji filozofê îsewî (xiristyan) Ebû Bişr Muxa Bin Yunus Isagaçî mantiq, ji Ebû Bekir îbn El Sarrac nahîv (zimanzanî) ders dîtiye. Denur ku li Heranê li ser felsefeyê dixebitiya Yuhanna Bîn Haylan nas kir û jê ders stand. Berhemên Arîstoteles ên ku wê demê dihatin zanîn xwendin û fikira dibistana



(ekola) felsefeyê ya bi navê nihênîyî (gezimciler) hîn bû.

Di mantiqa Arîstoteles de metoda ku li ser tişt avakirin bi riya aqil pêk tê. Lê ji ber hindê jî ew di qada aqilane (rasyonalist) de namîne berê xwe dide tesawifê. Farabiyê ku di hemû fikirên aqilî de rêbaza talîl (deduksiyên) esas girtiye, lê dixebite ku boçûnên Arîstoteles û Eflatûn li hev bîne. Ji bo Farabiyê ku zêdetir li ser berhemên kesên din lêkolîn û şîroveya wan kiriye.

Lêkolîn û teşebûsa wî ya li hevanîna fikiran dide nîşan ku ew mirovekî ansîklopedîk e.

Hin filozof û zanyarên serdemên pêşin ên ku Farabî rexne li fikrên wan girtine û li hemberî wan derketiye Pythagoras, Arîstîppos, Kînikîyan, Stoaiyan, Pîogenes, Pyrron û Epîkûros in, ji fikirmendên îslamî yê ku herî zêde li hember şer kiriyê Ravandî ye. Li gorî Farabî ji aliyê derûnî ve ruh neynika mirovan e. Tiştê ku biri-qînê dayê aqilê nazarî ye. Feyza Xweda ew e ku di ruhê mirovan de reng vedide. Ji ber vê qasê divê ku ruh bê pakkirin. Pakbûna ruh jî, bi filîtîna ji lezeta sehekê û bi bilinbûna lezeta zihîne pêk tê.

A ji ber vî qasî, nivîskar û lêkolînerê hêja. H. Mem, Farabî wekî mamosteyê sêyemîn qebûl dike.

Em jî ji dil û can tevî vê dîtina wî dibin. Nivîskar li ser bîngeha xalên hevpar ên sê şarezaiyan, di warê fikir, dewletmîrov, xwedavend, şer û aşî, aqilruh, tore bawerî û mantiqê de ked daye, xwêdana xwe rêtiye û ji nav fikirmendan wekî mamosteyê sêyemîn Ehmedê Xanî bijartîye. Ji ber vê yekê jî pirtûka xwe wekî "Mamosteyê Sêyemîn Xanî" bi nav kiriye.

Çima Mamosteyê Sêyemîn Xanî?

H. Mem di kitêba xwe de

wiha bersiva pirsar me dide:

"Xanî şîret kir ku tenê navgîna pêwîst zanîst ye. Wî reçeteyên gihîştina ferdê ya bironahiyê û xelasbûna ji cehaletê nivîsî wî got: 'Teoriya perwerdehiyê azadbûn e.' Li gorî Xanî ew civakên ku rûmet bidin hiqûqê û li ser vê esasê azad tev bigerin. Ev civak ji aliyê huner, felsefe û edebiyatê ve pir bi pêş dikevin. Aboriya wan, wekhevîyê pêk tîne. Di mercên wiha de her ku ferd zana dibe, bi sewdaya rûyê edaleta bêhempa dikeve û digihîje dereceya evînê, digihîje azadiya xwe û koletî û hişkebawariyê ji xwe dûr dixwe. Dibe talibê bedeldanê, di vê oxirê de. Encama tez û antîtezan, sentez e. Şerê di navbera her duyan de bi aştiyê encama xwe dibîne. Armanc aşti ye. Di encamê de qencî û xerabî di ceneta xwe de wê di nav aştiyê de bi hev re bijîn. Di encama şerê Tajdîn ê xwedî Stiyê adil û hêmana xerab Beko de, dê ceneta Memê xwedî Zîn ye azad pêk bê. Di nav wî şerê civakî de, dê nasnameya etnikî yan Mîr Zeydîn ê bi esilê xwe ereb winda bibe û dê nasnameya Xusrev ya desthilatiya adil derkeve holê.

Kesayetiya Xanî ya olî, senteza olên Hind, Îran, Mezopotamya, Misir û Anatoliyayê yên di qalikê Îslamê de ye. Kesayetiya wî derûna van giştan e, fêkiyê wan ê gihîştî ye. Wekî pêşewa Mûsa ye. Ji aliyê nasnameya zanistî ve tabloya aştiyane ya nûnerên

felsefeyên nasnameya hunerî, hunermendê Ariyan Manî ye."

H. Mem, dibêje ku eger mirov Xanî tenê wekî mutesawif qebûl bike têrî nake, dûr an jî nêzik dê bê zanîn ku Xanî filozof e.

Dibêje Xanî "Ew mirov e ku navenda gerdûnê ye." Em roşanbîr gelek baş bi berhema

H. Mem li ser vê berhema wî sekinî ye, di pirtûka xwe de metodeke xweşik û mayînde pêk aniye, wî nasname taybetî û qîmeta Xanî derxistiyê pêş. Li gorî me tiştê ku heta îro hatibû jibîrkirin û nehatibû kirin, ev bû.

wî ya bi navê Mem û Zînê dizanin. Em rûmeteke mezin didinê.

H. Mem li ser vê berhema wî sekinî ye, di pirtûka xwe de metodeke xweşik û mayînde pêk aniye, wî nasname taybetî û qîmeta Xanî derxistiyê pêş. Li gorî me tiştê ku heta îro hatibû jibîrkirin û nehatibû kirin, ev bû. H. Mem yek bi yek li ser rêzên di berhema bi navê Mem û Zînê radiweste û her xwendekarekî/ê wê digihîne Ehmedê Xanî. Felsefeya wî bi riya gotinên wî yên di berhema wî ya navdar de, dadihûrîne (analîz dike). Bi keşfên reqemî yên ku me matmayî dihêle û yên ku di tesewifê de

jî girîng in, encamên efsaneyî û mûcîzeyî datîne holê. Bala xwe bidinê ku gotinên derbarê Xanî de nivîsîne çi qas balkêş in.

"Pêşî min bi firçeya îlmî ya di destê min de, ku her çi têrî jî nedikir, tozên li ser yê salane paqij kir. Her ku min paqij kir, min dît ku tablo li ser bingehê matematîkî hatiye çêkirin. Min keşf kir ku ew mîmar endezyarekî fikirê yê gelek mezin e. Min tabloya nasnameya wî ya ku ji mirariyan spî û ji mircanan sor, kola û birinçand. Dema ku min sazkirina hejmarî, rolên wî yê remzî yê hêmanên bingehîn cih bi cih kir, ez bi cezbe mame heyran ku Xanî endezyarekî civakî yê dahî ye."

H. Mem van gotinan bêsebeb nabêje. Li gorî min, tevî yê ku berê Mem û Zîn xwendine jî, divê ku berhema H. Mem ya bi navê Mamosteyê Sêyemîn Xanî, ji nû ve bi baldarî bixwînin. Ez di wê baweriyê de me ku dê gelek tiştên nû hîn bibin û dê ji xwendina wê gelek kêfê jî bistînin.

H. Mem bi çapkirin û belavkirina berhema xwe ya Mamosteyê Sêyemîn Xanî, xizmeteke mezin pêşkêşî gelê me kiriye. Ez ji can û dil wî piroz dikim û bi hêviya ku hê gelek berhemên din jî binivîse û nivîsara xwe li vir bi dawî tînim.

LI SER WERGERA M. EMÎN BOZARSLAN A MEM Û ZÎNA EHMEDÊ XANÎ

Perwîz Cîhanî

Çi xweş gotiye hozanekî
Îranî:

*Eger hosta xîmê xanî xwar
danî*

*Xwar diçe ew ta ber perê
esmanî*

*Rast nabe ew li çi dewr û
zemanî*

Çu guman di wê de tune ye ku Mem û Zîna Ehmedê Xanî, çi di bara darêştina toreyî, hunerî de û çi jî di bara nave-roka xwe ya felsefî, îrfanî û peyama xwe ya neteweyî de, şahkara toreyî kurdî ye. Ta niha gelek nivîskar, torevan û wêjekarên kurd û biyanî li ser vê şahkarê, paye û asta wê ya bilind û li ser bîr û hizrên Xanî yên pêşketî gelek gotar nivîsîne û lêkolîn pêk anîne. Lê berevajiyê van lêvekol û wêjekarên, du kes ji nivîskarên kurd jî ev şahkara mezin wergerandine. Lê wan Mem û Zîn wernegerandine ser zimanekî biyanî, belkî wan Mem û Zîna ku bi kurdî hatiye nivîsandin û afirandin, wergerandine ser zimanê kurdî bi xwe. Erê bi rastî, ragihandin û vegotina vê risteyê jî wek tiştekî sosret tê xuyanê.

Eger ev şahkar, çend hezar salan berî niha bihata nivîsandin, dîsan kêr û zêde mirov dikarî hindek maf bida wan wergerên hêja. Lê Mem û Zîn hind kevn nîn e û zimanê wê jî wisan ku hindek tê dihizirin, seyr û sosret nîn e. Xanî di vê pirtûkê de xîmê çîrokeke kurdî ya folklorîk li ser felsefê û îrfanê daniye. Bi gotinekê dî, kirasê felsefê û îrfanê li çîrokeke kurdî kiriye û bi rêka wê bîr û hizirên xwe yên felsefî û ramyarî ragihandine. Di babetên îrfan û felsefeyê de gelek peyv hene ku hemwateyên wan ne tenê di zimanê kurdî de, belkî ji bilî erebî, di hîç zimanekî din ê Rojhilata Navîn de û bi giştî yên misilmanên ne ereb de tune ne. Îcar ji ber nebûna van cure tégîn û biwêjên di zimanê kurdî de, Xanî neçar bûye van peyv û biwêj û tégînên erebî bi kar bîne. Her wisan Xanî di serdema xwe de jiya ye. Di serdema Xanî de zimanê nivîsandin û axiftinê, wisan bûye. Hingê kesekî serketî dihate jimarê, ku peyvên giran bi kar bîne.

Em ji gotina xwe ya binêşeyî dûr nekevin. Me got ku du kesan Mem û Zîna Xanî ji

kurdî wergerandine ser zimanê kurdî. Ew her du kesên hêja ku ev karê sosret kirine, yek mamosteyê gorbihîşt Hejar Mukriyanî bû û yê dî jî hêja M. Emîn Bozarslan e.

Pêş wê hindê da ku ez dakevim kûraniya vê rexneyê, ez pêdivî dibînim ku li ser peyva wergeran yan wergerandinê rawestim. Wergeran an wergerandin ku di hindek devokên kurdî de jê re çerxkirin, zivirandin û paçvekirin jî dibêjin, ew e ku mirov babetekê yan gotinekê ji zimanekî bîne yan wergerîne ser zimanekî dî, da ku axêverên zimanê duyem ji wê babetê yan gotinê têbigihîjin. Lê kesî ta niha nebihîstiyê û bi lêv jî nekiriye ku mirov gotinekê ji zimanekî bo heman zimanî bi xwe wergerîne. Ji vî karî re şîrovekirin û ronkirnewe tê gotin, ku ew jî bi xwe xwedanê destûr, rê û rêbazên taybetî ye.

Mamoste Hejar Mem û Zîna Xanî ji zaravayê kurmançiya bakur zivirandiye ser zaravayê kurmançiya başûr (ji vî zaravayî re soranî jî tê gotin). Wî Mem û Zîn bi şeweyeke serbest wergerandiye. Çawan ku çarîneyên

Xeyamê Nîşabûrî jî bi wî şêweyî ji zimanê farisî wergerandine ser zaravayê kurmanciya başûr. Şêweya serbestwergeranê ew e ku wergêr bi dû peyvan nakeve û ne di xema wergerana peyvan de ye, ew tenê kakilê gotinê ji zimanekî bo zimanê dî werdigêrîne. Ev şêwe, delîve û şiyannê dide wergêrî/ê, ku di karê xwe de serketî be. Her çend ku Mamoste Hejar bi wêcwergerandin ji vê şêweyê di wergerana Mem û Zîna Xanî de ser ketiye jî, lê ew kar di dema xwe de, ji layê gelek torevan û nivîskaran ve bi tundî hatiye rexne kirin û wek karekî sosret hatiye ragihandin. Lê Mamoste Hejar digot "Min Mem û Zîn ji zaravayekî bo zaravayê dî wergerand, da ku ew kesên ku zaravayê kurmanciya bakur baş tê nagihin, bikarin bi alîkariya wê wergeranê wêc û mifayê ji bîr û hizirên Xanî vegirin."

Xwezî mamoste Hejar an jî yekî wek muftiyê Qamişlokê şîroveyeke wek şîroveya dîwana Melayê Cizîrî li ser Mem û Zînê jî bikira.

Her çend ku mamoste Hejar Mem û Zîn di asteke huneriyê ya bilind de wergerandiye û di bara zimanê de jî wisan zengîn e ku mirov di seranserî wê wergeranê de kêman rastî şaşiya peyvek biyanî

tê. Lê dîsan jî her wekî hate gotin, karê wî karekî sosret û ne asayî hate ragihandin.

Bi dû mamoste Hejar re hêja M. Emîn Bozarslan kete hizira wergerandina Mem û Zîna Xanî. Wî berevajiyê Mamoste Hejarî Mem û Zîn ji zaravayekî bo zaravayê dî na, belkî ji zaravayekî bo heman wî zaravayî bi xwe wergerandiye. Karê M. Emîn Bozarslan hê ji karê mamoste Hejar jî sosretir bû. M. Emîn Bozarslan ji kurmancî bo kurmancî û bi wêcwergerandin ji şêweya peyv bi peyv xwestiye wê şahkara delal û navdar, ne ku bi pexşan, belkî bi helbest wergerîne. Lê bi dax û kesrên giran ve, neşiyaye bi serbilindî ji bin wî barê giran rabe.

Ez bi xwe karê van her du hêjayan jî çewt dizanim. Di cîhanê de gelek nimûneyên zindî û navdar ji toreya klasîk hene, ku naveroka wan diqewime gelek ji ya Mem û Zîna Xanî taybetîtir û diwartir be jî, lê kesî ta roja îro ew tomîka ku van her du hêjayan anîne serê vê şahkara me ya toreyî, neînane serê wan nimûneyên toreya xwe. Em gelekî dûr neçin. Ji bo nimûne bi dehan pirtûkên farisî yê klasîk hene, ku naveroka wan eger ji ya Mem û Zînê diwartir jî nebe, ne sanahîtir e. Û layê kêman şeş sed-heft sed salan berî Mem û Zîna Xanî jî hatine afirandin. Lê ta niha çî torevan û nivîskarekî/ê Îranî yan farsîzanekî/ê di nav wê deryaya torevanan de, ew

karê çewt û sosret nekirine. Kes ta niha ranebûye ku ji bo nimûne Şahname-ya Firdewsiyê Tûsî, Gulistana Seîdiyê Şîrazî, Dîwana Hafîzê Şîrazî, Pênc Gencên Nizamiyê Gencewî, dîwana Nasir Xosrewê Qubadiyanî, dîwana Xaqaniyê Şerwanî, Gulşenê Raza Şebisterî û bi dehan nimûneyên dî ji farisî wergerîne ser zimanê farisî. Lê ta niha bi dehan û belkî bi sedan gotar, vekolîn û şîrovekirinên hêja li ser wan babetan hatine weşandin û ta niha jî her ew kar domdike û ew babat her nû mane.



Ji karên van her du hêjayan, -her çend ku karên her duyan jî di binêşê de çewt e-karê Mamoste Hejar di bara ramiyari de û di bara ji hev cudakirin û ji hev veqetandina her du zaravayên serekî yê zimanê kurdî de karekî pir bivedar û bi nerînê bû. Mamoste Hejar bi wê wergêranê rasterast ragihand ku zimanê kurdî zimanek tenê nîn e û belkî çend ziman bi navê zimanê kurdî hene ku xelkê Kurdistanê û axêverên van zimanan ne tenê ji axiftinê hev tê nagihîjin, belkî toreyê hev a nivîskî jî fehm nakin. Wate mamoste Hejar bi vî karî av berda aşê neyarên kurd û Kurdistanê û ew bîra çewt û dijminan e, selimand. Ew bîra ku dibêje "Kurd netewekeye tekûz û bi serê xwe nîn e û her hoz û xêlek bi hindêk devokên zimanên farisî, tirkî yan erebî diaxivin û hindêk jî peyvên navçeyî yê gelên mirî û jinavçûyî yê Rojhilat Navîn di axaftinê xwe de bi kar tînin."

Lê mirov dikare sererayî van hemû rexneyan karê Hejar di bara toreyî û hunerî de binirxîne. Ji bilî zimanê rewan û xweşik ê mamoste Hejar û kêmbûna peyvên biyanî di wê wergêranê de, tiştê ku di bara hunerî de sere-tiyê dide karê Hejar, agahdariya wî ji rê û rêbazên helbesta klasîk e. Bi dîtina min di wergêrana helbestan de, du tişt pir girîng in. Yek li berçavgirtina zimanê hunerî ye helbesta binêşeyî, ya duyem jî di wergeranê de raçavkirina

kêşa binêşeyî -bi taybet di helbestên klasîk de- û bikarbirina wê kêşê. Mamoste Hejar hem zimanê helbestê û hem jî kêşa helbesta Mem û Zîna Xanî raçav kirine.

Mem û Zîna Xanî li ser kêşa erûzî û li ser paya (rukna) mefûlo, mefaîlon, feiûlon hatiye danan:

*Sernameyê name namê
Ellah*

*Bêy namê te natemame
Wellah*

Ew kêş, bi durûşman ji layê çepê bo layê rastê wiha tê nîşandan:

-- U / U - U - / U --

Ji bo wê hindê ku em bizanin mamoste Hejar ew kêş çawan li ber çav girtiye, ez ê lêre de nimûneyekê ji karê Hejar bînin:

Zorzanî û bîr û wêjewanî

Parçêke bira be bejnî Xanî

Ew baxî gulan û min bîjarim

*Bîr lew dekem û delêm
Hejarim*

(ji pêşekiya Mem û Zîna Hejar)

Lê muxabin, di karê hêja M. Emîn Bozarslan de çewtî û şaşiyên wisan binêşeyî hene ku mirov nikare çavên xwe li wan bimiçîne û bi sanahî li rex wan derbas bibe. Şaşiyên herî mezin û hegerên serkî û berbiçav ku xîmê karê wî dilerizîn û koşka kiryarên wî dihiloşîne gelek in ku ji wan ez ê lêre de sê xalên girîng destnîşan bikim ku ev xalên serekî bûne heger ji bo dîtir

çewtî û aloziyan:

1. M. E. Bozarslan ne helbestvan e û xwestiye helbestan binivîse, lê nikariye.

2. M. E. Bozarslan bi farisî nizane û biwêj û têgînên toreyî yê zimanê farisî yê ku di Mem û Zîna Xanî de hatine, baş nas nekirine.

3. Bozarslani felsefe nexwendiyê û îrfanê, bi taybet îrfana îranî nas nake û têgîn û biwêjên felsefî û îrfanî, ku xîmê Mem û Zîna li ser wan hatiye danan, baş nizane.

Em pêk ve berên xwe bide-nê, kanê çima û ji bo çi ez hêja Bozarslan wiha rexne dikim.

Her çend ku dibêjin helbestvan tiştêkî sirûştî, zatî, xwedêdayî ye û zanistek iktisabî wate destvehên nîn e, belkî tiştêkî zatî û hundiranî ye. Lê dîsan jî hindêk bi zorê têdikoşin ku xwe wek helbestvan nîşan bidin. Lê pêşiyar gotine: "Nan bo nanewayî, goşt bo goştîroşî"

Lê her helbestvanek çî nûjen û çî kevneşop, çî zatî û çî nezatî divê hindêk têgîn û biwêjên helbestan nas bike û wan di nivîsadin û axiftinê xwe de, di cih de bide xebitandin û tiştêkî ji rê û rêbaza helbest û helbestvaniyê bizanibe, paşê pê de were meydana pirarîşe û pirderdeser. Helbestvan her çend helbestvanekî/e nûjen be jî, dîsan divê bizanibe ka paşbend (qafiye) çî ye û rêz (redîf) kîjan e û kêş (wezin) çîk e. Kêşa arûzî û kêşa birgeyî (kîteyî) ji hev nas bike û bizanibe kanê muzîka di helbestê de çî ye, her wiha

bizanibe muzîka derveyî û muzîka hundiranî çawan jêk cuda dibin! Û bi dehan têtî, biwêj, rê û rêbaz û destûrên di ku înan wan lêre de dibe hegera dirêjbûna vê rexneyê.

Ev têtî û biwêjên han ku min nimûne înan, babetên herî seretayî ne ku xwendevanên xwendegehan di pileyên seretayî û navîn de digel wan nasyar dibin û her kî pê dabe nav meydana tore û hunerê û bi taybetî toreya klasik, divê baş serederiya wan bike. Dena dê bi her du piyan bikule û di karê xwe de qet bi ser nekeve. Lê mixabin em dibînin ku M.E. Bozarslan ne tenê haya wî ji wan têtî û biwêjana nîn e, belkî pîvana helbestê, di bal wî kurtî û dirêjî ye. Binêrin Mem û Zîn, wergêran M. Emîn Bozarslanî rûpela 109' an.

Her wisan M. E. Bozarslan cudatiya nîveka rêzê û paşbendê jî nizane. Wî di wergêrana xwe de rêz (redîf) û paşbend (qafîye) têkelî hev kirine û ew her du yek zaniye. Heleyên M. E. Bozarslan tenê ew nîn e ku wate û navê van têtî û biwêjan û cudatiya wan û cihê bikarbirina wan nas nake û têkel dike, belkî wî hem naveroka Mem û Zînê ya binêseyî destvedayî kiriye û hem jî gelek di cihan de ew bi çewtî çerx kiriye.

Berî wê hindê ku ez çend nimûneyan ji şaşî û çewtiyên M. E. Bozarslan bînim, pêdivî ye ku em pêk ve birekê ji pêşgotina wî li ser Mem û Zînê bixwînin:

"... Helbestên kurdî bi

piranî êdî ji nava çarçova erûzê derketine û azad tîn nivîsîn. Ji ber vî sedemî (vê sedemê) û ji bo ku mane û naveroka Mem û Zînê bi hêsanî bê dayîn, me di wergerana kurdiya xwerû de awayê azad bijart; yanî me wergerana kurdiya xwerû ji nava qalibê erûzê derxist û bi awayekî azad nivîsî. Bi vî awayî, wek ku li jor jî me da zanîn, hin malikên wergeranê kurt, hin jî dirêj hatin." (R.109, heman pirtûk)

Lê wisan nîn e, gava ku mirov wergêrana Bozarslan dixwîne, mirov dibîne ku wî di gelek cihan de naveroka helbestan li gorî çêkirina paşbendê (qafîyê) kiriye, her çend ku paşbend û rêzê jî jêk nas nake û wan jî hev venaqetîne. Wate jî bo wê hindê ku paşbendê çêbike, xwe neçar dike, hindek gotinên ku Xanî negotiye jî, li helbestê zêde bike û wê bêyî paşbend nehêle. Her wisan jî ber vê hindê naveroka wergêrana wî her wekî ew doz dike, ne tenê ji ya Xanî sanahîtir e, belkî li gelek cihan ew zor aloz kiriye jî. Ji ber vê hindê ye ku em dibînin, Bozarslan jî bo wê hindê ku xwendevan bizanibin kanê wî, ne ku Xanî çi gotiye, peyvên xwe di perawêzan de şîrove kirine.

Bozarslan her wekî li jorê min nimûne ji nivîsara wî aniye, dibêje "Min awayê azad bijart" Lê em dizanin ku di awayê azad de helbestvan hind di xema paşbendê de nîn e, ku naveroka babetê li gorî peydakirina paşbendê bike û

ji bo paşbendê şaşî û çewtiyan di cihê rastiyê de bi cih bike. Mînak Xanî dibêje:

*Şêxê wekû pence hec bijarî
Dîn kir te ji bo keça kufarî*

Bozarslan ev malik wiha wergerandiye:

*Şêxê ku pence car çû hecê
û li wir kete nava haziran
Te ew dîn kir ji bo keça
kafiran*

Em dibînin ku Bozarslan hê jî bo wê hindê ku qafiyeyê jî peyva kafiran re peyde bike, hê di ber xwe de nîvmalka yekê dirêj kiriye û bêyî wê hindê ku Xanî gotibe, dibêje "Ew li wir ket nava haziran." Em dibînin ku Xanî di vê malika helbesta xwe de ew tiştê hanê negotiye, belkî Bozarslan her li ber tengiya qafiyeyê ew lê zêde kiriye. Gelo awayê azad ê helbestan ev e?!

Xanî dibêje:

*Her wisan M. E.
Bozarslan cudatiya nîveka rêzê û paşbendê jî nizane. Wî di wergêrana xwe de rêz (redîf) û paşbend (qafîye) têkelî hev kirine û ew her du yek zaniye. Heleyên M. E. Bozarslan tenê ew nîn e ku wate û navê van têtî û biwêjan û cudatiya wan û cihê bikarbirina wan nas nake û têkel dike, belkî wî hem naveroka Mem û Zînê ya binêseyî destvedayî kiriye û hem jî çewtî çerx kiriye.*

*Tajdîn û biran ji xelkê lalî
Xwestin bi dilê xwe wan
helalî*

*Kêşane derê, bi reqs û bazî
Rexşê erebî semendê tazî*

Hêja M. E. Bozarslan van
her du malikan wiha werdige-
rîne:

*Tacdîn û birayan, ji kesên
ku cîgirtibûn li alî wan*

*Xwestin bi dilê xwe xatir û
helalî wan*

*Bi reqs û leystin kişandin
derê tewlê*

*Hespên şê yên Erebî û yên
wek Rexşê Ristemê Zalê*

(R.63, heman pirtûk)

Em dibînin lêre de jî dîsan
M. E. Bozarslan her ji bo ten-
giya qafiyeyê wateya helbestê
guhartiye û ew li gorî qafiye-
yê kiriye. Lê dîsan jî qafiyeya
helbesta wî çewt e. Lewre ku
zalê û tewlê bi hev re nabin
qafiye. Her wisan em dizanin
ku Zal bavê Rostem e. Zal
navê mêran e. Navdêrên nêr
di zimanê kurdî de, di dema
zêsta xwedanetî û peywendê
de bi tîpa "ê" natewin, belkî
navdêrên mê bi wê tîpê dite-
win. Ji bo nimûne: Ehmedê
Gulîzerê, Azadê Dilberê, Eh-
medê Hesên, û Azadê
Camêrî...

Di wê wergêranê de Zalê
wateya jinikê dide. Bozarslan
navê Rostemê Zal, pehlewane
navdar ê îranî jî çewt nivîsiye
û kiriye Ristem. Hêja Boz-
arslan xwestiye ku ji peyva
tewlê re paşbendekê peyde
bike, lê çunkî peyvek babet û
hevpaşbend nedîtiye, neçar û

bêgav maye ku Zalê Zer bavê
Rostem û kurê Samê Nerî-
man, pehlewane navdar ê
îranî bike pîrejinekê.

Kesê ku helbestan dinivîse
û hinde di xema paşbendê de
ye, divê bizanibe ku di pileya
yekê de; Zalê di gel tewlê
nabe paşbend. Zalê di gel
malê, halê, salê û hwd. dibe
paşbend. Her wisan Zal navê
mêran e û navên mêran û bi
gotineke dî navdêrên nêr li
rewşa ku me dabaşa wê kir, bi
tîpa "ê"yê natewe.

Eger em ew tiştên ku
Bozarslan bi navê helbesta
azad û nûjen nivîsiye, bipeji-
rînin, hingê em dikarin bibêji-
nê "Eger te helbesta nûjen û
azad û ne arûzî nivîsiye, ev çi
ye ku tu hind li dû paşbendê
ketiyî û te ev hemû peyvên
kurdî ji binêşe û wateya wan
dûr kirine, te nêr û mê lêk
guheriye, her tenê ji bo wê
hindê ku tu paşbendekê peyde
bikî? Eger te xwestiye tu hel-
besta klasîk binivîsî, te ji bo
kêş (wezn), paşbend (qafiye)
û rêz (redîf) di cih de bi kar
nebirine?"

Hêja M. E. Bozarslan doza
wê hindê kiriye ku Mem û
Zîna Xanî, bi kurdiya xwerû
wergelandiye. Ez ê çend
nimûneyên biçûk ji wergeran-
dina wî binim, kanê kurdiya
xwerû li bal wî çi kurdiyek e?
Xanî dibêje:

*Textê wî Cizîr û bext
mes`ûd*

*Talî`qewî û meqam meh-
mûd*

*E`ql û huner û sexa û mey-
dan*

*"Eger te helbesta
nûjen û azad û ne arûzî
nivîsiye, ev çi ye ku tu
hind li dû paşbendê
ketiyî û te ev hemû pey-
vên kurdî ji binêşe û
wateya wan dûr kirine,
te nêr û mê lêk guheriye,
her tenê ji bo wê hindê
ku tu paşbendekê peyde
bikî? Eger te xwestiye tu
helbesta klasîk binivîsî,
te ji bo kêş (wezn), paş-
bend (qafiye) û rêz
(redîf) di cih de bi kar
nebirine?"*

*Zebt û neseq û nizam û
dîwan*

Em jê vegerin ku Bozar-
slan di van malikana de li cihê
bext nivîsiye bextê, di cihê
meqam de nivîsiye me-qamî,
di cihê e`ql de nivîsiye aq`l û
di cihê nizam de nivîsiye
nîzam. Lê em bibînin kanê wî
çawan ew her du malik kirine
kurdiya xwerû?!

*Textê wî li Cizîrê bû, bextê
wî jê re yar*

*Talîê wî xurt û zexim bû,
meqamê wî bilind û diyar*

*Aqil û huner û şerkarî û
ciwamêrî*

*Dîsîplîn û tîkûzî û dûzen û
kargêrî*

Em nizanin ka kengê ev
peyvên talî, zexim (zexîm),
meqam, dîsîplîn û dûzen bûne
kurdî, ew jî kurdiya xwerû?!

Min ew çend nimûneyên
hanê ji pêşgotina ku M. E.
Bozarslan li ser Mem û Zînê
nivîsiye, wergirtine, niha pê-

divî ye em pêk ve awirekî bidin Mem û Zîna wî. Ji bo vî karî ez ê her tenê her du bendên seretayî yên Mem û Zînê hilbijêrim. Ev her du bend ji 93 malikan pêk hatine. Ez ê wan her du bendan di sê bareyan de bidim ber hûrbîna rexneyê û daweriyê jî, ji bo xwendewanên hêja bihêlim.

a. Şaşiyên helbestvaniyê.

b. Desttêwerdana di Mem û Zîna Xanî de

c. Şaşiyên wergeranê û têgihîştinê

A. Şaşiyên helbestvaniyê:

Hêja M. E. Bozarşan, her wekî me di pêş de jî got, di pişka zore malikên xwe de rêz û paşbendê jêk nanase û wan tevî hev dike. Mînak di yekimîn malikê de:

Sernivîsara pirtûkê navê Xwedê

Bê navê wî ew nivçe ye bi Xwedê

Di vê malikê de M. Emîn Bozarşan peyvên *navê Xwedê* û bi *Xwedê* pêk ve kiriye paşbend ku çewt e. Di vê malkê de her du peyvên *Xwedê* rêz wate redîf in û navê û bi jî pêk ve paşbendê çênakin.

Di malika 2'an de peyvên *kir û rû* de bi peyvên di *rû* de, bûne paşbend, ku çewt e.

Di malika 3'an de peyvên *nameya evîne* û *qelega evîne* pêk ve bûne paşbend, ku çewt e.

Di malika 5'an de peyvên *hozanan navê* te ye û *dîsa navê* te ye, pêk ve bûne paşbend, ku çewt e.

Di malika 7'an de peyvên *xwedîdilan* û *xwe ve dilan* pêk ve bûne paşbend,

Di malika 9'an de peyvên *tê dîtin* û *tê xwestin* pêk ve,

Di malka 13'an de peyvên *xûyayî* û *heyî* pêk ve,

Di malka 15'an de peyvên *fermana* te û *wê fermana* te pêk ve,

Di malika 23'an de peyvên *nediyar* û *diyar*, pêk ve,

Di malka 26'an de peyvên *gewre* û *bilind* û *qedirbilind*, pêk ve,

Di malika 28'an de peyvên *unsuran* û *cewheran*, pêk ve,

Di malika 29'an de peyvên *giranbûha* û *wiha*, pêk ve,

Di malika 33'an de peyvên *ronî ye* û *deniye* pêkve,

Di malika 36'an de peyvên *xwe, te* û *şikrê te*, û di malika 39'an de peyvên *tim hebe* û *tune nabe* û *heye* û *tune nabe* di gel hev bûne paşbend.

Bi giştî di malkên 42, 51, 52, 54, 56, 66, 67, 69, 71, 73, 78, 82, 84 û 85'an de berêkê de ev peyv bi hev re bûne paşbend ku hemû jî li gorî destûra arûz û qafiyeyê çewt in. Ew peyv berêkê de ev in: *heyî ye* û *ronayî ye*, *xûyang e* û *veşarg e*, *hebûnek* û *xûyabûnek*, *tune çu cî* û *kirine cî*, *xêza yaran* û *xîretê neyaran*, *bi şewqî* û *şewqî*, *dilkêş* û *derdkêş*, *pêşberî hev* û *hevberî hev*, *girt* û *vegirt*, *ser avê* û *avê*, *daxwazî* û *bixwazî*, *nebiribû secde* û *birin secde*, *bi dizî* û *pîrozî*, *cinayetkar* û *qencîkar*....

Em dibînin ku ji 93 paşbendan 29 paşbend hê di xîm

de çewt in. Ji 64 paşbendên mayî jî 19 paşbend ên Xanî bi xwe ne, ku Bozarşan ew îname. Ji yên mayî jî di 16 paşbendan de wate û naveroka binêşeyî li gorî paşbendê kiriye. Ango ji bo wê hindê ku paşbendekê bîne, neçar maye gotinekê bike ku Xanî negotiye. Bi vê hejmarê em dibînin ku ji 93 paşbendan tenê 29 paşbend durist in ku ew jî pişka zorê wan paşbendan, paşbenda şayîgan e, ku ew paşbenda li bal hostayên helbesta klasîk ne tenê huner nîn e, belkî kêmasiya helbestvan tene jimarê.

B. Desttêwerdana di Mem û Zîna Xanî de

Xanî di yekemîn malika Mem û Zînê de dibêje:

Sernameyê name namê Ellah

Bêy namê te natemame wellah

Lê Hêja Bozarşan ew malik wiha nivîsiye:

Sernameê name namê Ellah

Bê namê *wî* natemame wellah

Em dibînin ku hêja M. E. Bozarşan di cîhê *nameyê* de *nameê* nivîsiye. Mîrov hê bi vê yekemîn peyvê re dizane ku ew îzafeya farîsî nas nake û her wisan wî di cîhê peyva *te* de peyva *wî* daniye.

Lêre de du xalên girîng hene ku Bozarşan raçav nekîrine. Yek ew e ku ev benda helbestê munacat wate gaze ye. Xanî bi *Xwedayê* xwe re xeber dide û dibêje: *Xwedayo*

bêyî navê te pirtûka min yê nivîşkan bimîne. Xala duyem ew e ku eger em di cihê peyva *te* de, peyva wî bipejirînin, kêşa wê malikê hindekê aloz dibe. Her wisan gava ku mirov dêhna xwe dide malkên din ên vê bendê jî, mirov dibîne ku Xanî di wan de jî ji bîst carî zêdetir ji peyvên *te* û *tu* wêc wergirtiye. Ev jî serpelgeyek dî ye ku diselimîne Xanî digel Xwdayê xwe axiftiye û gazî wî kiriye. Lê hêja Bozarşan karekî baş kiriye ku di perawêzê de, nimûne ji çapên din jî înayê û ragihan-diye ku di dîtir çapan de li cihê peyva *wî* peyva *te* hatiye.

Di malika 5'an de peyva *şahbeyt* bûye *şahbeyt* ku hele ye. Di zimanê farisî de peyva şah dikeve pêş hindek navan û wateya mezinayê û seratiyê didê. Wekî şahbal, şahkar, şahper, şahbaz... Dîsan di heman malikê de hêja Bozarşan peyva *fêhrist* kiriye *fihrist* ku çewt e.

Di malika 8'an de peyva erebî ya *meî şûq* kiriye *maşûq*, ku çewt e. Di kîjan nusxeya Mem û Zîna Xanî de ev peyv wisan hatiye nivîsandin? Eger hêja Bozarşan bibêje ku di ber nebûna tîpa "e'yn" a erebî di rênivîsa kurdî ya latînî de ew neçar maye ku di cihê eynê de ji tîpa "a"yê wêcê wergire, durist nîn e, lewre ku wî di gelek cihên dî de tîpa e'yn a erebî bi danana durûsmekê li jor dengdêrên weke (a, î, i, ...) nîşan daye. Pêdivî bû ku van cure peyvan jî wek binêşeya wan li ber çav bigirta.

Dîsan di heman wê malikê de peyva *lêyk* bûye *lêk*. *Lêyk*, kurtkirina peyva erebî ya lakin e, ku di helbestan de zortir bi şeweya *lêyk* tê. Lê peyva *lêk* di kurdî de bi wateya çilm û gilêzê ye.

Di malika 9'an de peyva murad bûye mirad, ku çewt e.

Di malika 11'an de peyva ne *eyan* bûye ji *eyan*. Xanî dibêje: *Şemsî ne eyan*, tu *perdedarî*. Lê hêja Bozarşan dinivîse: *Şemsî ji eyan tu perdedarî*, ku hele ye û wateya malikê diguhire. Ez ê di pişka şaşiyên wergêranê de li ser vê çewtiyê rawestim.

Di malika 14'an de peyva *medare* bûye *midare* ku çewt e.

Dîsan heman wê madikê de *peyvên xelq welemr*, bûne *xelq û welemr* ku hem di bara wateyê de çewt e û hem jî kêşa helbestê aloz dike. Ez ê di pişka şaşiyên wergêranê de li ser van her du peyvan rawestim.

Di malika 17'an de peyva *heqîqeten*, bûye *heqîqeta* ku çewt e. Ez ê di pişka çewtiyên wergêranê de li ser rawestim.

Di malika 21'an de peyva *me'înî*, bûye *mane* ku çewt e.

Di malika 27'an de peyvên *kargeh* û *bargeh* bûne *garegeh* û *baregeh* ku çewt in.

Di malika 29'an de peyva *nêîmet* yan *ni`met* bûye *nîmet*

Di malika 32'an de peyva *burdibar* bûye *ber de bar*; Hêja Bozarşan ji wateya peyvê têngiheştiye û ew weke li ber barî yan di ber barî wergerandiye.

Di malika 35'an de peyva *sukr* bûye *şikr*

Di malika 36'an de peyva *nihne* bûye *nehin*.

Di malika 41'an de peyva *mulk* bûye *milk*

Di malika 43'an de peyva *nikûkar* bûye *nikûkar*. Rast e ku peyvên *nikûkar* û *nikûkar* her duk her yek peyv in û *nikûkar* kurtkiriya *nikûkar* e. Lê di vê helbestê de eger em di cihê peyva *nikûkar* de peyva *nîkûkar* binivîsin, kêşa helbestê aloz dibe.

Di malika 47'an de peyva *meiden* bûye *maden*.

Di malika 58'an de peyva ji *reşkê* bûye ji *rengê*, ku ez ê di pişka şaşiyên wergêranê de jî li ser rawestim.

Di malika 62'an de peyva *mêhr* bûye *mîhr*.

Di malika 65'an de peyva *bulbul* bûye *bilbil*. Durust e ku *bilbil* û *bulbul* her du bi yek wateyê ne û *bilbil* kurdîtir e ta ku *bulbul*. Lê Xanî di vê malikê de, di nîveka peyvên sorgul û *bulbul* de paşbend çêkiriye, lewre ez dibêjim ku *bilbil* di vê malikê de çewt e.

Di malika 69'an de peyvên *aya te ne çêkirin* bûne *aya ne te çêkirin* ku bi şeweya dûyê wate û ango ya malikê tê guhirin.

Di malika 79'an de peyva *zetal* bûye *dadal*. Tîpa zad a erebî di zimanên kurdî û farisî de weke tîpa "z" tê bilêvkirin. Her çend ku Celadet Berixan jî di hemberî wê tîpê de tîpa "d" ya kurdî daniye, lê kurd û faris wê tîpê her wekî

"z" bi kar tînin. Ji bo nimûne kurd dibêjin meha remezanê, razî û hwd... Lê di hindêk navçeyên Kurdistanê de bi taybet di rojava û başûrê rojavaya welêt de wê tîpê "d" rabêj dikin. Lê Bozarşan ji wê destûrê jî derketiye û li cihê ku binivîse zelal nivîsiye dalal.

Her wisan di dîtir malikên vê bendê de peyvên *meilûm* û *meibûd* bûne *malûm* û *mabûd*, û di zor cihan de tîpa erebî ya e'yn yan bûye "a" yan jî bûye "î".

Di malika 93 an de peyva *aşîna* bûye *aşîna*...

C. Şaşiyên wergeran û têgi-hîştinê

Em bizanin kanê hêja M. E. Bozarşan çawan ji Xanî têgiheştiye û helbestên wê çawan wergerandine. Xanî dibêje:

Me îşûq tuy î bi fexir û nazi
Aşiq tuy î lêyki bê nîyazi

Em hemû dizanin ku peyva niyaz peyvek arî ye û kurd jî wê peyvê bi kar tînin. Çawan ku di peyvên hevbend de (murekeb) pêşniyaz û niyazmend de em wê peyvê dibînin. Bêniyaz wate bêhewce, kesê ku hewcedar nîn e, kesê ku niyazmend nîn e. Lê Bozarşan peyva bêniyaz kiriye nelavakar. Nelavakar, wate kesê ku lavayîyan nake. Lavayî û niyaz gelekî ji hev dûr in û qet çu tîkiliyên wan yê wateyê jî bi hev re tune ye. Xanî dibêje:

Mutleq tu mufîd û mustefadî

Bê şubhe murîd û hem muradî

Her du peyvên murîd û murad (her çend ku hêja Bozarşan di cihê murad de mirad nivîsiye) ji bilî wateyên ku Bozarşan danê, wateyên serekiyên di jî hene ku bi dîtina min mebesta Xanî ji wan her du peyvên têgînên felsefî û sofîtiyê bûye. Ev her du peyv, di sofîti û felsefeyê de van wateyan didin: Murad, wate, şêx, rêveber, pîr, daxwaza murîdan. Murîd jî wate ew kesê ku li dû muradî diçe û ji wî fermanberiyê dike, terîqetê ji wî fêr dibe.

Xanî dibêje :

Şemi î ne ji qismê nûr û narî
Şemsî ne eyan, tu perdedarî

Lê Bozarşan wiha dinivîse:
Şem î ne ji qismê nûr û narî

Şems î ji eyan tu perdedarî.

Û ewê wiha jî werdigerîne:

Find î tu, lê belê tu ne ji cebeba ronayiyê û agirî

Roj î tu, lê ji ber xuyabûnê tu di perdeyan de veşirî
(R.123)

Di pileya yekê de em dibînin ku hêja Bozarşan hê ji bo wê hindê ku paşbendekê ji peyva *agirî* re peyde bike, *veşartî* kiriye *veşirî*. Kêm kurd dibêjin tu *veşirî*, belkî dibêjin tu hatî *veşartin*, yan te xwe *veşart*.

Eger em carek di nîvmalka duyê ya hêja Bozarşan bixwînin û lê hûr bibin, em ê bibînin ku ew çu wateyê nade: "*rojî tu, lê di ber xûya-*

bûnê tu di perdeyan de veşirî." Mirov yan jî Xwedê çawa di ber xuyabûnê di perdeyan de *veşartî* dimîne?

Di pileya duyem de her wekî min li jorê jî nivîsî Xanî gotiye: *Şemsî ne eyan tu perdedarî* ; wate Xwedayo her çend ku tu wekî rojê yî, - hebûna te wekî hebûna rojê ronahî ye- lê tu li pişt perdeyan î. Wate her çend ku tu heyî, lê tu nayê xûyan. Kesek te nabîne. Lêre de Xanî vê hizira ayînî radigihîne ku her çend hebûna Xwedê wekî rojê ron û aşkera ye, lê kes nikare wî bi çav bibîne.

Xanî di malika 14'an de dibêje:

Hemîyan bi teye medare û debr

Feyyazê rîyazê xelq welemr

Lê her wekî li jorê jî min got, M. E. Bozarşan wê malkê wiha dinivîse:

Hem`yan bi te ye midare û debr

Feyyazê rîyazê xelq û we`lemr

Di pileya yekê de hem`yan nîn e, belkî hemûyan e, midar nîn e medar e, xelq û we`l-emr nîn e, xelq welemr e. "We" yan "ve"ya erebî her "û"ya kurdî ye. Kê du caran "û" yê li dû hev tî-ne, da ku Xanî jî bîne? Xelq welemr wate xelq û emr, xelq û welemr wate xelq û emr. Lê em bizanin kanê Bozarşan vê malikê çawan werdigerîne û çu wateyê dide van her du peyvên felsefî?

Bi te ye abûrî û kargêriya wan hemûyan

Ey ê ku dide baxçê afirandinê, feyz û ferman (r.123)

Her du peyvên xelq û emr lêre de wateya afirandin û fermanê nadin. Ev her du peyv peyvên felsefî ne. Xelq bi wateya cîhana cismanî û zevînî, emr wateya bi cîhana ruhanî û asimanî ye. Xanî bi xwe wateya van her du peyvên di malikên 17-25'an de bi ronahî radigihîne. Ku mi-xabin Bozarşan wan he-mûyan jî bi çewtî bi wateya a-firandin û fermanê werdigerîne. Kakila gotina Xanî di wan malikan de ew e ku mi-rov hem ji cîhana asimanî, hem jî ji cîhana zevînî, hem ji nûrê hem jî ji axê, hem ji ronahiyê û hem jî ji tarîtiyê, hem ji cîhana lahûtî û hem jî ji ya nasûtî hatiye afirandin.

Xanî dibêje:

Ew herf heqîqeten muheqeq

Hem emre bi qudreta te hem xelq

Lê hêja Bozarşan wiha nivîsiye:

Ew herfe heqîqeta muheqeq

Hem emr e bi qudreta te hem xelq

Û wiha jî wergerandiye:

Ew tîpe rastiya bêguman a hemin

Hem ferman e bi qudreta te hem jî afirandin.

Erê bi rastî ku derê vê gotinê kurdiya xwerû ye? (Ew

tîpe rastiya bêguman a hemin)

Heqîqetên wate bi rastî. Muheqeq jî wate durist û binecîbûyî. Xanî dibêje, Xwedaya bi rastî ku hatiye binecîkirin ku mirov bi şîyan û karîn û tiwanista te ji du layenên dijî hev û din wate ronahî û tarîtiyê, nûr û axê, leş û can... pêk hatiye. Lê gava ku mirov wergêrana hêja Bozarşan dixwîne, mirov çu tiştê jê fêhm nake. Her wisan wekî tê dîtin, Bozarşan di wergêrana xwe de jî heman peyva qudret a erebî înyayê ku di zimanê kurdî de ta cihê ke ez dizanim, sê peyv dikarin di cihê wê de rûnên ku min li jorê înyayê. Ev e wateya kurdiya xwerû ku hêja Bozarşan doza wê dike.

Her wekî hate gotin, M. E. Bozarşan wateya van cure peyvên felsefî û îrfanî nizanîye û vê hindê lêdaye karê wî veresandiye û zehmeta wî ya çend salan daye bayê.

Xanî dibêje:

Bîlcumle ji bo me re bi (li) karin

Fîlcumle ji bo me burbarin

Hêja Bozarşan peyva fari-sî ya burdbar kiriye (ber di bar) û wiha wergerandiye:

Bi giştî jibo me re di kar de ne:

Û hemî pêkve jibo me di binê bar dan

Lê wateya peyva burdbar di binê bar de nîn e, burdbar wate bêhnfireh.

Bozarşan malika 58'î wiha dinivîse:

Şîrîn te kire şeker li Perwîz Ferhad ji rengê eşkê xûnrîz

Lê em dibînin ku wisan nîn e. Di nîvmalka yekem de peyva şeker, çewt e û rastiya wê Şeker e. Di nîvmalka duyem de jî rengê nîn e û ji reşkê ye. Ji rengê eşkê xwîn-rîz wate: xwînê ji rengê hêsiran dirêje, ne ku hêsiran ji rengê xwînê. Xwîn ji rengê hêsiran rêtin çu wateyê dide vê malikê?

Xanî wiha gotiye.

Şîrîn te kire Şeker li Perwîz Ferhad ji reşkê eşkê xwîn-rîz

Xanî di vê malika helbestê de ji ciwankariyên toreyî yên wek telmîh, cinas, tenasub, muraatunnezîr û îlamê wêc wergitiye. Em bizanin kanê min çu re nivîsî ku şeker di wê malikê de çewt e û rastiya wê Şeker e. Ma cudatiya şeker û Şekerê çu ye?

Gorekî jêderên mêjûyî û toreyî em dizanin ku navê jina herî mezin û xoşdivî û berdilka Xosrew Perwîzê Sasanî Şeker bûye, Şeker sertaca hemû jinên wî bûye. Lê Xosrew Perwîz Şîrîn keçika ermenî di ser wê re girtiye. (binêrin Xosrew û Şîrîn ya Nizamiyê Genceyî) Peyva Şeker di vê malikê de îham e. Mirov di cara pêşîn de wê dizane ku mebesta Xanî jî vê peyvê qend û şeker û şîrînayî ye, lê gava ku mirov lê kûr dibe, ji mirovî re aşkera dibe ku mebesta Xanî çu ye.

Xanî dibêje: Xwedaya tu ew Xweda yî ku te Şîrîna

ermenî li ber çavên Xosrew Perwîz Şahê Îranê wekî şahbanî Şeker xanimê xoşewîst û wekî qend û şeker jî şîrîn kir. Û Ferhad ji reşkê eşkê xûnrîz) te wisan kir ku Ferhad ku evîndarê rastîn ê Şîrînê bû, ji kerb û hesretan (reşk=hesed) hêsrên xwînîn birijîne, wate xwîn bigirî.

Lê Bozarslan hem helbesta binêşeyî bi çewtî nivîsiye û hem jî ew çewt çerx kiriye.

Xanî di malika 64'an de dibêje:

Sorgul te kirin ji xar (ê) peyda

Bilbil te kirin hezar (ê) seyda

Lê Bozarslan vê malikê wiha werdigerîne:

Tuyî ku te ji nava strîyan peyda kirin sorgul

Tu yî ku te hezar qat gêj û bêhiş kirin bilbil

Lêre de em dibînin ku Bozarslan wateya peyva hezarê nezaniye. Eger Bozarslan kûşkê xwe biêşanda û li perawêza Mem û Zîna çapa Ormiyê ku li ber destên wî bûye, mêze bikira yan farisî bizaniya û li ferhengeke farisî mêze bikira, dê bizaniya ku mebesta Xanî ji peyva hezarê çî ye. Hezar navekî bilbilê ye ku hezardestan jî dibêjinê. Gorekî bîr û hizira gelêrî bilbil dikare bi hezar awayî dengên xweş derîne, lewre jê re hezar yan hezardestan gotine.

Xanî dibêje Xwedêyo tu ew Xweda yî ku tu sorgulê - wê gula ciwan û xweşik û

nerm û nol- ji dirikan, -ji dirikên hişk û tûj- diafirînî û bilbil ew baldara biçûk te bi evîndarî û bi dana hezar cure dengên di cîhanê de bi nav û bang kiriye.

Mixabin ev pirtûka delal mişt e ji çewtiyên wiha yên toreyî. Eger em rûnên û wan cure çewtiyan wiha rêz bikin, pêdivî ye ku pirtûkeke serbixwe bête nivîsandin.

Ev tenê mewîjek ji kewîjê bû. Di seranserê wergêrana wê pirtûkê de em rastî van cure şaşiyên tîn.

Bi giştî gava ku mirov bi hûrgilî li karê Bozarslan dinihêre û mirov wê di gel dîtir berhemên toreyî dide ber hev û hildisengîne, mirov dibîne ku wergêrana M. E. Bozarslan nakeve nav çu pîvanê. Ew tiştên ku wî nivîsîne ne pexşan e, ne pirtûkên toreyî ne, ne helbesta klasîk e û ne jî helbesta nûjen e. Lewre ku her yek ji van babetên ku me gotin, xwedanê pîvane û destûrên taybetî ne.

Di pexşanê de cihê navdêr, kirar, bireser, lêkarê (lêkerê), cînavk, rewşnav (sifet) û hwd. belî ye û pîvaneya ristesaziyê di her zimanekî de weke destûreke giştî ye û her axêver an nivîskar û helbestvan divê ji wê destûrê fermanberiyê bike. Em dibînin ku di wê wergêranê de ew destûr û pîvaneya ristesaziyê li ber çavan nakeve. Wate ew wergêran, ne pexşan e. Ew wergêran ne helbestên klasîk in jî, lewre ku ji pîvaneya wan derketine.

Ne helbestên nû û pirtûkên toreyî ne jî, lew re ku ji zimanekî toreyî û darêjtineke hunerî bêpar û pişk in.

Xwezî M. E. Bozarslan ev kar nekira û her li ser karê xwe yê binşeyî xizmeta xwe bidomanda. Ez niha jî çîroka wî ya bi navê Meyro digel vî karê wî naguherim.

Diyar e bi nivîsandina vê rexneyê min nexwestiye ku ez sivikatiyê bi hêja M. E. Bozarslan û her wisan sivikatiyê li gorbihîşt Mamoste Hejar bikim. Ji bo her kurdekî xûya û aşkera ye ku van her du hêjayan giştî jiyana xwe di riya gel û welatê xwe de bext kirine û bi dehan babetên hêja pêşkêşî gel û welatê xwe kirine. Nivîsandina vê rexneyê çu tiştî ji pile û payeya wan kêmanake.

Dîsan jî rêz û hurmetên min ji bo wan xebatkarên newest û berxwedar re heye û ez dilovaniya Xwedê ji giyanê pak ê Mamoste Hejar re û temenekî dirêj û pirdestvehat û ked jî ji hêja M. E. Bozarslan re dixwazim.

Cavkanî

1. Mem û Zîna Xanî wergêrana M. E. Bozarslan
2. Mem û Zîna Xanî Wergêran Mamoste Hejar
3. Mem û Zîna Xanî çapa Or-miyê
4. Pênc Gencên Nizamiyê Gencewî
5. Ferhenga farisî ya Dr. M. Mu`în
6. Bedî û Êrûz û Qafiye ji bo xwendevnên pîla şeşem ya kutayiyê.

MELA EHMEDÊ XASÎ

Kirmanckî/zazakî/kirdkî/dimilkî tewr ver çi çax nusîyayo? Kamî verêcû nuştî? Çi nuştî? No behs de, çiqas materyali, çiqas çimeyî estê?..

Hem nê behsî di/de him zî kirmanckî çi ya, çi nîya? Na meselaye ser a gelek wext o muneqşeyî benê... (Aver di ke quwetê mi bibo ez wazena no behsê "kirmanckî çi ya çi nîya" ser a sewbîna wext vinda...)

Nuştox, cigêrayox M. Sîraç Bîlgînî û sewbîna nuştoxan gore: "kirmanckî, tewr ver kitabê Zerduşt Pêxemberî Avesta di/de nusîyayo. Nê kitabî di en tay se ra şeştî çekuy/kelîmey kirmanckî yê û esasê kitabî Kurdkî yo û 'eslê Zerduşt Pêxemberî zî Kurd o (Winasî yew îddîa Dr. Kamuran A. Bedîrxan zî keno. Bewnî; Hawar, Huma-re 26. "Zerdeşt û Rêya Zerdeşt." Çime: Kutlay, Nacî, Kürtler Weşanê Pêrî 2002, r. 139)

Eyla çîyo ki/ke ma (ez) ewro zana, mîladî ra pey 1856 di nuştox û cigêrayoxê ûrisan, Lerchî, tewr ver metînî kirmanckî nuştî. Ti ra pey zî Mela Ehmedê Xasî û Êsman Efendîyo Babijî serra 1903 di bi nameyê "Mewlûdê Nebî" dînî rnetînî nuştî. Înan ra pey/dima zî serranê 70'yan di mana modernî di nuştox, cigêrayox M. Malmîsanijî nuş-

teyê kirmanckî nuştê û hîna zî Kovara Vate û sewbîna cayan di nuseno.

Çi heyf ki/ke Mela Ehmedê Xasî ser a zaf çimeyî, materyalî ma dest di çin ê.

Çîyo ki ma zanî û ma xo bi dê resna cêr a yê: ⁽¹⁾

(1)"Ehmedê Xasî (1863-1951): 1863 di/de Hezan di marda/maya xo ra bîyo. Hezan, ewro yew nahîyeya Licê ya (Savat) ki tê de zarava kirmanckî qalî/qesey beno. Kalkê Ehmedê Xasî, dormarê-yê/çorşmeyê Bîngolî ra ameybî Hezan. Nameyê ey bi xo Ehmed o. Semedo ki nameyê babê (eşîra) ey Xas bîyo, ey ra vajiyayo "Ehmedê Xasî." Pîyê ey "Mela Hesên" o.

Ehmedê Xasîyî medreseyan di wend. Erebkî, farskî û tirkî zî zanaynî. Îcazeyê xo Muftîyê Dîyarbe-kirî "Hacî Îbrahîm Efendî" ra girewt. Xasî, peynîya Mew-lûdî di yew ca di qalê "Hacî Îbrahîmî" keno;

1 Lede'l- Hacî îbrahîm ustazî'l-alî(Hostayo berz Hacî Îbrahîmî het.)

Derheqê Hacî Îbrahîm Efendî di ma do zaf çî nêzanî. Labelê Salname-î Vîlayet (Dîyarberkîr, 1901-1902) di qismê 'Vilayetimiz Ahalisinden olan Ashab'- Meratib (rupel: 160) di nameyê yew Hacî Îbrahîm Efendî vêreno.

Tîya ra fam beno ki Hacî Îbrahîm Efendî Dîyarbekir di marda/maya xo ra bîyo û ê wextan muderrîse Medreseya Mesudîye (Mesudîye Medreseyi muderrisi) bîyo. Beno ki Hacî Îbrahîmo ki Melayê Xasî ti ra îcazey xo girewto no Hacî îbrahîm Efendî bo.

Nameyê Muftîyê Dîyarbekirî Elhac Îbrahîm Efendî 5'ê Gulana 1920 di rojnameya (gazeteya) Hakimiyet-î Miliye di zî vêreno. Na rojnameye di yew fetwaya muftîyanê Anadolîye û Kurdistanî esta. Bineyê fetwa di yew fetwaya muftîyanê tesdîqkerdoxan mîyan di nameyê Muftîyê Dîyarbekirî Elhac Îbrahîmî zî esto. Na fetwa destur dana ki bisilmanê Dewleta Osmanîye, vera emperyalîstan lej bikerê (Bew-nî: Yalçın Küçük, Aydın Üzerine Tezler-I, Tekin Yayınevi, İstanbul, 1984, r. 102). Reyêna beno ki muftî bo.

Na fetwaya ki ma cor ra behsê aye kerd, bineyê aye di nameyê Muftiyê Sêwrege Êsmanî zî nuşte yo. Beno ki no zî Êsman Efendîyo Babij bo ki 1903 di yew Mewlûdê kirmanckî nuşt bi.

Heto bîn ra Zinnar Silopî nuseno ki Muftîyê Dîyarbekirî Hacî Îbrahîm Efendî û merdimê xo Pîrîncîzadeyî destekdayoxê kurdeyî nêbî,

duşmenê na dawa bî (bewnî: Zinar Sîlopî, Doza Kurdistan, Stewr Basımevi, 19-69 r. 47).

Ehmedê Xasî gelek zeman/wext Hezan di mend. Ê wextan Şexê Hezanî, Şex Selîm zî Hezan di bi (soyadî-yê/nasnameyê keyeyê Şex Selîmî "Aydin" o). Wextê Herbê Şex Seyidî (1925) di, Sêx Selîmî kışta Hukmatê Tirkan girewta û vanê ki Mustafa Kemalî (Ataturk) yew saeto zerrên ey rê hedîye kerdo. Banê Ehmedê Xasî û Şex Selîmî zî pêra nîzdî bî. Labelê semedo ki Ehmedê Xasî welatperwer bi mabenê ey û Şex Selîmî weş nebî. Xora ewro mirîdê Şex Selîmî hîna zî Melay Xasî ra hes nêkenê. Vatiş bi Hezanijan gore Ehmedê Xasî gelekî şîrî (helbest) bi kirmanckî nuşti bi. Nê şîran ra yewi-di Xasî qîrfan fineno Şexî û qalê dewijanê belengazan keno ki Şexî rê çiy-mîy ardêne. Vatişan gore Ehmedê Xasî şîrê kurmanckî û erebkî zî nuştê. Nê şîrananê ey ra tayînî mela û suxteyê Kurdistanî fek ra zanê. Mesela, vatiş bi Bahrî Koçkaya gore Ehmedê Xasî, yew şîra xo ya 'erebkî di qalê Mistefa Kemalî keno û vano:

"Qîdwetu'I-Etrakî turren el- musemma bî'l - Kemal

Kane me' nabû zewalen, fî'z zewalîn fizop zewal."

Hîna verî Sultan Ebdulhemîdî xebata kurdey ra Xasî surgunê Rodosî kerdo (Rodos Deryayê Sipî der o.). Ehmedê Xasî şes aşmî/mengî Rodos di mendo.

Hewna vatişan gore Melay Xasî mesela kurdey ser a Zîya Gokalpî di zaf munaqêşeyî kerdê.

Seke peynîya Mewlûdî di aseno Fethullah Hesbîyê Ûmerî, qandê Mewlûdê Xasî rê yew teqrîza edebî nuşt. Na teqrîza erebkî di Fethullah Hesbî wesfê Mewlûdê Ehmedê Xasî dano. Çi heyf ki ma derheqê Fethullah Hesbî Sêrtijî di çiyekî nêzanîme.

Seke Xasî bi xo vano, mewlûdê kirmanckî 1898 (bi tarîxê Erebi 1316) di nuseno û 1899 di Dîyarbekir di metbea ra guneno/weşanêno/çap beno.

Çend tornanê Ehmedê Xasî ra 'Elî û Evdilla Hezan di roşenê...

Mela Ehmedê Xasî û Mewlûdê Nebî ⁽²⁾

Mewlûdê Nebî, bi zîwanê kurdkî, bi zaravayê kirmanckî, bi destê Mela Ehmedê Xasî ameyo nûştene. Dîyê 25'ê aşma adarî ya 1315 (1899) de çarse (400) hebî di Çapxanê Litografya, Sûka Dîyarbekirî de ameyî çapkerdene.

Labelê ma derbarey cuwanê Xasî de zaf çî nêzanenê. Zanayîşo ke ma der û dor ra û Kovara Hêvî ra girewto; Mela Ehmedê Xasî serranê 1867-1868 de dewê Hezanî de ameyo dinya. Hezan nika navçey Pêşkevirî de dewêka gird a û ewro nehîya ya, a dewe giredayêya Licê ya.

Nameyê pîyê Mela Ehmedê Xasîyî, Mela Hesên o.

Ehmedê Xasî pîyê xo het di dest bi wendişî kerdo. Peycû wendişê xo yê dewe feqîtiye kerde û wendişê medreseyan berdewam kerd, wendişê xo yo peyên zî Dîyarbekir de tamam kerd û îcazeyê xo Miftîyê Dîyarbekirî Hecî Îbrahîm Efendî het de girewt. Demêke bî miftîyê Licê. 1909 Melayê Xasî Dîyarbekir ra surgunê Rodos a ke Deryayê Sipî de ya kerdo. Ehmedê Xasî 18.2.1951 di dinyayê xo bedelnaya (şiyoye rehmet).

Ehmedê Xasî di ê demî û ê rewşî de roşinvîr, alîm û welatparêzêke germ bî. Neslê Xasî ra yew keyna û nebîyê ey estê. Gore vatişanê kesê ke ey nas kerdêne zaf eserê ey biyê. Ê çiy wefatê ey ra pey tersê dewlete ra ameyî veşnayene. Ewro zî şîrê ey bi tirkî, erebkî, kurmanckî şarî mîyan de estê. Ez wazena nê şîranê Xasî ra di heban zî wendoxan rê pêşkêş bikera. Xasî, zîwanê tirkî, erebkî, farskî û kurdkî (kurmanckî, kirmanckî) zanaynê.

Mewlûdê Nebî, bi zîwanê Kurdî bi zaravayê zazakî (dimilkî) bi destê Mela Ehmedê Xasî ameyo nûştişî. Di 25'ê aşmê Adarî 1315 (1899) de çarsey (400) hebî di çapxanê Litografya sûkê Dîyarbekirî de ameyî çapkerdiş. La mixabin ma derbarey jîyanê Xasî de zaf çîke nêzanê.

Mewlûdê Nebî ra yew nîmune:

Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm
 Ez bi bîsmîllahî îbtida kena,
 Raziqê 'aman û xasan piya kena.
 Rebî, hemd û şukrî ancax to rê bê.
 Kîbr û medh û fexrî pêro to rê bê.
 Çende rey bê ma sewa bê hemdê ma,
 La belê nêrê hîsaban çendê ma.
 Hemd û şukrê to eda qet nêbenê,
 Ma sera Rebbî, ti zanê vînenê.
 Halê mîskîn û feqîr û naqisan,
 Rûreş û zer sîyahê zey hesan.
 Her nefes de vacê hemd û şukrê to,
 Wacib o bê şubhe ancî heqqê to.
 Maneno îne sero şukrê çiman,
 Dest û ling û piyabê 'ezayê bînan.
 Key yeno ca Rebbî, heqê şukrê to,
 Ger ezel ra ta ebed ebed ma zikrê to.
 Tim biker, qet xafilî nêbin mudam,
 Hermehal o ger edaker ma tamam.
 Labelê ma zanê rehma bê hîsab,
 To hete esta wû ma bî dilkebab.
 Wazenê ma lîrfê to hergû hewe,
 Tim bi zarîy û fixan roc û şewe.
 Ez qesem daîm bi zatê to kena,
 Hem bi yew yew ez sîfatê to kena.
 Ger ebed yew hemdê to qet nêkero,
 Rehmetey to ancî yo go her hero.
 Çunkî rehmay to bi qeybê yê biya,
 Ger çîqa şermende wû sîne sîya.
 Rebbî halê bixu to ra'eyan,
 Lazimey hindî çîya vaco zîwan.
 Xaliqê ma tim ti yê Barî Xuda.
 Şafi'ê ma zî Muhemmed Mustefa.
 Hindî ma şeytanî ra perway çîyo
 Yo ku to ra tim biyo bê hêvîyo.
 Ey birayê dînî! Tim goştari bê,
 Hem bi qelbê xu bi hêşyarî bê.
 Key şîma dî nameyê Şahê şîma,
 Ame vatiş, sunneto vacê şîma:

"Esselatû wesselamû ya habîb!
 Daîma to ro bivarê ya tebîb!"
 Wazenê ger ma xelasiyya tamam,
 Vatişê ma esselatû wesselam.

Not: Temamê Eserê Mela Ehmedê Xesê,
 756 misra yo.

Benzer (*)

Bir kavm kitapsız olsa
 Dilsiz dawara benzer.
 Dinsiz hayat-ı fani
 Yazsız bahara benzer.

.....(**)

Zalim olan kimsene
 Çehre-i mara benzer.
 Alim olan münevver
 Bütün envare benzer.
 Cahil olan zavallı
 Mumsuz fenere benzer.
 Kelam-ı hikmetimiz
 Misk-i Tatara benzer.
 Hasi, makal -ı sandık
 Şems- i nehara benzer.

Amadekar: C. Zerduşt Pîraniş

Cîme:

(*) Mela Ehmedê Xasê ra yew şîra Tirkî

(**) Nacî Kutlay wita di/de dina hebin dîzeyan nûseno:

"Cehaletin libasi, kirlî humara benzer
 Libasi dini soyan, uyuz himare benzer."

Nacî Kutlay, kitabê "Kürtler" weşanê Pêrî r. 144 di
 (Korkusuz Şefik- Diyarbekir Ulemasi-1996- ist.
 Melisa Matb. r. 22) çîme nawnenno.z

(1) Hêvî Kovara Çandî ya giştî Paris, No: 4, Îlon
 1985 r. 75.97.

(2) Tadayox,tipane 'Erebkî ra Mihanî, Weşanên
 Fîrat,Tebax; 1994

PÎR ŞALYARÊ HEWRAMÎ

YÊ YEKEM

► M. Reşîd Irgat

Hewraman herêmeke Kurdistanê ya çiyayîn, kevirîn û asêgeh e. Di demên kevn de kesên derveyî vê herêmê bi hêsanî nedikarin bihatana wan deveran. Bi piranî nişteciyên Hewramanê kesên xakî, nerm û dilpaqij bûn. Xwarina xwe ji hilberînên sewalan, ji fêkiyên daran ên mîna gûz, tû, şahbelût, karçîn û ji rehên giyan pêk dianîn. Berg û cilên lixwekirinê jî ji hiriyaya sewalên kedîkirî an jî ji pembû çêdikirin. Bi amûrên destan, ji korskeriyê, kincên herêmî çêdikirin. Bi vê rêzîkê wisan jî hewramaniyan, hewceyî bi têkilî û peywendiyên bi kesên dûr an nêzik nedidîtin. Ji ber vê sedemê, di encamê de ji bûyeran agahdar nedibûn. Heke bibûna jî giringî nedidanê. Ev bes, bi kar û xebatên debarê yên ji bo jînê û bi parastina kevneşopiya xwe ve girêdayî bûn.

Hewramanî, Ahora Mazdaperest bûn û girêdayî ola Zerdûşt bûn. Piştî êrişê erebên misilman li ser axa Îranê û ji holêrabûna fermanre-

Yek ji pîrên ola Zerdûşt ku li Hewramanê dijiya, Pîr Şalyarê (Pîrşehriyarê) kurê Camasp bû. Ev pîr, mirovekî gelek zana, agahdar û xwedî sirûşteke rewan bû. Wî Pîrê zana pirtûkeke bi navê "Me'rifetî Pîrê Şalyar" (Me'riferî pîrî Şehriyar) bi zaravayê kurdî yê hewramî, bi ristî nivîsîbû.

watiya sasanîyan û belavbûna ola îslamê di berfirehiya wê erdnîgariyê de, hewramanî demeke dirêj li ser bîr û bawerîya xwe ya olî

ya bastan li ber xwe dan. Ew, bi wan kesên ku fermanrêznameyên ola îslamê belavî herêmê dikirin, ew qas rûgeş û dilxweş nedibûn.

Yek ji pîrên ola Zerdûşt ku li Hewramanê dijiya, Pîr Şalyarê (Pîrşehriyarê) kurê Camasp bû. Ev pîr, mirovekî gelek zana, agahdar û xwedî sirûşteke rewan bû. Wî Pîrê zana pirtûkeke bi navê "Me'rifetî Pîrê Şalyar" (Me'riferî pîrî Şehriyar) bi zaravayê kurdî yê hewramî, bi ristî nivîsîbû. Di naveroka vê pirtûkê de, gotinên pêşiyar, şîretên hêja, rêzik, kevneşopiyên bastanî, rêzanî û raspêriyên bêhempa hebûn. Mîna pêkanîna nejbîrkerîna van xalên ku di pirtûkê de hatine rêzîkirin û nivîsandin. Jimarên vê pirtûkê mîna kimyan in, bi dest nakevin, lê beşek ji pexşan û malikên helbestên pirtûkê hê jî di bîra mirovên hewramanî de mane û di cihên çavkaniyan de, wek mînak didin nîşandan. Di wê pirtûkê de, piştî her du malikan, malîkek tê dubarekirin bi vê naverokê ye:

Goşit ce wateyî pîrî şalyar bo

Hoşit ce kiysteyî zanayî sîmyar bo

Yani guh bidêre gotinên Pîrê Şehriyar û bo têngihîştina nivîsên Zerdûştê zana hişyar be.

Ev jî, yek ji du malikên wan helbestan e:

Daran giyandaren cerg û dil bergen

Gayî purbergen, gayî bêbergen

Kereg ce hêlên hêlê ce kergen

Ruwas ez ruwas, wurgen ce wurgen

Wergera van malikan bi kurmançî ev e:

Dar giyandar in, dil û cergên wan belg in

*Hin caran purbelg in, hin caran bêbelg in
Perende ji hêkan in, hêk jî ji perendeyan
Rûvî ji rûvî, gur jî ji gur in.*

Em du malikên din jî wek mînak derpêş bikin:

*Wewrê wewaro wewre werên e
Wurêse biryo çîwar se rêne
Kerigê siyawe hêliş çermên e
Goşlê me miryo duwê derê ne*

Wateya van malikan bi zaravayê kurmançî:



Berfêk dibare, berfxwer e.

Werîs parçe bit çar serî jê peyda dibin.

Mak reş, çêlik spî ne.

Dîzik qul be derî dibin dudu.

Hinek ji zanyarên kurd û danişmendên wan bawer in ku Pîrê Şalyar di dawiya jiyana xwe de, ola îslamê pejirandiye. Hatiye sehkirin ku mirovên hewramî yên wê demê bi ola îslamê aşîna û nasîne bûne. Lê di vî warî de, pêşketin bi dest neket û Pîrê Şalyar di dawiya sedsala pêncemîn a koçî de piştî xwe da cihanê. Bes hinek nîşane didin xuyandin ku Pîrê Şalyar di dawiya sedsala yekem de jiyaye û li ser bîr û baweriya xwe ya olî ya bastan maye û heya dawiya jîna xwe domandiye.

Nîşana vê rasteqîniyê ya yekem: Di sedsala çaremîn pêncemîn û sêşenîm de, ola îslamê li seranserî herêma Hewraman belav bûye û bi giştî niştecihên wê herêmê bîr û bawerî bi ola îslamê anîne û ola îslamê pîroz dîtine.

Nîşana duyem: Pejirandina Pîrê Şalyarê yekem bi ola îslamê, bi rastî jî ne guncan e û bi rastiye nagirit, ji lew re Pîrê Şalyar berhe- ma xwe ya ristî, bi helbestkî bi xwe nivîsiye. Naveroka vê behremê, mecûsîfî û kevnêso- piyên bastanî û rêzikên kevnareyên wê olê ne. Heke Pîrê Şalyar ola îslamê pejirandibûya, bêguman wê hinek guherandin pêk anîba û wê di pirtûka xwe de cih bida beşek ferman û rêzikên ola îslamê. Çawan ku Pîrê Şalyarê duyem misilman bûbû û ev kar pêk anîbû.

Cavkanî

1. Merdûx; Tarixê Kurdistan
2. Reşîd Yasmî; Kurd û Peywendiyên Nijadî û Dî-roka wî

ŞÊX MIHEMED KERBELAYÎ

► Kerem Soylu

Mihemed Kerbelayî, lawê Şêx Mihemedê Aqtepî, neviyê Şêx Hesênê Nûranî yê Aqtepî ye. Aqtepe, gundê bi ser navçeya Çinara Amedê ye. Malbata aqtepiyan, malbatek wisan e ku gelek pisporên wêjeyê ne. Hunermend û bi nav û nîşan bûne. Şêx Ebdurehman, Şêx Mihemedcan û Şêx Mihemed Kerbelayî her sê jî xwedî berhemên zor girîng in.

Mihemed Kerbelayî, di sala 1885'an de li Aqtepeyê hatiye dinyayê. Di heft saliya xwe de, li medreseya malbatê dest bi xwendinê kiriye. Di dema xwe ya salên ewilîn de ji temamî şagirtên hevalên xwe jîr û zîrektir bûye. Di encama pêkanîna dozdeh zanistên (dozdeh ilmên) medreyê de, bi rewşeke awerte nav û dengên wî li herêmên derdorê belav bû. Her wisan derbarê welatparêziyê de jî, li welêt ew wek beranek qoç bigustîl di nav civakê de kifşe û xuya bû, çawan ku derbarê wî de hatiye gotin:

*Mihemed Kerbelayî mêwe
û berî dara tuba cinan*

Serê wî bilind bala der

gulşênî Kurdistan

*Gul û reyhanê ber bêhna
me dil kul û xemdar û bindestan*

*Di medhê pesndayîna wî
de lal bûne ziman.*

An ku dara tubayê di bihiştê de çi qas bi mêwe (fêkî) ye, Kerbelayî ev çend di nav gul û gulistanên Kurdîstanê de bejn bilind e, her wisan ew fêkî û gul û rihana me bindestan e. Lê em çiqas jî bêjin jî ziman ji pesndayîna wî lal dibin, nikarin hunermendiya wî bidin xuyakirin.

Gelek diyar e ku gelek berhemên vî hunermendê payebilind û binavûnîşan ji ber

*Kerbelayî di dîwana
xwe ya bi navê
Dîwana Kerbelayî de, helbestên
xwe li ser şopa
Mem û Zîna filozofê
giranbiha Ehmedî Xanî
dimeşîne. Dema ku mirov
ristên wî ber çav dike,
wek ristên Mem û Zînê
tehm û lezetê dide bin
zimanê mirov û çavê
mirov ronahî dikin û ev
dîwan di warê arûz û
watedariyê de dîwaneke
gelek birêkûpêk e.*

xedariya demê û zor û zexta li ser kurdên zanyar, welatparêz û canfêda an hatine şewitandin an jî di bin axê de riziyanê.

Kerbelayî di dîwana xwe ya bi navê Dîwana Kerbelayî de, helbestên xwe li ser şopa Mem û Zîna filozofê giranbiha Ehmedî Xanî dimeşîne. Dema ku mirov ristên wî ber çav dike, wek ristên Mem û Zînê tehm û lezetê dide bin zimanê mirov û çavê mirov ronahî dikin û ev dîwan di warê arûz û watedariyê de dîwaneke gelek birêkûpêk e.

Hunermendê hêja gramera erebî, farsî gelek baş zanibûye, her wisan li gor şertên demê zimanê tirkî jî baş zaniye. Lê di zanista helbestê de tu zimanek hempayê zimanê kurdî nedîtiye. Rind dîtiye ku li Rojhilata Navîn zimanên cur bi cur hene jî, lê zimanê kurdî pêşî ji temamî zimanan stendiye û mora xwe li helbestê daye û wiha aniye zimên:

*Gerçî ereb e, tirk e, şahî
ecem e ema*

*Zanim ku bi kurmançî
sîkeya xwe li serî da*

Çawan ku tê zanîn
Mihemed Kerbelayî jî tiliya

xwe di helbesta xwe de daye ser ku zanyar û filozofên wêjeya gelê kurd ev her sê ziman baş zanîne jî, lê ew pêtên agir ên ku di nav dilên wan de diherikî û ew evîna welatparêzî bi tenê bi zimanê kurdî dikaribûn terîf bikira û merama xwe pêk bianiya. Ji ber wê mebestê, bi kurdî helbest nivîsînê û her wisan evîndariya neteweyî û welatparêziyê di helbesta kurdî de cihêkî awarte girtiye û rol lîstiyê.


Neyîstaniya Mihemed Kerbelayî

Di sala 1344'ê koçî (1925'ê zayînî) de ew jî wek gelek kurdistanîyan jî ber tevgera Şêx Seîdê Paloyî koçberî bajarê Îşaqê bû. Neyîstaniya (sirgûna) Mihemed Kerbelayî wiha dest pê kir.

Paşê Komara Tirk ew şand bajarê Edeneyê. Wî di koçberiyê de gelek tengasî, zor û zext dît. Di xewn û xeyala wî de çûyîna welêt hebû. Du salên wî li koçberiyê qediyar, rojekê ew çû ber Çemê Ceyhanê, daxwaznamek li ser navê xwe û hevalên xwe nivîsî û avête ava çem. Azadiya xwe jî Yêzdan kiribûn. Wilo tê gotin ku wê şevê qedexeya koçberiyê bi têlbîrûskê li ser koçberan radibe.

Di sala 1346'ê koçî (1927'ê zayînî) de ew jî koç-

beriyê vedigere diçe li gundê Çolê, bi malbatî rûdinê. Ew 12 salên dawî jî temenê xwe tim di mal de derbas dike. Xew û xwarina wî gelek kêmbû. Karê wî xwendin û nivîsandin bû. Ji ber qedexe, zor û zexta li ser kurdan, bi taybet jî li ser berhemên wan, wî tim dinivîsî, dû re



Şêx Mihemed Kerbelayî

dixwend û di pey re dişewitand. Bandora tevgera Şêx Seîdê Pîranî gelek li ser mabû, ji ber wê berhemên xwe tune dikirin.

Zanyarê mezin, hunermendê hêja di dawiya temenê xwe de, dibêje ku "Ez sindoqek devgirtî hatim û ez ê devgirtî jî herim." Di sala 1358'ê koçî (1939'ê zayînî) de ew çû ser dilovaniya xwedê.

Helbest:

Canê xwe şand bihiştê jorê, piştta xwe siparte axa gorê

Teyrê ku qefes li ber vebûyî, ew rengê firî wekî nebûyî

Ya Reb tu Kerbelayî bi fedla xwe bibexşîn

Hezar tavanî rehma li gora wî bîreşîn

Berhemên wî

1) Di sala 1331'ê koçî (1912'ê zayînî) de ferhengek ji 1350 peyvên bi zimanê kurdî û farisî pevxistiyê, navê wê daniye "mîrsadil etfal" ango şerha zarokan.

Wekî Nûbara Şêxê Xanî esasa wê ji bo etfalan danî. Xanî bi kurdî û erebî ferheng çekir, wî jî bi kurdî farisî çekiriyê. Ji ber ku her du ziman di wê deme de pir dihatin xebitandin.

2) Di sala 1333'yê koçî (1914'ê zayînî) de dîwanek bi kurdî, erebî û farisî bi meqam çekiriyê. Ji dîwana Melayê Cizîrî pencekek di vê dîwana xwe de îqtibas kiriye, bi kar aniye. Bi zelalî di hunerê de ev dîwan li şopa dîwana Cizîrî meşandiyê.

3) Dîwana Mihemed Kerbelayî; wisan diyar e ku ev dîwana wî berî koçberiya wî hatiye nivîsandin. Ji ber ku piştî koçberiyê berhemên xwe sewitandine û tune kirine. Ew

dîwana Kerbalayî, ji 40 beşan û ji 696 ristan pêk tê. Di sala 1400'ê koçî (1980'ê zayînî) de ji aliyê Zeynel Abidîn Diljar ve bi tîpen erebî hatiye rêzkirin. Di rêbendana 2002'an de, ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve, tîpguheziya wê bal tîpên latînî ve hatiye kirin.

Hunermendê payebilind di van ristan de mijarên cur bi cur tîne zimên. Her wekî ol, felsefe, welatparezî her wisan teknîka helbestan bi terzê zanista arûzê pêk tîne. Mihemed Kerbelayî, dîwana xwe bi pesndayîna Yêzdan û selam li ser Mihemed, di rêzên dû re de, di beşa yekem de dest bi bûyera Kerbelayê dike û dîwana xwe pev dixê. Çend helbest ji mijara Kerbelayê;

*Destê teqdîrê ezê der m'eredê qa lû bela
Xil'etî ehmer dida cundan xakê Kerbela
Der ciwarê, erşê heq fushet serayê şeh Huseîn
Zerê sûrx e, yek nemet eywanê xakê
Kerbela*

*Name û mexber, qelem l'el û ifada xu neşan
Tên tewatûr fetwe ê şeyxanê xakê Kerbela
Der mûherrem her sene dar û ber û ax û nebat
Xwûn dibarînin, ev e nîşanî xakê Kerbela
Sed hezar l'anet dibejin ser Yezîd û tabî'an
Behrê wan mezlûmê meqtûlanê xakê
Kerbela*

Hunermendê payebilind, ji bo komkujiya Kerbelayê gelek gelek xemgîn bûye. Her tim di bin bandora wê êş û elema bûyerê de, xwe aciz û melûl dîtiye û di gotin û nivîsên xwe de dem dem nefreta xwe nîşan daye û aniye zimên. Di helbestên jor de dibêje ku:

*Qey teqdîra ezê li ya meydana qal û belayê
Ev bazîne sor dabû leşkerê xweliya Kerbelayê
Di nêzî erşa Xweda de seraya Şeh Huseyn
çêbû*

*Eywana wî bi cerak bi zêrên sor hat pêkânî
nîn an ku xwîna gewe*

*Hubir, qelem û kaxiz û tamamî lêvan şîna
xwînrijîne dikin*

*Li pey hev rêz dibin, tîne şîna û girîna mezi-
nên Kerbelayê.*

*Di meha miheremê de her sal dar, ber, ax û
temamên candaran şîna dikin*

*Hestirên xwîne dibarînin, nîşana xaka
Kerbelayê her sal ev e.*

*Dema ku şîna, girîna dikin pê re sed hezar lene-
tan li yezîd û alîkarên wî dikin*

*Bo xatêre mezlûm û meqtûlan xaka Kerbelayê
nefreta xwe nîşan didin.*

Ji bo nimune, çend helbest ji dîwana Mihemed Kerbelayî der barê evîndariya welêt de, bi derûnî (dîlbikûl) tîne zimên.

*Bi çehre Yûsûf ê dehrî bileb abê heyatê can
Bi tac û setwet û şewket yeqîne min Suleyman î
Selehuddîne Eyûb î weya Perwîzê Şîrîn î
Nizanim şahê Îran î weyaxud mîrê Kurdan î
Bi vî terzî perî çehri eceb şûxê dilaşob î*

*Bi vî tertîbê bedmêhr î nihayet dijminê can î
Nema carek tu rehûm kî heta kengê cefakar î
Nema taqet kesem billah bes e ev namusul-
man î*

*Mudameê ba dilê miskîn, xwo şîrê şerze der
ceng î*

*Hezebrê peêşe î ya Rustemê Samê Nerîman î
Dilê te seng e, pûlad e, hecer ew çendî bêbak e
Tu axir merhemet ke ey tu neslê xanê xanan î
Helandin cilwe ê te bes tu azarê esîran kî*

*Mekuj seydê herem ey mehremê esrarê Yezdan î
Nigarîna kerem ke bûseyek bo xatîrê xemgîn
Ji wan yaqutê rumanî, ji wan l'ele bedexşanî
Nedîtî der melek hinde letafet qet di a'lem de*

*Di şehd û şeker û ney de me hale hinde şîranî
Bi bezmê w'ede da dîlber Suleyman lew muferrêh bû
Ji Belqîza Seba îro seher hûdhûd xeber anî
Bi mewla Kerbelai mulketê sebr û tehem-
mul çû*

Bike himmet bi pabûsek nîgarê bes girançan î

“Kurdî behreke kûr e, melevaniya mirov têrê nake”

► **Hevpeyvîn: Yaşar Eroğlu**

Em wek kovara Zendê dixwazin her du berhemên te, ango ferheng û xebata te bîdin nasandin. Lê bêyî nasandina te jî nabe. Hema em ji te dest pê bikin. Zana farqînî kî ye ?

Tiştêkî zor e ku mirov xwe bide naskirin. Bi awayekî klasîk em dest pê bikin, gava ku kes xwe didin naskirin serê pêşî ji dayikbûna xwe dest pê dikin. Ez jî wisan bikim.

Ez di sala 1967'an de li gundekî Farqîna Amedê hatime dinyayê. Min dibistana seretayî û ya navîn li Farqînê, lîse û zanîngeh jî li Stenbolê xwendin. Ji sala 1984'an bi vir ve li Stenbolê dijîm. Wekî din ez ji malbateke niv xweşşal tîm. Em 11 xwişk û bira ne. Heft jê keç û çar ji kur in. Em tev jî, ji dê û bavekî ne. Ji nav van ê ku lîse û zanîngeh xwendiyê ez im.

Eleqeya min a bi ziman re diçe heta salên dibistana seretayî. Ez vê jî bibêjim, min hinekî bi derengî, di nehsaliyê de dest bi dibistanê kir. Wê demê ji ber ku temenê min hinekî zede bû, min bêhtir bîr dibir tiştan. Jixwe Farqîn jî devereke siyasî bû. Li wir hestên neteweyî pir li pêş bûn. Mamosteyên me bi xwe jî kesên welatparêz bûn. Hîka-

riya min a neteweyî li wir dest pê kir. Her wiha hezkirina min a ji zimên jî. Li dibistana seretayî, di salên sêçaran de min ji xwe re digot çima kurdî jî bi alfabe ya latînî nayê nivîsandin. Ma qey alfabe ya me tune? Min pirsên wiha ji xwe dikirin.



Vê yekê heya dibistana navîn domand. Mem û Zîna Ehmedê Xanî, ku ji hêla M. Emîn Bozarşan ve bi tîpên latînî hatibû wergerandin, di sala 1981'ê de bi dest min ket. Êdî ez bi ser xezîneya xwe ve vebûbûm.

Te cur bi cur xebat kirine. Çima te li ser xebata ferhenggan biryara xwe da?

Wekî ku min bersiv da pirsê pêşîn jî, bi rastî hezkirina min a zimanê kurdî ji zû de dest pê kiriye. Bala min tim li

ser zimanê kurdî bû. Min dixwest ku ez xwe ji aliyê rêziman ve bigihînim. Lê di ber re min peyv berhev dikirin. Hiş û bala min li ser zargotina kurdî jî bû. Çirok, çîrçîrok, stran, gotinên pêşiyar û her wekî din.

Tiştêkî din jî bibêjim. Stran jî dihêle ku tu nehêlî! Dema ku tu bi kurdî bistrî, tu zû bi zû nahêlî. Di zarokatiya xwe de min stran jî digotin. A ev yek jî bû sedama hezkirina min a zimên. Heya sala 1990'î hem li ser gramerê min xwe digihand, hem min peyv berhev dikirin.

Hevalên min ên zanîngehê dizanin, her civata ku ez tê de bûma, her sohbeta me li ser kurdî bû. Min tişt ji hevalan dipirsîn.

Di 1991'ê de min bi kovara Rewşenê ya Navenda Çanda Mezopotamyayê dest pê kir û nivîsand jî. Paşê Welat, Welatê Me û Azadiya Welat. Di van kovar û rojnemayan de, ji bilî berpîrsiya karê nivîsaran û gerîndetiyê weşanê, min karê redaksiyonê jî dikir. Bi kirina van karan re êdî di warê peyvyan de tûrikê me tijî bûbû.

Ferhengnasî karekî zehmet e. We di vî warî de perwerde neditîye. Lê we du ferheng amade kirine. Xebatên di şertên asayî de çi ne û we bi metodeke çawan ev xebat kirin?

Rast e, ne tenê karekî diwar, her wiha karekî bi lome ye, bi gilî û gazîn e jî. Tu nikarî bi xebatên ku te kirine dilê her kesî xweş bikî, her kesî kêfxweş bikî.

Wekî ku min berê jî anî zîmên, ez gelek li ser sekinîm ku di warê gramera kurdî de xwe bigihînim. Heta ji me hat me xwest ku em xwe bigihînin xebatên ku hatibûn kirin, wekî yên Celadet Bedirxan û kesên me yên li Ewrûpayê nemaze li Swêdê.

Ez niha dibêjim xwezî min ne beşa civaknasiyê (sosyolojiyê) xwendibûya. Eger min zanibûya ku ez ê wan karan bikim, min ê beşa zimanekî bixwenda. Qet nedibû min dê di warê zimên de xwe bigihanda. Hîn jî kêmasiyên min hene. Di vî warî de ez hîn jî tengasiyê dikişînim.

Lê ji bo ku ez nekevim tengasiyê û heta ji min bê ku kêmasiyên ez bikim kêmtir bin, min der barê ferhengan de lêkolîn kirin, cureyên wan çi ne, teknîka wan çi ye, bê ka ferheng çawan tên amadekirin.

Serdema ku em tê de ne ji bo me avantajên wê gelek hene, lewre serdema teknolojiyê ye. Kompîtûr bi her awayî rê li ber me hêsan dikan. Êdî wekî berê ji bo her herfekê tu fişekê amade nakî û nizanîm tiştên din. Karê amadekirina ferhengê gelek hêsan bûye. Kompîtûr ji te re peyvan bi rêz dike, ji aliyê wext ve gelek avantajan dide mirov, karê mirov hêsan dike.

Zimanên serdest, zimanên ku bi pêş ketine, gelş û arîşeyên xwe çareser kirine ji te re hinek rê vedikin ku tu karibî

kêmasiyên zimanê xwe temîn bikî. Peyvên ku êdî di jiyana te ya rojane de nayêne bikaranîn, hatine jibîrkirin an jî di çîrok û çîrçîrokan de, di stran û gotinên pêşiyên de mane. Divê mirov bi pey van bikeve bipirse, hîn bibe.

Me bi ferhengeke du zimanî dest pê kir. Ne ku bi kurdî-kurdî. Heke ku bi kurdî kurdî bûya, bi rastî ji wê gelek zehmet bûya. Wê gelek kêmasiyên me çêbibûna.

Min bi zanebûn berê dest avêt ferhenga tirkî-kurdî. Li hemberî peyva tirkî min berginda wê ya kurdî ya rast danî. Her wiha, vê yekê dihişt ku em hem bi pey hemwateya peyva tirkî ya kurdî bikevin, wê bi dest bixin û hem jî hewcedariya zimanê xwe bizani-

*Zimanên serdest,
zimanên ku bi pêş ketine,
gelş û arîşeyên xwe çareser
kirine ji te re hinek rê
vedikin ku tu karibî
kêmasiyên zimanê xwe
temîn bikî. Peyvên ku êdî
di jiyana te ya rojane de
nayêne bikaranîn, hatine
jibîrkirin an jî di çîrok û
çîrçîrokan de, di stran û
gotinên pêşiyên de mane.
Divê mirov bi pey van
bikeve bipirse, hîn bibe.*

bin, jê re li çareyan bigerin. Kêmasiyên wê ji rastê hilînin. Li aliyê din, ku em bikaribin ji teknîka amadekirina ferhengan sûd wergirin. Min berî vê jî li ser ferhengên du zimanî lêkolîn kiribû, bê ka çawan tên amadekirin. Ka divê di ferhengê de pêwîst e çi bê diyarkirin

û çi neyê diyarkirin. Bi kurtasî, bi vî rengî min dest avête karê amadekirina ferhengê.

Em ji bîr nekin ku medrese hebûn. Di medreseyan de digel zimanê erebî bi kurdî jî ders û talîm dihate dayîn. Hin peyv hatibûn peydekirin. Ji ber ku zaravayê me yê kurmanciya jêrê rastî qedexekirinan nehatibû, gelek kêmasiyên xwe di warê terîman de ji holê rakiribûn; peyv daraştibûn, çêkiribûn, me ji wan îstifade kir. Gelek terîmên zanistê me jê girtin. Jixwe berê jî gelek peyv bi riya zimanê nivîskî ketibûn zaravayê me. Nema ze li derveyî welêt, bi taybetî jî li Swêdê û li deverên din.

Piştî ku li Stenbolê Rewşen, Welat, Welatê Me, Azadiya Welat, Nûbihar û yên din derketin, pêwîstiya me bi wan terîman çêdibû, me serî li vî zaravayê zimanê xwe dida. Bi vî rengî me derbasî kurmanciya nivîskî dikir û cihê xwe digirt.

We çawan peyv ber hev kirin? Alîkariya kes an jî sazîyan li we dibû?

Belê, ez wiha bersiva pirsê bidim. Çendî ku min di adara sala 1997'an de dest bi amadekirina ferhengê kir jî, lê belê beriya wê jî haziriyên min hebûn. Çi bûn ev hazirî? Min kiribû serê xwe ku ez ê rojekê ferhengê amade bikim. Min kiribû serê xwe ku ez dê di warê kurdî de xwe bi pêş bixim.

Baweriyek hebû di nava kesên me yên xwende de, hinekan digot, "zimanê kurdî têra xwe îfadekirina me nake. Zimanekî paşvemayî ye." Min dît ku pîvana her kesî ev bû;

çiças bi kurdî bizanîbûya, di tûrikê wî de çi qas peyvên kurdî hebûna, li gorî wî zimanê kurdî ew qas bû. Çi heyf ku em bi qasî dayik û bavên xwe nikarin bi kurdî bifikirin, bipeyîvin û daxwaz û ramanên xwe derbibin.

Her tiştê ku bi kurdî derke- ta eger min karîbûya ew bi dest bixista, min ew bi dest dixist û peyv û biwêj jê derdixistin. Ev civarî wisan çêbû. Navê me, wek 'nêçîrvanê peyvan' derket. Bi rastî min kî bidîta min tişt jê dipirsîn. Min ji nivîsan, ji gotaran peyv derdixistin. Îcar dema ku min nivîskarên wan gotaran bidîtan min ji wan wateya wan dipirsî.

Min ne tenê ji berhemên nivîskî peyv berhev dikirin, her wiha min ji şexsan jî dipirsî ka filan tişt çi ye, bi zimanê tirkî ev dibêjin hûn bi kurdî jê re çi dibêjin û nizanîm çi.

Jixwe min di pêşgotina xwe ya ferhenga tirkî-kurdî de daye diyarkirin bê ka min ji çi û ji kîjan berhemên nivîskî îstifade kiriye, kê alîkarî bi min re kiriye, peyv berhev kirine ji min re şandine. Mesela piştî ku min dest bi amadekirina ferhengê kir, kesên ku pê hesiyar ez wî karî dikim, hin kesan ji min re peyv jî şandin. Lê dikarim vê bibêjim, bi qasî ku min hêvî dikir peyv ji min re nehatin. Tenê neh-deh kesan bêje ango peyv ji min re bi rê kirin.

Her wiha ferhengên ku berê hatibûn amadekirin, berhemên nivîskî, nexasim çîrok, roman, kovar, rojname, Welat, Welatê Me, Azadiya Welat, Kurmancî ku weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ye, tev bûn

sedem ku xabeteke wiha derkeve holê. Jixwe min ev xebat li ser navê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê dikir û saziyê li gorî derfetên xwe heta jê dihat madî manewî piştgiriya min dikir. Heke ku ew sazî, ew kes, ew xebat û berhemên weşandî nebûna, ev ferheng evqas berfirê û dirust pêk nedihat.

Li gorî we hêviyên we yê der barê ferhengan de hatin cih?

Wiha bibêjim; min dixwest bêhtir rexne bîn û rexne jî bi nivîskî bin. Ne ku bibêjin mala te ava, te karekî baş kiriye û ne jî bibêjin te şaş kiriye. Mala te ava, lê ji ber çi ava û mala te neava îcar ji ber çi neava. Aliyên baş û nebaş rasterast, bi awayekî berbiçav deyne rastê. Mixabin kesek du kes ne tê de, bi nivîskî kesî tiştek negihande min. Hin kesan digotin dest û tiliyên te ter bin, te xebateke pir pîroz kiriye, hin kesan jî digotin mameste hin tişt şaş in.

Me di pêşgotina xwe de dabû xuyakirin. Me gotibû em îdia nakin ku her tiştê me daye rast e. Em ne xwedî angaşteke wiha ne. Bi gotina kin û kurt, ev hêviya ku ez li bendê bûm nehate pê.

Tiştê dilxweşker ev e ku ji gelek kesan re bû çavkanî. Ya rast êdî ji min bi xwe re jî çavkanî ye. Ez bi xwe jî gelek caran lê dînêrim, bê ka min peyv çawan nivîsiye, min wateyên wê çawan diyar kirine. Jixwe hevalên min ên ku di vî warî de pispor in, digote min ku xebateke wiha bivê nevé de bibe çavkanî. Min jî bi vê bîr û baweriyê bêhtir bala xwe

dayê û ez bêhtir tê fikirîm. Heta ji destê min hat bi kesan şewirîm û bi awayekî pir bi hendaze min bala xwe berda serê ku ez zêde şaşiyar nekim.

Di ferhenga kurdî-tirkî de 131 hezar made û 35 hezar jî berdewamiya madeyê hene, ya rast kurdan jî wisan hêvî nedikir ku evqas hebe. Lê we ev yek dexiste holê. Gelo bi rastî kurdî ev qas dewlemend e?

Gava ku hê nû min dest bi ferhenga tirkî-kurdî kir, hin hevalên ku ji xebata min agahdar bûn, digot ku tu karibî 50-60 hezar peyvî bidî hev dê serketineke mezin be. Lê min jî ji xwe re digot, 'ez ê karibim bigihîjim nêzî 100 hezarî.' Ji ber ku şert û mercên em tê de bûn derfet nîn bû ku em karibin herin her derê lêkolînan der barê gencîneya zimanê kurdî de bikin.

Li aliyê din rexne dihatin, hinekan digot, 'çima ev ne xebateke kolektîf e, çima çend kes bi hev re çênakin?' Ev ne tercîha min bû û min nedigot ku ez dê bi tena serê xwe çêkim, bila kesî din çêneke. Lê îmkan û derfet nebûn û em nikaribin li hêviya Godot bûna. Digel her rexneyê, dîsan me xwe lê qerase kir. Lê ji bo ku bibe xebateke kolektîf, yanê ji bo ku her kes keda xwe têkê, ji bo ku kêmasî û şaşî kêmtir bibin ez bi gelek kesan şewirîm. Min li fikir û ramanên kesên pispor guhdarî kir. Pûte bi wan da. Bi vî awayî heta ji me hat, me xwest ku rengeke wê wiha hebe.

Piştî ku ez ketim nav xebata li ser ferhengê min dît ku bi

rastî jî zimanê kurdî wek behreke kûr e û melevaniya ku ez dizanim têrê nake da ku ez karibim xwe bigihînim her derê wê. Ji ber çî têrê nake? Ji ber ku mirov karibe xebateke tekûz pêk bîne, zanebûn têrê nake. Loma ez dixwazim vê bibêjim ne gengaz e ku mirov karibe hemû peyvên ku di zimanê me de hene di ferhengê de bi cih bike. Çimkî ziman tiştêkî zindî ye, tim û tim xwe nû dike. Tiştên nû diafirîne. Yen heyî bi awayekî tu dikarî xwe bigihîniyê.

Ji bo ku tu bikaribî xebateke wiha birêkûpêk bikî, divê tu sê xebatên bingehîn bikî. Yek divê tu xebata qadî angoyan meydanî biki. Dudu, divê tu zorgotina kurdî berhev bikî. Sisê, divê tu hemû berhemên xwe yê nivîskî bixwîni û ji wan peyvên derxî. Îcar di şert û mercên me yê îro de hê jî ev pêk nehatine.

Li ser berhemên me yê klasîk hin lêkolîn hatine kirin, peyv ji wan hatine derxistin, hin xebatên zargotîna hatine kirin, ku em ji wan îstîfade dikin. Li aliyê din pir hindik be jî xebatên lêkolînê yê li ser zargotîna hatine kirin. Çendî ku em bi têra dilê xwe neçûne der bi der, gund bi gund, bajar bi bajar, herêm bi herêm negeriyane jî, lê dîsan me jî peyvên wan herêman sûd û kelk wergirtiye. Ji wan herêman kesan peyv ji me re şandine, me ji kesên ji wan herêman pirsîne. Yanê bi vî rengî, ne bes be jî, me peyv bi dest xistine û di ferhengan de bi cih kirine.

Niha li ber destê min ji 6 hezarî zêdetir bêjeyên kurdî

hene ku min di ferhenga kurdî-tirkî de bi cih nekirine. Sedema wê ya pêşîn ev bû, min ev peyv ji nivîsan berhev kirine, lê başbaş min wateya wan nizanibû û wext jî li me teng bûbû, nexwe min dê ev peyv ji xwediyên wan re bişandana da ku wateya wan a rast ji min re bigota. Ji lew re min hişt ji bo çapeke din.

Li hemberî evqas peyvên reaksiyona kesên çawan bû?

Bêhtir tiştê ku ez şaşwaz kirim pirs û bertekiyên kesên kurd bûn. Helwesta wan, bertekiya wan li hemberî vê ferhengê bû. Me got ku 131 hezar serê madeyê û 35 hezar jî berdevamiya madeyê ne, ku tevî hev dike 166 hezar made. Gelekan digot, "Te evqas peyv ji ku anîn?" Nabêje bi rastî evqas peyv di kurdî de hene, dibêje, "Te ji ku anîn?" Ma ez ê ji ku bînim!

Ez bi salan ji serê sibehê heya êvarê rûnim li ser bifikirin jî ez nikarim ev qas peyv çêkim, ev yek ne mimkûn e. Ew kurdên me yê ku li hemberî vê yekê şaşwaz dimînin, pîvana wan ev e. Di tûrikê wan de çiqas peyv hebin, gençîneya zimanê kurdî ew e.

Min divê ez tiştêkî aşkera bibêjim. Ev peyvên ku di ferhenga kurdî-tirkî de bi cih bûne hemû ne xwerû bi kurdî ne. Tiştêkî wisan li tu deverê dinyayê tune ye. Di hemû zimanan de peyvên biyanî hene. Ev yek ne tenê xweserî zimanê me ye dîl û reben e.

Mesela gelek peyvên erebî ketine zimanê me. Sedema vê yekê jî aşkera û diyar e. Ji ber dîne îslamê ye. Kitêba pîroz a

Piştî ku ez ketim nav xebata li ser ferhengê min dît ku bi rastî jî zimanê kurdî wek behreke kûr e û melevaniya ku ez dizanim têrê nake da ku ez karibim xwe bigihînim her derê wê. Ji ber çî têrê nake? Ji ber ku mirov karibe xebateke tekûz pêk bîne, zanebûn têrê nake. Loma ez dixwazim vê bibêjim ne gengaz e ku mirov karibe hemû peyvên ku di zimanê me de hene di ferhengê de bi cih bike. Çimkî ziman tiştêkî zindî ye, tim û tim xwe nû dike.

vî dîni bi erebî ye. Lewma erebî wek zimanekî pîroz û wek zimanê dîne îslamê hatiye dîtin û pejirandin. Çawan ku zimanê latînî ketiye hemû zimanên ewrûpiyan, ji ber ku ev wekî zimanê xirîstiyaniyê hatiye dîtin, a wisan zimanê erebî ketiye zimanê hemû gelên misilman jî. Tenê ji ber olê peyvên biyanî nakevî nav zimanan. Sedemên vê yekê gelek in. Lewma di zimanê me di jî gelek peyvên biyanî hene. Ev ji bo zimanê me ne kêmasiya ne jî dewlemendiyeke e. Ev rastiyeke cihanê ye.

Hin peyv hene ku cudahiya di navbera wan de hindik e. Lê şeweyê wan yek e, wateya wan jî yek e. Wekî aşkera-êşkera, hilo-hilî, tilî-tilîk û hwd. Gelo rewşa van peyvên di nav ferhengê de çî ye?

*Ji aliyê vekîtê
ango rastnivîsê ve gra-
mer mifte ye. Lê rêzi-
man, gramer bi tena serê
xwe gelşê çaraser nake.
Divê tu serî li fonetîka
zimanê xwe bidî, divê
haya te ji morfolojiya
peyvê hebe. Nizanim
gerek tu serî li etîmolo-
jiya peyvê bidî. Ji rastni-
vîsa kevneşopî sûd wer-
girî. Ev hemû tişt, her
yek ji aliyekî ve bi kêrî
mirov tên û riyê li ber
mirov xweş dikin.*

Ev mesela rastnivîsê ye, ji ber ku ez ji çapemeniyê dihatim, min karê redaksiyonê jî pir kiribû, min serê xwe li ser êşandibû. Ji bo awayê rast ê peyvê çavkaniyên min zimanê nivîskî bû, min ew li ber çav girtin. Bivê nevē di warê zimanê nivîskî de standarda hin peyvan çêbûbû.

Ligel vê yekê dîsan min tenê qîma xwe bi wan neanî. Hîn di sala 94'an de çend gotarên min li ser guherina dangan ên di zimanê kurdî de, di Welatê Me de hatibûn çapkirin, dîsan piştê bi awayekî berfirehtir hin gotarên min di kovara Zendê ya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de hatin weşandin. Sedem û armanca van xebatan jî ev bû ku em rastnivîsîna peyvan di zimanê nivîskî de bi cih bikin. Min ne bi awayekî tercîhî ku em bibêjin filan herêm filan devok, lê heta ji min hat, bi awayekî zanîstî min nêzikayî li vê arîşê û gelemşeyê kir. Divê ez bidim xuyakirin ku heta ji min hatiye, min xwe ji devoka

herêma xwe jî dûr xistiye. Nabêjim tesîra herêma min li ser min tune.

Ji aliyê vekîtê ango rastnivîsê ve gramer mifte ye. Lê rêziman, gramer bi tena serê xwe gelşê çaraser nake. Divê tu serî li fonetîka zimanê xwe bidî, divê haya te ji morfolojiya peyvê hebe. Nizanim gerek tu serî li etîmolojiya peyvê bidî. Ji rastnivîsa kevneşopî sûd wergirî. Ev hemû tişt, her yek ji aliyekî ve bi kêrî mirov tên û riyê li ber mirov xweş dikin.

Ev hemû dibin alîkar ku tu bi ser awayê rast ê peyvê vebî. Mesela peyvên ku hevedudanî bin, bi awayekî giştî, bi rihetî em dikarin ji nav awayên wan ên cur bi cur ya rast bibînin.

Nimûneyek ji bo peyvên hevedudanî bidim mange an jî mangan. Ev her du awa di zimanê me yê devkî de hene. Heta di zimanê me yê nivîskî de hin kes mangan û hinde kes jî manganê dinivîsin. Lê em dizanin ku peyvek hevedudanî ye û ji pêrkîta /man/ û ji navdêra /ga/ hatiye çêkirin. Heta bi vê pêrkîte peyva manker jî hatiye çêkirin. Lewma awayê wê yê rast, bêyî dudilî ez dibêjim ku mangan ye û peyva çêlek jî hemwateya wê ye.

Dîsan dixwazim aşkera bikim ku ez ji aliyê rêziman ve, ji hêla etîmolojî û morfolojîyê ve nêzikayî li peyvan dikim.

Em bînin ser peyva aşkera, aşkere û eşkereyê. Di zimanê me de lêkera me ya bi navê aşkartin heye. Ev peyva me ya aşkera, an jî aşkere û eşkere ji vê tê. Nexwe ew, êdî ne eşkere an jî aşkere ye. Ev

peyv di hin devokên me de bûye eşkere. Heta di Hawarê de bi awayê eşkere derbas dibe. Gelek kesên me vî awayî ji xwe re rast qebûl dikin. Ger ku ew dûvajoyên Celadetin Bedirxan dibêjin herêma Botan ji bo bilêvkirina kurdî bingeh e, botî çî bibêjin a rast ew e. Na, Celadet Bedirxan bi xwe jî di Hawarê de dibêje, "Ez botî me lê ez bi kurmancî dinivîsim. Heke min wekî botiyan binivîsiya min dê bigota çêbî, min nedigot çêbû. Yan jî min dê bigota bîk min nedigot bûk." Ev jî nîşan dide ku Celadet bi xwe jî li ser rêbaza gramerê ye. Ne ya filan herêmê yan ya bêvan kesî.

Ji bo rêbaza gramerê ez hin nimûneyan bidim. Hinek gava lêkerê li gorî deman dikîşînin û dinivîsin, dibêjin bihîstin an jî bihîztin. Li vir meseleya dengên /s/ û /z/ yê heye. Em dizanin ku di zimanê kurdî de tewanga lêkeran heye û lêker di dema niha û dema bê de gava tînişandin, tînişandina. Mesela ji bo kişandina lêkera parastinê bibêjim, dibêje diparêzim, ez dê biparêzim, ji bo demên borî dibêje min parast, min parastiye, min dê biparasta û hwd.

Ez dirêj nekim. Ji bo peyvên ku guhertoyên hev in, heta ji me hatiye me awayekî wan î rast tercîh kiriye û me cih daye awayên wan ên din jî. Lê me berê bikarhêneran bi kurtebêja bnrê daye awayê rast.

Ji lew re em mecbûr man ku em wan jî di ferhengê de bi cih bikin. Ji bo ku hîn di vî warî de lihevkiyên me tune ye. Zimanê me yê nivîskî tam

li hev bi keys nebûye. Standard nebûye. Nemaze ji aliyê rastnivîsina cureyên peyvvan ve.

Ev peyv pir in û zêde dubare bûne, sedemê wê çi ye?

Tilî û tilîk, wateya van her duyan jî yek e. Lê ku tu lê binêrî tilî bi halê xwe yê sade ye. Tilîk, careke din hatiye çêkirin û nuansê di navbera wê û tilî de heye. Wekî vê, pêçî û pêçîk jî hene. Carinan ew bi paşgira /k/yê tên biçûkkirin. Êdî ew peyvên ji hev cuda ne. Ji aliyê wateyê ve cudahiyeke di navbera wan de çêdibe. Ji lew re wek du bêtayên ji hev cihê divê mirov hilde dest. Ji aliyê şêweyê ve gelş nîn e. Lê peyva mîna ling ku wekî ning, nik, nig derdikeve pêşberî mirov, xwedî pirsgirêk e. Ji lew re hewce dike ku mirov awayê wê yê rast tespît bike.

Li ser vê peyvê em vê bidin xuyakirin ku ji bilî ketina dangan, guherîna dangan jî tê de çêbûye. Di zimanê me de dengên "l" û "n" pir bi hev diguherin. Wekî "nivîn" û "livîn". Ji neçarî di ferhengê de me cih daye guhertoyê van peyvvan jî, lê heta ji me hatiye me awayê wê yê rast ji xwe re esas girtiye û bi kurtebêja bnr jî, berê bikarhêneran daye ser a rast.

Hûn carinan dibêjin ev ne dewlemendiya zimanê kurdî ye. Bi rastî jî ev sergêjîyek e. Gelo çareya sadekirin û zelalkirina van peyvvan tune ye?

Wiha bibêjim, pirsgirêka me di tilî, pêçî an jî pêçîkê de nîn e. Problem ev e. Hin peyv hene ku gelek guhertoyên wan hene. Herêma ji hev cuda bi lêv

dikin. Pêwîst e ku em ji nav wan awayê herî rast bibijêrin û di zimanê nivîskî de wê bi kar bînin. Ji bo zelalbûna mijarê ez li ser nimûneyekê rawestim. Kêrgoşk, kêvroşk, kîvroşk, kîroşk û her wekî din. Pirs li vir ev e: Gelo ji van kîjan a rast e. Ji ber ku ev guhartoyên hev in divê em yek jê li gorî pîvaneyan ji xwe re rast bipejirînin.

Ji bo ku bê zanîn bê em çawan nêzikayî li peyvên wiha dikin, ez hinek li ser vê nimûneyê bisekinim. Peyv, peyveke hevdudanî ye, ji "ker", "goş" û parkîta "k"yê çêbûye. Rastiya wê kergoşk e û hin herêma dibêjin kêrgoşk.

Mesela em dê bêhn an bîn, çawa/çawan an çewa/çewan, wisa/wîsan an wesa/wîsin, usa binivîsin. Yanê ez dikarim bi sedan mînakên wiha bidim. A problem li ser van e, ne li ser peyvên sînonîm e. Ji ber ku hîn zimanê me yê nivîskî nebûye xwediyê standardekê û her nivîskar an weşanek xwedî hin rastnivîsan e. Ez jî neçar mam min ew awayên peyvvan di ferhengê de bi cih kirin. Jixwe bi domana demê re, hêdî be jî awayên hin peyvvan derdikevin pêş û bi mudaxaleyê zanistî ew peyv bere bere di zimanê nivîskî de cihê xwe digirin.

Ji bilî van peyvên ku ji aliyê şêkil ve guhertoyên hev in, peyvên me yên hemwate jî, serêşiyê, sergêjîyê çêdikin. Bikarhênerên zimên ji xwe re metel û heyîrî dimînin ka kîjanê bi kar bînin.

Bivil, difin, kep û poz peyvên sînonîm in, ango hemwate ne. Îcar li herêmeke me ya din

poz xwedî wateyêke xerab e.

Xebitîn, şixulîn, şiqulîn, şol kirin, an jî nexş û neqş, fikirîn, fedkirîn û fikirin, qise û qezî, kivkarik, kiyark, kîdark, kuvark, karî, karok, kardî û nîzanim çî. Mînakên wiha zehf in û hemwateyên hev in. Lazim e em ji van re çareyekê bibînin.

Ji bo bersiva vê pirsê ez dixwazim vê bibêjim. Karê me zor û dijwar e. Pêwîst e em bi awayekî zanistî li ser wan rawestin û awayekê jê ji xwe re rast bipejirînin. Her wiha, divê em zaravayên xwe yên din jî li ber çavan bigirin û yên hevpar ango muştêrek ji xwe re tercîh bikin ku ew di zimanê me yê nivîskî de derkeve pêş. Bi vî awayî qet nebe di warê zimanê nivîskî de em dê karibin hinekî din zaravayên xwe nêzi hev bikin. Bi vê kirinê, belkî em karibin piçekî ji sergêjîyê xwe rizgar bikin.

Hin peyv hene ku xwedî gelek wateyan in. Ev peyv di her du ferhengan de jî pir in. Gava ku pêdivî pê çêbe, gelo mirov çawan jê sûd wergire û kîjanê esas bigire?

Bikaranîna ferhengê bi serê xwe zanebûnekê dixwaze. Kesê ku ferhengan bi kar tîne û bixwaze sûdê ji wan wergire, divê bizanibe ferhengê bi kar bîne. Ev yek, a duyemîn, ji ber ku ev ferheng ferhengên du zimanî ne ku yek tirkî-kurdî û ya din jî kurdî tirkî ye, divê mirov van her du zimanan baş zanibe. Gava ji ya tirkî-kurdî îstifade bike divê ku tirkî baş bizanibe ku kurdiya wê ya rast bibîne, yê ku ji ya kurdî-tirkî sûd wergire,

divê ku kurdî baş bizanibe ku bikaribe tirkîya wê ya rast bibîne.

Aliyê din jî dimîne li ser amadekarê ferhengê, ku divê ew jî zelaltir û fehmbartir karibe mijaran hilde dest, şîrove bike, bi hevokên nimûneyî jî bike ku bikarhênerên ferhengê nekevin kêmasî û şaşîyan.

Mesela ez bibêjim, ez gava li ya tirkî-kurdî dinêrim eger aqilê min ê îro bûya min ê bi awayek din nêzikayî lê bikira. Ji lew re ez dixwazim careke din li ser ya tirkî-kurdî bisekinim ku ez wê hîn siviktir û fehmbartir bikim.

Tiştên ku em nefikirîne, di piratikê de tu dibînî ku divê ne wisan bûya. Ez jî aliyê pratîkbûna ferhengê ve vê dibêjim. Ji bo nimûne, diviya ku min ji bo hemûyan hevokên nimûneyî bidana da ku hêsantir bibûya.

Em wê jî ji bîr nekin ku fehngên du zimanî ji sedî sed bersiva her tiştî nikarin bidin. Hinek jî li ser qabiliyeta bikarhêneran dimîne.

We di her du pêşgotinên xwe de jî gotiye ku ev ferheng di esasê xwe de ya kurmancî ye, ne ya kurdî ye. Gelo çima?

Em dibêjin zimanê kurdî, lê zimanê kurdî di nav xwe de xwedî çar zaravayan e, heta hin kes hejmarê zêdetir dikin. Gava tu navê kurdî lê datinî yên ji zaravayên din dibêjin, "Ma ku kurmancî kurdî be, nexwe zaravayê me çi ye." Kurdî ji bo hemu zaravayan tê gotin. Ev navê wan î raser e.

Ligel ku min wekî navê

kurdî tercîh kir jî, min pêwîstî pê dît ku ez bidim xuyakirin ku ev ferhenga tirkî-kurmancî an jî kurmancî-tirkî ye. Çaxê ku kesên ne kurd ji van ferhengan sûd wergire bizanibe ku ev kîjan zarava ye.

Jixwe kevneşopiyek çêbûye, kesên ku ferheng amade kirine tavan gotine ferhenga kurdî. Lewma me jî da ser wê rêçê. Ev nayê wê wateyê ku me ji zaravayên xwe yê din jî îstifade nekiriye, sûd ji wan negirtiye. Nemaze ji soranî. Lê ev ferheng, bi taybetî yê zaravayê kurmancî ne.

Li gorî we, ji bo standardkirna ziman rola ferhengê çi ye?

Wekî her tiştê me, zimanê me jî di rewşeke ne asayî de ye. Heta ku rastnivîseke me ya ku her kes li serê li hev kiriye, tune be, tu dê çawan ferhengê amade bikî?! Ev bi serê xwe jî me re gelşeke mezin e. Em hîn ne xwedî vekîteke welê ne ku li ber destê me heye û her kes li gorî wê dinivîse.. Ne ku em dibêjin qayde û rêzîkên zimanê me nehatine danîn. Ji vî aliyê ve em ji Celadet Bedirxan re minetdar in. Lê hemû cureyên peyvên me yek bi yek nehatine tespîtkirin û awayê wan ê rast nehatiye diyarkirin. Ev yek wek gelleşeyê mezin li ber me sekinandî ye.

Her kes xwediyê fikrekê ye. Me her tiştî bi xwe neda destpêkirin. Der barê vekîte de xebatên hin kesan hene. Di pratîka nivîsandinê de me hin tişt bi hev û din dan qebûlkirin. Şaş be jî me wisan biryar li ser şeweya hin peyvên girt.

Lê ferheng bi ya min her çiqas armanceke wê ya wisan tunebe jî lê êdî bû wek rêbera rastnivîsê jî. Ji ber ku gelek kes tiştan ji min dipirsin, didin xuyakirin ku rastnivîsa ferhengê ji xwe re rast dipejirînin. Lewma ez wisan dibêjim. Lê ez angaşt nakim ango îdia nakim û nabêjim ferheng jî aliyê rastnivîsê ve jî bêtêmasî ye, tu qusûr tê de nîn e. Her tişt diguhere. Bi qonaxa demê re ramanên mirov, biryar û angaştên mirov jî diguherin. Zanebûna mirov zêdetir dibe, vê gavê mirov çewtiyên xwe jî dibîne. Li gotina xwe poşman dibe.

Lê em nikarin li hêviya ku bila her tişt çêbe, bila bikemile û hêja em dest biavêjinê, bimînin. Wext li me dereng e, bi rastî jî leza me heye. Bi vî zimanî, bi vî zaravayî êdî ji berê bêhtir tê nivîsandin û weşan tê kirin. Lewma jî divê em lez bikin û bilezînin. Ji aliyê ziman ve bingehê xweş bikin. Riya bikarhênerên ziman rast bikin.

Pêdiviya resenkirina zimên heye? Gelo resenkirina zimên, dê rîskê jî bi xwe re neyne? Hûn vê yekê çawan dinirxînin?

Ez bi xwe dibêjim ku divê mirov tehdeyê li zimên neke. Ziman, divê di destê bikarhêneran de neke qarewar; neke hawar û gazî. Li ser rûyê erdê tu zimanekî xwerû nîn e. Di hemû zimanan de peyvên biyanî hene û zimanê ku bûbe zimanê nivîskî, bûbe zimanê perwerdehiyê jixwe nikare bê angaştin ku di wî zimanî de peyvên biyanî nîn in.

Ew zimanên ku êdî bûne zimanên sereke yên dinyayê wekî îngilîzî û fransî, wekî erebî ku ev ji bo alema îslamê zimanekî hevpar e, ew bi xwe jî nikarin biangêjin ku zimanê wan zimanekî xwerû ye, hemû peyv û biwêj ji binyata zimanên wan tên û wan ji zimanekî din tiştek nestandiye. Na!

Lê ev heye, hin peyv, têgihên ku pêwîstiya zimanê me bi wan heye ger em karibin li gorî binyata zimanê xwe, bêyî ku em zorê bidinê, bi pêrkît, parkît û navkîtan, bi teknîka peyvên hevedudanî wan çêkin, çima em çênekin?! Zimanê me ji vî aliyê ve xwediyê derfetên baş e. Ev derfet destûrê didin ku mirov peyvên nû li zimanê xwe zêde bike. Ji xwe her netewe serî li vê rêbazê dide. Lê bi şertê ku em zorê nedin zimanê xwe.

Lê ku em nikaribin bikin û di ser de jî em xwedî helwesteke wisan bin, bi vê helwesta ku divê hemû peyvên zimanê min resen bin, kurdî bin em dê dasê li gûzika piyê xwe bixin. Em dê ziyane bigihînin zimanê xwe. Em dê wî tehl bikin. Eger em wê bikin dê zimanekî nefehmbar, yê tenegehîştî derkeve rastê. Belkî ji me pê ve dê tu kes jê fehme neke. Her wiha eger em di şûna peyvên biyan de bixwazin peyvên resen ên kurdî bi kar bînin, em dê sîstema kodan a zimên têk bibin û bikin marekî nivkuştî. Mesela hin biwêjên me hene ku tê de bêjeyên biyan derbas dibin, eger li şûna wan em yên kurdî bi cih bikin, wateya biwêjê tev de têk diçe. Ji bo nimûne em balê bikişînin ser vê biwêjê: "Din-

ya alem bi me hesiya." De werin em dinya û alemê ji jê biavêjin û peyvên resen ên kurdî li cihê wan deynin. Cîhan û gerdûn bi me hesiya. Ma li rastê êdî biwêj dimîne!

Bi kurtasî, tiştê ku ketiye zimanê me êdî malê gencîneya zimanê me ye. Lewma min di ferhengê de cih da hemû peyvên ku ketine zimanê me, bêyî ku ez li rayek û koka wan binêrim. Li wir qesta min ne ew zimanê şikestî û asimilbûyî ye. Êdî ev maye li ser helwesta bikarhênerê zimên. Di vî warî de ew xwediyê çî siyasetê bin, dê li gora wê siyaseta xwe li ser zimanê kurdî bi kar bînin. Eger rabe bibêje, "Ez dixwazim zimanekî xwerû yê kurdî bi kar bînim.", tu nikarî bibêjî, "Tu çima wisan dikî?" Tu dikarî rexneyan lê bigirî, lê tu nikarî jê re bibêjî tu wisan bikî ez ê te ceza bikim. Di çarçoveya rexneyê de her kes dikare rexneyê li zimanê hev bigire, bê ka çî qas li gorî siruştaya zimanê kurdî ye.

Ziman jî mîna organîzmayeke candar e. Zindî ye, xwedî rêzik û qaliban e; xwedî riyên vegotinê ye. Şayes ango teswîrên wê hene. Rîyeke ku tê de diherike heye. Divê haya mirov têr baş ji taybetiyên zimanê mirov hebe û ziman ne aîdî yekî ji me bi tenê ye. Ew ê me giştan e.

Wekî amadekarê du ferhengan tu rewşa zimanê kurdî çawan dibînî?

Divê mirov bi du awayan li zimanê kurdî binêre. Yek ji navê ve, yanê zimanê kurdî çî ye, têr dike nake û hwd. Aliyê din jî ev e; divê mirov ji aliyê derve ve lê binêre, ku rê li ber hatiye girtin, hatiye qedexekirin. Rê nehatiye dayîn ku ew peresîna xwe, werariya xwe berdewam bike. Her wiha bi vê yekê jî nemanê, ev ziman hatiye talankirin jî.

Heke mirov li gorî asta cureyên civakan li kurdî (nemaze ez ji bo zaravayê kurmancî dibêjim) binêre, mirov dibîne ku kurdî li gorî civaka feodal werariya xwe temam kireye, kemiliye. Heta tu dikarî bibêjî ku tu kêmasiyên wê, ji wî aliyê ve nemabûn. Werar bûye, tekamil bûye, bi rihetî hewcedariyên xwe dabîn û bîter kirine. Lê piştî ku hatiye qedexekirin û rê li ber hatiye girtin bi şûn de, ketiye rewşa têkçûnê.

Ziman tiştêkî wisan e ku tu bi kar neynî, wînda dibe. Ji heyama Komara Tirk bi vir ve, ji ber ku rê li ber hatiye girtin û hatiye qedexekirin, pêşketina wê rawestiyaye, li cihê xwe jî nesekiniye, berevajiyê wê, bi paş ketiye. Paşketin tê de çêbûye. Nikarîbûya rewşa xwe ya heyî biparêze. Lewma peyv û têgihên wê, biwêj û qalibên wê hatine jibîrkirin.

Îro em dêhna xwe didinê, kesên ku ji dibistanên tirkî rabûne, bi qasî ku dikarin bi tirkî bipeyîvin, bifikirin û ya dilê xwe vebêjin, ew çend nikarin bi kurdî biaxivin û ya di dilê xwe de bibêjin, raman û hizirên xwe derbibin. Ji ber vê yekê xwendeyên kurd bi

qasî nexwendeyên kurd, bi zimanê xwe nizanin. Digel vê yekê, dîsan em bi rihetî dikarin bibêjin ku zimanê kurdî têra xwe heye. Tenê pîrsgirêka wî ev e ku qedexetî, rêlibergirtin û astengên li pêşiyê bên hılanîn. Gava destekî zanistî têkilî wî bibe, ew kil û kêmasiyên ku hene dê ji holê bên hildan. Ziman jî birêkûpêk bibe, biserûber bibe. Ez bi dilekî saf, vê bibêjim, bi rastî jî zimanê kurdî zimanekî zengîn û dewlemend e. Teknîca zimanê kurdî bi xwe destûrê dide te ku tu têkilîkirineke baş lê bikî û vî zimanî ji rewşa neyînî rizgar bikî. Peyvên nû, yên ku hewcedarî bi wan heye jî, mirov pir bi hêsanî dişê ji pêrkît (pêşgir), navkît (navgîr) û parkîtan (paşgiran) dareje û çêke. Jixwe her ziman wisan dike. Di her zimanî de peyvên nû ji binyada zimên tên bidestxistin.

Gelo li Bakur xetere li pêşiya ziman heye? Ziman di çi rewşê de ye?

Ji sala 1991'ê bi şûn de, di dema Ozal de, li Tirkîyeyê qedexebûna li ser zimanê kurdî hate hılanîn. Ji wê bi şûn de weşanên me bi kurdî derketin. Kasetên bi kurdî derketin. Ne ku em dibêjin rê li ber nehate girtin û nehatin astengkirin. Qet nebe, ji hêla qanûnî ev asteng neman. Astengî di kirdariyê de çêbûn. Îcar kesên ku kar û barên xwe bi tirkî dikirin, hêdî hêdî lê vegeyan û karên xwe bi kurdî jî kirin.

Di warê zimanê kurdî de, li Bakur pêşketinek çêbû. Dezgehên me yên ku li ser

kurdî dixebitin, yên bi kurdî xebatên xwe dikin hatin damezirandin. Her çend ev dezgeh bi piranî ne di nav gel de bin jî karên baş kirin û niha jî dikin. Bi vê yekê, ev meseleya asîmilasyonê bi awayekî

Zarok, dahûtiya neteweyê ne. Eger zarokên wê neteweyê bi zimanê xwe perwerde nebin, bi zimanê xwe nepeyivin, nenivîsin ew ziman dikeve xetereyê. Heke zarokên me bi zimanê xwe mezin nebin û bi zimanê dê û bavê xwe ranebin, xetere gelek mezin e. Nexwe asîmilasyon li ber deriyê me di kemîne de ye. Bi rastî divê em baş li halê xwe bifikirin. Ziman bi me kesên navsere, bi me kesên xwende nafilite.

hate şkandin. Rê li ber hin tiştan hate girtin û hêdî hêdî zimanekî me yê standard ê nivîskî li nav gel belav bû. Ziman jî bi pêş ket, hejmara kesên ku niha bi kurdî dinivîsin, dixwînin, diaxivin zêdetir bûye. Vejînek çêbû. Ev cihê kêfxweşiyê ye. Lê xetereyêke din heye, divê em wê jî bibinin.

Zarok, dahûtiya neteweyê ne. Eger zarokên wê neteweyê bi zimanê xwe perwerde nebin, bi zimanê xwe nepeyivin, nenivîsin ew ziman dikeve xetereyê. Heke zarokên me bi zimanê xwe mezin nebin û bi zimanê dê û bavê xwe ranebin, xetere gelek mezin e. Nexwe asîmilasyon li ber deriyê me di kemîne de ye. Bi rastî divê em baş li halê xwe bifikirin. Ziman bi me kesên navse-

re, bi me kesên xwende nafilite. Çimkî yên ku wî zimanî ji me teslîm bistînin û dewam bikin, zarokên me ne. Divê em zarokên xwe ji bîr nekin. Ji lew re zarokên me ayendeya me ne, dahatûye me ne. Ji ayendeya me re, xetereya herî mezin ez dibêjim ev e. Divê zarokên me bi vî zimanî rabin.

Vekirina kursan çi tesîr dikare li ser asîmilasyonê bike?

Vekirina kursan pêngavek e. Em behsa rejîmekê dikin ku ev 80 sal in li ser înkara kurdan xwe berdewam kiriye. Ev ancax dikare qulêreke biçûk di vê sistemê de veke û roniyê bixe ser riya te ya tarî.

Lê ev têrê nake. Em qîma xwe bi tenê bi vekirina kursan binin em ê bi destê xwe mala xwe xera bikin. Di vê serdemê han de, eger ziman nebe zimanê bazarê, nebe zimanê perwerdehiyê, nebe yê xwendin û nivîsandinê, nebe yê her warê jiyane, nikare ji mirinê xelas bibe. Nexwe ev ziman dê hêdî hêdî pûç bibe, bihele û ji navê rabe. Ji bo ku ev ziman winda nebe, geş bibe zimanê tirkî xwedî çi mafî be divê zimanê kurdî jî xwedî wî mafî be.

Îro bi tenê zimanê me li herêmên gundewar serdest e. Berê li bajar û navçeyên me jî ev ziman zîndî bû. Digel ku ew qas pêşketin çêbûye jî, em dibînin ku zimanê me li van deran bi awayekî lez û bez berepaş diçe. Wisan bûye ku êdî di gundan de jî zarokên me bi tirkî dipeyivin. Zimanê zarokên me ne bi kurdî, lê dibe bi tirkî.

Baş bala xwe bidê, gelê me biçûk mezin tev mesajên xwe yên bi telefona destan bi tirkî dinivîsin. De em ji xwe re bifikirin ku gava şivanê me yê li serê çiya jî mesajên xwe ne bi zimanê xwe, lê bi tirkî binivîse, divê mirov rûne li ser halê xwe têr birame. Ziman bi rastî hestiyê piştê yê netewayan e. Eger zimanê me ji destê me here, em wekî netewe nikarin li ser piyan biminîn.

We 131 hezar peyv çawan hesab kirin, ferhengên tirkî an jî yên din çawan hatine hesabkirin?

Îro derfetên gelek mezin hene. Kompîtûr tişteki wisan e ku tu bi kompîtûrekî dikarî serê hemû madayan hesab bikî. Me jî bi kompîtûrê hesab kir. Min peyv hejmartin û berde-wamiya wan jî yek bi yek hejmartin. Ji ber ku min nikaribû bi kompîtûrê bihejmartin. 131 hezar serê made yê û 35 hezar jî berde-wamiya madeyê ye. Bi tevahî 166 hezar made. Ferhenga Saziya Zimanê Tirkî (Turk Dil Kurumu), ya ku van salên dawî derketiyê, 50 hezar serê madeyê, 25 hezar jî berde-wamiya madeyê ku bi giştî 75 made ye.

Di van madayan de peyvên sînonîm hene, yên ku ji aliyê şekil ve guhertoyên hev in, hene. Yên ku sînonîm in, tu mecbûr î wan bidî, ev wek madeyek tê hesabkirin. Wekî axaftin, peyvîn, qise kirin, ştexilîn, şor kirin, xeber dan. Ev sînonîmên hev in lê ji hev cuda ne. Qezîkirin û qisekirin guhartoyên hev in. Me peyva qezî jî daye, lê me bi kurtebêja bnr (binêre) berê bikarhêner

daye peyva qise.

Ji ber ku zimanê kurdî (qesta min kurmançî ye) hîn di warê zimanê nivîskî de bi keys nebûye, loma em jî neçar man ku em hin guhartoyên peyvyan jî bidin. Em bala xwe didinê ku di zimanê nivîskî de jî hevnegirtineke rastnivîsa peyvyan heye.

We hem di ferhenga kurdî-tirkî de hem jî di ya tirkî-kurdî de koka peyvyan diyar nekiriye, ji ber çi we diyar nekir?

Belê, beriya ku ez dest bi xebatê bikim min bi taybetî bala xwe da ferhengên du zimanî. Ji ber ku ferhenga ku min dê amade bikira dê du zimanî bûya. Hema bibêje bi giştî kesî etîmolojîya peyvyan yanî koka wan destnîşan nekiriye, nedaye xuyakirin. Tiştê ku girîngî pê tê dayîn ev e: Bi riya zimanekî tu zimanê xwe bidî hînkirin. Niha em jî aşkera bibêjin, bi riya zimanê tirkî em dixwazin kurmançî bidin hînkirin. Ê ku hindik dizane kurmançiya xwe pê bi pêş dixê, zengîntir û dewlementir dike. Min ji bo vê yekê dayîna koka peyvyan pêwîst û girîng nedît.

Lê min hemû cureyên peyvyan dan. Ew nebûya nedibû. Cureyê peyvê çi ye, nêr e, mê ye, nêtar e, navdêr e, hoker e, rengdêr e, cînavk e, daçek e; lêkerekê çawan e, tebatî ye, lebatî ye, gerguhêz e, negerguhêz e me ev tev di ferhengan de nîşan kirine. Tu koka peyvyan nedî jî dibe. Ev meseleya tercîhê ye. Ne ku kêmasî an jî zêdehiyeke wê ye. Lê eger tu di ferhengên yek zi-

manî de, peyvên zimanê xwe bi zimanê xwe şîrove bikî, divê tu etîmolojîya wê, koka peyvê jî bidî. Ev nebe nabe. Ev ji ber vê yekê bû; me wisan guncan dît.

Hûn ferhengên xwe bi çi awayî bi nav dikin? Ferhengên berhevkerinê ne, ferhengên fireh û mezin in, çi ne?

Ferhanga şeweyê berfireh e, ya mezin e. Lê ji bo rewşa me ya awarte, ya neasayî, em neçar mane ku ji cureyên ferhengên din, bêhemdî be jî, îstifade bikin. Me di bersiva pirsekê de diyar kir. Ji ber ku hîn peyvên me bi giştî, yên tîn zanîn, ji aliyê şekil ve, ji aliyê rastnivîsê ve lihevhatinek li ser wan çênebûye û hîn jî li rastê, li ber destê me rêbereke rastnivîsê ku hemû cureyên peyvên kurdî di nav xwe de dihevine tune, em neçar man ku em guhartoyên wan jî bidin. Yanê em bibêjin nogin e, newgon e, nûgon e, li ser van bivê nevwê em dikevin tengasiyê.

Me li gor bîr û bawerîya xwe, li gorî zanebûna xwe û li gorî pîvaneyên xwe ku em ji wan bawer in, em dibêjin ilmî ne, me şekilê wan ê rastnivîse tercîh kir. Xwezî me ev merhala li dû xwe hiştibûya, em li ser şeklê peyvyan gihîştibûna lihevhatinekê û ji vê geromolê, ji vê sergêjahiyê xelas bûbûna.

Li jor di axaftinên we de hûn li ser hin rexneyan sekinîn. Lê em dîsa bipirsîn, he-ta îro gelo rexne li we hatine girtin, eger hatibin girtin ji kîjan aliyên ve rexne li we

hatine kirin?

A rast tiştê ku min hêvî dikir pêk nehat. Ji bo her du ferhengên jî rexne û nirxandinên ku min hêvî dikirin, ez li bendê bûm, nehatin. Em hînî du terzê rexneyan bûne. Em nebêjin terz, em hînî du gotinan bûne. An em dibêjin mala te ava, dest û pêçiyên te ter bin, an jî dibêjin ne baş e, şaşî hene.

Bi awayekî başbaş nirxandin nehatin kirin, krîtîkên wan nehatin kirin. Aliyên wan ên kêr, aliyên wan ên baş li ber çavan nehatin raxistin. Kesek du kes ne tê de ku wan bi nivîskî ji min re şandin ku li ser ya tirk-kurdî bûn. Li ser a kurdî-tirkî hîn jî rexneyên bi nivîskî negihîştin ber destên min. Lê ez li hevîyê me, ez ne xwediyê wê angaşte (îdiayê) me ku ferhengên min amade kirine bêkêmasî û şaşî ne. Her wiha angaşta min a ku çî peyvên kurdî hene min di ferhengên de bi cih kirine jî tune.

Jixwe heta rewşa asayî çênebe em nikarin li her deverên welatê xwe bigerin, bi her kesî re bêendîşe, bêfîkar, bêtirs bidin û bistînin. Em neşên xebatên meydanî bikin, xebatên lêkolînî yên li ser zargotinê û li ser berhemên xwe yên klasîk bikin. A heta ev xebat pêk neyên em nikarin bibêjin em xwedî ferhengeke ya neteweyî ne. Jixwe ew ferhengên ku min amade kirine jî ne xwedî wê angaşte ne. Ew ferhenga ku em li hevîyê ne, ya kurdî bi kurdî ye. Divê ew bê amade kirin. Heta ku em ne xwediyê wê ferhengê bin em nikarin bibêjin em xwedî ferheng in.

Helbet gotinên mîna dest û pêçiyên te ter bin, mala te ava, spas û hwd. xweş in. Mirov pê kêfxweş dibe. Lê ji bo ku xebat baş û biserûbertir bîn kirin, hem alîkarî lazim e hem jî rexne û nirxandinên di cih de. Rexne jî divê bipalpişt bin, bi delîl û mesnet bin. Ne ku em pesnê hev bidin, an jî em dexesî û çavnebariya hev bikin.

Berê peyv di nav jîyanê de belawelayî bûn. We ew nêçîr kirin, we ew berhev kirin û anîn ba hev. Jê jî behrek pêk anî. Gelo jiyîna bi peyvan re, rabûn û rûniştina bi wan re hesteke çawan e? Nêçîrvanî hîn jî didome?

Ji ber van gotinên we yên dilxweşker spasiyên xwe pêşkêşî we dikim. Bi rastî yên ku min nas dikin, dizanin ku ev serê çendik û çend salan e ku ez hem serê xwe bi peyvan re diêşînim hem jî nêçîrvaniyê dikim. Lewma hevalan bi vî navî ez bi nav kirim. Bi rastî tiştêkî gelek xweş e. Ji ber ku kêfa min ji zimên re tê, eşqa min jê re heye, loma bi min xweş e. Çawan ku vebînerê ango kaşîfek tiştêkî dibîne pê dilşad dibe, dema ku ez jî peyveke ku ez nizanibim an jî maneyeke wê ya din ku ez pê nehesiyabim ez dibînin, ez pê kêfxweş dibim. Te dît dibêjin ku baskên mirov hebin mirov dikare bifire, a tiştêkî wisan bi min re çêdibe.

Wexta ku hê min dest bi ferhengê nekiribû, lê ez li ser ziman dixebîtim, gotinên wekî "Zimanê kurdî dewlemend e, mezin e" hinek ji min re wek propaganda dihatin.

Her miletekî bindest, gelekî bindest, zimanekî tehdîtî, zimanekî qedexekirî, zanaveke (nasnameyeke) qedexekirî bi her awayî dikeve rewşa xwe parêziyê: Yek dibêje tu nîn î, hebûna te red û înkare, tu jî li ber xwe didî, ji bo ku tu hebûna xwe ji her aliyê ve bidî îsbatkirin, carinan tiştên derî aqil û rastiyê dibêji. Ev tê fehmkirin.

Li hemberî red û înkare mirov ji xwe re li kesên xwe yên qehreman, kesên dîrokî û zanyar digere Mirov dibêje çandê min a dewlemend, zimanekî min î zengîn, edebiyateke min a pêşketî, zargotîneke min a wekî xezîne heye. Bi kurtasî, mirov li kesên zanyar, zana û jîrik, li kesên ku li dinyayê serê mirov bi wan bilind bibe, digere. Mirov dixwaze vîtrîna xwe ya moralê bi kesên bijare û nimûne tijî bike. Da ku bawerîya mirov bi mirov were.

Îcar ez bibêjim, piştî ku ez ketim nav xebata zimên, min dît ku bi rastî jî zimanê kurdî behr e. Ew soberiya (melevaniya) ku ez pê dizanim, têrê nake. Yanê pêwîstî bi eşqeke hîn mezintir û bi zanebûneke hîn kûrtir heye. Dibe ku bala we kişandibe min çend peyv di heman wateyê de bi kar anîn. Divê em van hemûyan bizanibin. Elbet em dê yek jê di zimanê nivîskî de tercîh bikin an jî dê ji ber xwe ve meylek çêbe.

Em pirseke wiha jî bikin. Ên ku dixwazin xebateke bi vî rengî bikin hûn ji wan re çî dikarin bibêjin?

Eger meyla wan, eşq û he-

wesa wan li ser zimanê kurdî hebe û ku bixwazin li ser zimanê kurdî xebatan bikin, heta ku têkoşînê bidin ku ez vê peyvê bi taybetî bikartînim, divê terciha xwe baş bikin. Eger bixwazin bibin zimanzan, bibin pisporê zimanê kurdî, bixwazin bibin zimanzanê zimanê kurdî bila xwe di warê teoriya zimanzaninê de baş bigihînin. Ez niha êşa wê yekê dikişînim. Min zanibûya ez dê bi zimanê kurdî re eleqedar bibim, min sosyolojî nedixwend, min dê filolojî bixwenda, min dê li ser zimanek bixwenda. Qene di warê teoriyê de, di warê metodolojiya van tiştan de ez dê agahdartir bûma û ez dê baştir li ser mijarê zimên rawestiyama. Niha ez tengasiya wê yekê dikişînim.

Tenê zanebûna gramera kurdî, zanebûna ruhê zimanê kurdî têrê nake ku tu bikaribî zimanê kurdî rave û şîrove bikî, bidî naskirin an jî rêzîkên wê, qaydeyên wê bi şewaza liguîstîkê formule bikî. Ji ber vê yekê zimanzanî, agahiyên der barê zimanzanîyê de, metodolojî pêwîst in. Ev tiştên jênager in. Lewma ez dixwazim bibêjim ew kesên ku dixwazin di vî warî de kar û xebatê bikin, bila xwendina xwe ya bilind li ser zimên bikin, çî ziman dibe bila bibe. Û zanabûna bi hin zimanan wekî îngilîzî, fransî, almanî, erebî şert e. Îcar ji bo kurdî divê em farsî bizanibin, em çendek zimanên îranî bizanibin.

Birêz Farqînî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Xelata Zimanê Kurdî ya Feqî Hu-

seyn Sagniç a Yekemîn diyarî te kir. Em bawer in ev xelat ji bo te jî ya yekemîn bû. Tu dikarî ji bo xwendevanên Zendê hest û ramanên xwe vebêjî û bi wan re parve bikî?

Rast e, ev xelata pêşîn bû ku min stand. Ji bo min taybetiyê wê ya cihê heye. Ev xelata ku li ser navê zimanzanê hêja rehetî Feqî Huseyn Sagniç bû, ji bo min xwedî girîngiyê mezin e. Min ji vî zimanzanê gorbihîşt dersên li ser zimanê kurdî wergirtibûn. Ango ez şagirtê wî bûm. Ez pê şanaz im ku wî ji min re mamostetî kiriye û Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê jî ez babet û layîqî vê Xelata Zimana Kurdî dîtîm ku ev jî xelata pêşîn a Zimanê Kurdî ya Feqî Huseyn bû.

Ma ji vê xweştir tiştêkî din heye, şagirt rabe xelata ku li ser navê mamosteyê wî hatibe amadekirin, bistîne! Ez dibêjim qey rewşeke wiha kêman caran tê dîtî. Ji lew re bi standina wê xelatê ez xwe mirovekî bextewer dibînim. Tiştêkî din jî dixwazim bidim xuyakirin. Heta ji min bê ez dê lê bixebitîm ku ez babetî van mirovên hêja bibim, ku bi rastî ne ji ked û xebata wan bûya, me dê wisan bi hêsanî nikaribûya li riya xwe bikudanda. Em spasdarên wan in û em keda wan jî dişêkirînim.

Êdî pirsên me bi dawî bûn. Gotineke ku hûn bixwazin bibêjin heye?

Belê, ez dixwazim wan kesên ku alîkariya wan gihîştîye min, destê alîkariyê dirêjî

Eger meyla wan, eşq û hewesa wan li ser zimanê kurdî hebe û ku bixwazin li ser zimanê kurdî xebatan bikin, heta ku têkoşînê bidin ku ez vê peyvê bi taybetî bikartînim, divê terciha xwe baş bikin. Eger bixwazin bibin zimanzan, bibin pisporê zimanê kurdî, bixwazin bibin zimanzanê zimanê kurdî bila xwe di warê teoriya zimanzaninê de baş bigihînin.

min kirine, derfetên xwe ji min teksîr nekirine û hemû kesên ku di warê zimanê kurdî de xebat kirine, berhem afirandine û bûne sedem ku em xebatên hîn baştir bikin, bi bîr binim, keda wan bişêkirînim û ez bibêjim carekê na hezar carî mala we ava. Eger ne ji we bûya xebatên bi vî rengî pêk nedihatî. Lewma keda we, xebatên ku we kirine bûne palpişt, bûne hêz, ketine çok, dest û milên me; ez ji wan hemûyan re careke din spasîyên xwe pêşkêş dikim.

Em jî wek kovara Zendê dibêjin mala we ava. Hem ji bo hevpeyvînê hem ji bo keda we ku we du ferheng pêşkêşî gel kirin, pêşkêşî gencîneya wê neteweyê kirin. Bi peyvên belawelayî we behrek pêk anî, careke din ji bo wê kedê spas û mala we ava.

Ez jî spasîyên xwe pêşkêşî we dikim ku we firsendek da min da ku bikaribim a dilê xwe ji xwînerên we re parve bikin.

TEORIYA MUZÎKÊ

YA GIŞTÎ -1-

Veysî Varlı

Der barê muzîka kurdî de heta îro xebateke kûr nehatiye kirin. Lê li cîhanê, di vî warî de bi hezaran belge li berdest hene. Eger lêkolîneke baş bê kirin, ev yek bi rihetî dê derkeve holê û bi belgeyan bê belgekirin. Divê neyê jibîrkirin ku, ew kesên navên wan di van belgeyan de hene û tên bilêvkirin, her kesê ku dixwaze li kelepura çandî ya Rojhilata Navîn, bi taybetî jî li ya Mezopotamyayê xwedî derkeve, wek yên xwe nîşan didin (wek mînak ermen, ereb, tirk, fars xwedî li Safiyûdînê Umîyewî/yî yê ku di navbera salên 1224/1294'an de jiyaye derdikevin û li gorî hinekan tirk e, li gorî hinekan ereb e, li gorî hinekan fars e an jî ermenî ye. Lê qet kes nabêje ew kurd e). Ji lew re, di vê nivîsara xwe de em dê hinek li ser vê yekê bisekinin. Muzîka ku bi dîroka mirovahiyê re hemsal e, ku heta îro hatiye, di nav pir guherînan re derbas bûye. Lewma jî em dê di serî de dest biavêjine peywendiyên mirovan û muzîkê. Piştî wê em dê bi kurtayî bastûr (binyad) û dîroka muzîka cîhanê û ya kurdan bînin ziman. Dîsa babeteke ku ez dixwazim diyar bikim ev e; ji bo ku em bikaribin van

mijaran bi her awayên wê ve bidin fêmkirin pêdivî bi pir wext û xebatan heye. Lewma jî em dixwazin ku xwendevanên me vê rewşa me fêm bikin.

"Bi riya lêkolîna civaka arkaîk, der barê meyl û hilberîna muzîka mirovên arkaîk de agahiyên kêmzêde dikarin bîn bidestxistin. Ev yek riya ronîkirina daboriyê ye û metodeke bi dilê mirovan rast

Mirovan, di nav milyonan dengên cur bi cur de, dengên bikêrhatî hilbijartine û anîne dereceke wisan ku mirov nikarin bêyî wê bikin. Tekamûla çandê ku di serdemêke dûvedirêj de pêk hatiye, zimanê çandê jî derxistiye holê. Di vê pêvajoyê de zimanê çandê tîpên dengdêr û dengdar bi awayekî xwe-ser û di nav pergaleke birêkûpêk de bi kar anîne.

e. Mirovên arkaîk, di gurîniya ewran de, sembola hêzen der-sirurîştî, di wîzîniya bageran de dengên ruhên neçêyan, di aramî yan jî xurmîniya behran de qencî an jî xezeba xwedawendan didîtin. Dengvedan, bi awayekî kehanetê, dengên ajalên hovanî wek qasidê

nepeniyê dihate îdraçkirin. Bi vî awayî di destpêka mirovahiyê de, ol û muzîk tevî hev bû. Mirovên arkaîk ku hebana (gencîneya) wan a peyvan teng bû, tiştên ku didîtin hema bi nav dikirin. Ji bo ku hestên xwe, navajoyên xwe û baweriyên xwe yên bi hêzên pîroz vebêjin, ji wan dengên ku hema di wê demê de pêk tên, sûd werdigirtin. Muzîk, her çû bi lorikan, bi zêmaran an jî merasimên bi rengê sêhrê, bi her awayî û di her qadê de ket jiyana mirovên arkaîk. Bi malûmetên gihîştine îro û bi lêkolînên li ser jiyana civaka girtî bûne, tê ferzkirin ku mirovên arkaîk, ji xenceraya xwe re dengên wek dengên çûkan ên zîl (tîz), dengên wek xurmîniya ajalên hovanî yên bemî (pes) derxistine û li hemberî xwezayê ji bo bihêz bin, bi kar anîne. Bi vî awayî dengê ku di siruştiya muzîkê de heye tê bikaranîn." (Kurt Sash, Kisa Muzîk Tarihi).

Mirov xwedî organîzmayeke taybetiyên bîopsîşîk in û hebûna wî çandî û civakî ye. Bi amûrên xwezayî, civakî û çandî, peresana (tekamûla) pêşveçûnê veguhastiye tekamûla çandê û bi vî awayî ji dereceya bîopsîşîk derbasî heyîna çandî kiriye. Mirovan, di nav milyonan dengên cur bi cur de, dengên bikêrhatî

hilibjartine û anîne dereceke wisan ku mirov nikarin bêyî wê bikin. Tekamûla çandê ku di serdemeke dûvedirêj de pêk hatiye, zimanê çandê jî derxistiye holê. Di vê pêvajoyê de zimanê çandê tîpên dengdêr û dengdar bi awayekî xweser û di nav pergaleke birêkûpêk de bi kar anîne. Netî dibêje "Di encama dirûvgirtina vê pergale û tekûzbûna axaftinê de, vî zimanê devkî taybetiyeke awazî (melodîk) girtiye" û sê merheleyên vê sîstemê diyar dike.

1) Ragihana necihêrengî-bûyî (ragihana bihêwirze).

2) Dîtina cudabuyîna di navbera muzîk û zimanê devkî de

3) Merhaleya cudabûna dengên awazî (melodîk). Ango derketina cudabûnê ku di navbera cureyên muzîkê de diqewime (Ew merhele ku dengên melodîk di navbera xwe de cuda dibin tê pejirandin û bi pêvajoya cudabûnê re derdikeve dereceya bilind).

Ji ber vê yekê jî, em dikarin ji aliyê jêderkên dangan û çavkaniyên wan ên bingehîn, bi sê şaxan ji hev biqetînin.

1) Dengên xwezayî (mînak, wîtniya çûkan)

2) Dengên civakî (mînak qîrîna mirovan)

3) Dengên çandî (mînak makîne, erebe û hwd.)

Ew dengên li jor di qada muzîkê de xwedî bandor in. Ji ber ku hinek zewq, coş, dilxweşî didin, hinek jî xem, keser, êş. Em hinekan red dikin, hinekan dixunifên û dipejirînin. Di nav gerdûna den-

gan a ku em dorpêç kirine de, dengên muzîkê xwedî cihekî cuda ne. Çimkî li ser nîrxên ne estetîk bin û senteza dengên muzîka wan ne estetîk be angog dengên li derveyî muzîkê bin bilind nabe, lê li ser taybetiyên wilo bilind dibe ku li aliyê kok, qewimîn, armanc û fonksiyonê ve wan ji hev diqetîne û cudatir dibin. Bi vî awayî çar taybetî hene ku dengên muzîkî dengên din ji hev diqetînin.

1) Ên ku terîfkirina wan gengaz in

2) Ên ku kategorîzekirina wan gengaz in

Peyva muzîkê ya ji aliyê mirovên ku îro li Tirkiyeyê dijîn (tirk, kurd, ereb, laz, çerkez û hwd.) ve tê bikaranîn, li gor awayê denganiya (fonetîk) fransîzî bi cih girtiye. Li Mezopotamyayê û çar sed salên serdema Osmanî yê ewil, ev huner bi navê îlmî şerîf hatibû binavkiribûn, ji dozdeh zanistan yek e û ew wek zanistekê hatiye ecibandin

3) Ên ku diyarkirina wan gengaz in

4) Ên ku bi navgîna dengên mirovan an jî bi navgîna amûrekê derxistina wan gengaz in. Ên ku derveyî van dimînin dengên amuzîkî (derîmuzîk) ne.

Ji aliyê kirpandina şidetê ve, bihîstina hemû dangan ji bo ademîzad bi awayê biyolojîk ne gengaz e. Deng, tê terîfkirin ku bûyereke fizîkî ye û

bi lerza dargî pêk hatiye. Ji bo lerza dargî pêdivî bi hêzê heye. Bi kesafeta hêzê ve dengên ku mirov dikarin bibihîzin di navbera 16 û 7552 frekansan de ne (hin fizîknas jî dibêjin ku di navbera 20 û 20.000'an de ye). Ew dengên ku bihîstina wan gengaz e, ji yê ku herî bemî (pes-stûr) ne bigirin heta yê zîl (tîz-zirav) in, ji gumlata (kutle) dangan re dibêjin pêlekana (merdiwan) dangan. Pêlekana dangan ku nêzî 8 (heşt) oktavan e, hemû dengên ku em di qada muzîkê de bi kar tînin di nav xwe de dihewîne.

Muzîk çi ye? Ew çawan vedîtine?

Muzîk îcad bû an hat vedîtin û ji aliyê mirovan ve wek zimanekî hevbeş hat bikaranîn? Beriya vê pirsê, em bersiva pîrsa "muzîk çi ye?" bidin, ez bawer im ku em dê bersiva vê pîrsa jorê hêsantir bidin. Wateya wê peyvê ji grekî, ji bêjeya mousa-mouz (perî-best/îlham -periya bestê-neh periyên biçûk) û qertafa ika/ike tê dawîya wê û wateya hunera periyên, a/ê periyên digire. Ji aliyê kokê ve grekî ye lê her netewe û gelî li gor xwe dirûv dayê. Wek mînak; bi almanî müğzîk, bi erebî el müğzîka, bi farisî musîkal, bi osmanî musîkî, bi fransîzî müzik tê zimên.

Peyva muzîkê ya ji aliyê mirovên ku îro li Tirkiyeyê dijîn (tirk, kurd, ereb, laz, çerkez û hwd.) ve tê bikaranîn, li gor awayê denganiya (fonetîk) fransîzî bi cih girtiye. Li Mezopotamyayê û çar sed

salên serdema Osmanî yên ewil, ev huner bi navê *ilmî şerîf hatibû binavkiribûn*, ji dozdeh zanistan yek e û ew wek zanistekê hatiye ecibandin (ji sedema ku peywendiyên wê bi sîstema kâinatê re heye di hin çavkaniyan de wek *ilmî nücum/necm* tê tebîrkirin). Bi navê mefhûma *ilmî şerîf* em bi rihetî dikarin bibêjin ku ew berhema mezin a bi navê Rîsaletul Şerefiye ya mamosteyê muzîka kurdî Safiyedîn Urmîyeyî/wî ku di navbera 1224-1294'an de ji-yaye nivîsiye, navê xwe ji vir digire. Wateya peyva şerîf, pîroz e. Her çî qas em îro navê *ilmî şerîf* bi kar nayînin jî, peyva muzîkê di grekî de wek hunera periyon, a/ê periyonango pîroz tê bikaranîn. Piştî vê wateyê, dema em vegerin ser pirsê "muzîk çî ye?", em tenê bersivê bidin hem ne rast e hem jî wateya wê cihê xwe nagire. Mirov dikare wateya felsefîk, civakî û wateya binyada wê (struktur) bi pîrrengî wateyê lê bar bike. Wek mînak:

Ji aliyê metafîzîk ve

- 1) Muzîk berhema nepeniyê ye (Herder).
- 2) Muzîk berhemeke xwedayî ye (Bethooven).
- 3) Muzîk lihevkirina di navbera esman û erdê de ye (Konfîçyus).

Ji aliyê ziman ve

- 1) Muzîk zimanê Xwedê ye (Eflatûn).
- 2) Muzîk zimanekî gerdûnî ye (Cotîn).
- 3) Muzîk zimanê ruhê mirovan e (Reber).

Ji aliyê naverokê ve

- 1) Muzîk, bi navgîna dengên vegotina hestan e (Koch).
- 2) Muzîk, hestek e ku mirov di xwe de dihesê û berê li ser xwe disêwirîne, pişt re ji bo kesên din bibihîzîn, bi navgîna dengên wan ragihandin e (Tolstoy).
- 3) Muzîk, mîmarî dengen e (De Stael).

Ji aliyê hêmayan ve

Muzîk, pêşveçûneke awaz û rîtmê ye. Rîtm, bingeha muzîkê û bi awayekî cewhera wê ye. Lê muzîk, ne hunereke qewimî ye. Rêza awazî ji rîtmê girîngtir e (prof. Îdman).

Ji aliyê pêkanîne ve

Muzîk, hunera pêkanîna estetîkê ye û zanist e ku bi awayê armanç û metodekê li gor feraseta bedewiyê, dema raman û hestên xwe nikare bi zimanê axaftinê îfade bike, bi riya ragihandinê lê bihevkirina qerekerên dengên mirovan tê ristin û hevgirtina wê tê pêkanîn.

Ji aliyê qada teng ve

Peyva muzîkê, zanist an jî hunereke bi dengên pêk tê, tîne zimên. Zanista muzîkê, di sedsala dawiyê de bi giştî di cîhanê de, di nav zimanê perwerdeyê de bûye xwedî kursî û ji vê qadê re gotine muzîkolojî. Ji yên ku lêkolîn û lêgerîna vî karî dikin re dibêjin muzîkolog. Muzîsyen îcrakar û pratîker e. Lê muzîkolog lêkolîner e.

Bi awayê hunerî muzîk çî ye?

Muzîk, giştîya peywendî û

çawanîyan e ku vegotina wan a hunerî heye, da ku karibe di nav xwe de lihevkirineke rêkûpêk, hest, raman, sêwiran, şopandinê wergire û her wiha bikaribe avabûneke estetîk damezirîne. Wek huner muzîk, behremeke giştî ye ku bi pêvajoya xema muzîkê, gerîna ku xwedî ruhekî estetîk, afirandin, zarevekirin û şîrovekirinê pêk tê. Ji ber vê sedemê jî, her îcrakarê muzîkê ne hunermend e.

Hawira muzîkal

Di hawira ku kes lê dijîn de, muzîkên ku çavkaniyên wan, cureyên wan, fonksiyonên wan hene û ligel avabûnên xwe, di nav hev de ne. Wek hemanên çandê li ser hev bandor dikin, ji hev bandor digirin û jidayikbûnê heta mirinê di bin bandora jiyana rojane de ne. Bi vî awayî bi şîrovekirin û îcraya pêvajoya muzîkal pêk tên. Em ji van hemû karîgerîyan re dibêjin hawira muzîkal. Di hawira muzîkal de, kesên amator û profesyonel hene ku cur bi cur saz û amûrên muzîkê yên guhdariyê bi kar tînin. Di hawira muzîkal de civata herî mezin, girseya guhdaran e. Ev girse, çavkaniyeke wilo ye ku ew bandor dike û di bin bandorê de dimîne û hilberîner, mezêxer û belavker e. Girseya guhdaran, ji bo hawira muzîkal derkeve holê û roleke bingehîn tîne cih.

Cureyên muzîkê

Di hawira muzîkal de, bi mirovên ku tê de dijîn ve her tim di nav guherînekê de ye, cur bi cur muzîk hene ku çav-

kaniyên wan, cureyên wan û fonksiyonên wan cuda ne. Em dikarin van cihê cihê kategorîze bikin.

a) Li gor asta pêşveçûna civakê an jî çandê; mînak muzîka serdema arkaîk

b) Li gor koma civak û çîna ku tê de ye; mînak muzîka geleri, muzîka dîwanê, muzîka berxwedêr û şoreşker, muzîka dejenere û populer,

c) Li gor karakterê neteweyî; mînak muzîka ereban, muzîka kurdan, muzîka tirkan,

d) Li gor dereceya belavbûyî; mînak, cihkî (lokal), herêmî, neteweyî, navneteweyî,

e) Li gor herêma çandî û erdnîgarî; mînak muzîka Rojava, muzîka Rojhilat, muzîka Latîn,

f) Li gor mijar û karîgeriya wê; mînak muzîka reqsê (dansê), muzîka filman, muzîka leyistîkê û hwd.

g) Li gor aîdiyeta serdema wê; mînak muzîka klasîk, muzîka romantîk,

h) Li gor qada wê; mînak qada girtî, meydan û hwd.

i) Li gor avabûna zarvekirina wê; mînak orkestra, koro, solo, bando,

j) Li gor mebesta bikaranîna wê; mînak muzîka hengê (şahîniyê), muzîka dîwankî (ya guhdarîkirinê), muzîka merasîmê û hwd.

k) Li gor mebesta olî; mînak muzîka olî, muzîka dinyewî,

l) Li gor aîdiyeta ola wê; mînak muzîka medreseyan, muzîka dêran,

m) Li gor sîstema dangan; mînak muzîka razber, muzîka konkret, muzîka yekdengî, muzîka pirdengî,

n) Li gor avabûna îcraya wê; mînak muzîka enstrûmantal û vokal,

o) Li gor temenê mirovan; mînak muzîka zarokan, muzîka ciwanan, muzîka mezinan û hwd.

Di jiyana mirovan de cihê muzîkê

Mirov bi muzîkê re, di zikê dayikê de, bi lédana dilê wê dinase, piştî wê li ber pêşîr û di dergûşê de, di ciwantî, kaltiyê de, di êş û kêf, dawet û pêşwazî de û bi kurtayî di temamiya jiyânê de li ser mirovan hîkariyê dike. Muzîk di jiyana mirovan de van sê fonksiyonan çêdike.

1) Zêhnî

2) Tevgerînî

3) Hestî.

Mirov organîzmake biyopsîşîk û çandî ye. Wek bîofizyolojîk, bi sê diyardeyên li jor li ser bingeha fonksiyonelî, sîstema tûreyan (sînîr), sîstema lemlateyan û sîstema avzêya navînî re bihevkirineke tekûz pêk tîne. Muzîk, yekkerîtiya zehni, hestî, şoreşî bi bingeha mirovan a civakî, siyasî, aborî, biyolojîk û erdnîgarî-iqlîmî re yekker dibe, ango bi bandora karigeriyên ku me qala wan kiribû, bi bandoreke cuda dikare dirûv bide jiyana mirovan. Lewma zimanê muzîkê gerdunî ye. Ji ber vê yekê, îro li hemû cîhanê avaniya muzîkal:

1) Etno muzîk (muzîka gel û neteweyan a li ser bingeha

etnikî ye),

2) World muzîk (muzîka li piraniya cîhanê berbelav bûye),

3) Tekno muzîk (muzîka ku bi amûrên teknolojîk pêk tê).

Bi kurtasî muzîk, huner û zanistek e û li gerdûnê zimanê hevpar e, di jiyana mirovan de cihê wê girîng e. Muzîk wek ziman gerdûnî ye. Mirov nikare bibêje muzîk xwe gerdûnî ye. Sedem ew e ku li cîhanê tenê zimanek, tenê çandek, çin û cografyayek tune.

Piştî van pênase û daxuyaniyan em dikarin bibêjin "muzîkê, bi vedîtina dangan a ku mirovan pêk aniye, yên ku di nav gerdûna dangan de ji dayikê bûne, dest pê kiriye". Ev dîtineke hevpar e û hemû antropolog, arkeolog û etnomuzîkologan li ser li hev kirine.

Hebûna çandî û biyolojîk a mirovan du milyon sal in. Di vê serûvena dîrokî de wek antropolojîk sê serdemên bingehîn tên nixandî û tên lêgerandî.

a) Serdema paleolîtîk: Ev heyam beriya hilberînê ye (dewra kevîran a kevî, dewra bidestkojana kevîran).

b) Serdema neolîtîk: Ev heyam ji beriya zayînê deh hezar salan dest pê dike heta beriya zayînê hezar û heşt sed salan didome (dewra kevîr a nû, dewra kewîrên sîqal-kirî/cîlakirî).

c) Serdema Endustriyê: piştî 1800'an dest pê dike (serdema bronz û hesinan)

Der heqê pêşveçûna teka-mûla çandê ya ku di tekamûla

biyolojîk derbas bûye de cur bi cur boçûn hene. Lê encama tekamûlê çi daye, ji cih û dema wê girîngtir e. Li gor arkeologan, di 40-50 hezar salên dawiya serdema paleolîtîk de tekamûla çandê pêk hatiye, li gor hinekan jî bi destpêka serdema neolîtîk her tişt guheriye. Wisan dixuyê ku digihe 12 milyon salên serdema paleolîtîk, heyama ziraet û hilberînê ya di nav deh hezar salan de, di heyama endustriyê de damezirîye. Şoreşa mirovahiyê ya herî mezin, tekamûla di navbera serdema paleolîtîk û serdema neolîtîk de derketiye holê. Di navbera van her du serdaman de, hêmanên ku mirov wan ji hev biqetîne ev in; mantiqê nêçîrê û berhevkirinê diqulibe ser mantiqê ajalkarî û ziraetê. Hilberîna adanê bi xwe re çanda dêmanî afirandiye. Tekamûla ziraetê pêwîstiya dêmaniyê derxistiye holê. Pîvanên mirovên nûjen û arkaîk ji hev cihê dikin; nivîs, matematîk, huqûk, madenkarî, keştîvanî, bazirganî, dirav, aboriya bazirganiyê, perwerdeya fermî, karbeşî, zêdetir sûdwegirtina ji hawira xwezayê, dîtin û bikaranîna çavkaniyên wizeyê (enerjiyê) û bajarvaniyê bi şoreşa ziraetê dest pê kirine û ji navendekê berbelayî cîhanê bûne. Olên ku heta îro jî hene, kraltî, siltantî, feodalîte, împaratorî, li ser bingeha şoreşa ziraetê bilind bûne, berhemên wê ne û şeweyê rêvebirina wê civakê ne.

Şoreşa ziraetê, qonaxa cîwarbûna li ser axê ya mirovan e û çanda serdema sereta

ya bilind gihîştandîye. Di derdora çar hezar salên beriya zayînê (BZ) de dest pê kiriyê, di deştên Mezopotamyayê yên berdar (bixêr û bêr) û Geliyê Nîlê yê Misrê de çandên pêşketî wek misir, hind, çîn, hîtît, fenîke, îbranî û şaristaniya grek afirandine. Di vê demê de muzîk bi zanayî û bi xemên estetîk çêdikirin. Afiranderên dastana Gilgamêş, Tewrat, qanûnên Hamûrabî, pîramîdên Misrê, dîroka Herodot, Îlyada û Odîseûs, bêguman di nav pênasa xwe ya dîrokî de hilberînên muzîkal ên heyama ziraetê afirandine. Sîn Lekke Unînî yê Kasîdî û îcrakarê muzîkê, îcraya muzîkal a destana Gilgamêş kiriye. Di dîrokê de stranbêjê ku tê zanîn yê destpêkê ye.

Mirovan dema ku pêwîstî ji bo lebata xwezayê û ku tirsên xwe li ser xwe biavêjin û xwe biparêzin, dît. Bi îfadeyên diyar û nediyar û bi liv û lebata beden û deng, ragihan û navajoya xweparêziyê vedîtin (keşîfkin). Bi vî awayî pêşiyê muzîk û dans ji bo perestîne (îbadetê) û parastina xwe bi kar anîne. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bibêje ku liv û lebata muzîk û reqsê ya sereta bi temayeke olî ye. Muzîkologê sedsala bîstî yê elman Sach, di berhema xwe ya bi navê "Kurtedîroka Muzîkê" de wiha dibêje: "Avahiya ji dûrî hunerbûna muzîka arkaîk, bi taybetî di warê sazane de derdikeve pêş. Di dinya arkaîkan de cure û hejmarazane sazane (amûr) mirovan diheyirîne. Çimkî arkaîkan çi tiştên ku guncan in û derbasî

deştên wan bûne, kirine amûrên ku deng pê der tê. Hestî bûye pîpîk. Cur bi cur qamîş li erdê xistinê deng derxistine û bûne amûrên wek saz, lûle, pîpîk. Bi qalîkên gûzê û kundir amûrên jenînê çêkirine ku dema dihejînin deng didin. Qalîkên mîdyê, şaxên dara yên nava wan vala, bûne lûle, gewdeyên daran anîne dereceya amûrên jenînê yên wek dêwan ku di nav wan de dikarin lotikan jî biavêjin. Bîrên li bin erdê ne vekirine, qulên daran, çermên ajalan (heywan) bûne dahol. Di destpêka şaristaniyê de mirovan dizanibûn ku bi pîfkinê, bi lêdanê, bi hejandinê de çawan deng derxin. Hem jî bi hezaran sal beriya hostayê pinc û pîrotan (kûzker). Li başûr, bakur, rojhilat, rojava û her çar aliyê cîhanê sazên bi vî awayî pêk hatine, dê ne ji bo armancên muzîkê, ji bo ku bi kêrî armancên sêhrê bîn. Her çi qas mirovan, hostatî ji bo çêkirin û bikaranîna wan nîşan dabe jî, ji bo çêjekê ji wan bigire hewl nedaye. Digel hemû taybetiyên van sazane (amûr), tu wate, spehîtî û dilkêşiyê bi xwe re nadin der. Dengên nerm an hêzdar, dengên dirende an miriyan, bi dirûvê gilover û tûj, bi rengên spîçolkî an jî sorê xwînê, bi lêxistina hejandinê, têdanê, lêdanê ev amûr ji bilî çêjdanê, me dibe nav tevliheviyeke berî muzîkê ku hîç e. Wek tiştan û wek dengdayokan, ev saz qada rojê an jî heyvê ya metafizîk, bingehên nêrtî û mêtîyê yên zayîner, boşayiyê, baranê, bayê sembolîze dike. Di merasiman de ku mirovan

ji bo hebûna xwe, tenduristiya xwe biparêze kiriye, di destên mirovan de bûne qaydeyên sêhrê yên xurt. Ji bo ku, ev saz ji amûrbûna sêhrê ya tirs û xofê dide derkeve, pêwîst bû riyeke dûvedirêj bê derbaskirin û bibin amûrên muzîkê yên demborandinê, çêjgirtinê, wek bilûra dengê qîrînê derdixe, şîrîn û komîk e, lûleyên hîrînkîrî ku ji daran çêdibe."

Ji ber vê sedemê, cihê ku amûrên jenînê û pîfikirinê lê peyda bûne, ne diyar e. Çimkî her cihên ku mirov lê jiyane ev saz hatine hilberandin, afirandin.

Dawiya vê destnîşanê em dikarin bi rihetî vê bibêjin, mirov bi destpêka hebûna xwe re dest pê kiriye bi awayekî ji derveyî zanîn û vîna xwe deng bi kar anîne û pişt re ev deng bi zanayî dîzayn kirine û bi kar anîne. Ji ber ku pêwîstiya me bi vekirina vîna mijarê heye, divê ku em bersiva pîrsa "awaz çawan qewimî?" bidin. Der barê vê babetê de yek ji boçûnên hevpar ev e: "Di riya xwepêşvebirinê de mirov, hewce dîtiye ku dengê xwe bi awayekî bi rêk û pêk bike, di dîrokê de ev kêmasî ji navê rakiriye û rastiya wê pêk aniye. Ev bi du awayê vegotinê qewimandiye. Ev awa di heman demê de li hemberî hev nakokiyekê diyar dikin. Yek ji van awayan ev e ku wek navgîneke mîsoger, dengên ku bandora peyvan li ser in tîna bikaranîn. Ji vê re dibêjin, logogenîk. A din, ji peyvan zêdetir ew rê ye ku di encama serberedayî berdana geş û coşiyê ango qehîrîn û stresa wek teqînekê ji

navê tê û ji wê re dibêjin pathogenîk. Di encama van her du riyên ango şeweyan de riya vegotinê kemiliye ku bi navê melogenîk tê bi navkirin û êdî deng bi awayekî awazî (melodîk) diyar dike. Eger em hinekî vekin, "gotina ku geşî bi wê dizayîne, deng di nav qîrînan de derdikeve perdeyên zirav an jî bi hirmijînê re derdikeve perdeyên qalind. Wek ev deng geş dibe hin navberên ku diyar in, mîna rêza 8'an, 5'an, 4'an, 3'an dibin palpiştêkên bibadek û didomin. Bi gotinekê re yekbûna gotina van her du gotinan (logogenîk-pathogenîk) bi riya çûyîna ber bi çaranyê ya strana ku peyvê daye zayandin an bihortina wê dibe. 4'anîya li vir, bi pêwîstiya navxweyî ji jor zêdetir mêyle ber bi jêr hatine, nîşan dide. Di encama vê yekbûnê de awaza ku pêyvê ew daye zayandin, wek awazeke sînorê guhirînê derbas bûye, lê nehehatiye bêsînorîya geş û coşiyê ya derdikeve pêş".

Li vir her çî qas hêmana peyvê karîger nebe jî qewmîna melogenîk ango di zayîna awazê de ziman xwedî taybetiyeke girîng e. Çimkî hêmana bingehîn a çanda ziman e. Wek tê gotin, ziman jî di nav çandê de ye ku girîngiya ziman di asta herî bilind de dide diyarkirin. George Thomson bal dikişîne ser zayîna zimanê muzîkê ya ku ji liv û lebata mirovan û dema ku di kar de çêdibe û dibêje, "Rêgezên (qaydeyên) rêziman û awayê muzîkê xwe spartine bingehê hevpar. Ev bingeh kar e. Dengê mirovan, bi saya stra-

nên kar gihîştîye wesfên muzîkal. Dîsgotin (neqerat) an jî heyamola qîrîneke nayê fêhm kirin e û dema mirov dixebite, dema dikeve dijwariyê derdixe û guhirîn dubare dibe. Ev jî nîşan dide ku di zayîna awazê de lebat û lotikên mirovanî roleke girîng leystine. Muzîka arkaîk, cureyekî muzîkê yê wilo ye ku dubareyê ke domdarî heye, nagihîje nuqteyên bilind, qet xwe nas-pêre tu hiş, hesabkirin û metodekê. Der barê zayîna awazê de gelek teorî hene. Ji wan teoriyan ên ku ji aliyê pir kesan ve herî zêde tîna peji-randin, teoriyên kar û ragihandinê ne. Em bixwazin li gor teoriya kar an jî li gorî teoriya ragihandinê zayîna awazê bipejirînin, ji eslê xwe ve cudatiyeke girîng nîn e. Ji ber ku evîn, êş, hêrs, geş, kar, baweriyên mirovan hene. Bi awayê hebûna xwe ya ewil dema guh û çavên wan hene, dikarin erdnîgariya ku li ser dijîn, rojê û heyvê bizanibin. Her wiha hestên ku di nav xwe de dide jiyandin û dikare bi dangan îfade bike, bi awayekî arkaîk be jî di nav de peyamek heye. Ev peyam, îfadekirina pergala hest û ramanê ye. Kirpandinên ku di nav kar de pêk tîna rîtm, bangên ji dev re derdikevin jî awazê diafirînin. Ev jî zayîna awazê ye.

Derketina nasnameya kurd û şaristaniya serdema sereta

4000 sal berî zayîna (BZ), cografyaya Mezopotamya ku li ser xaka adanî ya di navbera Dicle û Feratê de cih digire, bûye warê şaristanyên cur

bi cur. Di Mezopotamyayê de, qewm û civatên ku bi navê sumer, aqad, babîl, aşûr, kaldî, elam, lûlû, hûrî, mîtanî, gûtî, xaldî tên zanîn di hin demên dîrokê de bi navê xwe şaristanî ava kirine. Li vê derê, warê çandê û şaxek ji wê muzîk pir pêş ketiye. Ev pêşketin di serdemên din de jî domiyaye. Mirov vê rewşê diyar bike bi kêr tê; pêşketina şaristaniyên serdema sereta ev e ku ziraet û ziraeta avî li vê herêmê dest pê kiriye. Vê rewşê zanyariya ku ji nêçîrvaniyê mēyla xwe daye ser hilberîna ziraetê gengaz kiriye. Vê zanyariyê jî bi xwe re vedîtina nivîsê, zanist, hiqûq, raman, bazirganî, madenkarî û bilindbûna perwerde û hunerê anîne.

Mezopotamya, ku navenda şaristaniyê ya serdema seretayî ye, gelo kî cara pêşîn li vir şaristanî pê anî? Bersiva N. J. Marr wiha ye: "Kurd yek ji gelên Asyaya Pêş ên dêmanî û niştecih e û zimanê kurdî li vir qewimiye." Marr didomîne "Ev ziman di pêvajoyeke dûvedirêj de bûye zimane-kî HindEwropî û bi vî halê xwe yekser mîratgirên zimanê medî ye." V. Minorsky di sala 19-38'an de, di kongreyeke navneteweyî de gotiye ku "Koka kurdan xwe dispêre medan." Di dozîneya ku pêşkêş kiriye de wiha gotiye: "Med û pers gelên îranî ne yên ku beşdarî pêla koça dawiyê ya gelên Hind-Ewropî bûne. Med, BZ ji 700 salan vir ve, ji herêma Gola Ûrmiyeyê ber bi rojavaya başûr (herêma Botan) bi rê ketine. Li wir bi gelên dêmanî û niştecih re bi

yek bûne, heta şemîka deşta Mezopotamyayê hatine. Kurtî û Mard, îhtimaleke mezin bira ne, ketine nav hev û hîmê kurdan avêtine."

Di encama hevpar a dozi-neyên Minorsky û Marr de em dibînin ku koka Kurdan Med in. Lê belê tê zanîn li Mezopotamyayê ji qewmên dêmanî wek akad-hûrî, mîtanî, kasît, gûtî beriya medan hene, di dema xwe de desthilatdarên serdest in. Ev qewm, ji ber ku di nav hev de heliyane (ev hêman çand, şaristanî û ziman in) ku di encama wê de gelê ku derketiye rastê, koka wî Hîndo-Ewropî ye. Bawerî ev e. Em dikarin bibêjin kurdên ku hebûna xwe di nav çar dewletan de didomînin (em yên li Ewropayê ne û koçî dinyayê û deverên din bûne tev nakin) li erdnigariya wek resen, demanî û mafdar mîratgir û xwediyê nîrxên ku hatine afirandin in. Em dikarin nîrxên çandî û hunerî yên ku li rojhilatê Hindistanê, li bakur qewmên îran û indo-germen, li başûr qebile û qewmên ereban, li rojava jî hîtît, fenîkê, misir, grek, frîgya, ku di navenda wê erdnigariyê de Mezopotamya heye û di şexsê wê de şaristaniya serdema sereta heye, em wê demê wiha bi rêz bikin.

a) Muzisyenê sereta yê îcrakar Sîn Lekke Ünûnî ye ku wî di heyama xwe de peyvên helbestkî qulibandine ser awazan û bi devên serokên civatan hatine gotin, destana Gilgamêş bi awayê awazî (melodîk) îcra kiriye (îro şexpîrên merasimên ayînan ku di felsefeya êzîdî û elewiyan de

hene û tembûr û bizqê lê dixin).

b) Awayê derketina ku rahîb û koro li hemberî hev (responce) an jî du heb koro li hemberî hev (antîfonya) dibêjin.

c) Îhtimaleke mezin e ku di nav sumeran de, li gel îcada nivîsê di nava zimanê nivîsê de, ferzkirina nivîseke îşarkî peyda bûye. Di vê heyamê de ji awazê re gotine sîr, ji bilûrên ku ji qamîş hatine çêkirin re gotine sem, ji flûtên ku xar û rast tên lêxistin re gotine tîg/tîggî, ji daholên biçûk re gotine balag, ji daholên dubendî re gotine lîlîs, ji defan re gotine adapa (îro ji flûta kurdan re dibêjin fik an jî fikê).

d) Arpên ku aîdî heyama aşûran in û li ser milan tên lêxistin hatine dîtin. Di aşûra dereng de muzîka li derveyî olê û beşdarbûna wê ya şahiyân, tê texmînkirin.

e) Heyama kaldeyan, di dema Nabûşhednezar de bandor damezirandine (ji pirtûka Daniêl a ku çar sed sal ji piştî wê demê hatiye nivîsandin tê fêmkirin). Ji lûla ku di wê komê de hatiye lêxistin qarna, ji pîpikên ku ji qamîşan hatine çêkirin re masroqîtha, ji cureyên arpa yên li hembêzê tê lêxistin û an jî ji lîrê kastrop, ji ya dengstûr re sebbeka, ji ya dengzirav re psanrîn tê gotin û ev jî ji wê pirtûkê tên fêmkirin.

ê) Li gor nîrxandinên agahiyên ku li gora qralên Ûr derketine, ji sazbandan re gotine zammerû, ji muzisyenên îcrakarên vokalê re gotine

nam. Du cure teşeyên lîrê he-
ne. Ji van re dibêjin algar. A
dengstûr saggal e, ya dengzi-
rav jî zagsal e. Hin arp jî di
forma ganêran de ne, ev rastî
bi erdkolanan dest nîşan bûne.
Dîsa Sîr Leonard Woley, di
bajarê Êr û erdkolînekê de ar-
pa xwedawenda Şûb dîtiye û
belgeyên aîdî wê a niha di
Muzeya Brîtîsh ya Londonê li
ber dest in.

f) Sazên bitêl wek lûte
(lavta) çêbûne û di heyama
babîlan de hatine bikaranîn.
Di heyama îbraniyan de koro-
yên sazên jenînê, bi pifkirin û
ên bitêl pêk hatine, çêkirine.

g) Digel pêşveçûna cihû-
tiyê (li gor wergera Martîn
Lûther) qral Dawûd sazeke bi
navê kînnor lê xistiye. Bi
piranî yên ku saz lê xistine jin
in. Tê fêhmkirin ku îcrakarên
solo û vokal yek jin, yek mêr
(Musa-Meryem) e û ji serekê
sazbandan re jî jûval/jûddal tê
gotin.

h) Li ser tableta ku îro li
Muzeya London Brîtîshê ye û
bi texmînî aîdî Sumeran e, ku
ji BZ. Ji salên 280'yan maye,
der barê saza (bilûr) pifkirinê
ya bi navê na/nale de, hin aga-
hî here.

i) Di pirtûkeke der barê
Asyaya Biçûk de ku di sala
1870'an de hatiye nivîsandin,
a ku di Muzeya Della Boorde
Etnograf de ye, tê zanîn ku
saza bi navê Aûlos ya bi cot
qamîşan hatiye pê, bi texmînî
di heyama Misrê de bi kar
anîne (îro jî tê zanîn kurd vê
sazê bi kar tinin û jê re dibêjin
duzele).

Ji ber têkilî û karîgeriyên
civakî, aborî ev pêşveçûyînen

muzîkal ên li Mezopotam-
yayê bûne, bandora xwe ber-
dane ser şaristaniyên ku piştî
wan hatine û guhirandinên din
pêk hatine, ew jî bûne sede-
mên pêşveçûnên din. Gengaz
e ku mirov temamiya sazên
ku li Mezopotamyayê bi kar
anîne li Misrê jî bibîne. Bû-
zûkiya ku îro grekî bikartînin,
lûteya (lavta) kurdan a dutelî
ya wê demê ye. Piştî serdema
navîn, li gor hejmarê têlên
wê, awayê navên dane wê. Lê

... her çi qas muzîka
kurdî ji nîrxên hevpar ên
pir civakên ku li Mezo-
potamyayê jiyane sûd
wergirtibe jî, ew qas jî
nîrxên xwe tevî wan kiri-
ne, di heman demê de
hem yekser hem jî neyek-
ser hîkarî li ser binyata
muzîkal a gel û neteweyên
li erdnîgariyên cuda dijîn
kiriye (di rêzên pêş de em
dê mînakên wê bidin).
Kurdan êş, evîn, mêrxasî,
hesret, zêmarên li ser
miriyên xwe, lorikên ku
avêtine ser dergûşên xwe,
di îbadetê de, di beyt,
qasîdeyên semahan de
ango bi kurtasî bi hemû
jiyana xwe ve, xwe bi
muzîkê nîşan daye.

belê, ji ya li Grekistanê re
gotine dûtî (pişt re wan li gor
sîstema tanperê çêkirine). Di
bin bandora çanda îslamî de ji
wan sazan re gotine heram e,
lewma jî tenê kurdên elewî û
êzîdî lê xwedî derketine.
Bizqa du têlî (a bi zik) di ayî-
nên psîkoterapîk de bi kar

anîne û bi wateya biskên jinan
ên pîroz, jê re gotine tem-
bûr/dembûr (niyetbihrok,
dembihrok) ango saza şahiyê
(ev di pirtûka farabî ya bi
navê Musîkul Kîtab ûl Kebîr
beşa duyemîn de, di Seya-hat-
nameya Evliya Çelebî de
diyar e).

Muzîka kurdî çi ye?

Di bersivên ku me dane de,
pîrsên wek muzîk çi ye, hawi-
ra muzîkal çi ye, deng çi ye,
peywendiyê mirovên ku teka-
mûla çandî jiyane bi muzîkê
re çi ne, awaz çawan derket
hebûn û hat têgihîştin ku di
Mezopotamyayê de ku ew
warê şaristaniyan e, kurd bi
heyîna xwe ya kokdar gelekî
vê herêmê yê bingehîn e.
Kurd ne tenê ji aliyê mîratgi-
riya vê çandê ve dema lêkolî-
neke baş bê kirin her wiha ji
aliyê hilberînerî û afirandêrî
ve jî xwediyê vê çandê ne. Ji
ber vê yekê jî mafdar in ku
tenê xwe wek mîratgirên vê
çandê bidin diyarkirin. Beriya
pênasandina muzîka kurdî dê
bi kêr bê ku mirov van tiştan
bizanibe; her çi qas muzîka
kurdî ji nîrxên hevpar ên pir
civakên ku li Mezopotamyayê
jiyane sûd wergirtibe jî, ew
qas jî nîrxên xwe tevî wan
kirine, di heman demê de hem
yekser hem jî neyekser hîkarî
li ser binyata muzîkal a gel û
neteweyên li erdnîgariyên cu-
da dijîn kiriye (di rêzên pêş de
em dê mînakên wê bidin).
Kurdan êş, evîn, mêrxasî, hes-
ret, zêmarên li ser miriyên
xwe, lorikên ku avêtine ser
dergûşên xwe, di îbadetê de,
di beyt, qasîdeyên semahan
de ango bi kurtasî bi hemû

jiyana xwe ve, xwe bi muzîkê nîşan daye. Hin caran wek çekêkê bi kar aniyê hin caran mîna tîreke nikilê wê li dilê wan derketibe, hîs kiriye. Em niha bersiva pirsê xwe bidin. Em ji muzîka ku di dîrokê de di bin hîkariya mercên aborî, civakî, siyasî, erdnîgarî û iqlîmî de dirûv girtiye û bi zimanê kurdî tê gotin re, dibêjin muzîka kurdî. Ji bo ku em vê pênasîyê xurt bikin, divê ku em pêvajoya dîrokî ya muzîka kurdî û bastûra wê mêze bikin.

Dîroka muzîka kurdî

Di dîroka muzîka kurdan de pir merhaleyên girîng hene. Di şaristaniyên serdema sereta de, şîroveya peyvên helbestkî ya awazî (melodîk) cara yekem bi texmînî di dema qasîtan de bûye: Lêkolîner Benno Lenksberg ji bo qasîtan wiha dibêje: "Li Babilê, serdestiya ku ji dema Qral Argûmê 2'yem ve dest pê kiriye, 576 salan berdewam kiriye. Navê dewleta ku li Babilê ava kirine Kardûnî ye. Wekî çawan mirov agahiyên bidestxistî dinêre ev helbesta destana Gilgamêş e û ji aliyê muzîsyenê bi navê Sîn Lekke Ûnûnî ve îcra bûye (Gilgamêş qralê sîteya Ûrûk e ku ew jî ji şaristanên (bajardewletên) sumeran ê asta wî herî bilind e).

Li gundê Sultantepe yê Rihayê erdkolînek çêbûye. Li wir tabletek derketiye û parçeyên ku aîdî Destana Gilgamêş in hatine dîtin (bi texmînî ev tablet îro di Muzeya Rihayê de ne). Der heqê arpa ku îro di muzeya London

Brîtîsh de ye, Sîr Leonard Woley dibêje: "Min di erdkolanên aîdî heyama sumeran de, di odeya ku aîdî xwedawenda ye ya gora qralan de nedîmeyên kuştî dîtin ku bi du rêzan rêz kiribûn. Yek jî keçeke muzîsyen hebû ku bi milên xwe arpa destê xwe hembêz kiribû. Zelal diyar bû ku wextê mirinê li arpa xwe dida." Woley bi vê gotina xwe îfade dike ku jinên wê demê îcrakarên amûrên muzîkê bûn.

Tabletek hatiye dîtin ku agahiyên der barê skalaya saza bilûr/ney ku bi navê na/ nale tê bilêvkirin û aîdî salên BZ. 280 ye (li Muzeya Brîtîsh e). Hatiye têgihîştin ku vê heyamê bi awayekî zelal skalaya deng hatiye destnîşankirin û der heqê pêkhatina avahiya muzîkê de metodeke zanistî ji aliyê muzîsyenên ku di qesra qral de ne, hatiye bikaranîn.

Li Rihayê navçeya Curnê Reş (Hilwanê) di gundê Kantara Newala Çorî/ Çolî de erdkolînek çêbû. Li wir zinarekî aîdî 7 hezar sal BZ. (serdema neolîtîk-dewra kevirên sîqalkirî) hat dîtin. Li ser wî zinarî firaqek heye û li ser wê jî şanoyeke (sahne) reqsê heye.

Bi tevahî kevneşopîya îcrakirina dans û muzîkê BZ. ji aliyê oldarên subariyan bi tevlibûna gel çêbûye û bi şeweya responce û antîfol awaz hatiye gotin.

Dîsan li Rihayê, di erdkolînen Tîtrîş de aîdî pênc hezar salên BZ. 3/5 (serdema tûnc a sereta) figurekî mirovan hatiye dîtin. Ew bi kevirê kilsê çêbûye û bi awayê kemanê hatiye stîlîzekirin. Ev berhemên erd-kolîne îro di muzeya Rihayê de ne.

Di dema hukimdarê kardûnî de saza ku bi navê lûte (lavta) navkirî û dutelî ye hatiye bikaranîn. Ew saza ku dayika sazên îro wek tembûr, ûd, bizq e, der barê wê de agahiyên zelal û çavkaniya ku îro em li Fransayê di muzeya De la Borde Etnograf de ye û di sala 1780 hatiye nivîsandin de dibînin.

Tabletek hatiye dîtin ku agahiyên der barê skalaya saza bilûr/ney ku bi navê na/ nale tê bilêvkirin û aîdî salên BZ. 280 ye (li Muzeya Brîtîsh e). Hatiye têgihîştin ku vê heyamê bi awayekî zelal skalaya deng hatiye destnîşankirin û der heqê pêkhatina avahiya muzîkê de metodeke zanistî ji aliyê muzîsyenên ku di qesra qral de ne, hatiye bikaranîn.

Di sala 1984'an de di erdkolanên ku li Heranê çêbûne de, bilûreke di sedsala 13'an de (heyama Eyubîyan) ku ji hestî hatiye çêkirin, hatiye dîtin. Ev bilûr di mala erdkolanê de ye.

Ji Sîn Lekke Ûnûnî bi şûn ve, mirovê muzîkê yê ku navê wî tê zanîn ê herî kevn Berdaysan e. Zarokekî malbateke ji Erbilê koçî dorhêla Çemê Daysana (Karakoyun) kiriye (ihtimaleke mezin êzîdî ye) ye. Piştî Zayînê (PZ) di

Mehdî di serdema ciwaniya xwe de, bi notaya ebced, nivîsandina muzîkê wek meraqekê di dilê xwe de mezin kiriye (El Kîndiyê ku di sala 874'an de miriye û şagirtê îshaq Misûlî bûye, şîroveyek cuda ji vê notayê re aniye û notaya ku di dîrokê de jê re gotine notaya kîndî çêkiriye).

sala 168'an de ji dayik bûye. Navê Berdaysan ji çemê li ber bûye girtiye. Wateya wî navê ev e; ê ku li Daysanê bûye, li Daysanê ji hev zêde bûye, li Daysanê ber dayî (em wateya ber a di kurdî de bi çend mînakên bidin xuyakirin, rezên me ber dane, bostanê me beridî, manga me ber avêt). Daysan ji bo perwerdehiyê şandine bajarê Membîçê (Mabbogê) ku di navbera Sirûç û Halebê de ye. Bajarê Berdaysan ê ku lê perwerde didît, yek ji perestgeha herî mezin a îlahiya Atargatîs hebû. Bajar ji navenda çand û olên berî xristiyanîyê yek bû. Berdaysan, ji ber ku şeweya ramanên serbest û îfadeyê, bi xristiyanîyê re li hev nedikir li Rihayê, ji aliyê keşê Akî ve, ji dêrê hate afarozkirin. Ew bi qral Abgar ê 8'em (Abgarê mezin) re hemsalî ye û bi hev re perwerde dîtine. Di qesra qral de mêvanê qral ê herî bijare bûye û ew qral û malbata qralên cuda ku hatine mêvaniya qral mêvandarî kiriye. Digel vê jî bi rojên muzîkbar ew kêfxweş kirine (kevneşopiya kurdan a hunerê degbêjiyê ku di qesrên began de tê şopandin heta van rojan diçe). Baweriya Berdaysan

ew e ku ruh xwe nû dike lê beden nû nabe. Di mersiye-yên ku wî nivîsîne û muzîka ku wî beste kiriye de, giranî li ser boçûna vê felsefê ye. Hingî ku ji muzîkê hez dike navê lawê xwe daniye Harmonîûs (aheng) (binêrin Urfa Muzîk Tarîhî, Abuzer Akbiyik)

Îbrahîm Misûlî

Îbrahîm Mehdî di sala 743'an de li Misûlê ji dayik bûye û ji muzîsyenên heyamê yê herî baştir bûye. Ew ji malbata Bab tê. Kevneşopiya wan a muzîsyeniyê hebû. Îbrahîm Mehdî di serdema ciwaniya xwe de, bi notaya ebced, nivîsandina muzîkê wek meraqekê di dilê xwe de mezin kiriye (El Kîndiyê ku di sala 874'an de miriye û şagirtê îshaq Misûlî bûye, şîroveyek cuda ji vê notayê re aniye û notaya ku di dîrokê de jê re gotine notaya kîndî çêkiriye). Dîsa Îbrahîm Misûlî ji bo ku awayeke saza lûte (lafta) ku dayika sazên bitêl tê pejirandin çêbike, ji dil ve hostatiya xwe nîşan daye. Bi vê hewla xwe, bi navê çatra sazek çêkiriye ku prototîpa saza îro jê re tê gotin, ûd e. Dema navdariya Îbrahîm Misûlî bi vî awayî bilind dibe, bala Xelîfe Harûn Reşîd dikişîne û dibe nedîmê qesrê yê herî baştir. Ji bo perwerdeya muzîkê ya zarokê malbatên xirîstîyan, bi pêşniyara Îbrahîm Misûlî, Xelîfe Harûn Reşîd dibistaneke muzîkê saz kiriye ku ew konservatuvara serata ya Rojhilata Navîn hatiye pejirandin û Îbrahîm Misûlî jî aniye serê. Ji aliyê dîroknasên muzîkê ve, Îbrahîm Mehdî wek mezinti-

rînê muzîka îslamê tê pejirandin. Ji meqamê ku bi navê wî tê îfadekirin wek Îbrahîmî û ji taybetiyên saza ku çêkiriye ve tê fêhmkirin ku ew hem bi saza xwe hem bi dengê xwe îcrakarekî pir baş e. Di qada sazê de vîrtuoz e. Yek ji şagirtên ku wî gihîştandiyê lawê wî Îshaq Misûlî û yê din jî Ziryab e. Dema di sala 806'an de miriye li pey xwe pênasa teorîk a pergala (sîstem) deng û dibistaneke mezin a muzîkê hiştiye.

Îshaq Misûlî

Di sala 767'an de li Bexdayê ji dayik bûye. Di perwerdeya bavê xwe Îbrahîm Misûlî re derbas bûye û bûye muzîsyenekî baş. Girîngî daye teoriya muzîkê û ramanên ku der barê pergala avaniya gera meqaman de ne, hilberîne. Nêzikayî çar sed heb meqam îfade kirine ku şeweya damezirandina meqaman bi awayê cînsan pêk hatiye. Piştî mirina bavê xwe, hatiye ser dibistanê. Ligel Ziryab ê ku hem hevalê wî yê perwerdehiyê ye û hem jî şagirtê wî ye, di qesrê de ders daye. Ligel pirtûka Ehbarû Îshaq Misûlî ya ku Yehya Elî nivîsiye em fêr dibin ku dengê Îshaq Misûlî xurtir e, xatib e û nîzamnâmeya muzîkê (disîplîna deng, perwerdeya şan) baştir zanibûye. Di pirtûka Yehya Alî de, ya ku li Tehranê nivîsiye û me li jorê diyar kir, daye xuyakirin ku di îcraya meqamê hîcaz (iraq) de wî cudatiyên di navbera deng û bi pênaseya zanistî îfade kiriye. Îshaq Misûlî di sala 850'î de miriye û ji bo

pêkhatina ekola Misûl herî kêmîr bi qasê bavê xwe rol lîstîye.

Hamad Misûlî

Lawê Îshaq Misûlî ye. Aliyê wî yê muzîkê wek bav û kalikê wî ne li pêş e. Digel vê yekê, ji bo bingeha kevneşopiya malbatê bidomîne xebatên cidî kirine û destxetên aîdî bavê xwe û kalikê xwe yên li qesra bavê xwe ya ku li Bexdayê ne, berhev kirine, teoriya pergale ku wek dibistanên sereta yên pergale hatine pejirandin, afirandîye.

Ziryab Îbrahîm Mehdî

Şagirtê Misûlî ye. Ji gundekî Misûlê, lawê kurdekî cihû yê azadkirî ye. Di sala 789'an de ji dayik bûye. Wê demê ji muzîsyenê cihû re dibêjin geyno/geyna. Ziryab li ser aliyê vîrtuoziya mamosteyê xwe Îbrahîm Misûlî sekiniye û girîngî dayê. Teoriya muzîkê ya Safiyûdîn Êrmiyewî ku hawîrdor piştî çar sed salî berhev kiriye û wek bingeha pergala muzîka xwe pejirandiye, ya wî ye. Bi muzîkên Hind, Grek û Îranê re sentezek çêkiriye û 12 meqam, 7 awaz û 24 navba bi dest xistine (her çiqas hin kes bibêjin bi vê mabesta wî ev bûye ku navbera di oktave de heye bide xuyakirin lê dema li Cordobayê bi cih bûye îfade kiriye ku di nav pênaseyên muzîka Flamenkoyê de ya ku wî bi xwe pêk aniye, ya ku bi navê navba aniye ziman, bi rastiya xwe 24 meqamên şedin. Ziryab wek sazûmankarê muzîka Endulûsê tê pejirandin.

Li bajarê Cordobayê dibistanê muzîkê vekiriye û doktrînen mamosteyên xwe di jiyane de pêk aniye. Saza ûd a ku mamosteyê wî çêkiriye, têla pênca lê zêde kiriye û cara yekem bi pêjenê (mizrabê) saza bitel bi kar aniye û di dîrokê de bi mafdarî cihê xwe girtiye. Ziryab di sala 857'an de li Cordobayê miriye. Îro jî li Spanyayê mirov dikare rastî şopa wî bê. Heke ez şaş nebim îro li Spanyayê bi navê wî dibistanên muzîkê hene.

Yahya Elî

Di sala 856'an de li gundekî nêzikî Silêmaniyê ji dayik bûye. Dema perwerdeya olê didît bavê wî qabiliyeta deng û muzîkê ya wî ferq kir ew bir dibistana muzîkê ya Bexdayê ku wê demê di Rojhilata Navîn û Rojhilata Nêzik de ya herî baştir bû û dersdayîne Hamad Misûlî pêk dianî. Hamad Misûlî teoriya bavê xwe da vî şagirtê xwe. Yahya, bi vê teoriyê mezin bû, lê ji Hamad zêdetir Îshaq Misûlî wek mamosteyê xwe didîtiye (wê demê Îshaq Misûlî her çiqas nedijîya jî). Piştî perwerdeya xwe, derbasî paytexta Îranê Tehranê bû û Yahya Elî li wir perwerdeya xwe domand. Beriya mirina xwe, li wir berhemên bi navê Rîsale Fîl Musîkî-Kitabul Bahr-Ahbaru Îshaki Musulî nivîsî. Di sala 912'an de li Tehranê mir.

Muhamed'ul Katibî Erbilî (nivîskarê Cevahir ül-nizam fi marifat ül-efgani), dibeêje derbarê vî kesî de min hin belge tesbît kirin lê mixabin hin jî, ji ber ku ez negîştîme van belge-

yan, tenê ez dê bikaribim navê wî diyar bikim.

Safiyûdîn Abdumumîn Êrmiyewî (1224?-1294)



Yek ji navên mezin ê pergala muzîkê ya dinyayê û muzîka kurdan Safiyûdîn Abdumumîn e. Di çavkaniyên dîroka muzîkê de bi navên wek Safiyûdîn Êrmiyeyî, Safiyûdîn Ebdilmumîn Êrmevî, Îbnî Fahrî'l Êrmevî, Safiyûdîn Ebdilmumîn bîn Êsiv bîn Fexir tê binavkirin. Her çiqas bi rasteqînî nayê zanîn jî, bi texmînî di navbera salên 1224-25'an de ji dayik bûye. Dîsan bi texmînî di heftê saliya xwe de, di 28'ê Rêbendana 1294'an de li Esfahanê miriye. Em bi agahî û çavkaniyên hatine bidestxistin, wî dinasin.

Malbata wî ji Êrmiyeyê ye. Çiroka serpêhatiya wî ya beriya muhasibiya xelîfê dawiyê yê Ebasî Mutasim Bîlah (mirina wî 1258) tarî ye. Di ciwaniya xwe de nav daye û bûye zanyarê muzîkê. Em vê yekê hem ji peywira wî ya qesrê û hem jî piştî mirina xelîfe, ji bo nivîsandina berhemên xwe, ji rayedayîna

Eladîn Cuweyrî têdigihîjin. Her wiha em, ji berhemên wî yên li berdest in têdigihîjin ku wî perwerdeyeke pir baş dîtiye û xwe baş gihandiye.

Dema ku di qesra Bexdayê de wek muzîsyen û ûdjen xebitiye, di heman demê de pirtûkxaneyê xelîfe jî bi rê ve biriye û mustensih bûye, ango bi destxetê pirtûk zêde kirine. Kesatiya wî ji aliyê muzîsyen û begên wê demê ve pir bi rêz û rûmet hatiye ecibandin, lê li ser rojên vî hostayê mezin ewrên reş bi dûr neketine.

Bi dagiriya Bexdayê re, ya ji aliyê împeratorê Muxol Hûlagû ya di sala 12-58'an de dawî li her tiştî tê. Xelîfe tê kuştin, bajar bi erdê re yeksan dikan, pirtûkxane tê şewitandin û diavêjin Çemê Dicleyê.

Piştî van rojên aloz, Safiyûdîn derdixin pêş hukimdarê nû, ji wî tê xwestin ku li ûdê bixe. Di saya lêdana ûdê jî îdamê difilite. Ji ber ku Nasredîn Tusî rewşenbîr e û girîngî dide hunerê, hîkariya wî rê li ber kuştina Safiyûdîn digire û ew berhema xwe ya herî girîng Rîsaletul Şerefiye dinivîse.

Demekê mamostetiye jî lawê wezîrê îlhaniyan Şemsedîn (Muhemed û Şerafedîn) re dike. Bi israra cuvêniyan tê ser "Dîwana Avahiye". Wexta Bahaedîn Muhemed dibe waliyê Îsfahanê, di sala 126'an de bi wî re diçe Îsfahanê. Lê belê dema malbata cuvêni hêza xwe ya berê winda dike û dirûxe, Safiyedîn jî tê jibîrkin, dawiya

jiyana xwe di nav xizaniyê de derbas dike, ji sedemên ku nikaribûye deynê xwe bide, hepis bûye û li wir jiyana wî bi dawî bûye.

Ji berhemên wî yên bi dest ketine, pirtûkxanekariya wî û ji peywîrên wî tê zanîn ku ew nivîskarekî mezin bûye.

Li pey Îbnî Tagribîrdî û Îshak al-Masvîlî (Îbrahîm û Îshaq Misûlî) teorîsyenê muzîkê yê herî mezin e. Ji bo ramanên wî Sîr Hubert, H. Perî wiha dibêje: "Ew rêzedegekî wisan e ku tu car neyê ramandin." Dr. Helmholz jî dibêje, "Ew pêşxistina pergala Pîtagores a bi awayekî bingehîn e."

Bi rastî Safiyûdîn sazûmankarê teoriya pergala ye. Her çiqas hin kes dibêjin pirtûka wî Şerefiye awayê pirtûka Farabî ya kurtkirî ye jî, lê ev ne rast e. Ji aliyê pergala muzîkê ve Ziryab û Yahya Eliyê ku bi doktrîna Îbrahîm/Îshaq Misûlî (bav û law) mezin bûne, doktrîna wan ji xwe re esas girtiye. Çavkaniyên ku Farabî û Îbnî Sîna xwe spartine yên muzîkê, heman çavkanî ne.

Piştî Safiyûdîn û Xoce Ebdilqadir di pergala dengê muzîka me de zêde guhartin çênebûne. Lê bele, di dema osmaniyan de xwestine hin guhertinan çêbikin (navê navbera guhartine, meqam çêkirine û heta piştî komarê pergala arelezgî-ûzdîlek bi vî mantiqî hatiye çêkirin), lê belê tişteki girîng ku bikaribe cewhera wê biguhirîne nikaribûne lê

bikin. Îro hîn jî di muzîka gel û ya hunerê de ev pergala tê bikaranîn. Digel vê yekê, li ser berhemên Safiyûdîn ji aliyê muzîkologên Rojhilat û Rojava ve bi kûrayî lêgerîn hatiye kirin, daxuyanî bûne, heta bûne çavkaniyên muzîka tirk ên sereke. Berhemên teorîsyenên bi dû wî re hatine, ramanên wî ji xwe re esas girtine û hatine nivîsandin.

Safiyûdîn di heman demê de bestekar e. Wek hunermend, piştî Kindî û Misûliyan "notaya ebced" cara yekem bi kar aniye. Berhemeke wî ya ku bi meqamê newrozê, usûla remel hatiye bestekirin, heye. Mirovê ku pergala dengê muzîka kurdî li ser bingehê zanistî daye sazîkirin, ew e. Amurên muzîkê yên wek santûr, nuzhe yan jî mugnî, qanûn, tê gotin ku di dema salên li Esfahanê dima, wî ew îcad kirine.

Berhemên wî: Safiyûdîn kurd bû digel vê yekê berhemên xwe bi erebî nivîsîne, ji ber ku wê serdemê zimanê zanistî erebî bû. Ev berhem hemû bi zimanên Rojava hatiye wergerandin û çapkirin.

1) Çendî tê gotin ku 130 heb besteyên wî hene jî, lê ji van tenê yek gihîştîye îro.

2) Rîsalati Şereyya fî'l-Nisab al Talifiya; yên ku îdia dikin ku ev pirtûk di sala 1252'an de ji bo Şemsedîn Cuveynî nivîsiye hene jî, her wiha yên ku bêyî destnîşankirina çavkaniyan dibêjin ev ji bo şagirtê xwe Şerafedîn Harun pêşkeş kiriye jî hene. Bi

navê kurt Şerefiye, ji pênc gotaran pêk hatiye. Fîzîka deng, lerza têlan, nîspeta bilindahiya dangan bi têlan re, dirêjayî û kinbûna amûrên muzîkê û guherîna dangan berfireh di Kitabû'l -Edvarê de hatiye vegotin.

3) Kîtabû'l- Edvar: Di vê berhema xwe de jî wek di ya yekem de li ser awazê lêgerîn kiriye. Li gor dirêjahiya sazên li ser guherîna sazên lê kolîyaye, behsa taybetiyên sazên kiriye. Di serî de ney û mîzmar, der barê pir sazên de agahî daye, bi taybetî dûvedirêj li ser ûdê rawestiyaye. Kîtabû'l Edvar bi 15 fasilan hatiye nivîsandin û meqam bi 12 cureyan dane. Ahmedoğlu Şukrullah (1388-1470) ev berhema wî bi navê "Terceme-î Kîtab-i Edvar wergerandiye tirkî. Ebdilqadirê Meragayî jî bi navê "Şerhu'l-Kîtab-i Edvar" şîroveya wê kiriye. Baron d' Erlanger ev berhem wergerandiye fransîzî û bi şerha Mevlana Mubarek Han wergera Şerefiye ji xwe re esas girtiye.

4) Fi'l-Ulum al-Arûz va'l Kavafî va'l -Badî: Behsa rêgezên arûz, qafîye û estetîk dîke.

Bi kurtasî Safiyûdîn Abdulmumîn, di dema lê dijî de muzîk xistiye qalibên zanistî, teknîk û klasîk. Ew pergala ku hîn îro jî li Rojhilata Navîn, ji aliyê pir gelan ve tê bikaranîn ku 17 navberên di yek oktavê de ne wekhev in, di çarçoveya rêgezên malbata Misûliyan de daye pergalkirin

û pêk aniye ku bikaribin heta îro bîn.

Xoce Ebdilqadirê Meragî (1353?-1435)



Muzîka kurdî ya navdar, bi navê Ustad-i Salîs, Ebdilqadirê Meragayî, îbnî Gayb, Xoce Ebdilqadir Meragayî tê bi navkirin. Dîroka jidayikbûna wî baş nayê zanîn. A tê zanîn jî li gor texmînan e û di navbera 1353 û 1360'î de digihure. Jiyanêke pir balkêş û bi liv û lebat derbas kiriye. Piraniya jiyana wî tê zanîn. Ji ber ku berhemên xwe bi zimanên erebî û farisî nivîsîne, hin lêkolîner wî wek ereb û ecem diyar dikin. Heta yê wek azerî, tirk û ermenî ku lê xwedî derdikevin jî hene (sê heb pirtûkên di Avestayê de hatine çapkirin). Bavê zanista me yê muzîkê, ji zanyarên serdemê Giyasedîn Gaybî ye. Dema behsa bavê xwe dîke dibêje " Der barê şaxên pir zanistan de agahiyên wî hebûn; bi taybetî hostayê şaxên muzîkê yê teorîk û pratîk bû."

Ji ber ku wiha gotiye, nexwe zanînen esasî û muzîk ji bavê xwe fêr bûye. Li dû mirina bavê xwe çûye Tebrêzê. Di heyama îlhaniyan de, berê bûye nedîmê (perwerdekar) hukimdarê sêyemîn siltan Huseyn, piştî wê jî di sala 1380'î de bûye yê Ehmed Celayerî. Pêşbaziya muzîkê, ku muzîsyenê navdar ê wê heyamê Rizaedîn Ridvan Şah li dar xistiye, bi dest xistiye û navê wî mezin bûye û hem di warê teoriyê de hem jî di warê îcrayê de wek mirovekî mezin ê muzîkê xwe îsbat kiriye.

Di sala 1386'an de, li ser leyan û dagiriya Tîmûr, Ehmed Celayerî reviyaye Bexdayê û bi xwe re Xoce Ebdilqadirê ku jê re gotiye, "yarê ezîz" jî birîye. Dema Bexda jî ketiye destê Tîmûr Ehmed Celayerî bi Yildirim Beyazîd star bûye. Meragayî jî dîl ketiye destê Tîmûr. Mîna pir mirovên huner û zanistê Tîmûr ew jî şandiye Semerqendê. Di sala 1397 'an de, di vê qesrê de maye. Di sala 1399'an de, di nav nedîmên kurê Tîmûr ê nexweşê derûnî de bû (wekî pir zanyarên kurd û ecem û yê din. Di nav van de ji xeynî Meragayî muzîsyenê navdar wek Qudbedîn Neyî, Hebîbê Ûdî, Ardeşîrê Çengî hebûn). Ramana Tîmûr ev e ku sedemê nexweşiya kurê wî ew kesên li derdora wî ne û ji ber vê yekê gelek ji van dide kuştin. Ebdilqadir canê xwe bi dijwarî xelas dîke û bi dilqê derweşan ji Semerqendê direve û diçe Bexdayê. Dîsan dikeve bin bandora begê berê,

ev zêde nadome. Di sala 1401'ê de, dema Bexda care-ke din dikeve destê Tîmûr demekê xwe vedişêre. Lê belê bi tesadûfî bi Tîmûr re rû bi rû dimîne. Tîmûr bêşik û bêfîkar fermana îdama wî dide. Lê belê dema dibin cihê îdamê, Meragayî sûreyeke Quranê ji dil û ji ber xwe dixwîne. Serleşkerê Tîmûr li ser vê yekê dev ji îdamkirina wî berdide û dixwaze ku Tîmûr jî dev jê berde. Tîmûr jî dev jê berdide û şanaziya wî bi şûn ve vedigerîne. Demekê bi Tîmûr re digere. Piştî sefera Hindistanê ji bo ku biçê Semerqendê destûrê ji Tîmûr dixwaze. Tîmûr dicibîne, lê ew jê diqete û naçe Semerqendê.

Di sala 1421'ê de tê Bursayê û di qesra Siltan Muradê duyemîn de perwerdekarî û îcrakariya muzîkê dike. Digel gi-handina pir muzîsyenan bingeha muzîka ku îro jê re dibêjin Muzîka Hunerê ya Tirk (di heman demê de muzîka gel a tirk jî) datîne. Li vir, li ser meqam û pergala dengan û taybetiyên usûl û rîtmên ku malbata Misûliyan berhev kiriye û ji aliyê Safiyûdîn ve hatiye pergalkirin. Di sala 1435'an de ji ber nexweşiya webayê miriye.

Helmholtz nêzî pênc sed salan piştî wî jiyaye û raman û pejnên wî texdîr kirine. Gotiye ku, "Min di berhema wî ya bi navê 'fizîoloji der Tonemphfningen' de hemû berhemen wî xwendine û jê sûd wergirtiye." Kiesswetter dibêje, Hammer notên girîng ên wergerandine, Ebdilqadir esas

girtiye û nivîsîne.

Di berhemên xwe de aliyên muzîkê yên teorîk û pratîk berhev kirine, ev spartine bûyer û qanûnên fîzîkê, bi riya ramanên ceribandîniyên kiriye. Bi rastî jî, di pêşgotina pirtûka xwe ya Camû'l Elhan de dibêje ku muzîk ji giregirên matematîkê riknek e (erkani riyaziye) û ji parçeyek sirê yê bêpîvan e (ecza-î hikmetten bir cüzüv). Ew dema ku pêşiyên muzîk bi astrolojiyê re eleqedar dikirin, ev huner ji ilmî nucum dihat ferzkirin, wî di vê pirtûka xwe de muzîk wiha ji hev cihê kiriye û lêkolîn kiriye û her wiha metodên xwe îsbat kirine.

Di beşa yekem de terîfa deng, terîfa awazê, deng û awaz çawan tê guh, dereceyên bemîfî (pesîfî) û zîltiyê (tîzîtiyê), di beşa duyem de nîspeta navberê, ji hev cudatiya navberan, ji hev eleqeya navberê û sedemên dengên ku xweş nayên guh nivîsîne.

Berhemên wî

1) Kenzu'l Elhan: Ev berhema tê wateya gencîneya newayan. Heta îro li tu cihekî nehatiye dîtin. Meragayî pêşniyar kiriye, dema ku mijarên muzîkê neyên fêmkirin bila serî li vê berhema bidin. A din jî, ew dibêje ku pir notayên besteyên xwe li vê berhema xwe qeyd kiriye. Nemaze di pêşgotina Camû'l-Elhan de dibêje ku eger ev pirtûka wî baş bê lêkolînkirin, êdî hewce namîne ku ji bo pirsgirêkên muzîkê mirov li berhemen din binêre.

2) Camû'l Elhan (koma-siya newayan): Ev pirtûk di sala 1405'an de diyarî kurê xwe Nuredîn Ebdirehman kiriye. Bi notên li ser berhema tê fehmkirin ku di sala 1423'an de ew berhema bi şûn ve girtiye, bala xwe dayê û hin tişt pê ve kirine. Nuxxayek ji vê pirtûka ku li ser pêşeka ji bo Şahrûh (1415) heye, li Stenbolê di Pirtûkxaneya Nuruosmaniye de ye. Bi farisî hatiye nivîsandin û di nav de notayên hin berhemen wî hene.

3) Makasîdu'l Elhan (mebesta newayan): Di sala 1422'an de pêşkêşî Siltan Muradê Duyem kiriye û bi farisî hatiye nivîsandin. Nuxxayek ji vê berhema di pirtûkxaneya Rauf Yekta de ye ku ew pisporê muzîka tirk e, nuxxaya ku pêşeka ji bo Muradê Duyem tê de ye jî, di pirtûkxaneya Zanîngeha Leyde-nê de ye. Di vê berhema xwe

Di sala 1421'ê de tê Bursayê û di qesra Siltan Muradê duyemîn de perwerdekarî û îcrakariya muzîkê dike. Digel gi-handina pir muzîsyenan bingeha muzîka ku îro jê re dibêjin Muzîka Hunerê ya Tirk (di heman demê de muzîka gel a tirk jî) datîne. Li vir, li ser meqam û pergala dengan û taybetiyên usûl û rîtmên ku malbata Misûliyan berhev kiriye û ji aliyê Safiyûdîn ve hatiye pergalkirin.

de, der barê sazên ku wî îcad kirine de, agahiyan dide.

4) Şehru'l Kîtabu'l Edvar: Ev berhema wî şîroveya Kîtabu'l Edvara Safiyudîn Abdulumûn e. Ev pirtûka ku bi farîsî hatiye nivîsandin, nusxayek jê di Pirtûkxaneyaya Nuruosmaniyyê de ye.

5) Kîtabu'l Edvar (dema li Bursayê, di qesrê de bûye nivîsiye). Ev berhem bi osmanî hatiye nivîsandin û tenê yek ji nusxaya vê pirtûkê li Leydenê ye. Di vê pirtûka teoriyê de, notayên hin besteyên wî hene.

6) Berhemên Muzîkê: Ew mirovê mezin ku pir amûrên muzîkê îcad kirine û yên ku heta wê demê tên zanîn jî îslah kirine, berhemên wî yên gihîştine îro bi "notaya ebced" qeyd kiriye û hatina wan a îro pêk aniye. Ev berhem ji aliyê teknîka besteyan ve û ji aliyê formê ve ji bo bestakar û muzîsyenên pey wî hatine, bûye mînak. Berhemên wî yên aîdî muzîka enstrumantal nîn in. Di her berhemên xwe de digel diyarkirina ku bi vî rengî jî besteyên wî hene, ji ber ku bi nota nekirine, wînda bûne. Berhemên bi devkî cur bi cur meqam û usûlan ve 13 kar beste, nexş beste, nexş yuruk semaî, sengîn semaî û kulek (aksak) semaî bi tevahî 30 heb in. Ên herî navdar kari muhteşema ku meqamê rast e û bi usûla devr-hîndî hatiye bestekirin, kar- i şevaza kumeqamê segah e û hay-darname ne. Pir berhemên wî bi Kenzu'l Elhan re wînda bûne.

Alahî

Yek ji şênîyên Amedê yê alimê olî ye. Şairê dîwanê û bestekarê muzîka olî ye. Ji ber ku Alahî vexwendinên siltan nepejirandine, neçûye qesra wî û berê jê devxweşiya siltan dîtiye bi fermana siltan hatiye îdamkirin (Vê heyamê muzîsyenên ku di nav kurdan de navdar in an di qesrê de an jî di dîwana begên di bin fermana siltan de ne de, cih digirtin).

Şukrulah Begê Erebgirî

Behsa Şukrulah begê di Seyahatnameya Evliya Çelebî de dibe. Ji muzîsyenên herî baştir ê derdora Erebgirê ye. Çelebî dibêje saza ku ew lê dixê navê wê ravza ye û behsa zanîna wî ya berfireh a muzîkê dike.

Usiv Nabî

Di sala 1642'an de ji dayik bûye. Der barê muzîka tesawufê de hosta ye, dengê wî xweş e. Bi bernavê Seyîd Nuh berhemek beste kiriye. Em van ji berhema Atrab-ul Asar a Şexulîslam Mehmed Esad nivîsiye, fêm dikin.

Bedrî Şîrvanî

Der barê jidayikbûna wî de qetî tiştek nayê zanîn. Îcarakar û bestekarê muzîka olî ye û di sala 1424'an de li devera Wanê miriye.

Bi sedan muzîsyenên kurd hene ku navên wan tên zanîn lê em der barê wan de zêde ne xwedî agahî ne, lê em ji şopa ku wan di dîrokê de hiştine dibînin ku wa ew hene. Eger ez bigihîjime belge û agahiyan der barê wan de, ez pa-

revekirina wan agahiyan wek dayekî ji xwe re dibînim.

Heta salên 1500-16-00'î muzîka kurdî xwedî pergala dibistanî ye û ji bo avaniya muzîka gelên din bingeh pêk aniye. Lê ji vê dîrokê bi şûn ve, bi piranî bi qerekerê muzîka gel xwe nîşan daye û vî awayî domiyaye. Êdî muzîk ji bo kurdan wek dibistana dîrokê, wêjeyê û zimên rol listiye. Heyama ku muzîsyenên dibistanî cihê xwe bidin dengbêjen ku bi awayê hosta û şagirtan xwe gihandine, dest pê kiriye. Dengbêj, feqî û jinên kurdan êdî bûne kevirê hîmî yê muzîka kurdî. Bi lorikên xwe, bi lawikên xwe, bi helbest û payîzokên xwe, bi beyt û qasîdeyên feqiyên medresê, bi muzîka zikirê ya civata sofîyên kurd ên misilman ên sunî, jiyane. Kurdên êzîdî û elewî jî, bi gaveke pêşvetir hem muzîk hem jî hin amûrên muzîka kurdî dane jiyandin. Eger elewî nebûna me nikaribû behsa tenbûrê bikira, eger êzîdî nebûna me nikaribû behsa bizqê û kevanekê (kemençe/ribabê) bikira.

Di erdnîgariya kurdan de dengbêjen pir navdar jiyane û van bi destan û çîrokên xwe, bi tevlîkirina feqî û dayikan ve muzîka kurdî, ligel vê ziman, dîrok û zargotina kurdî heta îro jî me re anîne. Ji ber keda wan ku ev gencîne dewrî me kirine û parastine, em spasdarên wan in.

(Dûmahîka wê heye)

ÊZÎDÎTÎ *

Çend raman û nêrîn li ser rastya vê ola kevnar, rewşa wê ya îro,
nexwendîtiya olî ya di nav me de û leyîstokên siyasî

Ezîzê Cewo

"Ji çi welat dest pê dibe?!.."

(Ji straneke rûsî ya sovyetî)

Dema hinek hevalên me yên ji Yekîtiya Êzîdiyên Kurdistanê ji min re digotin "Tu çima tiştêkî ji kovara me La-lîşê re nanivîsî", ez di nav mitalayên xwe de digeriyam, min dixwest tê bigîhîjim ka ez çi dikarim binivîsim û min tu bersiveke erênî nedidît. "Ê, ez ê çi binivîsim" min digot. "Ez ne amade me û naxwazim he-ma wisan ji bo xatirê nivîsekê, tiştêkî binivîsim. Pirs û pirsgirêkên êzîdîtiyê pirsinen giran in, mijara wê jî ne wisan pir hêsan e."

Her çiqas jî min gotibû "Na"jî, dîsan dem bi dem tişt di mêjiyê min de digeriyam. Min li ser wan serê xwe di-êşand, lê dîsan ez ji xwe razî nedimam. Heya ku em gi-hîştin demêkê û min dît ku hinekan êzîdîti kirine mijara gotin û nivîsên çewt û vala; her kesek çi tê serê wî dibêje û dinivîse. Nêrînan diavêje holê; hemî di vê rewşê de ne dost û neyarên ola êzîdîtiyê û neteweya kurd jî dest avêtine van nezan û hêsrên heş û sewdayê xwe yên di nav me de û ev hemû kirine mijara kirin û firotina siyasî.

Û ev pirsgirêk wek gêj-

gerîngêkê li hev zivirî, zivirî û ji xwe re nêrîneke mêjiyê nexweş û dûrî hiş û aqilan derxist holê. Gotin "Êzîdî ne kurd in!" Li hemberî vê di nav gel de helwestekê rû da. "Eger êzîdî ne kurd in, êdî kî kurd e?" Û van tevan ez ve-gerandim zaroktiya min. Û min ji wir ve dest bi lêgerîna bingeha xwe ya êzîdîtiyê kir: Em êzîdî kî ne? Ji bo çi ji me re dibêjin êzîdî? Êzîdîti bi xwe çi ye? Van û pirsên din, tebatî nedidan min.

Bi rastî, hingî min çavên xwe vekirine ji mirovahiyê û cihanê re, têgihîştina min çêbûye, min xwe êzîdî nas kiriyê. Rastir dibû ku mirov bigota, me hemûyan, ên ku di gundê me de mezin dibûn, xwe wek lawê êzîdî nas dikir. Êzîdî jî, ne wek tiştêkî cuda, wek rengêkî kurdan, ên herî kurdmayî yên li ser bingeha neteweyî dombûyî û zimanê xwe jî me kurdî dizanibû. Ev ji çi dihat? Her çiqas bavê min, Cewoyê Emerê Mamo mamostayê zimanên kurdî û ermenî bû, endamê Partiya Komûnîst a Yekîtiya Sovyetê bû û îdeolojiya vê partiyê jî atêizm ferz dikir, lê kalik û pîrikên min û dayika min bawermend bûn, êzîdîti diparêzin, şêx, pîr, xwîşk û birayên axiretê, koçek ji mala me kêr nedibûn. Her cejneke olî bi girêdaneke pir mezin

dihate pîrozkirin. Bi şev ra-dibûn paşivan û rojî digirtin, dîwar, stûn û banê xaniyan ên ji teniya dûyê tenûrê reşbûyî bi êr dinitirandin, êvara Cejna Xidirnebî xwe bi hêlêkanan dikilan, ji bo ku "gunehên xwe dawêşinin." *Dolîdang digerandin*; keç û xortên 1012 salî radibûn ser xaniyê her malekê, goreke rengîn an jî tûrikek di kuleka wê malê de dadileqandin û bi hev re wek straneke deng didan hev

Dolîdangê, dolîdangê

Xortê malê zavangê

Pîra malê qurbangê

Tiştêkî bixin vê dolîdangê

Lê hema wê şevê di sê-niyekê de ar datanîn ser stêr, temeziyeke heftrengî dia-vêtine ser û hêviya hatina si-warê mirazbexş Xidirnebî bûn. Eger şopa sima hespê Xidirnebî li ser êr bihata dîtin, bizanibe çerxa wê malê rast dizivire û ew ê bibe xwedî mal û hebûneke mezin, mala wan jî dê tije keç û kur be, dê keç û xortên wê malê bigîhîjin bext û mirazên xwe.

Her çiqas jî ev hemû he-bûn, ev rê û resmên neteweyî, toreyên kevneşopî dihatin pa-rastin, vî gundî bi êzîdîtiyê bêhn dida, lê dîsan jî navê wî (gundî) Pampa Kurdan bû. Hemû pampiyan bi serbilindî digotin em ji Pampa Kurdan

in. Her paşê dereng, navê gund guhartin û danîn Sîpan. Lê dîsan heya îro jî kesekî ji gundê Sîpanê ji xwe re nabêje sîpanî, dibêjin pampî.

Ev, rewşa me ya xwezayî bû. Tu carê jî di serê me re derbas nedibû ku em ê vê rewşa xwe ya xwezayî ji hinekan re şîrove bikin. Dibe ku, eger ev nezaniya ji nav me derketî nebûya, me dê der barê van tiştan de behs jî nekira.

A li vir e, ku dibêjin "Tu tiştêkî xerab tune, ku tiştêkî qenc tê de nîn be!"

Belê, em dîsan vegehin ser Pampa Kurdan. Ev gund li Ermenîstanê, li bakurê Çiyayê Elegezê, di nav sêgoşeya rêzeçiyana de, di destpêka sedsala 19'an de ji hêla êzîdiyên ku ji tevkujiya Roma Reş filitî bûn, hatibû avakirin. Van êzîdîyan hê 200 sal berê dizanibûne ku ew bi ola xwe ve êzîdî ne, lê bi netewe kurd in, ango kurdên êzîdî ne. Ji bo wê jî navê gundê xwe danîbûn Pampa Kurdan.

Mîrov diêşe jî, ku di destpêka sedsala 21'ê û hezarsala sîsîyan van tiştan şîrove dike, lê çawan bikî, kortî û nezaniyê timî di dîroka me de roleke reş û kirêt lîstîye û yên ku bi van nezanan dilîzin jî wek seyên birçî yên ku li der û dorên malan digerin, ji bo hestiyekî birevînin, dest diavêjin wan û dijî yekîtiya neteweyî didin lîstin!

Lîstik bi lîstikan, lê em bîn ser êzîdîtiyê.

Di Sovyeta berê de, bêhtir jî di Ermenîstanê de, kurdan êzîdîtiya xwe baş parastîye. Ev, ji ber ku 24 gundên me yên xwerû kurd li Ermenîstanê hebûne, hem jî bi ziyaret û ocaxên xwe ve, bi oldar û bawermendên xwe ve, bi xanî û tenûr û kuçikên xwe ve, bi şîn û şahiyên xwe ve. Hemû



bi reng û naveroka xwe ve neteweyî, reng û awazên ola kurdan a kevnar êzîdîtiyê ve.

Bi hemû rabûn û rûniştinên xwe, van kurdan bi êzîdîtiyê bêhn didan; rojiyên xwe digirtin, cejnên xwe pîroz dikirin, şîn û şahiyên xwe pêk dianîn, diçûn ser mezelan, li goristanan miriyên xwe bi bîr dianîn, nanê miyana derdixistin, xêr didan wek ku şanê êzîdîyan dikeve. Li hev dipirsîn, diçûn hewarîgazyên hev, dibûn xwendiyên şahiyana, diçûn ber ocax û ziyaretan tiya dibûn, serê xwe dadanîn, hêviya jiyaneke bextewar dikirin û bi vî rengî

jiyana xwe ya neteweyî didomandin.

Lê kuloça sersalê? Ev jî hema hema diket dema ku şev û roj weke hev dibûn û dema sersala kurdî ya neteweyî Newrozê. Wan rojan li fêza gundê me, li davanê berfînek derdiket ne wek kulîlken berfê yên din bû, bejna wê bilind bû, serê wê wek ku zengilekî lêvên wî tîjtîjî bibin û bi paş ve zivirîbin, vajî bûbûn, wek pelên serbixwe. Rengê wan sût bû. Di navenda her pelekî tûdirêjkî re kêleke zerê vekirî (qîçik) derbas dibû, te yê bigota yekî ta û derzî hildaye û ew kêl daye. Hûn dizanin navê wê berfînê çi bû? Newroz! Berfina sersalê, mizgî-niya biharê Newroz, New-roza

delal! Lê dema ku kuloç ker dikirin?! Her we bidîta, em zarok çawa li dorê dicivîyan, me çit digirt û em bêsebir li hêviyê bûn, ka wê morî para kê bikeve. Mezinê malê jî (demekê kalikê min, lê paşê jî bavê min) kuloç ker dikir û ji bêhna petinî û temtîskan hewayê li ber bêvila me firdida û dengê mezinê malê guhê me dihingaft: "Ev para mêrê rojê, ev para xudanê malê, ev para ziyayê zer, ev para mamereşan, ev para mamê şivan, ev para gavanê zerzan, ev para xeta cot, ev para malxwêyê malê, ev para rêwiye me, ev para xwendevanê me, ev para..."

A, êzîdîti ev bû! Û îro jî ev e, eger em bi rastî êzîdî bin; bi biçûk û mezinên xwe ve, bi

oldar û bawermendên xwe ve bêyî qîle û lêpî ji ber ku êzîdî ne, ji ber ku rewşa kurd a xwezayî êzîdîtî ye. Û êzîdîtî û êzîdîbûn jî ne wisan hêsan e!

Û li vir fêlbazî, lêpokî ne pêwîst in. Êzîdîtiyeke nû, ji ber xwe hinartî, bêbingeh nikare hebe, dûmka wê kin e, ji ber ku êzîdîtiya rast û ya pîroz a destpêketî li ser zarên kal û pîrên me maye, di rewan û ramana wan de ye, ya ku bi zarê pîroz ê oldarên me yên rast û paqij tê gotin û dibe perwerdeya me ya rewanî² Ev jî di jiyana me ya her rojî de hema wisan hêsan çênabe. Zaroka ku bi çanda biyanî ya xerîb mezin bû, ya ku heya bi xurekê xerîb hate mezinkirin, di mala xwe de bi êzîdîtî nejiya û bêhn neda, nikare bibe êzîdî. Bi gotina "Ez êzîdî me" mirov nabe êzîdî. Êzîdîtî, di destpêkê de bi perwerdeya dayikê re tê; dayika êzîdî ya ku ew bi şîrê xwe re, bi lorîkên xwe re dide zarokên xwe. Eger em dixwazin zarokên êzîdî mezin bikin, divê her dayikeke êzîdî bikin mamosteya ola êzîdîtiyê. Ol, bawerî ye, bawerî jî bi riya têgihîştina ramanî digihîje, ji vê re jî kar û xebateke bêhempa pêwîst e.

Bingeheke wiha çêbûyî jî, wisan bi hêsanî hilnawêşe, nayê tunekirin. Ev hezar û sed sal e, ola îslamê di Kurdistanê de cihê xwe girtiye, giraniya gelê me % 80-90 vê olê diparêze, lê hê jî, piştî ew qas sal, gelek kevneşopiyên êzîdîtiyê di nav wan de mane.

Havîna 1993'an me yê li

Komara Adîgêyê ya Federasyonê Rûsyayê, di gundê Bêloyê de konferansa Yekîtiya Kurdên Sovyetê li dar bixista. Wê demê, ez der û dorê 15 rojan li wir mam û malmêvanên min jî du malbatên kurdên misilman bûn. Dayikên van malan, dema sond dixwarin, digotin: "Ez bi vê Rojê!", "Ez bi vî nanê germ û texte û sifreya sar!", "Ez bi vî agirî!" Ma ev jî ku tên?

Lê eger em li sondên nav me êzîdîyan binihêrin? Wan jî wiha digotin: "Ez bi vî Şemsî!", "Similayî!" (ango Bismilayî), "Ez bi milyaketan!", "Ez bi Cin Teyar!", "Ez bi Şêşims!" Ma îcar ev jî ku tên?

Wek ku ji van her du mînan kan tê xuyakirin, li bal hinek kurdên misilman hinek tiştên bingehîn ên êzîdîtiyê bêhtir hatine parastin, ne ku li bal kurdên êzîdî.

Demekê oldarekî êzîdî bû mêvanê me, mirovekî hêja, oldarekî pîroz! Min demekê xizmeta wî kir. Her carê, dema ez bi wî re têkildar dibûm, zaroktiya min di hate bîra min. Dema kalikê min Emerê Mamo ez dişandim pey şêx, an pîrê xwe, "Here, lawo, bibêje Pîr Kerîmê Biro, bila bê. Bêhna min teng bûye, min bêriya wî kiriye. Ya Xwedê hêviyê ji min kêm nekî, ez gunehkarek im, li rû erdê dijîm. Ya Xwedê!" digot û ez dilezandim. Pê re jî digot: "De bilive, ha!"

Her carê, dema ez bi oldarê bi rêz û hurmet re diaxivîm, min texmîn dikir, wek

ku dema zaroktiya min, bêhna kalikê min bi Kerîmê Biro fireh dibû, bêhna min jî bi kekê pîr. Lê piştî van, dema di hat bîra min ku ev zarokên me yên îro, ji hebûn û bawerîya xwe bêzanebûn mezin dibin, ez bêhteng dibûm.

Di demeke wiha de, carekê wî pîrê me yê pîroz ê rûheden ji min re got: "Ez ji te re gorî bim, xwezî êzîdîyên mîna te pir hebûna!" Min ber xwe neda, ez teqiyam, min got: "Ez çi êzîdî me!"

Wî pîrsî, "Ma, li te xweş nayê, ku tu êzîdî yî?"

"Na! Ne ku li min xweş nayê! Ma êzîdîtî wiha dibe? Em û hemû yên derdorên me, heya gelek zarokên we oldaran jî, nizanin êzîdîtî çi ye, mirov çawan bi êzîdîtî dijî, mercên êzîdîbûn û êzîdîtiyê çi ne? Gelo, eger van fehmkorên nav me zanibûna, wê bigotana, ku êzîdî ne kurd in?" û min bi dengê bilind gotina xwe birî.

"Ma, tu çawan tiştê wisan dibêjî" got û pîr ber dilê min da hat. "Her êzîdiyek ji dayika xwe êzîdî dibe! Ma dê û bavê te ne êzîdî bûn?"

"Belê!"

"Tu jî êzîdî yî!"

Min dîsan li ber xwe neda, vê carê ez bêhteng bûm (bila keko min biborîne!), û bi keyd min lê vegerand: "Keko, ez gorî, ez ji dê û bavê xwe wek mirov hatime cîhanê. Paşê ez bi çanda kurdî wek kurd mezin bûme! Êzîdîtiya min jî, dema ez bi dayika xwe re çûme ber ziyaret û ocaxên

me, şêwaz girtiye. Dema ol-dar hatine mala me, wan û kalikê min suhbet kirine, wan dirozge xwendine, qewl û beyt gotine, dema hatine ser miriyan, rojên mezelan... û hew! Hema kesekî ez êzîdîtî fêr nekirime, dayika min ji min re lorik, an mercên êzîdîtîyê negotine. Ew ê bi xwe jî ew nizanibûne. Kesekî ew jî fêr nekiriye. Hê ya me baş e, me gund dîtin, me êzîdîtî (pir an hindik!) dît û jiyân kir. Lê van zarokan, ên ku li metropolên biyanî mezin dibin, bi çanda xerîb, di nav hewa û dor û berê olên xerîb de, em ê çawan biparêzin?"

"Çawa?" Pîr bêyî hemdê xwe pîrsa min dubare kir.

"Ê ku xwe êzîdî dibîne" min got "Divê ji bo êzîdîtîyê tiştêkî bike." Kekê pîr bi pîrs li min nihêrî. "Çi?" Min pîrsa wî ya bêdeng bi zar lê zivirand. "Vê jî hûnê bibêjin! Û barê herî giran li ser milê we oldaran e! Hûn ê ji bo ruhê her zarokêkê têkoşînê bikin, têkoşîna olîneteweyî ya qezenckirinê. Ne bes e ku hûn herin ser miriyan, dirozgeyan bixwînin, divê hûn herin her maleke êzîdiyan, li bal zindiyan, her yekî re têkilîdar bin, rewan û mêjîyê wan bi êzîdîtîyê perwerde bikin. Hûn in, hostayên rewana wan! Nizanim, ez ne oldar im, lê ez dibînim ên olên din çawan kar dikin. Roj, nava rojê keriyê we ji destê we diçe. Eger wisan bidome, demên bê, hûn ê bibin wek şivanên bêkerî."

Kekê pîr bi melûlî li çavê min nihêrî, min texmîn kir ku

di ruhê wî dae hêwirzeyek rabûye...

Ew hêwirze îro jî di nav min de kel dide. Dahatûya van zarokan wê çawan be? Em ê vê ola kevnar a gelê kurd çawan biparêzin wek parçeyekî xezîna çanda mirovahiye? Ev nezaniya ola neteweyî, nexwendîtîya olî, em ê çawan ji holê rakin û bingeha xwe ya ruh û rewanî nas bikin? Ev pîrsinên hanê dikin hêwarze û bersîva xwe dixwazin.

Ji hêla din ve, guftûgoyên cuda yên ku îro li ser ola ezîdîtîyê derketine holê, netebatîyê didin her kurdekî têgihîştî (ew êzîdî be, an na) û mirov dixwaze tê bigihîje û bersivên wan pîrsan bibîne.

Dema em dibêjin êzîdîtî ola kurdî ya kevnar e, yên dijberî me van tiştên hanê didin pêş me:

- Eger êzîdîtî ola kurdan a kevnar e, lê ev peyvên wiha yên ku di vê olê de hene, hûn ê çawan şîrove bikin? *Şems, Şêşims, Sultan Êzîd, cinet, cehneme, ruh, cin, milyaket, melek, Tawîsî Melek, şêx, Nasrêdîn, Sicadîn, Melek Fexedîn, Şêxûbekir, Ebûbekir, Cinteyar, Şêxadî (Şêx Adî), similayî (bismilayî), Rebê alemê/ Rebilalem, Xuliqelah, Xaliq...*

Dibêjin ku ev navên bingeîn ên ola êzîdî, ne ku tenê yên erebî ne, lê her wiha giraniya wan peywîrên ola îslamê destnîşan dikin.

Heya radeyekê ev rast e. Lê tenê heya radeyekê! Heya

destpêka dema Şêxadî rews cuda bû. Bi hatina Şêxadî û hemû reformên bi navê wî re girêdayî, serdemeke nû di dîroka ola êzîdiyan de dest pê dibe, ya ku em ê bi mercî wek serdema Şêxadî bi nav bikin. Lê serdema berî Şêxadî jî em ê wek serdema êzîdîtîya kezî, ya bihurtî (pîroz) bi nav bikin.

Êzîdîtîya îro, nîgara vê ola me ya kevnar û pîroz, bi hatina Şêxadî re şêwazeke din wergirt. Wek ku ji çavkaniyên dîrokî tê zanîn, Şêxadî (Şêx Adî) di dema xwe de (sedsala pêncan a koçî) li Bexdayê xwendina zanistî standiye (*binihêre gotara Feqî Huseyin Saxniç a "Şêxadî", kovara Laliş, 2004, hejmar 21, rûpel 24-26.*). Û wê demê jî li Bexdayê ji xeynî perwerdeya ola îslamê tu perwerdeke din nikaribûye hebe, ji xeynî misilmanan yekî ji oleke din ji bo perwerdeyê nehatiye pejirandin, ji ber ku ew perwerdeya ola îslamê bûye. Ji bo wê jî ew êzîdîtîya serdema Şêxadî bi rengê xwe ve pir nêzîkî îslamê bûye, heya wek terîqetê wê û hemû zanista wî ya olî bi termînolojiya îslamî hatiye û gihîştîye me. Heya hemû navên Xweda û xwedawendên ola êzîdî wergerandine erebî, ango kirasekî îslamî li wan kirine. Ev jî xwezayî ye, ji ber ku wî perwerdeya ola îslamê standiye, ne ya ola êzîdîtîyê. Heya radeyekê ev zanîsta Şêxadî ya ku oldarê serdema wî tenê zarekî hîn bûne (oldarên êzîdî dibêjim, "ew dînekî sînemdevterî ye û li ser balgî digihîje hinek

oldarên şareza û pispor"), di nav çarçoveya oldaran de tenê teng maye. Lê êzîdîtiya berî Şêxadî ya ku bêhtir gelêrî bûye, di nav gel de, di nav zargotina me ya gelêrî de hatiye parastin.

Em hema li van peyvyan ên ku hê jî di nava êzîdîyan de zindî mane, binihêrin: *Mêrê Rojê*³, *Xudanê malê*, *Ziyayê zer*, *Memê Şivan*, *Gavanê Zerzan*, *Mamereşan* û navên din ên pîroz, eger ne navê xwedewandan in, lê çi ne? Her çiqas jî di nav sedsalan de hinek tişt di wan de dikare hatibin guhartin jî.

Bi vî awayî, piştî reformên Şêxadî hêdî hêdî, bi berekê ve li şûna peyvên Xweda (ê)⁴ *rewan*, *bihuşt*, *raman*, *dojeh*, *ferîşte*, *ol*, *tep*, *roj*, *bi hêviya xwedê* van peyvyan bikar tînin: *Elah*, *Reb*, *Xuliqelâh*, *Rebilalem* (*Rebê Alemê*), *ruh*, *cinet*, *cehnime*, *fikir*, *milyaket*, *dîn*, *cin*, *şems*.

Dibe ku dehsal pêwîst bin (dibe ku sedsal), ku lêkolînerên ola êzîdî bingehên wan ên neteweyî bibînin.

Êdî em der barê nexwendîtiya hinek oldarên me de nabêjim ên ku li ser şîn û xêran li şûna dirozgeyên ola êzîdîtiyê heya ayatên Qurana pîroz dibêjin û hay jî pê nîn in.

Îro êzîdîti jî çarçoveya teng a monopoliya çend oldaran tenê derketiye. Di dema xwe de gelek berhevkarên zargotina kurdî her wiha qewl û beyt û dirozgeyên ola êzîdîtiyê jî berhev kirine û weşandine. Weşanên Yekîtiya

Êzîdîyên Kurdistanê îro bi lêkolînerên xwe ve guftûgoyeke berfireh li ser vê ola kurdan a kevnar vekirine (bingehîn jî di Lalişê de). Û ew guftûgoyên di civakê de (li hinek cihan bitirs, li hinek cihan bişerm û dizî) îro cihê xwe didin lêkolînerên zanîstî yên li ser rûpelên weşanan û bi radyo-televizyonan.

Wek me li jorê jî got, hê jî di nav me de hinek ji nexwendîtiya olî, êzîdîyan ji neteweya kurd cuda dikin. Ji bo van tiştan jî bingehên cuda cuda hene. Yek, wek ku me got, nezaniya olî ya di nav me de ye, ya duduyan cuda-xweziya olî, ya ku bingeha xwe ya objektîvî heye û di

"Ew ên wisan dibêjin, dibe ku ne kurd bin. Ger wisan e, ew ne êzîdî ne jî. Wê demê ew divê ji pîrik û dayikên xwe bipirsin, ka ew ji ku tên. Eger ew ên ku wisan dibêjin ne kurd bin jî, ew nayê wê wateyê ku êzîdî ne kurd in, ji ber ku tu tîkiliya mirovên wiha bi êzîdîtiyê re tune ye. Eger êzîdî ne kurd in, êdî kî kurd e?"

nav gelek gelên cihanê de jî rû dide⁵, a din, jî faktora siyasî ye. Dema destekî ji derve van tiştan tevger û destek dike, ji bo ku derbeyê bigihîne yekîtiya neteweyê bi giştî. An jî cih cihinan ev hemû faktor bi tev dertên holê.

Em wek êzîdî û her wiha lêkolînerên ola êzîdîtiyê gi-

hiştine qonaxekê ku divê em vekirî bi hev re biaxivin. Hemû terefên pirsê yên tarî ronî bikin, çavê cihanê li ser rastiya êzîdîtiyê, nezani-nexwendîtiya di nav me de û leyîstokên siyasî vekin.

Divê mirov ne li vê pirsê, ne jî xetereya leyîstokên siyasî yên ser me êzîdîyan, bi çavekî biçûk binihêre.

Li şûna peyvnişarê

Du sal berê ji Lalişê pey-wirdarek hatibû Rûsyayê. Ew, bi temenê xwe ciwan lê pir zana bû. Bi zanistî nêzikî pirs û pirsgerêkên olî dibû, ji bo wê jî ji hêla gel ve hate hezkirin.

Dema hevdîtinekê kurdekî êzîdî jê pirsî: "Koçekê birêz, li vir hinek êzîdî derketine û dibêjin, êzîdî ne kurd in. Ev çi tişt e, ji ku hat? Hûn li vê pirsê çawan dinihêrin!"

Koçek hizingek rahişt û bêyî ku lez bike, peyv bi peyv, yeko yeko gotinên xwe rêz kirin: "Ew ên wisan dibêjin, dibe ku ne kurd bin. Ger wisan e, ew ne êzîdî ne jî. Wê demê ew divê ji pîrik û dayikên xwe bipirsin, ka ew ji ku tên. Eger ew ên ku wisan dibêjin ne kurd bin jî, ew nayê wê wateyê ku êzîdî ne kurd in, ji ber ku tu tîkiliya mirovên wiha bi êzîdîtiyê re tune ye. Eger êzîdî ne kurd in, êdî kî kurd e?"

Koçek gotina xwe domand. "Kî kurd e, ne kurd e, ez nizamim, lê êzîdî kurd in, ew jî kurdên li ser bingeha kal û bavan mayî ne, ez vê di-nizamim. Û cihan jî vê dizane."

Nasî

1. Tu girîfteriyek di navbera navê ola kurdan a kevnar *êzîdî* û navê *Sultan Êzîd* de nîn e. Navê ola *êzîdiyê* yek ji navên *Xwedê* ye. Di qewlekî ola *êzîdîtiyê* de tê gotin: "Hezar û yek navên *Xwedê* hene, *êzîdî* jî navekî *Xwedê* ye!". Her navekî *Xwedê* tê ravekirin: Peyva *êzîdî* ji peyverêza "*Yê ez dayî*" tê. Paşê, hê dereng, ev peyverêz di axaftina zindî de hey hatiye gotin û di wê de guhartin çêbûne, peyv jê weriyane, gihîştine hev û ew bûye peyvek. Peyverêza "*yê ez dayî*" bûye *yêzîdî*, ev jî ji hêla xwe ve bûye *êzîdî* (*êzîdî* <*êzdayî* <*yêzdayî* <*yê ez dayî*). Hê jî di nav gelek *êzîdîyan* de ji *êzîdîyan* re dibêjin *ezdayî*...

Lê *Yêzîd bîn Muawî bîn Ebî Sifyan benî Omeya* ji eşîra ereban a *Qureşîyan* a li Mekê, pismamê Mihemed Pêxember ê dûr e, yek ji *Xelîfê cîhana îslamê* bûye.

Yezîd (an, wek *yên êzîdî wî* nav dîkin, *Sultan Êzîd*) kurê *Muawî bîn Ebî Sifyan* e. Heya *Êzîd* (*Yezîd*) xelîfetî di dest malbata *Pêxember* de bûye. Ji vê malbatê *Elî xelîfê 4'em* ê dawiyê bûye. Tê gotin ku kuştina *wî* bi destê *muaewîyan* çêbûye. Hesenê kurê *Elî*, tê jehirdadayîkirin, ê *dînê Huseyn* û hemû malbata wan, bi giştî 22 kes, di *Kerbelayê* de ji hêla *Êzîd* ve tên kuştin. Bi *vî awayî*, dawî bi desthilatdariya malbata *Pêxember* tê û pismamên wan ên dûr *muawîyan* desthilatdariyê hiltînin dest xwe. *Êzîd* dibe *Xelîfe*.

2. *Rewan*, angoyê *ruh*, di kurdî de peyva *Pakrewan* (*pak+rewan*), tê wateya *ruhê pak/paqij*, angoyê *şehîd*. Her wiha di *Avestayê* de jî peyva *ravan* tê wateya *ruh* (*li ser ruh û rewan* binihêre nasiya 3.).

3. Di kurdî de wateya peyva *mêr* teng nîn e (*mêr û jin*). Di zargotina me de peyverêzên wiha mane û gihîştine me: *Mêrê Rojê*, *Mêrê Dîwanê*, *Mêr-Milyaket*. Dema em di çarçoveya zimanên hind-ewropî (hindgermanî) de hemberî hev dîkin, dibînin ku di hinek cihan de wateyên wan digihîjin hev. Mînak, di îngîlîzî de peyva *merit* (*mrit*) tê wateyên *qazenc*, *hêjayî*, *qazencîkirin*, *hêjayî tiştêkî bûyîn*. Di rûsî de peyva *mêr* di nav peyverêza "*mêr goroda*" de tê wateya *rêveber*, *serok* (*rêveberê/serokê bajêr*). Dema mirov van mînakên dide ber hev, dibîne ku di kurdiya kevn de *mêr* hatiye wateya *peywardarekî payebilind* (*Mêrê dîwanê*), *peywardarekî pîroz* di "*pantêona*" xwedawendan de (*Mêrê Rojê*, *Mêr-milyaket*). Eger em peyverêza *mêr milyaket* ravekin, em ê bibînin ku li vir *mêr* bi wateya *milyaket* hatiye têgihîştin. Dema pêşiyên me peyveke biyanîyan di nav axaftina xwe de anîne, ew bi peyveke kurdî re bi tevahî bi kar anîne, ji bo ku bê têgihîştin: *horî-melek*, *mêr-milyaket*, *ruh û rewan*, *roj û şemal*, *şert û merc*, *dua-dirozge*, *hiş-aqil*, *derî-bacî*...

Mêr peyvek e ku di kurdî de wateya wê fireh bûye, an

du peyvên cuda ne, *yên* ku tenê bi *şewazên* xwe ve di nava demê de bûne wek hev? Ji bo bersîveke rast û zanîstî bê dayîn, divê lêkolîneke zanîstî ya kûr û berfireh bê kirin...

4. Wek ku me li jorê jî got (binihêre nasiya l'em), her navekî *Xwedê* şîroveya wê heye. *Xwedê* jî wateya xwe heye, angoyê ku xwe daye. Di qewlekî *êzîdîyan* de hê jî şîroveya wê maye:

Xwedê cîhan sêwirand,

Kesekî Xwedê nesêwirand

Xwedê xweda ye!

Li hinek deverên *Kurdistanê* niha jî li şûna peyva *xwedê* (*xudê*) peyva *xweda* (*xuda*) tê bikaranîn.

Her wiha navên *Xwedê* *yên* din jî hene: *Yekê jorîn*, *Yê bêheval*, *Padişahê Padişahan û hwd*.

5. Em zêde dûr neçin; ev êdî zêdetirî heştê salî ye, *Ermenîstan* wek komar heye, siyaseteke neteweyî ya yekgirtî tê meşandin, dibis-tanên neteweyî hene, lê hê jî *ermeniyên katolik* xwe *frang* bi nav dîkin û bi dijwarî hal û zewacê bi *ermeniyên grîgorîyan* re pêk tînin. Ew xwe *frang* dihesibînin, ên din *ermenî*, ji zaravayê xwe re *nabêjin* *ermenî*, dibêjin *frangî* (bi *ermenîkî frangêrên*). Hema em hemû jî dizanin ku ew rengekî *ermenîyan* in. Êdî em der barê *ermeniyên hemşî* de, *yên* ku misilman in, *nabêjin*.

Gulan- pûşper, 2004

Moskova

XEBAT Û ÇALAKIYÊN ENSTÎTUYÊ

Ji hejmara heftemîn a Zendê bi vir de, gelek xebat û çalakiyên Enstîtuyê çêbûn û pêk hatin. Kovara Zendê, bi her awayî hem deng û hem jî navgîn û amûra xebat û çalakiyên Enstîtuyê ye. Ji van çalakî û xebatan, xaleke girîng jî çalakî û xebatên Enstîtuyê yên navxweyî ne.

Em dê, bi navgîna vê nivîsarê, xebat û çalakiyên Enstîtuyê yên borî, ku di navbera salekê de pêk hatine ragihînine we.

Ferhenga Kurdî-Tirkî, ku encama ked û xabata bi salan bû, derket. Ferhenga Kurdî-Tirkî ya Zana Farqînî, wek me dabû xuyakirin ku amadehiya wê bi salan domiya ku çavên her kurdî lê bû û kesên aleqedar li benda wê bûn, çapa wê ya duyemîn jî hat kirin. Ferhenga Kurdî-Tirkî, di avrêla 20-04'an de çap bû. Ev Ferhenga ku di encama kedê de hêja de amade bûye, tevî hev 166 hezar made ye. Ji wan 131. 266 serê madeyê û 35 hezar jî berdewamiya serê madeyê ne. Ferhenga navborî jî 2132 rûpelan pêk hatiye. Ferheng, xwedî ebateke mezin e û bi kaxizeke biqalîte hatiye çapkirin.

Di avrêla 2005'an de jî çapa wê ya duyemîn hate ki-

rin. Di vê çapa nû de guherîna tenê ji aliyê gramaja kaxîzê wê ve ye.

Ligel vê yekê, Enstîtuyê çapa duyem a Ferhenga Tirkî-Kurdî jî kir, ku ev jî ji aliyê Zana Farqînî ve hatibû amadekirin. Ev çapa duyemîn a Ferhenga Tirkî-Kurdî, bi çapa pêşîn a Ferhenga Kurdî-Tirkî ya yekemîn re derket.

Yek ji xebatên Enstîtuyê jî pirtûka Kurdiya Nûjen a Çeto Özel bû. Wek tê zanîn, Kurdiya Nûjen berê jî, ji aliyê Enstîtuya kurdî ya Stenbolê ve hatibû çapkirin. Nivîskarê wê Çeto Özel, heman pirtûk jî bo çapa duyemîn di ber çav re derbas kir, hin guherîna tê de kirin û hin mijar jî berfirehtir kirin. Vê xebatê jî du sal dom kir û piştî jî hêla Enstîtuyê ve jî nû ve hate amadekirin bi navê Kurdiya Nûjen-Destpêk di dawiya 2004'an de careke din hate çapkirin. Pirtûk, bi kaxîzên qûşe, bi wêne û bi awayekî rengîn e.

Ji bilî xebatên weşanê, Enstîtuya Kurdî beşdarî gelek panel, konferans, sempozyûm û xebatên bi vî rengî bû. Serokê Enstîtuyê Şefîk Beyaz, di Festîvala Amedê de beşdarî panela der barê zimên de bû û teblîxek pêşkêş kir. Di Festîvala Batmanê de Serokê Beşa

Wêjeyê Alattîn Aktaş wek panelîst tevî panela li ser zimên, endamê rêveberiyê Qahir Bateyî wek panelîst beşdarî panela li ser wêjeyê û Serokê Beşa Dîrokê Hesen Baraçkiliç jî wek wek panelîst beşdarî ya li ser dîrokê bûn. Endamê rêveberiyê Yaşar Eroglu jî wek panelîst beşdarî panela Weşanên Aramê bû ku li ser zimên, li Tûyap Kitap Fuariyê hat lidarxistin. Dîsan Serokê Beşa Ziman Zana Farqînî wek panelîst beşdarî panela li ser zimên bû ku xwendekarên zanîngehê, li loka TMMOB'ê pêk anî bûn.

Serokê Beşa Ziman Zana Farqînî, xebata perwerdeyî ya li ser rêziman û rastnivîsa zimanê kurdî da destpêkirin û xebatkar û endamên enstîtuyê beşdarî lê kirin.

Çalakiyeke girîng a Enstîtuya Kurdî jî, Xelata Zimên a li ser navê rehmetî Feqî Huseyn Sagniç bû. Di salvegera duyemîn a mirina wî de ew hate bi bîranîn û li ser navê wî Xelata Zimanê Kurdî hate dayîn. Dê ev Xelata Zimanê Kurdî ya Feqî Huseyn Sagniç her sal bê dayîn. Jixwe ev biryar jî di Kongreya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ya Heştamîn de hatibû standin ku Enstîtu li ser navê Feqî Huseyn xelata zimanê

kurdî bide û vê yekê jî her sal berdewam bike.

Ev xelatdayîna ji aliyê Enstîtuyê ve, cara yekem bû û wek deynekî li hemberî kesên ku ji bo ziman, çand, dîrok û wêjeya kurdî ked dane, li ser Enstîtuyê bû. Bi rastî her netewe, gava yên ji bo wê difikirin, diafirînin, ji bo ziman û çanda wê bi pêş ve biçe keda xwe didin, bi tiştên cur bi cur şanaz dikin û bi kirinên wiha ew bi xwe jî bilind dibin. Ev rewş, di dîroka gelan de asteke nûjen e. Nirxên gelan ên ku ji daboriyê tîn û yên hemdem bi vî awayî hem tîn parastin û hem jî tîn bipêşxistin. Enstîtuya Kurdî jî, bi vê zimanê tevgeriya.

Îsal wek destpêk, di roja bîranîna mirina Apê Feqî de Xelata Zimên hat dayîn. Komisyona ku ji bo tespîtkirina xelatgir hatibû avakirin, biryara xwe li ser Zana Farqînî da û rêveberiya Enstîtuyê jî ev biryar pejirand. Bi vî awayî Zana Farqînî wek kesê xelatgirê pêşîn ê Xelata Zimanê Kurdî ya Feqî Huseyn, layîq hate dîtin

Zana Farqînî, bi salan e li ser zimanê kurdî xebatên hêja dike û bi van xebat û lêkolînan xwe jî tê teqdîrkirin. Ji bo nimûne, di encama xebatên dûr û dirêj de mora xwe li du ferhengên giranbiha da. Zana Farqînî Xelata Zimên a Yeke-mîn bi destê endamê Senato-ya Enstîtuyê Îsmet Kiliçaslan girt. Di axaftina xwe de Zana Farqînî wiha got:

"Ez gelek şad im ku ez xelatgirê pêşîn ê Xelata Zimanê Kurdî ya Feqî Huseyn Sagniç im. Feqî Huseyn mamosteyê min bû, keda wî li ser min heye. Ew ne tenê zimanzan bû, bi rastî ew kesekî wisan bû ku di navbera kesên medreseyê û dibistanê de pirek bû. Ew kesekî wisan bû ku mirov bi hêsanî dikare bibêje ew nîşaneya nefsbîçûkiyê bû jî. Heta ji min bê, ez dê girêdayî taybetmendiyên wî bim. Ji ber ku hevalan ez liyaqî vê xelatê dîtîme, ez spasdarê wan im.

Di kesatiya Feqî Huseyn de, ez bejna xwe li ber hemû zimanzanên kurd ên ku rê li ber me vekirine, dîtewînim û dibêjim mala we ava ey kesên ku ji bo me du kevir danîne ser hev û rê li ber me xweş kirine."

Wekî tê zanîn 18 Avrêlê dîroka damezirandina Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ye. Ji ber ku ew roj rastî roja duşemê dihat, şeva Enstîtuyê di 17'ê Avrêlê de hate lidar-

xistin. Enstîtuya Kurdî, bi şahiyekê 13. sala xwe ya damezirandinê pîroz kir û gelek kes û şexsiyetên xuyanî beşdarî şeva Enstîtuyê bûn.

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di vê şahiyê de ji ber ked û xebatê, plaketa da sê damezirînerên xwe Îsmail Beşikçi, Cemşîd Bender û Îbrahîm Gurbuz. wek me li jor anî zimên, divê dilsozî û wefa li hember kedên nirxbar hebe.

Civaknas Îsmail Beşikçi, ji bo kurdan pir xebatên kêrhatî kirine. Bi xebat û berhemên xwe, di hişyariya neteweyî ya gelê kurd de cihekî wî ye gelek mezin heye. Bi helwesta xwe ya zanyarî bûye nimûneyek. Ew rûmet û serbilindiya zanist û mirovahiyê ye. Wijdanê gelê tirk e.

Cemşîd Bender jî, bi lêkolînan û xebatên xwe yên li ser dîrok û çanda kurdî xwedî kedeke giranbiha ye. Her wiha Îbrahîm Gurbuz jî, ji dema avakirina Enstîtuyê ta roja îro ji bo Enstîtuya Kurdî û saziyên çandî yên gelê kurd



xwedî kedeke bijarte û berbiçav e.

Di şeva Enstîtuyê de, ku li Varans Restourantê li Bakirkoya Stenbolê pêk hat, van her sê damezirînerên hêja yên Enstîtuyê plaketên xwe ji destê serokê Enstîtuyê Şefîk Beyaz girtin.

Îsmail Beşikçi di axaftina xwe de spasiyên xwe ji bo Enstîtuya Kurdî pêşkêş kirin û got: "Tenê li Stenbolê çar milyon kurd dijîn, lê mixabin rojnameye wan e rojane nîn e. Ev nakokiyê mezî e. Hin rewşên nîvîskarên kurd dibêjin, em ji tirkî hez dikin, ji ber wê em bi tirkî dinivîsin. Ev ne duristî ye. Divê kurd zimanê dewleta ku zext û zorê bi wî zimanî li wan dike û bi wî zimanî fermana koçberî û kuştinê dide, biterikînin. Ew çawan dikarin ji wî zimanî hez bikin, ev rewşeke ne durist e."

Piştî Beşikçi Cemşîd Bender xelata xwe stend û wiha got: "Ez kurd im. Lê mixabin, ez bi kurdî nikarim biaxivim û binivîsim. We bi vê xelatê piştvanîyê mezî li min û xebatên min kir. Gelek kes devdirêjiya min û xebatên min dikin. Min divê ez bidim xuyakirin ku hemû xebatên min bi belge û palpişt in. Kesên ku dixwazin ez amade me ku belgeyan nîşanî war bidim. Ji ber vê xelatê ez gelek şad û bextewer im."

Di pey Bender re Îbrahîm Gurbuz xelata xwe ji destê Şefîk Beyaz stend û bi kurtasî

wiha axivî: "Ez ji bo van rojan bejna xwe li ber Apê Musa û Apê Feqî ditewînim. Dil dixwest ku îro ew jî di nav me de bûna. Divê ku saziyên kurdan bi her awayî mezin û dorfireh bibin. Ji bo me saziyên wek zanîngeh, weqf, TV û radyo divên."

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi Enstîtuya Zimanê Kurdî ya Amedê re, li Amedê Otela Kervansarayê şeveke hevbeş li dar xist. Ev şev ji bo danasîna herd du enstîtuyan hat amadekirin. Di serî de Serokê Şarederiya Mezin Oman Baydemir gelek serokên şarederiyên û kesên din beşdarî şevê bûn. Şev bi geş û coş, bi serketî derbas bû.

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di vê navberê de hin pirtûk jî çap kirin. Belge û axaftinên Konferansa Wêjeya Rojhilata Navîn û Pirçandiyê deşîfre kirin û wek pirtûk çap kir. Pirtûkên H. Mem, Mamosteyê Seyemîn Xanî û Tesewira Xaniyê Fîlozof ku berê bi tirkî hatibûn weşandin, îcar li zimanê kurdî (kurmancî) hatin wergerandin û ji aliyê Enstîtuyê ve hatin çapkirin. Enstîtuyê berhema H. Mem "Üçüncü Öğretmen Xanî" ji nû ve wek çapa duyem da çapkirin. Dîsan xebata dawî ya H. Mem "Mem û Zîn İdeal Memê Alan Destan Masal" weşand.

H. Mem di vê xebata xwe ya dawî de Mem û Zîn û Destana Memê Alan dide berhev û cudatîyên wan û

taybetîyên wan dide nasîn û bi dîtinên xwe yên cihê reng şîrove dike.

"Dîroka Nijada Şêrwan", ji aliyê mîrê Şêrwanê Salihê Kurê Xan Budaq ve bi zimanê erebî hatiye nivîsandin. Salihê Kurê Xan Budaq ku di sedsala 19'an de jiyaye, di vê berhemê de li ser nîjad û mîrekên Şêrwanê radiweste. Ew pirtûkeke belgeyî ya destnivîsar ji aliyê endamê senatoya enstîtuya me Kerem Soyly ve ji erebî li kurmancî hate wergerandin û Enstîtuyê ew di meha adara 2005'an de da çapkirin.

Pirtûka Samî Tan "Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî" ji hêla Enstîtuya me ve hate çapkirin. Pirtûk ji 352 rûpelan pêk tê û mijarên rastnivîsa rêzimanê kurmancî bi berfirehî hildaye dest.

Destûrnameya Enstîtuyê ya nû jî wek kurtepiştûk hat çapkirin.

Pirtûkên ku ji aliyê Sida (Swedish International Development Cooperatin Agency) ve hatibûn finansekirin û Weqfa Kurdî ya Kulturî ya li Stockholmê û Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi hev re çap û belavkirina wê girtibûn ser xwe, ji aliyê Enstîtuya Kurdî ve hatin belav kirin. Piştî pirtûkên beşa yekem, di meha avrêlê de îcar pirtûkên beşa duyem ji çapê derketin. Beşa duyemîn a van pirtûkan ji pênc hebên kurmancî û ji çar hebên kirmanckî (dimilî) pêk hatiye.